



**K. T.**

**ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ  
ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ  
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Ê ÇANDA KURDÎ**

**TEZA LÎSANSÂ BİLIND**

**BERHEVXITNA CÎNAVKÊN KESÎ DI  
KURMANCIYA JORÎN Ê JÊRÎN DE**

**Gharib Ali Salih SALIH**

**WAN - 2017**

**K. T.**  
**ZANÎNGEHA YÛZÛNCÛ YILÊ**  
**ENSTÎTUYA ZIMANÊN ZINDÎ**  
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN û ÇANDA KURDÎ**

**TEZA LÎSANS A BILIND**

**BERHEVXITNA CÎNAVKÊN KESÎ DI**  
**KURMANCIYA JORÎN Û JÊRÎN DE**

**Amadekar**  
**Gharib Ali Salih SALIH**

**Şewirmend**  
**Alk. Doç. Dr. Metin BARLIK**

**WAN - 2017**

**T.C**  
**YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ**  
**YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ**  
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**YUKARI VE AŞAĞI KURMANCI'DEKİ**  
**ŞAHIS ZAMİRLERİNİN TOPLANMASI.**

**HAZIRLAYAN**  
**Gharib Ali Salih SALIH**

**DANIŞMAN**  
**Alk. Doç. Dr. Metin BARLIK**

**VAN - 2017**



T.C.  
YÜZÜNCÜ YIL ÜNİVERSİTESİ  
Yaşayan Diller Enstitüsü

TEZ KABUL TUTANAĞI

YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Yrd. Doç. Dr. Metin BARLIK danışmanlığında, Gharib Ali Salih SALIH tarafından hazırlanan “Berhevistina Cinavkên Kesî de Kirmanciya Jêrîn û Jorîn” adlı bu çalışma, 09/05/2017 tarihinde aşağıdaki jüri tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

Başkan(Danışman) : Yrd. Doç. Dr. Metin BARLIK

İmza:

ÜYE : Yrd. Doç. Dr. Nesim SÖNMEZ

İmza:

ÜYE : Yrd. Doç. Dr. İbrahim SÜRÜCÜ

İmza:

ÜYE : .....

İmza:

ÜYE : .....

İmza:

ONAY: Yukarıdaki imzaların, adı geçen öğretim üyelerine ait olduğunu onaylım.

Prof. Dr. Murat DEMİREL

Enstitü Müdürü



## NAVEROK

NAVEROK.....	i
KURTKÎRÎN.....	iv
KURTE.....	v
ÖZET.....	vi
ABSTRACT.....	vii
SPASÎ.....	viii
PÊŞGOTÎN.....	ix
DESTPÊK.....	1
1 HIN AGAHİYÊN TEORIYA CÎNAVK Û CÎNAVKÊN KESÎ:.....	4
1.1 Agahiyên Teoriya Cînavkê:.....	4
1.1.1 Danasîna Cînavkê:.....	4
1.1.2 Rastiya Cînavk û Cênaw û Têgeh(Têrim)ên Din:.....	11
1.1.3 Dabeşkirina Cînavkê li Gorî Dîtina Kevin û Nû:.....	21
1.2 Hin Agahiyên Teoriya Cînavkên Kesî:.....	24
1.2.1 Danasîna Cînavkên Kesî:.....	24
1.2.2 Taybetî û Cureyên Cînavkên Kesî di K. Jorîn û jêrîn de:.....	27
2 ŞÎROVEKIRNA MORFOLOJÎ Û MORFOFONÊMIYA CÎNAVKÊN KESÎ:.....	45
2.1 Morfolojiya Cînavkên Kesî ya K.Jorîn:.....	45
2.1.1 Cînavkên Serbixwe Desteya Xwerû:.....	45
2.1.2 Cînavkên Serbixwe Desteya Tewandî:.....	46
2.1.3 Cînavkên Pêve:.....	48
2.2 Morfolojiya Cînavkên Kesî Ya K. Jêrîn:.....	52
2.2.1 Cînavkên Serbixwe:.....	52
2.2.2 Cînavkên Pêve Desteya Bihêz:.....	53
2.2.3 Cînavkên Pêve Desteya Bêhêz:.....	55
2.3 Şîrovkirina Morfofonêmiya Cînavkên Kesî:.....	62
2.3.1 Morfofonêmi:.....	62
2.3.2 Morfomonêmiya Cînavkên Kesî Yê K. Jorîn:.....	64
2.3.3 Morfofonêmiya Cînavkên Kesî Yê K. Jêrîn:.....	71

2.4	Berhevixistina Fonolojiya Cînavkên Kesî Di Navbera K.Jêrîn û Jorîn: .....	82
2.4.1	Ji Aliyê Cudatîyê Ve: .....	82
2.4.2	Ji Aliyê Wekhevîyê Ve: .....	84
2.5	Tevlîbûna Hinek ji Cînavkên Kesî di Navbera Herdû zaraveyan de: .....	86
2.5.1	Cînavkên Kesî yên Serbixwe: .....	86
2.5.2	Cînavkên Kesî yên Pêve: .....	91
3	ROL Ê ERKA CÎNAVKÊN SERBIXWE DI HEVOKSAZÎYÊ Ê RÊKEFTINÊ DE: 95	
3.1	Rol ê Erkên Hevoksaziya Cînavkên Desteya Xwerû(K. Jorîn): .....	95
3.1.1	Di Rola Kirdeyê de: .....	95
3.1.2	Di Rola Nîhadê de:.....	96
3.1.3	Di Rola Cîgira Kirdeyê de: .....	98
3.1.4	Di Rola Bireserê de:.....	100
3.1.5	Di Rola Têrkerê de:.....	100
3.1.6	Di Rola Raveberê de: .....	101
3.1.7	Di Rola Ravekerê de: .....	103
3.2	Rol ê Erkên Hevoksaziya Cînavkên Desteya Tewandî (K. Jorîn): .....	103
3.2.1	Di Rola Kirdeyê de: .....	103
3.2.2	Di Rola Nîhadê de:.....	103
3.2.3	Di Rola Cîgira di Kirdeyê de: .....	103
3.2.4	Di Rola Bireserê de:.....	104
3.2.5	Di Rola Têrkerê de:.....	104
3.2.6	Di Rola Raveberê de: .....	105
3.2.7	Di Rola Ravekerê de: .....	105
3.3	Rol ê Erkên Hevoksaziya Cînavkên serbixwe ya (K. Jêrîn): .....	106
3.3.1	Di Rola Kirdeyê de: .....	106
3.3.2	Di Rola Nîhadê de:.....	107
3.3.3	Di Rola Cîgira Kirdeyê de: .....	108
3.3.4	Di Rola Bireserê:.....	109
3.3.5	Di Rola Têrkerê de:.....	109
3.3.6	Di Rola Raveberê de: .....	110
3.3.7	Di Rola Ravekerê de: .....	113
3.4	Şîroveya Rêkeftinê di Her Du Zaraveyan de: .....	115

3.4.1	Şîroveya Rêkeftinê:.....	115
3.4.2	Rola Rêkeftina di K. Jorîn de:.....	118
3.4.3	Rola Rêkeftina di K. Jêrîn de:.....	123
3.5	Berhevistina Hevoksazî û Sîstema Rêkeftinê di Cînavkên Serbixwe de: .....	126
3.5.1	Ji aliyê cudahiyê ve:.....	126
3.5.2	Ji Aliyê Wekheviyê ve: .....	127
4	ŞÎROVEYA HEVOKSAZIYÊN CÎNAVKÊN PÊVE: .....	128
4.1	Hevoksaziya Cînavkên Pêve ya (K. Jorîn):.....	128
4.1.1	Di Rola Kirdê de: .....	128
4.1.2	Di Rola Nîhadê de:.....	131
4.1.3	Di Rola Cîgira Kirdeyê de: .....	135
4.1.4	Di Rola Bireserê de:.....	137
4.1.5	Di Rola Têrkerê de:.....	137
4.1.6	Di Rola Têrker, Bireser û Kirdeyê de bi Hev re: .....	137
4.1.7	Di Rola Ravekerê de: .....	138
4.2	Hevoksaziya Cînavkên Kesî Pêve ya K. Jêrîn: .....	138
4.2.1	Di Rola Kirdeyê de: .....	138
4.2.2	Di Rola Nîhadê de:.....	144
4.2.3	Di Rola Cîgira Kirdeyê de:.....	152
4.2.4	Di Rola Bireserê de:.....	153
4.2.5	Di Rola Têrkerê de:.....	157
4.2.6	Di Rola Têrker, Bireser û Kirdê de bi Hev re: .....	160
4.2.7	Di Rola Ravekerê de: .....	163
4.3	Berhevistina Cînavkên Pêve ya K. Jorîn û Jêrîn di Rola Hevoksaziyê de:.....	168
4.3.1	Ji Aliyê Cudahiyê Ve:.....	168
4.3.2	Ji Aliyê Wekheviyê Ve: .....	169
	ENCAM:.....	172
	ÇAVKANÎ:.....	176
	XWE JÎNENÎGARÎ .....	185

## **KURTKİRİN**

B. :	Borî
C.:	Cînavk
D. :	Dem
Ger:	Gerguhêz
Hej. :	Hejmar
Neger. :	Negerguhêz
K:	Kurmancî
L. :	Lêker
Pir.:	Pirjimar
Q. :	Qertaf
R. :	Rupel
Ra.:	Rayek
Neb.:	Neborî
T.	Têrker
Yek.:	Yekjimar
⊗ :	li nav çûn
+ :	Di gel
* :	Na rêzimanî
→ :	Dibe be
Ø:	Morfîma Sifir
/:	an



## KURTE

Armanca vê lêkolînê berhevistina şîrovekarî di navbera du zaravayên giring yê zimanê Kurdî de ne. Her wek tê zanîn Kurmanciya Jorîn û Jêrîn di Kurdî de zaravayên herî dewlemend û belavbûyîne. Ev lêkolîn jî berhevistina Cînavkên Kesî di Kurmanciya Jorîn û Jêrîn e. Bikaranîna termînolojîya Kurmanciya Jorîn di herdû astên peyvsazî û hevoksazîyê de hatiye şîrove kirin û dahûrandin. Piştî jî wekhevî û cudahîyên herdûyan hatine diyar kirin. Cînavkên kesî di her du zaraveyên zimanê Kurdî de dibine du beş, yek bi awayekî serbixwe tên, yek jî bi awayekî pêve tên. Di Kurmanciya Jorîn de du cûreyên serbixwe hene, cûreyeke jî pêve heye lê di Kurmanciya Jêrîn de yek cûreyek serbixwe heye, du cûreyên pêve hene.

Ev lêkolîn ji kurte, pêşgotin, encam û ji çavkaniyê tevîhev jî ji çar beşan pêk tê. Di van beşan de bi awayekî kûr amaje bi taybetmendî û cûreyên cînavkên kesî di her du zaraveyan de; her wiha teşe û erkên hevoksaziyane yê cînavkên kesî bi mînakên zanistî hatine diyar kirin.

## ÖZET

Bu çalışmada amaç; Kürtçe'nin önemli iki lehçesi arasındaki farklılıkların yorumlanarak toplanmasıdır. Bilinen kadarıyla yukarı Kurmanci ile aşağı Kurmanci lehçeleri Kürtçe'nin en zengin ve en yaygın lehçeleridir. Bu çalışmada juri Yukarı ve Aşağı Kurmanci'deki Şahıs Zamirlerinin toplanması. Yukarı Kurmanci'nin terminolojisi kullanılarak her iki seviyenin kelime ve cümle yapısı yorumlanıp, analiz edilmiştir. Daha sonra da benzerlik ve farklılıkları belirtilmiştir. Şahıs zamirleri her iki lehçelerde de ikiye ayrılır; bağımsız ve bitişik gelenler. Yukarı Kurmanci lehçesinde iki tür bağımsız, bir de bitişik tür vardır; ancak aşağı Kurmanci lehçesinde bir tür bağımsız iki tür de bitişik zamir vardır.

Bu çalışma; özet, önsöz, sonuç ve kaynakça olmak üzere toplam dört bölümden oluşuyor. Bu bölümlerde derin bir şekilde her iki lehçelerdeki zamirlerin tür ve özellikleri üzerinde durulmuştur. Bunun yanında şahıs zamirlerinin cümle dizimindeki stil ve lehçelerdeki vazifeler bilimsel bir şekilde örneklendirilerek, belirtilmiştir. Aşağı

## **ABSTRACT**

The objective of this research is to analyze and compare two different great dialects in Kurdish language. As it is known both dialects of Kurmanji, Zhuru and Zeri are widely used in Kurdistan. This research is a comparative analysis of personal pronouns in Zhuru and Zeri in both syntactical and Morphological levels. Using the terminological method, the personal pronouns are explained and analyzed in each dialect. And then the common and difference points in both dialects are illustrated. The personal pronouns in both dialects can be classified in two groups; first group is written independent in a sentence, and the second group is added to the words (nouns, verbs) as suffixes in sentences. The personal pronouns of Kurmanji-Zhuru have two independent groups and one added to the words (Nouns, Verbs) as suffixes in sentences but in Kurmanji-Zeri there's one independent group and two groups added to the words as suffixes

This research includes abstract, introduction, four chapters, results, and resources. In each chapter we have precisely indicated the character and all kinds of personal pronouns in both dialects, besides exposing the form and syntactic duties of personal pronouns with examples

## SPASÎ

Ez pir spasiyan mamosteyên hêja û rêzdar ên beşê zimanê kurdî li Zanîngeha Yüzüncü Yılê dikim ku bi ked û dilsoziyeke herî mezin bi me re westiyan. Her wiha ez pir sipasiya Alk. Doç. Dr. Metîn BARLIK dikim ku erkê serpereştîkirina vê lêkolînê li stûyê xwe girt. Her wisa vê xebatê pêşkêşî ruhê bavê xwe, diya xwe û hemû malbata xwe dikim û her wisa ji bo gelek heval û dostên xwe bi rûmet ji bakûr û başûrê kurdistanê dikim, gelek alîkarê bi min kirin.

Xerîb Elî Salih SALIH

21. 03. 2017



## PÊŞGOTÎN

Eşkereye K. Jorîn û K. Jêrîn du zaraveyên herî zengîn û berbelavên zimanê kurdî ne. Agahiyên giştî yên derbarê K. Jorîn û K. Jêrîn de kême zêde tên zanîn. Her du zaraveyên kurdî bi gelek merheleyan de derbas bûn e. Di sed sala borî de gelek caran ketine bin zilmê û li hev durketin û qedexa kirinê. Gelek xebat û lêkolîn bi awayê serbixwe tenê li ser zaraveyekî hatine kirin. Ji ber ku zimanê standard a kurdî tune ye û her du zarave zêdetir bi awayên cuda tên dahûrandin, ji ber wê tenê xebat li ser yek zaraveyê kêmasî ye, her çiqas ew xebatên ku bi awayê cuda tenê li ser zaraveyekî hatine kirin jî îro rîya me ron dike. Cînavk jî yek ji here giringtirîn mijarên rêzimana zimanê kurdî ye. Bi awayek her kes dema diaxive di her hevokekê de herî kême cînavkêke bi kar tîne, cureyên cînavkê jî gelek in, Ya herî giring cînavkên kesî ne ku her tim cihê nîqaşê bûne di lêkolînên zimanê kurdî de. Cînavkên kesî bi xwe jî dabeş dibin bi ser du cureyên cînavkan; yek bi awayê serbixwe ne ku di K. Jorîn dibine yan xwerû yan jî tewandî, di K. Jêrîn tenê ya xwerû ne, cureya duyem jî yên pêve ne ku di K. Jorîn de tenê yek desteye, di K. Jêrîn de du destê cînavkên pêve hene desteyek her çiqas ne tewandî ne, erk û rola wan di hevokê de mîna desteya cînavkên tewandi ye. Me di vê xebatê de awayê standard û normala her du zaraveyên kurdî berhev xistine li gor têrmonoljiya K. Jorîn li hin cihan pêdiviya me bi termên K. Jêrîn û termên navnetewî(Ingilîzî) hebû ne û bikar anîne.

## **DESTPÊK**

### **Nav û nîşana tezê**

Ev lêkolîn bi nav û nîşana "Berhevxiştina Cînavkên Kesî di K. Jorîn û Jêrîn de" ye ev jî tê vê wateyê tê tez ji bo dahûrandin û diyarkirina teşe û cureyên cînavkên kesî di warê morfolojî (peyvsazî) û kar û rolên cînavkên kesî di warê hevoksaziyê de. Diyarkirina xalên mîna hev û cuda. Her çiqas gelek çavkaniyan de bi K.Jorîn tenê dibê "kurmancî", bi K.Jêrîn jî dibê "Sorani" di rastî yê de ev şaş e, ji ber ku her du zarave kurmancîne yek jorîn û yek jî jêrîn e. Her wisa di zimanê kurdî de peyva "Sorani" ji bo zareveke kurdî bingeha wê tune ye.

### **Sedema helbijartina vê mijarê:**

Sedema helbijartina vê mijarê ji bo tezê û lêkolînê, ji ber vê ye ku piraniya zimanvan û rêzimanivîsên K. Jorîn û K. Jêrîn ev mijar şîrove kirine. Tenê di nav zaraveyekî de yan jî ger yekî behsa zaraveyên din kiribe tenê wek têbînî yan gotaran de bi hev re behis kirine. Tu lêkolînî akademîk ya berhevxiştina cînavkan de di navbera K. Jorîn û K. Jêrîn tune ye. Her çiqas jî ev du zarave, du zaraveyên herî giring û berbelav in jî ji bilî vê ku cînavk bi xwe mijareka here giring e di warê hevoksaziyê de.

### **Sînora tezê "çarçoveya tezê"**

Sînora tezê di navbera her du zaraveyên jorîn û jêrîn de ye. Ji aliyê du astên zimanvanî ku asta morfolojî û asta hevoksaziyê ye. Mînakên vê lêkolînê jî di axaftinê rojane û çavkaniyên taybetin bi devok û zaraveyên K. Jorîn û Jêrîn in. Her wisa me awayê standarda her duyan şîrove û dahûrandiye.

### **Giringiya Pêşniyarkirina Tezê:**

Bêguman tu kar û xebatên teqez tune ye. Ji ber vê di nav xebat û lêkolînê me jî de kêmasî hene lê em dikarin bêjin: ev xebat dê bibe sedema li hev nêzîkbûna her du zarave û kêmkirina wan valahî û kêmasiyên di warê lêkolîn û xebatên ziman û rêzimana kurdî de hene. Ji ber ku me di teza xwe de: Şîroveya cînavkên kesî yê K. Jorîn û K. Jêrîn bi têrmonolojiya K.Jorîn bi wan êkolên zimanvanî yê ku K. Jêrîn pê

hatiye lêkolandin. Her wisa şîroveyên cînavkên kesî yên K. Jorîn û K. Jêrîn di her du astên peyvsazî û hevoksaziyê de diyarkirina erk û rolên wan. Diyarkirina awayên kevin û li hev nêzîkbûna cînavkên kesî ya devokên her du zareveyan, li awayê standarda hev û din e. Ya herî giring jî diyarkirina, wekhevî û cudahiye cînavkên kesî yên her du zaraveyan.

### **Pergal û Rêbaza Tezê:**

Di vê tezê de rêbaza, lêkolîna wesfî hatiye peyrewkirin. Piştî komkirina van mînak û kereseyan hatine şîrovekirin û berhevexistin. Her wisa hin hevok û mînak bi awayê hêlkarî û zagonî hatine nîşandan û şîrovekirin.

### **Arîşeyên tezê**

Li hevnekirina zimanvanan li ser têgeh û tîrmên zanistiyê. Hebûna boçûnên cuda di nav yek zaraveyê de, her çiqas her du zarave jî yek ziman in lê cudahî gelek di warê tîrm û têgehên her du zaraveyan de hene mîna du zimanên cuda ne.

### **Naveroka tezê**

Ev tez dibe çar beş:

**Beşa yekem:** Agahiyên teoriya cînavk û cînavkên kesî ne; Dibe du par:

Para yekem behsa teoriya cînavkê bi giştî; Behsa danasîna cînavk, zarave û têgîna cînavkê û cureyên cînavkê hatine şîrovekirin. Di her du zaravan de bi hev re. Para duyem jî behsa teoriya cînavkên kesî; taybetî û danasîna cînavkên kesî, cureyên cînavkên kesî di her du zaraveyan de bi awayên cuda bi awayeka di K. Jorîn de du deste cînavkên kesî yên serbixwe desteyeke pêve jî hatine diyarkirin. Desteya pêve jî ji bo hêsaniyê lêkolîn û fêmkirinê me kiriye çar desteyên dine piçûkin. Di K. Jêrîn de desteyeke serbixwe û du desteyên bingehî yên pêve hene. Bi navê desteya bihêz û desteya bêhêz, her wisa desteya bêhêz jî me kiriye sê desteyên dine piçûk.

**Beşa duyem:** Şîrovekirina morfolojî û morfofonemî cînavkên kesî ye; Dibe pênc par:

Para yekem û duyem; morfolojîya cînavkên kesî di her du zaraveyan de û diyarkirina teşe û taybetiyên cînavkên kesî yên serbixwe û yên pêve di her du zara-

veyan de bi awayê cuda. Para siyem; şîroveya morfofonêmiya cînavkên kesî di her du zaraveyan de û teşe û cureyên wan hatine şîrovekirin. Para çiwrem; berhevxiştina xalên cuda û wekheviya her du zaraveyan di warê morfolojî û morfofonêmiyê hatiye diyarkirin. Para pêncem; şîroveya cînavkên kesî yên serbixwe û yên pêve di devokên her du zaraveyan de nêzîkbûn û têvlîbûna wan, di awayê standarta her du zaraveyan. Bi mînak û delîlên zanistî hatiye îspatkirin.

**Beşa siyem:** Taybetî bi şîrovekirina hevoksaziya cînavkên kesî yên serbixwe, rol û erkên wan di hevokê de û her wisa awayê rêkeftina cînavkên kesî di her du zaraveyan de, ji bo her yek wan erk û rola wan me tenê yek mînak daye; Dibe pênc par:

Para yekem û duyem; erk û rolên cînavkên kesî yên serbixwe ya K. Jorîn di hevokan de, ji ber ku hejmara rûpelên tezê zêde nebin ku para yekem ji bo desteya xwerû ye. Para duyem jî ji bo deseya tewandî ye, para siyem jî taybetî bi erk û rolên cînavkên kesî yên serbixwe ya K. Jêrîndi hevokan de, para çarem jî cînavkên kesî di rola rêkeftin de di her du zaraveyan de bi awayê cuda hatine şîrovekirin. Para dawî jî taybetî bi berhevxiştin û xalên cuda û wekheviya her du zaraveyan di warê hevoksaziya cînavkên serbixwe û rola cînavkên kesî di rêkeftina kereseyên hevokê de.

**Beşa çarem:** Taybetiya bi şîrovekirina hevoksaziya cînavkên kesî yên pêve di her du zaraveyan de; li gor dem, awayî û cureyên lêkeran ku ji bo her yek cureyekî mînak bikar aniye, her gavek li kesên din de jî awayekî awarte hebe me dîtibe behs jê kiriye û mînak bikar aniye; Dibe sê par:

Para yekem; awayên kar kirin û erk û rolên cînavkên kesî yên pêve ya K. Jorîn di hevokan de, para duyem jî awayê kar kirin û erk û rolên cînavkên kesî yên pêve ya K. Jêrîn di hevokan de, para dawî jî berhevxiştina her du zaraveyan û diyarkirina xalên wekhevî û cudahiya her du zarave di erk û rolên cînavkên pêve di hevokan de ye.



# 1 HIN AGAHİYÊN TEORIYA CÎNAVK Û CÎNAVKÊN KESÎ:

## 1.1 Agahiyên Teoriya Cînavkê:

Her weke ku tê zanîn, zanayên zimên ji mêj ve, li gor xwezaya peyv û erkan di dema axaftinê de, li ser lêkolîn û dîtina beşên axaftinê xebitîne.<sup>1</sup> Ji bo hêsan be, lêkolîn li gor teşe û cihê derkeftin û erka wan di dema axaftinê de, bi beşên cuda ji hev hatine veqetandin. Yek ji wan beşan jî "Cînavk" e. Ji ber vê em berî her tiştî, divê bizanin; gelo cînavk beşek ji beşên axaftinê ye? Cihê wê di ziman û rêziman de li ku ye? Cînavk çi ye, peyv e? Ger ku peyv be, peyveke erkî ye yan ferhengî ye? Cûrên wê hene an na? Gelo hejmarên wê diyar in an na? Gelo yên dibin cînavk, hejmarên wan tên zêdekirin an dikarin zêdetir bibin? Mirov di dema axaftinê de wan çiqasî bi kar tîne? Cihê wan çi ye di ziman de? Gelo danasînên ku ji aliyê rêzimanzanan ve hatine kirin ji bo me têra danasîna cînavkan dikin? Ev têgehên ku wek cînavk hatine bikaranîn çi ne û kîjan in?

### 1.1.1 Danasîna Cînavkê:

Zimanzanên ku di warê rêzimanê de xebitîne bi taybetî li ser cînavkan gelek lêkolîn kirine û bi danasînan xwestine bikaranîna cînavkan nîşanî me bidin, da ku vê mijarê zelal bikin. Piraniya wan rêzimanivîsan di bin bandora zimaneke din, di bin bandora ekoleka zimaneyanê danasîna cînavkan kirine. Em jî hin ji wan danasînan bînin pêşberî xwe û wan şîrove bikin, li gorî agahiyên xwe; ji bo em bizanin wan cînavk bi me daye nasîn an na.

❖ Hin Danasînên Cînavkê di K. Jorîn de:

- *"Pronav ew bêje ye ku dikeve şûna navdêrê. Pronav, mêjer û carina jî zayenda navdêrê dide zanîn. Ji hêla din pronav wezîfeyên navdêrên ku dinimîne li ser xwe digire û wan ditîne cih."*<sup>2</sup>
- *"Bêjeyeke serbixwe ye li şûna navdêrê bi kar tê û wê dinimîne."*<sup>3</sup>

<sup>1</sup>Mes'ud Mihemed, *"Hindê Babetî Ziman û Rênûsî Kurdî"*, Dezgayî çap û bilawkirdeneweyî Aras, Çapî duwem, Çapxaneyî Aras, Hewlêr, 2011, R.61.

<sup>2</sup> Bedirxan Celadet Alî, *"Bingehên Gramêra Kurmancî"*, Avêsta, Istanbul, 2010, R.55.

<sup>3</sup> Mihemed. E. Elî û Dîlan Elî, *"Nasîna Rêzimana Kurdî, Pirtûka fêrkirinê"* (PDF), Efrîn, 2012, R.34.

- *"Cînavkek di nav hevokê de ciyên navdêran digirin. Di kurmancî de cînavk bi awayê xwerû û diyarkirî ne. Wekî din ji aliyê teşeyî ve hinek ji wan peyv in û hinek ji wan jî qertaf in."*<sup>4</sup>
  - *"Cînavk bi xwe ne nav in lê di şûna navan de wek qertaf û peyvên tînan bikaranîn. Peywira navan pêk tînin."*<sup>5</sup>
  - *"Cînavk ew cureyên peyvê ku di nava hevokê de hem cihê navdêran digirin hem jî peywira wan digirin ser xwe. Her wiha hemû taybetiyên navdêran ên mîna tewang, mêjer, zayend û nêterê derbasî wan dibin."*<sup>6</sup>
- ❖ Hin danasînên Cînavk di K. Jêrîn de:
- *"Zemîr levzêke cêgay isim degrêw."*<sup>7</sup>
  - *"Bonaw kelîmeyêke ke lebatî nawê ke le pêşa witrabê yan bîsrabê bekelk ehênrê."*<sup>8</sup>
  - *"Witeyêke ya pîtêke leciyatî nawêk ya witeyêkîr bekarêhênrê ji bo mebestî dubare nekiridnewey wite le rîsteda."*<sup>9</sup>
  - *"Kontirîn wişey ferhengîye, lerûy wate û nîşaney rêzmannîyewe be naw, awelaw û jimare peyweste û weku cîgirî em beşey axawtin bekar dehênrê ..."*<sup>10</sup>
  - *"Cênaw beşêke le beşekanî axawtin, ke le cîgay nawî kesêk yen şîtêk dêt, wate debête cîgirewew naw."*<sup>11</sup>
  - *"Ew morfîmanen ke amaje bo kes deken û lebirî kes bekar dên"*<sup>12</sup>.

<sup>4</sup> Baran Bahoz, "Rêzmana Kurmancî", Çapxane: Kayhan Matbaacılı Davutpaşa Ced, Diyarbekir, 2012, R. 87.

<sup>5</sup> Aktuğ Halil, "Giramers Kurdî – Kürtçe Gramer", Avêsta, Stembol, 2013, R. 254.

<sup>6</sup> Ocek Nezir, "Waneyên Rêzmana Kurmancî", Sîtav, 2014, R. 110.

<sup>7</sup> Se'îd Sidqî Kaban, "Mitesir sirif û Nehuy kurdî", Cizî yek, çapî yekem, Çapxaney Nicîh, Bexdad, 1928, R. 28.

<sup>8</sup> Tewfîq Wehbî, "Desturî Zimanî Kurdî" Cizmî yekem, Dar El-Tabî'e El-HesîEs, Bexda, 1929, R. 82.

<sup>9</sup> Ahmed Hesen Ahmed, "Rêzmana Kurdî – Be kurdî û 'Erebî'", Bergî yekem, Çapî Yekem, Çapxaneyî Dar El-Cahz, 1976, R.158.

<sup>10</sup> K. K. Kurdoyêv, "Rêzimanî Kurdî be Kerestey Dîyalêktî Kirmancî û Soranî, Wergêr Kurdistan Mukiryân, Çapxaney El-Edîb El-Bexdadî, Bexdad, 1984, R. 133.

<sup>11</sup> Nerîman Xoşnaw, "Rêzimanî Kurdî", Çapî Siyemû Çap û Billawkirawey Ziyadkiraw, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2011, R. 27.

Ji bilî van rêzimannivîsên jorê gelek rêzimannivîsên din jî danasîn ji bo cînavkan kirine. Ne hewce ye em di vir de qala wan bikin, ji ber ku gelek in divê em xwendînek ji bo vê danasînê bikin di K. Jêrîn û jorîn de ne. Em dibînin ku K. Jorîn û jêrîn gelekî nêzîkî hev in û cudahî kêm di navbera wan de hene. Kêmaniya cudahiyan nayê wateya tunebûna cudahiyan, hemû li dor van xalên jêrin dizivîrîn:

- Teşey(Form)a Cînavk:

Di piraniya van danasînanên jor de, rêzimannivîs berî her tiştî xwestine teşeya cînavkê diyar bikin, ji ber ku dema em lê dinêhêrin her yekî ji wan gotiye, cînavk; levzêk e, bêjeyek (peyv) e, wate(bêje) ye an pîte(tîp)e, an peyv in an qertaf in hin ji wan jî gotine tenê peyv in...Hwd. Tiştê girîng di vir de ew e ku di zimanê kurdî de di herdu zaravayên kurdî de cînavk ne tenê tîpek e, ne tenê peyv e jî; ji ber ku di her du zaravayan de cînavk hene peyv e lê peyveke erkî ye, mînak: Cînavkên serbixwe "ez, em, tu... , min, ême, to..." bi tenê jî tên bikaranîn. Herwiha hin cînavk jî hene ku peyv in; ferhengî ne, mînak: Cînavkên nediyar "hîç kes, tu kes...." û gelek in jî. Hin cînavk jî hene tenê yek tîp in an du tîp in an sisê ne ku nikarin bi tena serê xwe bînan bikaranîn, mînak: Cînavkên kesê pêve(likaw) erka wan di hevokan de heye. Ji ber wê em ji wan re dikarin bêjin "morfîma benda rêzimanî" an jî "qertaf". Di dawî de ji bo teşeya cînavkê jî em dikarin bêjin cînavk "peyv e an morfîmeka rêzimanî ye"

- Li CihêNavdêran Tên:

Tiştêkî din jî ku piraniya rêzimannivîsên kurdî di vî tiştî de hem fikir in û wisa jî didin nasîn; " Cînavk tê cihê navdêran û dewsa navdêr û kes digire an jî destnîşanî navdêrekî dike." Ger em lê hûr bibin, dibînin ku ne merc e û ne hemû cînavk jî dewsa navdêran bigirin. Hin rêzimannivîs jî wisa dibêjin, ji ber ku cihê navdêran digire nav jê kiriye bi "cînavk", fikrên wisa ne rast in, ji ber ku di K. Jêrîn de cînavkên serbixwe ji bo kesê yekem û duyem tu carî, bi ti awayî nikarin bikevin şûna navdêran mînak; Di hevoka "min hatim" de cînavka "min" hatiye. kesê yekem e û axêvera licihê ti navdêran negiritiye. Mîna navdêrekî bûye kirde. Her wiha ji bo kesê duyem jî gava bêjin "tu hatî" nikarin bêjin "tu" li şûna navdêrê de hatiye. Ji bilî wê jî tu carî nikarin

---

<sup>12</sup> 'Ebidul-wahîd Muşîr Dizey, "Rêzmanî Kurdî", Çapî Yekem, Nawendî Awêr bo Çap û Billawkirdinewe, Hewlêr, 2014, R. 73.

navdêrekî bînin cihê cînavkên pêve. Her wisa di K. Jorîn de jî cînavkên serbixwe yê xwerû yê kesê yekem û duyem qet li şûna navdêran nayên bikaranîn mînak "Ez hatim. Tu hatî" e "Ez û Tu" nehatine şûna tu navdêran. Ger bînin şûna navdêran; divê bikin navdêr di şûna wan de bînin bikaranîn. Ger navdêr di şûna wan de jî bînin bikaranîn divê wisa bin. Mînak kesek ku diaxive û hatiye navê wî "Azad" e hevok jî dibe "Azad hatim.\*" ji bilî wê çendê ku hevok ne rast e wisa ger pêveber jî li gor kirde bikşînin dibe "Azad hat" li vir jî dibe behsa kesekî din bike ne wê wateyê dide ku "Azad" dibêje "Ez hatim" wate di vir de cînavka "Ez" destnîşana navdêrekê dike ne di cihê navdêrekê de hatiye. Her wisa ji bo cînavkên tewandî jî wisa ye. Gava bêjin "min nan xwar." Ger navek li cihê cînavka "min" bê bikaranîn hevok dibe "Azad nan xwar." Rast e ev hevok ji aliyê rêzimanvanî ve rast e, ji aliyê wateyê ve şaş e. Wate di esla xwe de li vir ev cînavk destnîşana navdêrekê dike û li dewsa wê navdêrê hatiye. Ji ber wê em dikarin bêjin "cînavk tînin dewsa navdêran an destnîşana navdêran dikin."

- Taybetiyên Navdêran Digirin:

Hin rêzimanvîs wisa difikirin ku cînavk peywira navan an navdêran pêk tînin, herwiha hemû taybetiyên navdêran digirin. Ev rast e ku taybetiyên mîna tewang, mêjer, zayend û nêterê derbasî wan dibin, divê vê jî ji bîr nekin ku gelek cudahî di navbera cînavk û navdêran de hene:

- 1- Cînavk wek pêguhêr kar dikin. Wate ne merc e ku cînavk hemû taybetiyên navdêran bigrin, ji ber ku qet cînavkek ne her timye. Mebest jî pêguhêr, ev mînak e ku di hevoka "tu hatî" de cînavka "tu" dişê em bêjin merema me li vir xortekî bi navê "Bawer" e, di hevokeke din bi lêkereke din re her ev cînavk dibe merema kesekî din be, mînak: "tu çuyî." di vir de dibe merema me keçek be bi navê "leyla", wate li gor lêker diguhere lê navdêr ne wisa ne mînak navdêrên sernavnavê yekî "Azad" be bi kîjan lêker û di kîjan hevokê de bê bikaranîn tenê yek "Azad" e nabe kesekî din. An bi wateyê din; "*cînavk wek cîgira daneyêke watedar xwe dinimîne, wateya wê nagire, mînak; ger ku cînavka 'ew' di hevoka 'ew bigire' merema 'keçek' be ev tişit jî nayê wateya ku 'ew' 'keçek' digihîne, cînavk mîna peyveke watedar maneya xwe nagire. Îşaret dide ku di hevokê de*

*behsa bireserekî tê kirin ku ev nav e û yekhijimar e jî.*"<sup>13</sup>Hemû cînavk di hindurê xwe de xwediyê taybetmendiyan kes û mijarê ne. Hemû cînavkên kesî jî xwedanê taybetmendiyan binavkirinê ne\* cînavk qet morfîma binavkirin û nebinavkirinê û mijarê nagirin

2- Cînavk bi tu awayî nikarin rêngdêran nîşanî 'em, ew, ev, van vî, wan, wî,...hwd. bigirin, navdêr dikarin rengdêran nîşanî bigirin<sup>14</sup>.

3- Cûreyên cînavk ji aliyê hejmar ve. Ev cur e ne ku *"hejmarên daneyên wê sînordar e û di polên bi sînordar de ne"*<sup>15</sup>.

Xeleka din ku tenê " K. K. Kurdoyê" behsa wê dike ev e ku dibê "Cînavk kevntirîn peyva ferhengî ye."Ev jî ne rast e ,ji ber ku tu tiştê zanistî tune ye ku ev peyv kevntirîn peyva ferhengî be."*Bi awayek agahiyên me di derheqê ziman jî ne bi awayekî wisa ne ku em piştî xwe bidinê.*"<sup>16</sup> Wê fikirê.

- Ji bo ku em bikarin danasîneke baş ji cînavk re bikin pêwîst e em berî wê erk û mefayên cînavkê jî bizanin:

Mefayên cînavkê piranî bi merema "dubare nekirin" tê bikaranîn û girîngiya wê di bikaranîna hevok û axaftinê de gelek xurt e. Gelek caran tê dubarekirin û ji ber wê, weke beşeke girîng ya hevoksaziyê tê dîtin. Delîlek din ku girîngbûna wê diyar dike ew e ku di zimanê kurdî de kêm hevok hene ku di wan de cînavk tune bin. Nemaze K. Jêrîn ku di her hevokê de cînavkek an du cînavk di nav de hene. Ger ku bi awayekî eşkere xuya neke jî di hundirê hevokê de mîna morfîma sifir(Ø) heye. Gelek caran em bi xêra wê dikarin xwe ji dubarekirina peyvên rizgar bikin *"ji ber ku em*

<sup>13</sup> Ewrehmanî Hecî Marif, *"Rêzimanî Kurdî"*, Bergî yekem "Wişesazî", Beşî Duwem "Cênaw", Dezgayî Roşinbîrî û Bilawkirdneweyî Kurdî, Bexda, 1987, R. 4.

\*Di awayên awarte decînavkênkesî yên serbixwe di K. Jêrîn de qertafên nebinavkirî digirin û cînavkên kesî yên xwerû yên K.Jorîn veqetandekên binavkirî digirin, em li beşê (3.1) ev tişt behs dikin.

<sup>14</sup> Se'îd Sidiqî Kaban, "Mîtesir sirif û Nehuy kurdî", R. 28.

<sup>15</sup> Emîr Mihemd Mihemd Emîn, *"Wişey Erkî le Zimanî Kurdî de"*, Çapî Yekem, Dezgayî Çap û Pexşî Narîn, Hewlêr, 2016, R. 85.

<sup>16</sup> Xoşnaw Ezîz Hemeemîn, *"Rêzimanî Cênawî Likaw le Zimanî Kurdîde(Kirmancî Nawerast)"*, Namey Master, Fakeltî Perwerde, Zankoyî Koye, 2014, R. 62.

*dizanin dubarekirina navdêr dibe tişteke ne xweş û ne rind, ji ber wê em bikaranîna cînavk li vê nexweş û ne rind derbas dibin.*"<sup>17</sup>Mînak:

min "Xec" dît.

Heke em di vê hevokê de berî qala "Xec" bikin bizanin "Xec" kî ye? Dikarin di şûna "xec" de cînavkek bi kar bînin û bêjin:

Min ew dît.

Hin caran dibe ku hevok dirêjtir be jî, û bêjin:

Min "Xec" û mêrê "Xec" û zarokên "Xec" dît.

Di vê hevoka jorîn de sê caran gotiye "xec" ji bo sivikkirina hevokê, em dikarin li cihê navdêra "Xec" cînavk bi kar bînin, daku hevok siviktir û xweştir dibe.

Min "Xec" û mêrê "wê" û zarokên "wê" dît.

An jî dikarin bêjin:

Min "ew" û mêrê "wê" û zarokên "wê" dît.

Ger ku em lê binhêrin em dibînin dema cînavk tê bikaranîn hevok siviktir û xweştir dibe.

Mînakek din li gor K. Jêrîn:

A- "Xwendekaran" waneyan xwend û **yariyan** kird û **nanîşiyân** xward.

B- "Xwendekaran" waneyan xwênd, "xwendekaran" **yariyan** kird û "xwende-karan" **nanîşiyân** xward.

Ger em hevoka "A" û "B" bînin ber hev, eşkere herdu hevok heman tişt in. Xuya ye hevoka "A" xweştir û siviktir e, ew jî ji ber wê ye di hevoka "A"ê de tenê yek car "Xwendekar" hatiye û bûye kirde ya "xwênd" her wisa bûye kirdeya "kirin" û "xwarin" jî ji ber ku cînavka pêve "yan"e ji bilî "xwendekar" hatiye lê di hevoka "B"

---

<sup>17</sup> Tewfîq Wehbî, "Desturî Zimanî Kurdî", R. 82.

de peyva "xwendekar" sê car tê dubarekirin ev jî dibe sedema tengasî û zehmetî di axaftinê de.

- Bikaranîna Cînavke Bi Mecbûrî

Pêwîst e em tiştêkî ji bîr nekin , ew jî ev e; cînavk ne merc e hertim ji ber dubarekirinê be, car caran ji ber ku mecbûrî ye jî tê bi kar anîn, mînak: Gava yek behsa xwe dike dibêje "Min nanim xward." bi ti awayî nikare cînavka "min" jê bibe û navdêrekî ji bilî "min" bi kar bîne, behskirina kar bike, ji ber wê dikarin bêjin cînavkên kesê serbixwe yên kesê "yekem û duyemî" mefaya wan ne ji ber dubarekirinê ye belkî em mecbûr in bi kar binin ji ber ku bi ti awayî nikarin merema xwe bêjin an xwe binin ziman ger em cînavk bikarneyînin.

An jî dema mirov behsa gelek kesan dike nikare navê hemû kesan bêje an binivîse, mînak: Ger hevalên pola xwendekarekî "40" xwendekar bin bixwaze bi navê wan biaxeve nikare navê hemû xwendekaran bêje, ger bikaribe jî gelek diwar dibe û demek zêde divê. Ji ber wê ji bo axaftinek bi hêsanî cînavk tên bikaranîn. Ev tişt ji bo hemû cînavkên pirjimara dibe.

Mefayeka din ya cînavkê ev e *"ger ku kirdeya kar nenasin, an berevajî vê hin caran behsa kesî ji guhdaran re tê kirin û ew kes tê naskirin."*<sup>18</sup> Mînak:

Ew pencerekey şikand.

Li vir yê "pencere şikandiye" dikare neyê nasîn an jî guhdar dizane behsa kê tê kirin, ji ber wê navê wî bi cînavk tê. Hin car jî ji ber tirsê ev kesê tê behskirin dibê bila kes navê wî nizanibe. Ji ber wê li dewsa wî cînavk tê bi kar anîn.

Di dawiya van agahiyên jor û danasîna van rêzimanivîsên berê ,em dikarin bêjin:

Cînavk: beşeke ji beşên axaftinê ye, peyv e an morfîmeke rêzimanî ye, hejmara wan zelal e û zêde nabin, li şûna navdêran an jî li dewsa wan tên an jî destnîşanî navdêran dikin, di hevokê de heman erka navdêran dibînin, bi awayekî din di hevokê de dibe; kirde, bireser, têrker....

---

<sup>18</sup> Xoşinaw Ezîz Heme-emîn, *"Rêzimanî Cênawî Likaw le Zimanî Kurdîde(Kirmancî Nawerast)"*, R. 60.

### 1.1.2 Rastiya Cînavk û Cênaw û Têgeh(Têrim)ên Din:

Di derheqê têgeh û têrima cînavkan jî piraniya nivîskarên kurd nêzîkê hev difikirin û dibêjin "*cînavk kereseyek e ku ji bilî an li cihê navdêran tê bikaranîn.*"<sup>19</sup> Di derheqê cûreyên têgeha cînavk(cênaw) jî, mîna danasîna cînavk çawa nivîskarên kurd ji bo danasîna cînavk cuda cuda fikirîne, hin ji wan jî nêzîkê hev in, bi heman awayî ji bo têgeha cînavk jî rêzmannivîsên kurd xwedan fikir û ramanên cuda ne û her yek ji wan jî, li gor fikra xwe, li gor zimanê din ku dizanin û nêzîkê zimanê kurdî dibinîn, an li gor agahiya wan di derheqê ekola zimanvanî de, ji bo zimanê kurdî fikirîne. Gelek ji wan jî li gor van fikrên xwe têgeheke nû çêkirine û xebitandine. An jî li gor zarava û devoka xwe têgeheke nû xebitandine. Ji ber tunebûna sazî û komeleyek an enstîtuyekê standart ya kurdî ku biryara xwe bide û hemû nivîskar û xwendekar vê têgehê bipejirînin û bi kar bînin, gelek têgehên cuda ji bo hemû mijarên rêzimana kurdî hene. Yek ji wan mijaran jî "cînavk"e. Di derheqê vê yekê de, ku dikare her têgehek be dibe "*Wirriya Umer Emîn*"wiha dibêje "*Vollit, Feradî û bi hezaran têgehên din jî di warê zanistî de hemû navên kes û zanayên van waran in... qey dibe çi têkilî di navbera van navan û van têgehan de hebe ku ev navan digehînin. Kirina meseleyekî; têkilî û lihevhatina di navbera têgeh û wateya têgehê kirine bi meseleyeke girîng di ziman û rêziman de dibe xwe mijûl kirina bi qalikê ve.*"<sup>20</sup> Ji ber ku ya girîng pêkhatina li ser têgehekê ye. Fikreka din jî heye dibêje tiştê wiha nabe "*ji nav re sernavekî hizirî yê şaş bê bikaranîn, ku taybetiyên wî veşêre ango bibe xizmetkarê beşeke din, mîna navdêr.*"<sup>21</sup> Ji bo dîtina têgeheke minasib her mîna "Mesu'd Mehemed" dibêje û em jî dibêjin pêwîst e "*ev erk ji aliyê desteyek ji zimanvan û komeleyên zanyarî bê encamdan.*"<sup>22</sup> Mixabin heta niha gelek kom û enstîtuyên kurdî hatine avakirin qet yek ji wan nekarine têgeha minasib destnîşan bikin an li ser têgehek li hev bikin. Ji bo hemû mijarên rêzimanê û bi taybet rêzimana kurdî. Pirbûna van têgehan şaşî ye; ji ber ku çawa di warê "Dengsazî" de nabe dengê bi du tîp bê resimkirin an bi du awayî bê xuyakirin, bi heman awayî di

<sup>19</sup> Randolph Qurik and Sindney Greenbanm, A Universty Grammar of the English Language, London: Longman, 1992, R. 103.

<sup>20</sup> Wirriya Umer Emîn, "*Asoyekî Tirî Zimanewanî*", Bergî Yekem, Dezgayî Çap û Billawkirdineweyî Aras, Hewlêr, 2009, R. 222.

<sup>21</sup> Mes'ud Mehemed, "*Surêkî Xame Bedewrî Ranaw de*", Govarî Korî Zanyarî Kurd, Bergî Duwem – Beşî Yekem, Çapxaney Korî Zanyarî, Bexda, 1974, R. 74.

<sup>22</sup> Mesu'd Mehemed, "*Hind Babetî Ziman û Rênûsî Kurdî*", R. 99.



zaravasaziyê de jî nabe têgehek bi du zaravayên cuda an bi du peyvên cuda ji bo wî bîn bikaranîn<sup>23</sup>. Her wekî tê zanîn têgeh di nav her zimanekî de gelekî girîng e û ji bo çêkirina zimanekî hevgerî ye, ji ber ku têgeh bingeha ji dayikbûn û pêkanîna zimanê netewî ye.... têgeh stuna(gulte) zimanê neteweyî ye. Bingeha zimanê standart e. Ji ber ku zaravayên her neteweyekê nêzî hev dike û têkiliya wan bihêz dike.<sup>24</sup> Ji ber wê her têgehek hewce bi du mercên bingehe ne. Dema têgehek tê çêkirin dibe:

- 1- *"Her têrmek û fenomen an tiştêk hewce ye bi têgeheke serbixwe bê bilêvkirin û binavkirin.*
- 2- *Zêdetir ji yek têgehê ji bo têrmek an fenomenek neyê çêkirin û neyê bikaranîn ji.*<sup>25</sup>

Ji ber ku di zanista zaravasaziyê de heta derfet hebe divê fenomena "Hevmane", "Hevdeng" û Hevrenge" tune be. Ji ber ku hişê xwîner tevlihev dikin.<sup>26</sup> Ji ber vê yekê berçavnegirtina van herdu mercên jor dibe gera hebûna peyv û zaravayên hevmane. *"hebûna tiştên hevmane jî ger di warê ragehandin û zimanê edebî de sînore wan fireh bike û nivîsê xweşiktir bike jî di warê zimanvanî de tevliheviyê çêdike.*<sup>27</sup> Çawa di K. Jêrîn de têgehên cuda hemberî cînavkê hatine xebitandin di K. Jorîn de jî gelek têgehên cuda hatine xebitandin. Em wan jî şîrove bikin û têgehek rast li gor zanist û taybetmendiyên zimanê kurdî, bi zanebûn û agahiyên xwe destnîşan bikim:

- Pronav:

Beşa yekem ya vê têgehê ji "pro" ya malbata zimanên îndo-ewrûpî hatiye wergirtin, ji ber ku pêşgira "pro" di nav gelek zimanên din yê ewrûpî de mîna "latînî, îspanyolî, fransî û îngilîzî...hwd" tê bikaranîn \* di gel navdêra "nav" ya kurdî çê bûye,

<sup>23</sup> Şehab Teyb Tahîr, *"Binema û Pêkhatey Zarawe le Zimanê Kurdîde"*, Berêweberatî Çap û Billawkirdineweyî Silêmanî, Çapxaney Kemal, Silêmanî, 2012, R. 23.

<sup>24</sup> Heman Jêder, R. 14.

<sup>25</sup> Elî Qasim, *"Miqedmt Fî 'Îlim El-Mstl'"*, El-ttb't El-ewelî, Silsle El-mewsu'e El-Sxîre, Daîre El-şûin Elseqafe û El-neşîr, Bexdad, 1985, R. 14.

<sup>26</sup> Şehab Teyb Tahîr, *"Binema û Pêkhatey Zarawe le Zimanê Kurdîde"*, R. 12.

<sup>27</sup> Rojan Nurî 'Ebdulla, *"Ferhengê Zarawesazî"*, Xaney Çap û Billawkirdinewey ÇîwarÇîra, Çapî Yekem, Slêmanî, 2007, R. 233.

\*"binêre(Xiştaya-1)"

ji aliyê Celadet Bedirxan hat xebitandin.<sup>28</sup> Ger em bala xwe bidin vê gotinê em dibînin pêşgira wê ne kurdî ye û hin têgehên rastir û bedewtir hene, ji ber vê yekê li gor baweriya me ne rast e.

- Pênav:

Ev gotin ji aliyê "Arşek Baravî" ve hatiye xebitandin.<sup>29</sup> bi baweriya me ne rast e, ji ber ku "pêr" pêşgireke ku him di zimanê kurdî de tune ye, him jî di zimanên din de wisa nayê bikaranîn. Tenê nivîskar ji bo têgeha "cînavk" bi xwe çêkiriye, ji aliyekî din jî ev têgeh ne berbelav e. Ji ber wê ne rast e û em jî bi kar nayîn.

- Bernav:

Ji pêşgira "ber" û navdêra "nav" hatiye çêkirin, ji aliyê "Dr. Bedirxan Sindî"<sup>30</sup> û "Reşîd Kurdî"<sup>31</sup> hatiye qebûl kirin, bi gelemperî ji aliyê kêman nivîskar û rêziman nivîsan ve hatiye qebûl kirin lêbelê ne berbelav e, pêşgira "ber" jî pêşgireke aloz e û wateyên cuda yê wê hene.

Dibe pêşgir\*, Mînak: berdaş, berav, berdar, berbûk, berba, berçin, berberî, berçûn, berxwedan, berbang...

Dibe paşgir,\*\* Mîna: rêber, rençber, dîlber..

---

<sup>28</sup> Bedirxan Celadet Alî, *"Bingehên Gramêra kurdmançî"*, R. 55.

<sup>29</sup> Barvî Arşîk, *"Zarê Zêrîn Lêvegera Rêzmana Kurdî bi Şêwezarê Kurmançî"*, PDF, Bê sal, R. 113.

<sup>30</sup> Sindî Bedirxan, *"Ez û Min û Rêzimanê kurdîde"*, Govarî Korî Zaniyarî Êraq – Destey Kurd, Bergê Dehem, Çapxaney Korî Zaniyarî Êraq, Bexda, 1983, R. 133.

<sup>31</sup> Kurdî Reşîdê, *"Rêzimana Zimana Kurmançî"*, Ji Elfabêya Latîni Veguhaztiye Erebi: Îsmahîl Teha Şahîn, Çapê Êkê, Çapxanaî Xanî, 2008, R. 71.

\*Pêşgir: ev core qertafên ku tên pêşiya bêjeyê û wateyê nû li bêjeyê lêdikin. mînak:

Mê + kew → mêkew

bi + xêr → bixêr

çê + bûn → çêbûn

ra + bûn → rabûn. Binêre:

Samur Azîz, *"Rêzman û Rastnivîsa Kurdiya Kurmançî"* Çapa Duyem, Çapxane: Nûbehar, 2014, R. 161.

\*\*paşgir: ew core qertafên ku tên paşiya hin peyv û bêjeyan, peyvên nû çêdikin

Tîr + avêj → tîravêj

rê + ber → rêber

koç + er → koçer

Bi serê xwe jî peyveka xwerû ye: ber bi wateya kevir e ku teneke req e ji bo çêkirina dîwarên xanî tê bikaranîn.

Her çiqas pêşgira "ber" bi awayekî xurt û çalak tê bikaranîn. Ger lê binêrin jî zêdetir bi wateya "pêşberî tiştê" tê lê dema tê pêşiya "nav" û têgeha "bernav" çêdike, ne bi vê wateyê ye ku "pronoun" wê wateyê dide, ji bilî wê jî ji aliyê kêmanivîskaran ve tê bikaranîn. Em jî na ecebênin.

- Cînav:

Van formên jêrîn hemû mîna hev in tenê piçek cudahiya wan ji aliyê tîpêk an dengê ve heye, ya herî zêde tê bikaranîn "cînav" e.

A/ Cînav: ev ji "cî" û "nav" pêkhatiye û ji aliye gelek nivîskaran ve hatiye bikaranîn.<sup>32</sup>

B/ Cihnav: ji "cih" û "nav" pêkhatiye,\* ji aliyê Sadiq Behaedîn hatiye bikaranîn û dibêje: *"ji wan têgehan min cînav diciband ku bi kar bînim, ji ber ku ji hemûyan çêtir di cihê xwe de ye."*<sup>33</sup>

C/ Cênav: ev jî ji "cê" û "nav" pêkhatiye, Xazî 'Elî Xurşîd xebitandiyê,<sup>34</sup> ji aliyê kêmanivîskar hatiye bikaranîn.

D/ Cînav: ev jî hatiye xebitandin, tenê ji aliyê Mihemed. E. Elî Dîlan Elî ve.<sup>35</sup>

- Cînavk:

Ev têgeh jî piştî têgeha "Cînav" bi gelemperî ji aliyê piraniyê rêzmannivîsên K. Jorîn di van lêkolînên dawî de tê bikaranîn, bi baweriya "Îbrahîm Seydo

---

<sup>32</sup> A- Kurdo Qenatê, "Rêzmana Kurdî (Kurmançî – Soranî)", ji Kurdiya Soranî: Zülküf Ergün, Çapa yekem, Çapxane NûBihar, 2013, R. 115.

B- Samur Azîz, "Rêzmana û Rastnivîsa Kurdiya Kurmançî", R. 27.

\*Deham ebdulfettah di pirtûka cînav de dibê: *Seyda Sadiq Behadînê Amîdê 'cînav' xebitandiyê lê ev neraste ji ber ku seyda Seyda Sadiq Behadînê Amîdê 'cihnav' xebitandiyê ne 'cînav'.* Birwane: Ebdulfittah Deham, "Cînav", Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Stenbol, 2006, R.5.

<sup>33</sup> Sadiq Behaedîn Amêdî, "Rêzimana Kurdî/Kirmançîya Jorî û Jêrîya Hevberkrî", Çapa Êkê, Çapxana Dar El-Şû'n El-Diqafe El-'ame, Bexdad, 1987, R.203.

<sup>34</sup> Xazî 'Elî Xurşîd, "Rêzimana Fermî", Çapî Yekem, Dezgayî Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî, 2013, R. 35.

<sup>35</sup> Mihemed. E. Elî û Dîlan Elî, "Nasîna Rêzmana Kurdî", R. 34.

AYDOGAN" pirsgirêka wê heye û ev jî paşgira "k"ya dawiya "cînavk" e. Ji ber wê wisa dibêje: *"heger mirov qebûl bike ku qertaf an jî paşgira '-k' yê ji bo çêkirina navdêrên nû tê bikaranîn (weke xwelî-dan-k, weke ber-çav-k) hingê divê mirov peyva cînavk jî qebûl bike Lêbelê, ger mirov dijberê wê bifikire, hingê divê mirov peyvên xwelîdan û berçav jî bikar bîne ku îroj di nava xelkê de ev form bêtir bi formên xwe yên weke xwelîdank û berçavk tên naskirin."*<sup>36</sup> Ji bilî van peyvan gelek peyvên din jî hene ku paşgira "k" tê dawiya wan mînak "jêderk, bincilk, binkirask..." Gelek ji wan peyvan, ger ku em vê paşgirê jê bibin an pêve binivîsin wateya wan nayê guhertin. Di rastiyê de wateya van têgehên bi taybet (cînav û cînavk) mîna hev in, lê *"heger di eslê xwe de wateya van peyvan her yek e, lê belê heger tercîha xwe li ser bingehê hevpar daneyîne, hingê di fêrkirin û fêrbûyîna zimanî de pirsgirêkên têgihîştinê dikarin peyda bibin."*<sup>37</sup> Ji ber wê bi bawerî me ya herî rast têgeha "cînavk"e. Her çiqas "cînav" a K. Jorîn de gelek nêzî "cênaw" a K. Jêrîn e. Ji ber ku kêma tê bikaranîn nikarin vê qebûl bikin, piştî wê jî têgeha "cînavk" tê ku tenê cudayî jî ev paşgira dawî ye. Ev paşgira dawî jî tu pirsgirêkan ji aliyê wateyê ve çênake li gor lêkolîna me jî di van salan de ji aliyê piraniya nivîskar û rêzmannivîsên K. Jorîn ve tê bikaranîn û nêzî têgeha "cênaw" a K. Jêrîn e jî.

❖ Em dê di vir de behisa van têgehên bikin û berê xwe bidin ku ji aliyê rêzmannivîsên K. Jêrîn bikaranîne li gorî baweriyaya xwe kêmasiya têgehên jî diyar bikin:

1- Zemîr:

Têgeha zemîr yekem car ji aliyê Se'îd Sidiqî hatiye xebitandin<sup>38</sup>. Ev têgeh ji zimanê Erebi derbas bûye nav zimanê kurdî, li hemberî "cînavêk" hatiye bikaranîn, ji ber ku wê demê destpêka nivîsandin û lêkolîna ziman û rêzimana kurdî bûye, vê demê jî tenê çavkaniya Erebi li ber destê nivîskar de hebûne, di zimanê Erebi de jî têgeha "Zemîr" bikarhatiye ji ber wê nivîskar jî bê guhêrtinkarî "zemîr" a Erebi bikar aniyê. Ev têgeh ji bo wê demê rast bûye ji ber ku destpêka nivîs û lêkolînên ziman û

<sup>36</sup> Aydogan Îbrahîm Seyda, "Rêzmanên Kurdî û termînolojiya Wan ya Zimannasiyê," Inalco, Parîs 2011, R.5

<sup>37</sup> Heman Jêder, R. 5.

<sup>38</sup> Se'îd Sidiqî, "mitesir Srif û nehuy kurdî", R. 28.

rêzimana kurdî bûye. Her çend di zimanê "Farsî û Tirkî" de jî zemîr tê bikaranîn lê di nav wan de rêkeftin heye li ser wê têgehê mixabin di kurdî de rêkeftin tune ye. Li hemberî vê têgehê çend têgehên din jî hene. Ji ber wê hewceye em têgeheke kurdî bikarbihênin ku kan û bingeha wê têgeha zimanê kurdî be .

## 2- Bonaw

Ev têgeha bonaw jî ji aliyê "Tewfîq Wehbî" hatiye xebtandin<sup>39</sup>. Em vê têgehê jî na ecebênîn, ji ber ku ji bilî wê yekê ku kêma hatiye bikaranîn û ne berbelav e. Ev têgeh jî wate û ramanê naghînêt ku cînavk dighînêt, her wisa jî "bo"ya pêşiya "bonaw" di K. Jêrîn û zimanê kurdî de mîna daçek(pêşbend) tê bikaranîn ne mîna qertaf(pêşgir)ên peyv çêkir.

## 3- Cê nêw

Ev têgeh jî ji aliyê Cemal Nebez hatiye xebitandin,<sup>40</sup> Tiştê cihê behis kirin be ji aliyê wate û çêkirinê ve, di gel têgeha "Cênaw" mîna hev in tenê di du tiştan de cuda ne: yek "cî" û "nêw" ne bi hev re ne. Di navbera wan de valahî heye. Didu jî beşa duyemîne têgeha "nêw" ji xwe "naw(nav)" e, ew kiriye bi "nêw" ev jî guhêrtinek devkî ye.

## 4- Birîle

Ev têgeh tenê ji aliyê Hejar Mukiriyanî hatiye xebitandin<sup>41</sup>, bi Xwe "Birî" bi wateya "bedîl" û "yedek" tê an jî bi wateya cîgir tê. "le" a dawî jî wek paşpirtêk biçûk kirin tê bikaranîn, ev têgeh jî ji bilî wê ku kêma hatiye bikaranîn. Di nav kurdan de jî , ji bilî "birîle" peyva "lebirî" tê bikaranîn.

## 5- Ranaw

<sup>39</sup> Tewfîq Wehbî, "Desturî Zimanî Kurdî", R. 82.

<sup>40</sup> Cemal Nebez, "Zimanî Yekgirtuy Kurdî, Billawkirdinewey Yekêti Neteweyî Xwêndkaranî Kurd le Ewropa, Bambêrg, 1976, R. 23.

<sup>41</sup> Lîjîney Ziman û Zanistekan le Korî Zaniyarî Kurd, "Rêzmanî Axawtinî Kurdî", Dezgayî Çap û Bilawkirdnewey Aras, Çapî Duyem, Çapxaneyî Aras, Hewlêr, 2011, R. 50.

Têgeha "Ranaw" ji aliyê gelek rêzimannivîsên K. Jêrin hatiye bikaranîn. Mînak: Nurî Elî Emîn di pirtûka Rêzimanê Kurdî de têgeha "Ranaw"<sup>42</sup>, û Wirya Umer Emîn jî di hemû berhemên xwe de têgeha "Ranaw" xebitandiyê, bi baweriya wî jî: *"Ranaw nav e , ji bo komên peyv ku ji kerese-yên(matryal) Sîmantîkî(Kes û Mêjer)e ve hevpar in, cudahî tune ye 'ranaw' be an 'cînav' be... ji ber ku ya girîng rêkevtine li ser têgehek"*<sup>43</sup>, Her wisa jî "Mes'ud Mehemed" têgeha "Ranaw" bikartîne lê vê têgehê rexne dîke û bi bawera wî *"peyv 'Ranaw' dijberî ziman û rêzimana kurdî ye, ji ber ku pêşgira 'ra' ji kar ve aniye ser peyve 'nav'."*<sup>44</sup> Têgeha "ranaw" jî bi karaniye her wek bi xwe di gotara *"Surêkî Xame Bedewrî Ranaw"* de di pirtûka "Hindê Ziman û Rênûsî Kurdî" de wiha dibêje: *"Bi neçarî û wek kurd dibêje, bi gotina mamosta min ev têgeha kiriye sernava vê gotarê"*<sup>45</sup>, ji bilî van rêziman nivîsan cend nivîserên din jî ev têgîn bikaraniye mînak: Îbrahîm Ezîz Îbrahîm, Reuf Ehmed, Mihemed Emîn Hewramî, Ehmed Hesên Ehmed... hwd. Tiştêk cihê bas be ev têgeha gelek berbilave ji aliyê gelek kes hatiye bikar anîn, em dê piştê vê têgehê şîrove bikin.

#### 6- Cênaw

Di van salan de têgeha herî berbelav "Cênaw" e. Ji ber ku ji aliyê piraniye rêzimannivîsên K. Jêrin tê bikaranîn. Mîna Ewrehmanî Hacî Marif der heqa têgeha "Cênaw" dibêje: *"Têgihya 'Cênaw, Ranw- Pronoun' gelek car tenê ji bo van peyvyan tê bikaranîn ku di hevokê de heman erkê dibînin. Yan ku ev têgeha ji aliyê têrmolojiyê ve rasterast bi wateya 'cê - naw, ra - naw'- 'pro - noun' digirin, ku dibên li cihê nav û li dewsa nav tên...."*<sup>46</sup> Her çiqas ku baweriya wî wiha ye ku ta asteke baş "Cênaw û Ranaw" bi yek wate tên, têgeha "Cênaw" di hemû berhemên xwe de bikar dîne. Her wisa "Nerîman Ebdulla Xoşnaw" têgeha "Cênaw" bikar aniye, derheqê bikaranîna têgehên cuda jî wiha dibêje: *"di zimanê kurdî de ji bilî têgeha 'Cênaw' hin car têgehên 'ranaw, cînav, ranav....' tên bikaranîn hemû jî yek wate û*

<sup>42</sup> Nurî Elî Emîn, *"Rêzmanî Kurdî"*, Çapî duyem, Rêkixitnewe û le çapdanweyî: Nerîman Ebdulla Xoşnaw, Çapxaneyî Rojhelat, Hewlêr, 2012, R. 84.

<sup>43</sup> Wirya Umer Emîn, *"Rêzmanî Ranaw – Hindê Şikirdinewey Morfolojî"*, Govarî Roşinbîrî Niwê, Jimare "115", Bexda, 1987, R.197- 198.

<sup>44</sup> Mes'ud Mihemed, *"le Awêtey Em Gutsreda Tişkî Çend Çirayek"*, Govarî Karwan, Govarî Emîndaryetî Gîştî Roşinbîrî û Lawan, Jimare"20", Hewlêr, Maysî 1984, R.25.

<sup>45</sup> Mes'ud Mihemed, *"Hindê Babetî Ziman û Rênûsî Kurdî"*, R. 67.

<sup>46</sup> Ewrehmanî Hcî Marif, *"Rêzmanî Kurdî"*, Bergî yekem "Wişesazî", Beşî Duwem "Cênaw", R.4.

*ramanê digihînin*"<sup>47</sup>, ji bilî van nivîskaran geleka din jî têgihya "cênaw" bikaraniye, Mînak: Şêrko Baban, Cemal Hebîb Ellah, Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî....Hwd.

- Cî naw an Ranaw

Ev tiştên ku şiyana behskirinê ne; ta niha li gor lêkolînê me her du têgeh "Cênaw û Ranaw" ji bo K. Jêrin ji hemûyan zêdetir berbelav in û çêtirin jî , ev nabe vê egerê ku ev du têgehine bê kêmasî bin, bila em her du têgehên bidin berhev û kêmasî û başiya wan destnîşan bikin. Her wisa me bere jî got di van salên dawî de piraniya rêzimannivîsên K. Jêrin têgeha "Cî naw" tînin bikar anîn. Ji ber ku beşa yekemîn têgeha "Ranaw" , "ra" ye, fêhmkirin wê dijware, wateyên wê gelek in, kêmtir tê bikar anîn, bila em bizanin ev "ra" tê çî wateyê.

- 1- Peyva " Ranaw" ger li pêşgira "ra" ya; rahatin, rapiskawtin, rabiwardin, raguşîn... û peyva "naw" hatibe çêkirin, mîna ev tişte ku pembû bi hesin ve bê dirûtin, ji ber ku pêşgira "ra" tenê tê pêşiya kar tu kes nebîhisitiye bê gotin û bêje" raberd, ra'eleşîş, razurna... wate qet ev pêşgir naye ser nav.<sup>48</sup>
- 2- Ev pêşgir bi serî her peyvekê ve bê nivîsandin wate û teşeya wî tê guhêrtin, her wisa me berê jî gotibû bi tu awayî bi nav re naye nivîsandin;

ra + Birdin → rabirdin , ra + Dan → radan

ra + Bûn → rabûn , ra + Kiridin → rakiridin

ra + perrîn → raperrîn ... hwd\*.

- 3- Tê gumankirin ku "ra" ji "eray"ya farsî ve hatibe ku bi wate ya "bo çî [çîma]" tê.<sup>49</sup>

4- Şiyan: Rat nakewê : lêweşanewe

5- Ji bo destûr danê tê bikaranin : Ram lêye/ reîmlêye.

---

<sup>47</sup> Nerîman Ebdulla Xoşnaw, 2014, r.37.

<sup>48</sup> Mes'ud Mihemed, "*Zarewesazî Pêwane*", Dezgay Çap û Billawkirdinewey Aras, Çapê Yekem, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2011, R. 6.

\*Ji bo agahiyên zêdetir jî binêre: Mukiyânî Gîwî, "*Ferhengî Kurdistan (Kurdî – Kurdî)*", Çapa Duyem, Çapxane Gun Matbaacılık, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Amed, 2010, R. 941.

<sup>49</sup> Mes'ud Mihemed, "*Zarewesazî Pêwane*", R. 6.

6- Kurdan ji kevin de gotiye "le rehî xwa, ray xwa" wisa xeberdaye" rahî: ray" bi wate ye "lepênawî xwa, ji bo xatirî xwa, le rêy xwa" tê.<sup>50</sup>

7- Bi wate ye "rê, rêga" jî tê.

8- Hin car li dawiya peyv tê, erka morfîma "ewe, we" ya dubarekirinê dibîne. mînak: Bîrû boçûn: Tegbîr û ra, Ligell: bi min re, le min ra....Hwd<sup>51</sup>. Ev "ra" ye wek morfîma "ewe, we" ya dubarekirinê di warê wêje jî de tê bikaranîn. mînak

Le min re xo xeteyek rûy nedaw

Edî bê meylî bo rû da le tora<sup>52</sup>.

9- "Ra" ya têgeha "Ranaw" bi wateya "For" a îngilîzî tê, wate "Ranaw" dibe "For + naw" tê ev jî li têgehya " PRONOUN" a îngilîzî dur dikeve<sup>53</sup>. mebesta me ji dur ketin jî li vir ji aliyê watêyê ve ye. ji ber ku nayê heman watêyê ku têgehê "pronoun û cî naw" digihîne.

Ji ber van xalên jor têgeha "ranaw" bi baweriya me ne rast e. Ger ku em li têgeha "cî naw" binêrin ta asteke baş çêtir e ji têgeha "Ranaw" ji ber ku beşa yekema vê têgehê "cî" bi wate ya "pro" ya "pronoun" tê di gel piraniya zimanên din jî nêzî hev in û bi yek wateyê tên mînak divê xişteya jêrin de xuya dike.<sup>54</sup>

Ziman	Peyva Cînavk di van Zimanan de	Pêkhate	
Latînî	Pronomen	Pro	nomen
		Cî	naw
Îngilîzî	Pronoun	Pro	noun
		Cî	naw
Rusî	Местоимение (mestoimeniye)	Место	имение
		Cî	naw

<sup>50</sup> Xoşnaw Ezîz Heme-emîn, "Rêzimanî Cênawî Likaw le Zimanî Kurdîde (Kirmancî Nawerast)", R. 66.

<sup>51</sup> Hejar Ebdurehman Şerifkindî, "Henbane Borîne Ferhengî Kurdî – Kurdî – Farsî", Yek Cildî, Çapî Şeşem, Sirûş, Tehran, 1388, r.337).

<sup>52</sup> Hêmin Mukiriyani, "Dîwanî Hêmin", Çapî yekem, Çap û Pexşî Çiwar Çira, 2708, R.166.

<sup>53</sup> Xoşnaw Ezîz, Rêzimanî Cênawî Likaw le Zimanî Kurdîde (Kirmancî Nawerast) R.66.

<sup>54</sup> ji bo çêkirina vê xişteyê mefa ji vê rûpela wergerandinê (ww.Taranslate.google.iq, 11. 12. 2016) girtye



Fransizî	Pronom	Pro	nom
		Cî	naw
Spanyolî	Pronmber	Pro	Nnember
		Cî	naw
Portugalî	Pronome	Pro	nome
		Cî	naw

#### Xiştaya(1 - 1)

Em lê dinêrin dibînin ku di zimanên din de jî mefa ji "pro" ya Îngilîzî hatiye bikaranin, ji ber wê normale em wê bikar bihênin, ger ku em lê binêrin dibînin kêmasiya têgeha Cînaw jî heye, mîna ku rasterast li têgehê "PRONOUN" a ingilîzî û hatiye wergerandin ji bo ser zimane kurdî, ji erka wê hatiye kemkirin ku mîna beşê axavtinek erkeke girîng dibîne.<sup>55</sup> Ev ne pirsgirêka serekiye ji ber ku di gelek zimanên din jî wiha ye. Mînak wan zimanên jor di xiştaya (1-1) hatine şîrove kirin, divê bizanin ku di heman demê de bi awayeke rasterast li cihê nav naye bikaranîn. Mînak di kesê yekem û duyemîna yekjimar û pirjimar de

Divê em jî ji bîr nekîn *"yek peyv ne danasîne ta ku manaya têgeh bi temamî bigihîne hemû aliyên wî bê keşîfkin. Ya herî girîng jî di mijarê têgehê de li hev hatina li ser têgehekî. Li gor demê di nav forma fonolojiya vî zimanê de dihêle, xweziya vî zimanî digire."*<sup>56</sup> Em dikarin bêjin ger têgeha "Cênaw" şaş be jî, niha ji aliyê piraniya rêzimanivîsên K.Jêrîn tê xebitandin û ji bilî vê yekê jî, ji bo ji hev nêzîk bûna K. Jêrîn û K.Jorîn, em dê bikar bînin.

Di dawî yê de dikarin bêjin têgeha "Cênaw" ji bo K.Jêrîn û têgeha "cînavk"ê jî ji bo K.Jorîn ya herî dirust û rast e. Me di lêkolînê xwe de cînavek bikardihanî û ev jî nayê vê wateyê ku têgeha "cênaw" şaş e û nederûste, ji ber ku lêkolîna me bi K.Jorîn e ji ber wê em vê têgehê bikartînin. Xwezî em bikarîbin yek têgehê ji bo zimanê kurdî wata ji bo K. Jêrîn û K. Jorîn tenê yek têgeh bikar bînin, ne tenê cînavk ji bo her mijareka din e rêzimanî, têgehek standartî bînin bikar anin.

<sup>55</sup> Mes'ud Mihemed, *"Hindê Babetî Ziman û Rênûsî Kurdî"*, R. 20.

<sup>56</sup> Wirya Umer Emîn, *"Asoyekî Tirî Zimanewanî"*, R. 222.

### 1.1.3 Dabeşkirina Cînavkê li Gorî Dîtina Kevin û Nû:

Berî her tiştî derheqa beşên axaftinê yan nebûna bi beşa axaftinê em nikarin înkâr bikin; Cînavk beşên axaftineke serbixwe ye. Hin ji rêzimanivîsên kevnar ên kurd li bin bandoriya zimanvanên Erebb beşên axaftinê zimanê kurdî parveyên "isim û fi'l û herif" kirine, mîna beşa axaftinekê li cînavkê nenêrîne, her wekî beşeka navdêr lêkolîn li ser wê hatiye kirin. Wan heman erk jî bi "cînavk- zemîr" de ye di pêkhatina wate û hûnandina hevokên kurdî de, ku zimanvanên Erebb jê re daye.<sup>57</sup> Hin nivîskar jî li bin bandoriya zimanvanên Ewropî de bûne beşên rêzimanê ji bo "navdêr, cînavk, hoker, pêveber...hwd" parvekirina wateya cînavkê mîna beşa axaftineke cuda hesabandiyê lê bi awayek mîna *"zimanvanên Ewropî ku cînavk mîna siya navderê danîne, ji serbixweya wî hatiye kêmkirin û rola wî nehêliyê ku di heqîqeta axaftina kurdî de roleke mezin a wê heye."*<sup>58</sup> Bi awayekî din wisa fikirîne tenê ciyê navdêran digire û heman erk û taybetmendiya navdêran digrelê fikrên wisa şaş in. Ji ber ku cînavk yek ji girîngtirîn beşên axaftinê ye di zimanê kurdî de her weke mîna "Mes'ud Mehemed" dibêje: *"Ku em xwe azad bikin ji lasayîkirin û serbest bin ji bîr û baweriya heyî ya zimannasan û baldar bin li hemberî zimanê xwe wek ku heye, ne wek neynika zimanê biyanî lê binêrin, her wiha ji bo şiyandina vê behsê jî beşên cuda yên axaftin û hilsengandinê danîn ber hev. Di hişê me de zelal dibe ew komên peyvên ku di zimên de dibin cînavkên pêve hin beşên bingehîn û serbixwe ne di axaftinê de û roleka wiha bêhempa dilîzin di sazkirina hevoka tewawî de ku qet nayê hişên me van peyvyan bixin siya tu beşeka din."*<sup>59</sup> Her wisa nemaza cînavkên kesî em nikarin bi sanahî di ser re derbaz bin, mîna beşên axaftinê din an di gel beşê axaftinê din em jê vekolin. Her wisa *"ji babetên herdem gerim û hejî li pê çûnê di kirmancîya jorî de, babetê desteka cînavên kesî "Ez" û "Min"e, neku ji ber hindê cînavên xweser û serbexone yan weku desteka cînavên zimanên dîye Hîndo ewropîne, belkû çûnkî xweserîya wan heye û xweserîyek taybet didene zimanê kurdî nexasme zarê kirmanciya jorî."*<sup>60</sup> Divê em di vir de behsa cureyên cînavk û beşên cînavkê bikin ku "cureyên wan jî ji aliyê taybetî û peywendiyên wan cuda dibin ku

<sup>57</sup> Mes'ud Mihemed, *"Hindê Babetî Ziman û Rênûsê Kurdî"*, R. 17.

<sup>58</sup> Heman Jêder, R. 40.

<sup>59</sup> Heman Jêder, R. 40.

<sup>60</sup> Fazil Umer, *"Çend Awrek li Zimanê Kurdî"*, Çapî Êkê, Çapxane: Wezaretê Perwerdê, Hewlêr, 2004, R. 177.

hin komên cînavkê digihînin"<sup>61</sup>. Ger ku em li dabeşkirinên berî binêrin ku ji aliyê zimanvanên berî ji bo cînavkê hatine kirin. Dibînin ku fikrên cuda û gelek cudahî di navbera dabeşkirina wan de heye. Kêmasiya mezin heye ji bo bi standarkirina dabeşkirina cînavk, ev cudahî jî dizivire ji bo cudahiyên ekola zimanvanî û rê û rêbazên van ekolan ji ber ku hin nivîskar alîgirên ekola sunetî(çawlêkerî)ne, wan cînavk dabeşkiriye ji bo ser çend beşên cuda her yek ji baweriya xwe fikiriye di nav wan de jî rêkevtin tune ye.\* Her wisa bi awayekî giştî cînavk ev in:

<sup>61</sup> Ewrehmanî Hecî Marif, "*Rêzimanî Kurdî*", Bergî yekem "Wişesazî", Beşî Duwem "Cênaw", R. 78.

\*Binbêre:

- 1- "Cînavkên Kesî, Cînavkên Pirs, Cînavkên Nişane, Cînavkên Lêgder, Cînavkên Xoyî, Cînavkên Mibhîm(nadiyar) û Cînavkên Milkî". Binêre: Tewfîq Wehbî, "*Desturî Zimanî Kurdî*", R. 28.
- 2- Lîjney Ziman û Zanistekan: "Cînavkên Kesî(Cuda, Likaw), Cînavkên Îşare, Cînavkên Lêgder, Cînavkên Pirsyarî, Cînavkên Heyî, Cînavkên Xoyî, Cînavkên Nadyar". Binêre: Lîjney ziman û Zanistekanle Korî Zaniyarî Kurd, "*Rêzimanî Axawtinî Kurdî*", R. 64.
- 3- "Cînavkên Ciyawaz, Cînavkên Likaw, Cînavkên Azrî, Cînavkên Şarawe". Binêre: Ahmed hisin Ahmed, (1976), "*Rêzimanî Kurdî – be Kurdî û 'Erebî*", R. 158.
- 4- Cînavkên Kesî(Serbexo, Likaw), Cînavkên Xoyî, Cînavkên Nişane, Cînavkên pirsyarî, Cînavkên Çendêtî, Cînavkên Heyî, Cînavkên Nefî, Cînavkên Hawbeşî, Cînavkên Diyar, Cînavkên Nadyar:
  - A- Ewrehmanî Hacî marif, "*Rêzimanî Kurdî Bergî yekem (wişesazî) Beşî duyem(Cênaw)*", R. 78.
  - B- Cemal Hebîb Alle, "*Lebabet Rêzimanî Horamîyewe*", Çapemenî Peyiv, 2007, R. 58.
- 5- "Cînavkên Kesî(Serbexo, Likaw), Cînavkên Xoyî, Cînavkên Nişane, Cînavkên pirsyarî, Cînavkên Çendêtî, Cînavkên Heyî, Cînavkên Nefî, Cînavkên Hawbeşî, Cînavkên Diyar, Cînavkên Nadyar, Cînavkên lêgderî". Binêre: Nerîman 'Ebdulla Xoşnaw, "*Rêzimanî kurdî*", R. 36.
- 6- "Cînavkên Kesî, Cînavkên Likaw, Cînavkên Pirsyarî, Cînavkên nişane, Cînavkên çendyetî, Cînavkên heyî, Cînavkên xoyî, Cînavkên Nadyar, Cînavkên Diyar". Binêre: Mukiriyânî Kurdistan(1980), "*Corekanî Cênaw û Dewryan le Ristey Kurdîde le Diyalêkitî Kirmancî Xwarû û Kirmancî Jûrûda*", Govarî korî Zaniyarî Êraq, Bergî Hewtem, Çapxaney Korî Zaniyarî Êraq, Bexda, 1980, R. 233.
- 7- "Cînavkên Kesîn, Cînavkên Îşarekî, Cînavkên Girêkî, Cînavkên Pirsyarkî, Cînavkên ne Benavkirî, Cînavkên xwedîn". Binêre: Celadet Ali Bedirxan, "*Bingehên Gramêra kurdmancî*", R. 56.
- 8- "Cînavkên Serbexo, Cînavkên Likaw, Cînavkên Lêkder, Cînavkên Pirs, Cînavkên Nişane, Cînavkên Xoy, Cînavkên Nadyarî, Cînavkên Hawbeşî". Binêre: Îdirîs Ebdulla(2001), "*Cênaw Cor û Şewekanî le Şewezarî Deştî Hewlêrde*", Govarî Raman, jimare "61", Dezhay roşinbîrî û rageyandinî Gullan, Hewlêr, 5. temûz. 2001, R. 229.
- 9- "Cînavkên Pirs, Cînavkên nişane, Cînavkên Xoyî, Cînavkên Çendêtî, Cînavkên Heyî, Cînavkên Hawbeş, Cînavkên Nadyar, Cînavkên Nefî, Cînavkên Kesî Serbexo, Cînavkên Kesî Likaw, cînavwî Lêgder". Binêre: Saman mihemed, "*Cênawekan le Beşe Diyalêktî Xwarûda*", Govarî Raman, jimare: 67, Dezhay Roşinbîrî û Rageyandinî Gullan, Hewlêr, R. 235.
- 10- "Cînavkên Kesî Cînavkên Heyî, Cînavkên Xoy, Cînavkên Nişane kirdin, Cînavkên Nadyar, Cînavkên Pris, Cînavkên Pêwendî". Binêre: Nîmet 'Elî saye, "*Rêzimanî kurdî – Zarî kelhurî*", Çapxaney Şivan, Slêmanî, 2004, R. 19.
- 11- "Cînavkên Kesêne, Cînavkên Şanîdanê, Cînavkên Vegerok, Cînavkên Qertafî, Cînavkên Kesêndinê, Cînavkên Berbehevî, Cînavkên Lihevxiştî, Cînavkên Nebenavkirî, Cînavkên Xwedîtî, Cînavkên Jimarîn, Cînavkên Pirsyarî". Binêre:

- 1- Cînavkên kesî  
yên serbixwe(Serbexo)  
yên pêve(Likaw)
- 2- Cînavkên pirsiyarî(Pirsiyarî)
- 3- Cînavkên Nîşandanê(Nîşane)
- 4- Cînavkên Nebenavkirî(Diyar û Nedyar)
- 5- Cînavkên Girêkî (Lêgderî)
- 6- Cînavkên Peywendî

- 
- A- Tan Samî, "*Rêzimana kurmancî*", Çapa Berfirehkirî, Çapa Duyemîn, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2011, R. 124.
- B- OCEK Nezir (2014). *Waneyên rêzimana kurmancî*, R. 113.
- 12- "Cînavkên Kesî, Cînavkên Îşare, Cînavkên Lêkgder, Cînavkên Pirsyarî, Cînavkên Heyî, Cînavkên Xoy, Cînavkên Nadyar, Cînavkên Geyener". Binêre: Nuri Elî Emîm, "*Rêzimanî kurdî*" RR. 83- 100.
- 13- "Cînavkên Kesî Serbexo, Cînavkên Kesî Likaw, Cînavkên Kesî Xoy, Cînavkên Nadyar, Cînavkên Nîşane, Cînavkên Heyî, Cînavkên Pirsyarî". Binêre: Refîq Şiwanî, "*Wiîesazî Zimanî Kurdî (Lêkolîneweyekî Piraktîkiye)*", çapî yekem, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2011, R. 40.
- 14- Cînavkên Kesî (Kesî Serbexo û Kesî Likaw), Cînavkên Xoy, Cînavkên Îşare, Cînavkên Pirsyarî, Cînavkên Sersurhêner, Cînavkên Nadyar, Cînavkên Jijmarey, Cînavkên Heyî, Cînavkên Hawbeşî". Binêre: Ruxzadî 'Elî, "*Rêzimanî Kurdî Soranî*", Çapî yekem, Întşarat Kirdistan, Sine, 1389, R. 69.
- 15- A- cînavkên Kes: Cînavkên Cuda, Cînavkên Pêve.  
B- Cînavkên din: Cînavkên veşerog, Cînavkên Xweddyetê, Cînavkên Havbeşê, Cînavkên Lehevîstî, Cînavkên Nedyar, Cînavkên Pirsyarî". Binêre: Yıldırım Kadri, "*Temel Alıştırma ve Metinlerle – Kürtçe- Kurmancî*, Üçüncü Başkı, Avêsta, Istenbul, 2013, R. 288.
- 16- Cînavkên Kesî, Cînavkên Kesandinê, Cînavkên Nîşanî, Cînavkên Vegerok, Cînavkên Qertafî, Cînavkên Hevbeşyê, Cînavkên Têkel, Cînavkên Nedyar, Cînavkên Xwedîtê, Cînavkên Jimarî, Cînavkên Pirsyarî". Binêre: Samur Azîz, "*Kurdiya Kurmancî*", R. 111.
- 17- A- cînavkên Peyvî: Cînavkên Kesîn (Xwerû, Diyarîkrî), Cînavkên Nîşanî, Cînavkên Nedyar, Cînavkên Pirsyarî, Cînavkên Vegerok, Cînavkên Berbehevîn  
B - Cînavkên Qertafî: Cînavkên Kesîn, Cînavkên Hevbendyê, Cînavkên Pêgir". Binêre: Baran Bahoz, "*Rêzimana Kurmancî*", R. 87-100.
- 18- A- "cînavkên peyv: Cînavkên Kesêne, Cînavkên Xwe, Cînavkên Îşarekî(Şanîdanê), Cînavkên Nedyar, Cînavkên Pirsyarî, Cînavkên Hev  
B - Cînavkên Qertafî: Cînavkên Peywendî, Cînavkên Jimarkî, Cînavkên Levxistî(daçekî), Cînavkên Paşlêkerî, Cînavkên Xwemalî". Binêre: Aktuğ Halil, "*Giramera Kurdî – Kürtçe Gramer*", R. 254.
- 19- Cînavkên Kesî Serbexo, Cînavkên Xoyî, Cînavkên Amajekirdin, Cînavkên Diyar, Cînavkên Nadyar, Cînavkên Heyî, Cînavkên Pris, Cînavkên Nerê, Cînavkên Çendêfî, Cînavkên Hawbeş". Binêre: Emîr mihemd mihemd Emîn, "*Wişey Erkî le Zimanî Kurdîde*", R. 65.
- 20- "Cînavkên Kesêne, Cînavkên Şanîdanê, Cînavkên Vegerok, Cînavkên Qertafî, Cînavkên Grêkî, Cînavkên Berbehevî, Cînavkên lhevîstî, Cînavkên Nebenavkirî, Cînavkên Xwedîtyê, Cînavkên Pirsyarî". Binêre: Karbax Abdulla, "*Rêzimana Kurdî ya Kurmancî*", Bêsal(PDF), R. 61.

- 7- Cînavkên Xwedêtî(heyî)
- 8- Cînavkên xweyî(xoy)
- 9- Cînavkên Hevayî (Hawbeş)
- 10- Cînavkên Nefî,

Ji bilî van nivîskarên berî ku ser bi ekola zimanvaniya Sunetî ne, hin rêzimannivîs û zimanvanên din jî hene ku ser bi ekola nû ya zimanvanî ne, bi baweriya wan tenê cînavkên kesî, cînavk in yên dî ne cînavk in. Ev nivîser û rêzimanvanê jî "Tara Muhsîn Qadir, Umêd Berzan Bizro û Ebulwahîd Muşîr Dizeyî" ne. Lêkolîn û sekinîna li ser vê mijarê lazim e bi dem û lêkolînên zêdetir heye em li vir nikarin ji ber durketina ji navnîşana teza xwe lêkolînên derheqê her yek ji wan cureyan bidin. Her wisa em nikarin jî bi hêsanî bêjin kîjan awa rast e, ji ber ku ev tişt lazime bi lêkolînên zêdetir e. Ji ber wê hindê em di vir de tenê behsa cînavkên kesî dikin ku ji aliyê hemû nivîskarên kevin û nû jî hatiye behiskirin. Kêmasiyên lêkolînê gelek in, em bi hêvî ne bikaribin sînor û cureyên cînavkên kesî, erk û rolên Cînavkên kesî di hevokê de şîrove bikin.

## 1.2 Hin Agahiyên Teoriya Cînavkên Kesî:

### 1.2.1 Danasîna Cînavkên Kesî:

Rêzimannivîsên kurd gelek danasînên cuda ji bo cînavka kesî danane, di van danasînan de yan pişta xwe daye fikr û ramanên xwe an jî li ser şopa nivîskarên berî xwe bûne û carna jî danasîna berê bi hindê guhêrtinan hatiye dubarekirin. Piraniya wan danasînan ji aliyê meram û hundirê ve gelek nêzî hev in û kêmasiya wan jî hene:

- 1- *Ew ranawen ke lebirî kesî yekem û duyem û siyembikar dihênrên.*<sup>62</sup>
- 2- *Cênawî kesî wateya gyandar degeyenê, wate li rûyê peywendîy axavtinê: cênawî kesê yekem \_ qseker, wateya xawenî qise nîşan dide, cênawê kesê duwem \_ qise bo kiraw, wate beşdarîkirî qise derdixe, cênawî kesê siyem\_ qiselêkraw, wate beşdarî nekerî qise degeyenê. boye be bê bayexî dadenêyîn.*<sup>63</sup>

<sup>62</sup>Nurî 'Elî Emîn, Rêzmanî Kurdî, R. 83

<sup>63</sup>Umêd Berzan Bizro, "Dirûstey Firêz û Riste le Zimanî Kurdîde", Çapî Duyem, Çapxaneyî Genc, Silêmanî, 2012, R. 83.

3- *Cênawê kesî: wateya kese giyandar de grête xo, ke ewanîş qiseker û gwêgir û namade de grêtewe.*<sup>64</sup>

Ger ku em li van danasînên jor binêrin em dibînin hemû ji K.Jêrîn in, di wançavkaniyên destên me de ne, di K.Jorîn de tu danasîn ji bo cînavka kesî nehatiye kirin. Di van danasînên jor de jî kêmasiyên wan hene. Yek ji wan kêmasiyan ev e; dibên cînavkên kesî "cîhê navdêrên kesî digire yan li dewsa kes tê bikaranîn". Ev ne merce nemaza cînavkên kesî ya siyem pirjimar û yekjimar "tenê rola 'navdêrên kesî' nalîzin, belkî rola navdêran bi gelemperî dilîze, merema me ji navdêr bi gelemperî navên giyanewer û bêcan e, ji giyanewer jî de yên bihiş û bêhiş" in.<sup>65</sup> Mînak:

- Azad kitêbekey kirî.

Di vir de "y" cînavk e ji bo kesê yekjimar a duyemîn di gel navdêra "Azad" ku kirde ye. Cînavk jî ji bo "Azad" dizivire. Her gav jî bixwazin kirde "Azad" jê bibin, cînavka "y" dibe kirde tu pirsgirek jî çênabe. Wateya hevokê dide "kitêbekey kirî".

- Azad merikanî lewerand.

Di vir de her gav jî bixwazin û dikarin "merikan" jê bibin ku bireser û li dewsa wî cînavka kesê siyem "in" bi kar tê, "Azad lewerandinî." wateya cînavkê li dewsa navdêrên caneweran jî tê bikaranîn.

- Azad baxekeyî dekêlêt.

Di vir de jî "baxeke" biresere û navdêreke bêhiş e. Dikarin li dewsa vê cînavkê kesê siyem "y" dayinîn. Hevok jî dibe "Azad deykêlêt".

Ger ku em li her sê mînakên jor binêhêrin û bala xwe bidin ser, dibînin cînavk li dewsa navên giyanewerên bihiş ku mirov e û bêhiş jî ku ajal e tê bikaranîn. Her wisa li dewsa navdêrên bêcan jî tê. Ev tişt ne tenê di K.Jêrîn de heye, bi heman awayî di K.Jorîn jî de cînavkên kesî dikarin li dewsa navdêrên bêhiş û bihiş û bêcan jî bînan bikaranîn. Nerîma Ebdulla Xoşnaw di danasîna xwe de dibêje "wateya kesê giyandarê

<sup>64</sup>Nerîman Xoşnaw, "Rêzmanî Kurdî – Kirmancî Serû", Çapî yekem, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2015, r.56.

<sup>65</sup>Ednan Ehmed Elî, "Xwêndineweyek bo Pênasey Cênawî Likaw, Govarî Zimannasî, Jimare "14", Hewlêr, 2012, R. 212.

digire xo". Dive em vê ji bîr nekin cînavka kesî ji bilî kesên mirî jî tê bikaranîn, wek gava behsa kesekî dikin û dêbijin:

- Azad miriye.

Em dikarin li cihê navdêra "Azad" cînavkê bikar bînin û bêjin "Ew miriye" dive vê bizanin di vir de "ew" ji bilî keseke bê can hatiye bikaranîn. Li dawiya van agahên jor em dikarin bêjin:

Cînavkên kesî: Ev bêje ne; yên ku di pêvajoya hevokan de li dewsa navên kesan, an giyaneweran û tiştan tên. Ev kes jî , ji kesê yekem û duyem û siyem in. Du cureyên wî jî hene. yek serbixwe, yek jî pê vebestî.

❖ Ji bo têgeha cînavka kesî:

Di K.Jêrîn de derheqa beşê duyemîn têgeha "cînavkên kesî" tenê têgeha "Kesî" hatiye bikaranîn, li gorî agahiyên me di zaraveya K.Jorîn ti nav lê nekirîne ji ber ku tu nivîskar bi vî awayê dabeşkirina ji bo cînavkên kesî nekirine. Dive ji bîr nekin di K.Jorîn de têgeha kesî di hemberî têgeha (Serbixwe û kesî), tê bikarani. Bi wateyeke din gava dibêjin "cînavkên kesî" merama wan tenê cînavkên kesê serbixwe ye. Di K.Jêrîn "cînavkên kesî" sernava cînavka kesî yên serbixwe yên pêvê ye.

Em dê pirsekê bikin. Qey têgeha "Cînavkên Kesî" ne şaş e? Ji ber ku ger wisa be cînavkên kesî li dewsa navdêrên giyanewer û bêgan de bê jî. Ji ber ku dibêjin "Kes" û kes jî tenê ji bo mirov tê bikaranin. Ger wisa be jî, dive tenê li dewsa mirov bê bikaranîn! Ev çawa dibe? Em ê li vir careke din gotina "*Wirya Umer Emîn*" dubare bikin, bêjin: "*yek peyv ne danasîne ta ku wateya têgeh bi tewawî bigehînêt hemû aliyên wî bê keşîfîkirin, a herî girîng jî di têgehê de lihevhatina li ser têgehekî. Li gor demê di nav forma fonolojiya wê zimanê de dihêle, xwezaya wê zimanê digire.*"<sup>66</sup> Ji bilî vê yekê jî bi karanîna cînavkên kesî li dewsa navên ajal û ciyaneweran kêmtên bikaranîn piranî li dewsa navên mirovan tê bikaranin, ji ber wê diruste.

---

<sup>66</sup> Wirya Umer Emîn, "Rêzmanî Ranaw - Hendê Şikirdinewey Morfolocî", RR. 197- 198.

### 1.2.2 Taybetî û Cureyên Cînavkên Kesî di K. Jorîn û jêrîn de:

Derheqê cureyên cînavkên kesî di zimanê kurdî de û dabeşkirina wan cînavkan, dibin du cure yek bi vî awayê serbixwe tên, ya din jî bi awayê pêvebestî wateyê ne serbixwe tên. Wate dibin:

- 1- Cînavkên kesî yên serbixwe
- 2- Cînavkên kesî yên pêve

Me ji ber vê wisa dabeş kiriye; ji ber ku di her du destê cînavkan de mîna hev jî kesên yekem, duyem û siyem a yekjimar û pirjimar pêk tên. Rola wan jî aliyê hevoksazî ve gelek nêzî hevin. Em divê jibîr nekin jî aliyê nivîskarên berê: Mîna hemû mijarên din di vê mijarê de jî fikir û ramanên cuda hene, hin nivîskar li ser şopa nivîskarên berê fikirîne û hîn nivîskar jî li bin bandoriya zimanên din cureyên cînavkên kesên dabeş kiriye. Di K.Jorîn de kêr nivîskaran wisa dabeşkirine, yên mîna Kadri Yildirim jî hene û gotiye "cînavkên kesî cuda û pêve"<sup>67</sup>. Piraniya nivîskarên din tenê cînavkên kesî yên serbixwe destnîşan kirine, ger ku her du jî destnîşan kiribe bi du cureyên cuda dabeş kirine. Divê ev ê jî ji bîr nekin di van salên dawî de di lêkolînên K.Jêrîn de ta asteke baş dabeş kirineke standart heye. Ew jî wisa ye:

Cênawî kesî serbexo

Cênawî kesî likaw

Li vir jî ji ber ku lêkolînên me bi K. Jorîn e awayê her du cureyên cînavkan K. Jêrîn werdigrin ji bo awayê K. Jorîn. Ku ji bo ya serbixwe tenê guheraniya fonetîkî lazime bibe "serbixwe". Ji bo duyem jî xweştirîn peyv li hemberî têgeha "likaw" her ev peyvên ku Yildirim bikar aniye ew jî "pêve" ye\*.

---

<sup>67</sup> Yildirim Kadri, "Temel Alıştırma ve Metinlerle – Kürtçe Kurmancî Lehcesi", R. 228

\* Di K. Jêrîn ji bilî têgeha "serbexo û likaw" gelek têgehên din jî hatine bikaranîn lê yên herî zêde "serbexo û likaw" hatine bikaranîn

- 1- Mutsîl û Mûnfesîl : Seh'îd sidqî, "Mitesir 'Srif û Nehuy Kurdî", R. 28.
- 2- Pêwenûsaw û Serbexo : Tewfîq wehbî, "Destwrî Zimanî Kurdî", R. 83.
- 3- Ciwê û likaw: Nurî Elî Emîm, "Rêzimanî kurdî", R. 83.
- 4- Çalak û mend: Mes'ud Mihemed, "Surêkî Xame be Dewrî (Ranaw)de", R. 75.



### 1.2.2.1 *Cureyên Cînavkên Kesî di K.Jorîn de:*

#### 1.2.2.1.1 Cînavkên Kesî yên Serbixwe:

Gelek danasînên cur bi cur hatine kirin ji bo cînavkên kesî yên serbixwe di K.Jorîn de, Mînak:

- 1- *Cînavkên kesî ew bêje ne, yên ku di pêvajoya hevokan de cihê navên kesên(mirovan), giyanber û tiştan digirin, bêyî ku çi kêmasî bigihîje wan hevokan.*<sup>68</sup>
- 2- - *"Ew bernavên ku kesên pêşve dikin yan jî rasta rast şûna navên kesên digirin, ji wan re (ber navên kesok) tê gotin."*<sup>69</sup>
- 3- *"Ev cînavk, ciyê navên kesên digirin, awayên wan ên xwerû û diyarkirî hene."*<sup>70</sup>
- 4- *"Cînavên kesîn le şuna navê kesan tên xebatandin û wan dimînin."*<sup>71</sup>
- 5- *"Ew cure peyv in ku di hevokê de cihê navê kesên, giyanwer û tiştan digirin."*<sup>72</sup>
- 6- *"Mebest ji cînavkên kesî ew cînav in, ku dikarin cihê navên kesên bigirin."*<sup>73</sup>

- 
- 5- Kesî û likaw: Kurdistan Mukiriyani, *"Corekanî Cênaw û Dewryan le Ristey kurdîde le Diyalêkitî Kirmancî Xwarû û Kirmancî Jûrûda"*, RR. 234 , 240.
  - 6- Ciwê û likaw: Ewrehmanî Hacî Marif, *"Cênawî kesî Cuda le Zimanî Kurdîde"*, Govarî korî zaniyarî Êraq - destey kurid, Bergî diwazdehem, Çapxaney Korî Zaniyarî Êraq, Bexda, 1985, R. 45.
  - 7- Cuda û Likaw: Lîjney Ziman û Zanstekan le Korî Zaniyarî Kurd, *"Rêzmanî Axawtinî Kurdî"*, RR. 30 - 33.
  - 8- Serbexo û likaw: Îdirîs Ebdulla, *"Cênaw Cor û Şewekanî le Şewezarî Deştî Hewlêrde"*, R. 229.
  - 9- Serbexo û likaw: Viyan slêman Hacî Slêvaneyî, *"Rêkkewtin le Şewey Jûrûy Zimanî Kurdîde"*, R. 157.
  - 10- Cuda û Likaw: Saman Mihemed, *"Cênawekan le Beşe Diyalêktî Xwarûda"*, R. 236.
  - 11- Cuda û Likaw: Nî'met 'Elî Saye, *"Rêzmanî kurdî – Zarî Kelhurî"*, R. 19.
  - 12- Serbexo û likaw: Tara Muhsîn Qadir, *"Cênaw: Lêkneweyekî Ziwê le Zimanî Kurdîde( Bekerestey Diyalêktî Xwarû)"*, Namey Master, Kolêji Ziman, Zankoy Slêmanî, 2014, R. 15.
  - 13- Cuda û Likaw: Umêd Berzan Bizro, *"Rêzmanî Cênaw le Şewezarî Xaneqînîda (Lêkolîneweyekî Karekîye)"*, Xaney Çap û Bilawkirdinewey ÇwarÇira, Çapxaney Çiwar Çira, Silêmanî, 2009, R. 7.
  - 14- Serbixo û likaw: 'Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî, *"Rêzmanî Kurdî"*, R. 73.
  - <sup>68</sup> Ebdulfettah Deham, *"Cînav"*, R. 12.
  - <sup>69</sup> Kurdî Reşîdê, *"Rêzmanî Zimanê Kurmancî"* R.72.
  - <sup>70</sup> Baran Bahoz, *"Rêzmanî Kurmancî"* R .87.
  - <sup>71</sup> Mihemed E. Elî û Dîlan Elî, *"Nsîna Rêzmanî Kurdî Pirtûka Fêrkirinê"*, R. 34.
  - <sup>72</sup> Ocak Nezîr, *"Waneyên Rêzmanî Kurmancî"*, R .113

Ger ku lê binêrin di hemûyan de kêmasiyek dubare dibe ku hemu mîna hev dibin "rasta rast şûna navên kesên digirin" an "li şûna navên kesên tên xebatandin" an dibên "li cihê navan digirin" ev gotin şaş e. Ji ber ku cînavkên kesî yên serbixwe nikarin rasta rast şûna navên kesên bê. Ji ber ku tenê kesê siyem dikarin raste rast li şûna navên kesên bê, ji ber ku ger raste rast li şûna wan bê dibê em bikarin rasta rast navên kesên jî li şûna wan bînin bikaranin. Em nikarin wisa bikin; mînak di hevoka "Min nan xwar." an di hevoka "Ez hatim" de. Em serê xwe jî li dîwar bixin nikarin navêk li şûna cînavkên "min" û "Ez" da bînin. Ger ku nikarin navek li şûna cînavka "min" û "Ez" de bînin. Em dê çawa bêjin ev rasta rast an li şûna navên kesên hatine. Divê jibîr nekin tenê ya cînavkên kesê siyem dikarin raste rast li şûna navdêran bê, mînak "Ew hat" dikarin li şûna cînavka "ew" navdêra "Azad" bikar bînin û bêjin "Azad hat." An "wî nan xwar" Azad nan xwar." Ji ber wê em li dawiyê de dibêjin:

Cînavkên kesî yên serbixwe ew cure peyv in ku bi awayekî serbixwe di hevokê de li dewsa navên kesên, giyanawer û tiştên tên û wan dimînin. Sê kesên pirjimar û yekjimarê wî hene kesê yekemîn diaxive kesê duyemîn guhdarî dike kesê siyemîn na amade ye.

Wek têgeh jî têgehê "Kesok, Kesîn û Kesêne û kesî"\* tên xebitandin, bi piranî "Kesî" tê xebitandinê em serbixwe ji bilî kesî bikar tînin û cînavkên kesî wek sernav jî bo yên serbixwe û yên pêve ye. Di K. Jorîn de jî du cureyên cînavka kesî serbixwe hene, her çiqas gelek rêzmannivîs hene tu nav lê nekirine. Tenê bi navê komeleya yekem û komeleya duyem an desteya yekem û desteya duyem binav kirine. Me ew

<sup>73</sup> Husen muhammed, Cînav – Peydabûn û Bikaranîna wan, Govara zimanê Kurdî kanîzer, Hajimara 6, <https://zimannas.files.wordpress.com>, 6-7/2016, R. 11.

\*1- ji bo wan nivîskarên ku têgehê "Kesîn" bikar aniye, binêre:

A- Bedirxan Celadet Elî, "Bingehên Giramêra Kurmancî", R. 56.

B- Ebdulfettah Deham, "Cînav", R. 12.

C- Baran Bahoz, "Rêzmana Kurmancî" R. 82.

2- Kesok: Kurdî Reşîd, "Rêzmana Zimana Kurmancî", R. 72.

3- Piraniya lêkolînerên jî de têgeha "kesî" tên in bikaranin:

A- kurdo Qenatê, "Rêzmana Kurdî "Kurmancî – Soranî", R. 115.

B- Viyan silêman Hacî Slêvaneyî, "Rêkewtin le Şewey Jûrûy Zimanî Kurdîde(Kirmancî)", Namey Master, Kolêcî Adab, Zanko Selahedîn, 2001, R. 59.

C- Samur Azîz, "Rêzman û Rastnivîsa Kurdiya Kurmancî", R. 27.

D- Aydogan, 2012, r.177 ...hwd

4- her wisa nivîskar jî heye "kesane" bikar aniye, binêre:

Aktuğ Halil, "Gramera Kurdî – Kürtçe Gramer", R. 254.

binav dikin binavê xwerû tewandî , ya rast ev in, ji aliya piraniya nivîskarên berê jî tîn bikar anin\*\*:

- 1- cînavkên kesî yên serbixwe yên xwerû
- 2- cînavkên kesî yên serbixwe yên tewandî

Her du coreyên cînavkên serbixwe di K.Jorîn de Teşê û cureyên wan ne cihê nîqaş, in awayê wana stander heye. ji bo teşeya wan jî binêre beşa diduyan.

#### 1.2.2.1.2 Cînavkên Kesî yên Pêve:

Ev cînavk di K. Jorîn de her tim wek paşgir li dawiya cînavkên serbixwe yên xwerû tîn.<sup>74</sup> An "*wekî paşgir bi dawiya lêkeran ve dibin.*"<sup>75</sup> Bi serê xwe bê wate ne. Bi saya van qertafan em dizanin ev bûyer hatiye kirin an dizanin ji aliyê kîjan kesî hatiye kirin. Erka wan vê demê derdikeve holê bi awayekî xurt gava cînavkên kesî

\*\* Ger lê binêrin gelek têgehên din, ji bil tewandî û xwerû hatine bikaranin lê ya herî zêde xwerû tewandî ne:

- 1- bireser û kirar: Bedirxan Celadet Alî, "*Bingehên Gramêra kurdancî*", R. 57.
- 2- Xawenî û kara: Cemal Nebez, "*zimanî yekgirtûyê kurdî*", RR. 23- 24 .
- 3- Tîyan û Rastewxo: Ewrehmanî Hacî Marf, "*Ferhengê zarawey zimannasî*", Dezgay Çap Billawkirdnewey- Rojhelat, Çapî Duyem, Hewlêr, kitêbxaney Awêr, Hewlêr, 2014, R. 10.
- 4- Xawenî û Asay: 'Ebdula Husên Resul, "*Çend Basêkî Wirdî Zimanewanî – Kurdî*", Bergî Yekem, Çapî Yekem, Çapxaney- Hêvî, Hewlêr 2015, R. 182.
- 5- Rastewxo û Narastewxo :Mizgîn 'Ebdurehman Ehmed, "*Doxî Êrgetîv le Zimanî Kurdîde(kirmancî serû)*", Namey Master, Kolêjî Perwerde, Zankoy Selaheddîn, Hewlêr.2006, R. 60.
- 6- Xistîneser û Rastewxo,: Viyan Slêman Hacî Sêlavyanî, "*Rêkkewtin le şêweyê jûrûy zimanî kurdîde*", R. 59.
- 7- Her wisa binavê Desteya Rêkkewtin û desteya Xawenî jî binav kirine rupela 90.
- 8- Serkar: kurdî Reşîd, "*Rêzmana zimanê kurmancî*", R. 72.
- 9- Tewandû Pîvan : Mihemed. E. Elî û Dîlan Elî, "*Nsîna Rêzimana Kurdî Pirtûka Fêrkinê*", R. 35.
- 10- Tewandî û Xwerû: Yildirim Kadri, "*Temel Alışırma ve Metinlerle – kürçe- kurmancî Lehçesi*", R. 32.Diyarîkrî û Xwerû: Baran Bahoz, "*Rêzmana Kurmancî*", R. 87.
- 11- Berkar û kar : Xazî 'Elî Xurşîd, "*Rêzimana Fermî*", R. 51.
- 12- Tewandî û Xwerû: Ocak Nezîr, "*Waneyên Rêzimana Kurmancî*", R. 112.
- 13- Tewandî û Xwerû: Samur Azîz, "*Kurdiya Kurmancî*", R. 27.
- 14- Tewandî û Xwerû: Aktuğ Halil , "*Giramera kurdî – kürçe gramer*", R.254.
- 15- Tewandî û Xwerû: Onen Ronayî û Tan Samî, "*Hînkêr – Kurmancî*", asta duyemîn,çapê çaremîn,Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Weşan: Soylu Matbaa, stenbil, 2014, R. 7.
- 16- Tewandî û Xweû: Onen Ronayî û Tan Samî, "*Hînkêr – Kurmancî*", asta Yekemîn, çapa duyemîn, Enstîtuya kurdî ya stenbolê, çapxane:soylu matbaa, stenbil, '2015, R. 19.
- 17- Çemendî û Neçemendî: Husîn Muhammed, "*Cînav – peydabûn û bikaranîna wan*", R.11.

<sup>74</sup> Ocak Nezîr, "*Waneyên Rêzimana Kurmancî*", R. 124.

<sup>75</sup> Tan Samî, "*Rêzmana Kurmancî*", R. 137.

yên serbixwe ya xwerû di hevokê de veşartî bin an xuya nebin. Her tim jî rola rêkeftinê dibînin di navbera pêveber û kirdeyê yan di navbera pêveber û birêserê de. Piraniya rêzimannivîsên K. Jorîn di behsa cînavkê de cînavkên kesê pêve bi cînavk nehesibandine, an jî tenê yek deste diyarî kirine, ji bilî Kadri Yildirim ku desteya fermanîê jî bi cînavk hesibandiye. Divê ji bîr nekin hîn vekolerên K. Jêrîn mîna: Ewdirehmanî Hacî Marif, Wiriya Umer Emîn, Nerîman Xoşnaw, ...hwd. di behsa cînavkên kesî ya K. Jorîn de cînavkên kesî pêve bi cînavkên kesî hesibandiye. Wan jî cînavka desteya fermanîê bi cînavkên kesî pêve hesibandiye. Di K.Jorîn de hin nivîskar wisa li cînavkên kesî pêve nêrîne ku "lêkera bûn"ê ye. Mînak: Celadet Bedirxan û Sadiq Bahae Eldîn Amêdî. Hinêk ji nivîskaran jî mîna "Qertaf" bi navên cuda cuda binav kiriye. Mînak: Mofeq Zûbêr Yasîn be navê "Nîşaneyên rêkeftinê" bi nav kirine. Deham Ebdulfettah ji navê "paşkokên kesêne" lêkirîn. "Husen Muhammed" jî bi navê "paşgirên kesî" û "paşra cînavk" binav kirine. Hîn nivîskar jî bi cînavên kesî lê bi navê cuda jê behs kirine û li gor me jî ev cînavk in, ji ber ku li dewsa navdêran tên û bi saya wan cînavkan em dizanin bûyer ku hatiye kirin ji aliyê kîjan kesî ve hatiye kirin. Dema ku cînavkên serbixwe yên xwerû di hevokê de nebin ev cînavk erka hevoksaziyê dilîzin û bi rêka wan dizanin bûyer ji aliyê kê/kî ve hatiye kirin. Mînak:

- çî dikî?

Di vê hevokê de bi rêka cînavka "î" dizanin pirs ji kê hatiye kirin; Ji kesê duyem hatiye kirin, ji ber ku cînavka kesî pêve ji bo kesê yekjimar a duyemîn teşeya "î" ye. Di bersivê de jî mînak bêje:

- pirtûkê dixwînim

Li vir jî xuya dike ku ê tişteki dike "im" e. Kesê yekjimar yekemîn e. Bûye kirde.

Van nivîskarên ku di lêkolînê xwe de bi navê cuda cuda li cînavê kesî yên pêve kirine û delîlên xwe jî behs kirine em ê li gor agahiyên xwe bersiva van delîlan bidin:

1- Celadet Bedirxan, Sadiq Behaeeldîn Amêdî û Fazil Umer:

Her yek ji Celadet Bedirxan, Sadiq Behai eldîn Amêdî<sup>76</sup>, cînavkên kesî pêve bi "lêkerên bûn" datînin. An mîna Fazil Umer dibêje: "*Ji Layê Rêzimanê û erkîve gelek nêzîkî 'Verb to be'yên îngilîzî ne.*"<sup>77</sup> Di rastî jî de cudahî gelek di nav bera van cînavkan û "Verb to be" ya îngilîzî de heye: Em dê berî binêrîne "Verb to be" ya inglîzî baştir zelal bibe:

was û were → bi dema borî re tîn

is û am û are → di dema niha re tîn

will û shall → bi dema bê re tîn

Tê xuyakirin "Verb to be" di zimanê îngilîzî de li gor deman hatiye cudakirin wate ji bo demên borî, niha û bê cudahiya teşeyên wan heye. Her yek jî ji bo demekî tê bikaranin. Ev cînavka di zimanê kurdî de ne wisa ne. Her wekî Deham Ebdulfettah, dibêje: "Çi karê heye du mercîn sereke bixwe ve digire:

- demeke destnîşankirî (ji borî, niha, paşeroj)

- bûyere (rûdanek, bizav)"<sup>78</sup>

Ji ber ku her lêkerê be, dive ev du mercên jor di nav de hebe. Her yek li van dengan "im/m/me, n/n/ne, y/i/ye, n/ne, /eØ, in/n/ne" dem û bûyer di hundirê wan de tune ye, ji ber ku ger em bipirsin denga "im/m/me" ji bo çi demê tê bikaranîn? Xuya ye bersiva vê pirsê ji sê bersivan ne zêdetir e. Ji ber ku di ziman de tenê sê dem hene. Ev deng jî bi her sê deman re tê bikaranîn, mînak:

A- ji bo dema borî: Ez çûm.

B- ji bo dema niha: Ez diçim.

C- ji bo dema bê: Êz dê biçim.

<sup>76</sup>Sadiq Behaeldîn Amêdî, "*Rêzimana Kurdî'Kirmancîya Jorî û Jêrîya Hevberkrî*", R. 207.

<sup>77</sup> Fazil Umer, "*Çend Awrek li Zimanê Kurdî*", R. 118.

<sup>78</sup> Ebdulfettah Deham "*Kar (Lêker) di Zimanê Kurdî de (K. Jorîn)*", Çapa Êkê, Çapxaneyê: Hecî haşim, Hewlêr, 2012.

Em jî dipirsin ger denga "im/m" ji bo dema borî ye. Çima li dema niha hatiye bikaranin? An çima li dema bê tê bikaranin? An jî ger di dema niha de ye. Qey çima di dema borî, niha û bê tèn bikaranin

An ger ev deng lêkera bûn ê be qey lêkera "çûn" çiyê?

An dinav van dangan de çi bûyer û tevger heye ku bibine lêker?

An ti taybetmendiyeke lêkerê di bin wan dangan de heye:

Bê guman ev ne lêkerin ji ber ku ne bûyer û ne jî dem di nav de tune ye. Ji ber vê çendê bi bawerê me ev ne lêkera bûnê ne.

## 2- Halil Aktuğ

Yekî din jî ji van nivîskaran ku bi baweriya wî ev deng, ne cînavkên kesî pêve ne HalilAktuğ e ku wan binav dike bi "qertafên kesê(kesêne)". Derheqê wan de jî dibê "bi saya van qertafan em dizanin ku buyera hatiye kirin kê/ kî kiriye."<sup>79</sup> Bi rastî jî em bi saya van qertafan zanîn, ji bo cînavkên serbixwe jî her bi saya wan cînavkan dizanin ku buyera hatiye kirin kê/ kî kirîye.

Her wisa Aktuğ, de dibêje; *"Divê em qertafên kesên û qertaf lêkeran tevlihev nekin,"*<sup>80</sup> Demên bi lêkerê re tèn nivîsandin, bi "qertafê kesan" wan bi nav dike. Dema ku bi lêkera bûna bingehî ra tèn, wan bi "qertafên lêker"î binav dike. Bi xwe bi rastî jî her du jî yek tiştin û yek erk û rol dibînin, cudahî tenê ev e; dema bi niv lêkera bûna bingehî re tèn bi awayê cuda tèn nivîsin, ger bi lêkerên tewaw re bèn bi lêkeran re tèn nivîsin. Ev jî tenê di nivîsina latînî de bi serbixwe tèn nivîsandin lê di nivîsina tîpên aramî bi peyvên beriya xwe ve tèn nivîsin, mînak:

Tîpên Latînî	Tîpên Aramî
Ez baş im	ئه‌ز باشم
Tu baş î	تو باشی
Ew baş e	ئه‌و باشه

<sup>79</sup> Aktuğ Halil, "Giramera kurdî – kürtçe Gramer", R. 92.

<sup>80</sup> Heman Jêder, R. 92.

Em baş in	ئەم باشن
Hûn baş in	ههون باشن
Ew baş in	ئەو باشن

Xişteya (1- 2)

Li dawî de dibêjîn ji ber ku gava bi lêkerên tewaw û nîv lêkeran re bîn, yek erkê dibînin û di her duyan jî de bi rêga van dangan dizanin bûyer ji aliyê kê/kî ve hatiye kirin û li dewsa navdêran tên ji ber wê cînavk in.

3- Deham Ebdulfettah:

Yekî din ji van nivîskaran Deham Ebdulfettah, di pirtûka *"Kar (Lêker) di Zimanê Kurdî de (Kurmanciya Jorîn)"* de dibêje: *"Ev paşpirtek 'm, î, e, n' ne raveyên karê 'bûn' di dema niha de ne, ne cînavên pêvebestî ne jî, bi dîtina min, ew paşkokên kesî in. Li pey nav û cînavkên koma 'ez' tên û wekî peyvên pabendî bi wan ve girêdayî ne. Di dema niha de karê 'bûn' tê avêtin û ew paşkok li şûna wî dimînin"*<sup>81</sup> mamosta Deham Ebdulfettah rast dibêje dema dibêje "ev ne raweyên karê "bûn" ne de dema niha de ne, û li pey nav û cînavkên koma "ez" tên", her wisa dema ew wan "paşkokên kesî" nav dike. Raste ji ber ku yek her tim li paş kokên lêkerên tewaw û nîv lêkeran tê, dudi jî ji bo kes tên bikaranîn, dibê ji bîr nekin ev têgeha wateyê rasta van dangan nade ji ber ku ev deng li dewsa navdêran tên. mînak: Dema em bipirsîn "tu bi tenê çu yî?" An jî "hûn bi hev re çûne dibistanê?" dema yê bersiv dide dikare bêje "tenê çûme dibistanê." Em bi rêka "m" ya dawîya "çû" dizanin ku ya "çû" ye kî ye?. Û li dewsa navê kesê çûye tê. Erka vî dengê jî kirde ye. Ger ku bersiv bide "ez tenê çûme dibistanê." em bi rêka "ez" dizanin ku yê "çû" ye kî ye. Erka "ez" jî ji aliyê hevokszî dibe kirde. Cînavka "m" ji bo kirdeyê dizivire. Di rastî de di zimanê kurdî de cînavkên kesî pêve li dewsa cînavkên kesê serbixwe tên. Her wisa mamosta Ebdulfettah di rupela "276" dibêje *"em dizanîn ku cînav ew bêje ne, yên ku cîhê navdêran digirin û li şûna wan bikar tên"* van mînakan jî tên:

A) Azad çû dibistanê

<sup>81</sup> Ebdulfettah Deham *"Kar (Lêker) di Zimanê Kurdî de (K. Jorîn)"*, R. 276.

B) Ew çû dibistanê

Ger ku em lê binêrin dibînîn nivîskar wisa difikire ku di hevoka "B" da "ew çû dibistanê." cînavka "ew", li cihê navdêra "Azad" di hevoka "A" yê "Azad çû dibistanê" hatiye bikaranîn. Ev raste lê ev ne rast e ger ku em wisa bi hizirin, mîna ew bêje "gerek ev kurte bêje jî "cînav bin" divê cihê navdêran bigirin û li cihê wan bikar bên!!" ji ber ku cînavên serbixwe jî ya xwerû û tewandî jî ji bilî cînavên kesê siyem bi awayekî rast nikarin li cihê navdêran bên.

#### 4- Husin Muhammad

Yekî din ji van nivîskarên ku mîna cînavk ji cînavkên kesî pêve nanêre Husin Muhammad e di gotarek de bi navê "*paşgirên kesî yê lêkeran û dîroka wan*"<sup>82</sup> behsa wan dike. Berî her tiştê em dê tenê pirsê ji mamostayê Husin Muhammad bikin ev pirs jî ev e. Ew ji me re bêjê ev deng "im/me , î/ye , e , in/ne...) "*paşgirên kesî yê lêkeran*"in an jî "*paşgirên cînavk*"in?! Ji ber ku wî destpêka gotina xwe de, dibêje *paşgirên kesî û danasîna wan jî wisa dike, pişt re ji bo şrovekirinê û cudakirina wan bi paşgirên cînavkên ( ez, em, tu, hun....) binav dike. Xuya ye tiştên wisa di lêkolînên rêziman û ziman de şaşî ye, ji ber ku naşê tiştêk du tişt be di asteke zimên de. Yan du navên tiştêkî hebin.*

Paşgirên kesî yê lêkeran:

Ew di destpêka lêkolîna xwe de di Rupela "116" de dibêje "*Paşgirên kesî yê lêkeran ew paşgir in ku dikevin dawîya lêkeran û pê diyar dibe ka kirdeyê/bikêrê (subject) wê lêkerê kî ye*", Pişt re di heman rûpelê de bi çend mînakên meramê xwe zelaltir dike:

- dibêj-im ("im" a dawîya lêkerê diyar dike ku biker "ez" im: "ez dibêjim", ne "\*tu dibêjim" yan "\*ew dibêjim"...) )

- dibêj-î ("î" diyar dike ku biker "tu" yî: "tu dibêjî", ne "\*ez dibêjî", "\*em dibêjî"...) )

---

<sup>82</sup>Husin Muhammad, "*Paşgirên kesî yê lêkeran û dîroka wan*", Kovara Kanîzar, Kovara Zimanê Kurdî, Hjmar.7,(<https://zimannas.wordpress.com/>), 8-9.2006, R. 166.



Bi xwe di rastî de yek ji rola cînavkên kesî serbixwe jî her ev e ku di hevokê de diyar dike bûyer kî/kê kiriye kirde kî/kê ye. Vê demê tu ferq di navbera erka cînavkên kesî serbixwe û pêve de tune ye.

Her wisa di rûpela "117" dibêje *"de kurmanciya nivîskî de du desteyên paşgirên kesî yên lêkeran hene. Yek ji wan hingê li kar e gava ku rihê lêkerê bi konsonantekê bi dawî bê. Deste ya din ya paşgiran wê tê xebitandin dema ku li dawiya rihê lêkerê vokalek (a, e, ê, i, î, o, u, û) hebe."* Bi xwe di rastî de ev ne du desteyên cuda ne. Ji ber ku ev her du yek deste ne û alomorfên hevûdu ne. Ji aliyêke din re jî ne du morf in jî sê morf in, mînak: ji bo kesê yekjimara yekemîn:

-Ez duh çûme dibistanê.

Li vir de "m" cînavka kesî pêve ye ji bo kesê yekjimar a yekemîn e. Divê em şaş nekin ev "e" piştê cînavka "m" qertafa dema boriya dudar e.

Ez te dibînim.

Li vir de jî cînavk morfa "im" girtiye ji bo kesê yekjimar a yekemîn e.

Ez mamosta me.

Li vir de jî cînavka kesê yekjimar a yekemîn bi awayê morfa "me" xuya dibe\*

paşgira cînavk:

Wek xuya dike di destpêkê de mamoste Hussin van cînavkan bi paşgirên kesî yên lêkeran şîrove dike. Li vir şûn de ji bo cudakirina yekjimarî û pirjimariya wan ji wan re dibê "paşgira cînavk"! mînak di rûpela "118" de dibêje: *"Di hemû devokên kurmancî de paşgirên kesî ne wiha ne. Di hemûyan de paşgira cînavkên 'ez', 'hûn' û 'ew' yê pirjimar wek di zimanê nivîsê de ye."* Ger ku ew paşgirên kesî ne? Çima wan binavê paşgirê cînavên "ez, hun û ew" cuda dike û li vir şûn de ta çend rûpelên din. di lêkolînê xwe de, ew bi navê paşgira cînavk li gor devok û zaraveyên din diyar dike û şîrove dike. Mînakên din

*Paşgirên cînavkê "tu" (R.119).*

---

\*Ji bo agahên zêdetir binêre (2.2.2)

*Paşgirên cînavkê "ew" yê yekjimar (R.119).*

Dawiyê de dikarin bêjin ev deng di zimanê kurdî de ku her tim piştî lêker û niv lêkeran tên cînavkên kesî pêve ne. Ji ber ku li dewsa navdêran tên heman erk û rola cînavkên kesî serbixwe yê xwerû dibînin. Di kirmancî de tenê yek desteyên cînavkên kesî pêve hene lê em vê desteyê parve dikin çar desteyên piçûk ji bo hêsanî lêkolîn. Divê jibîr nekin desteya -1 digel desteya-2 tenê di kesî siyem de cuda ne û desteya – 3 jî tenê bi dema niha ya niv lêkera bûna bingehî de tê desteya -4 jî, ji bo kesî duyem e ji ber ku tenê di awayê fermanî re tê bikaranîn.

### **1.2.2.2 Cureyên Cînavkên Kesî di K. Jêrîn de:**

#### **1.2.2.2.1 Cînavkên Kesî yê Serbixwe:**

Ev cînavkên ku dikarin bi tenê serê xwe bi awayî cuda mîna morfîmeka azad û xweser di hevokê de ji bilî firêza navê de bî bikaranîn û hemû erkên navdêr bibînin. Wateya kesî yekem(axêver), kesî duyem(guhdarîker) û kesî siyem(naamade) nîşan dide û digîhîne. Di hevokê de mîna navdêran di gel dem û cureyên lêkeran tê kişandin û bikaranîn.\* Di K.Jêrîn de jî tenê yek koma cînavka kesî serbixwe heye.

#### **1.2.2.2.2 Cînavkên Kesî yê Pêve:**

Ev cure, cînavkên qertafî ne. Bi tena serê xwe wateyê wan tune ye, gava bi peyvekê an bêjeyê din re tî merema wan tî xuyakirin, li dewsa cînavkên kesî ya serbixwe tî bikaranîn. Di hevokê de jî dibin kirde, bireser, nîhad û raveker, heman rola cînavkên kesî yê serbixwe dilîzin. Mîna cînavkên kesî ya serbixwe sê kes in "axêver, gûhdarîker û naamade". Ev qas aktîvîna ku hevok û axaftin bê wan çê nabe\*\*.

---

\* Ji bo nivîsîna dansîne jor, ji wan danasînen jêr mefa ditiye:

1- *"Cînavkên serbixwe: Ev cînavkin ku dikarin bi awayekî serbixwe û cuda bê ku bi peyvên dinê a hevokê bî nivîsin, bi wateyêka din dişê destpêka hevok bi cînavkê bê."* Binêre:

Yusif Şerîf Se'îd, "Zimanewanî", Kokirdinewey Nerîman Xoşinaw, Çapî Yekem, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2011, R. 273.

2- *"Cînavkên kesî cuda: birîtin ji van cînavkên ku ji bilî kes tî bikaranîn û yekjimar û pirjimar."* Binêtr:

Saman mihemed, *"Cênawekan le Beşe Diyalêktî Xwarûda"* R. 236.

3- *"Ev cînavkin ku dikarin bi serbixwe û cuda mîna morfîmeka azad (xweser) di hevokê de ji bilî virêza navê bî bikar anîn û hemû erkên wan jî bibînin."* Binêre:

Umêd Berzan Bizro, *"Rêzimanî Cênaw le Şewezarî Xaneqîda"*, R. 7.

\*\* Ji bo nivîsîna danasîna jor, ji wan danasîna jêr mefa ditiye.:

Di K.Jêrîn de bi piranî têgeha "likaw" tê bikaranîn wateya li hemberî têgeha "pêve" têgeha "likaw" tê xebitandin. Gava em peyva "pêve" bikar tînin nabe sedema wê ku "likaw" şaş be ji ber ku lêkolînê me bi têrmînolojiya K.Jorîn e û dibe li gor vê zaraveyê têgeh jî bên bikaranîn. Ger wisa ne be "likaw" peyveka dirûst û xweşik e.

Cureyên cînavkên kesê pêve

Di dabeşkirina cureyên cînavkên kesê pêve di K.Jêrîn de mîna her mijareka din a rêzimanî cudahî di navbarê nivîskarên rêzimanan de heye. Mînak: Hin nivîskar hene tenê yek desteya cînavkên kesê pêve diyar kirine.<sup>83</sup>Hîn jî nivîskaran cînavkên kesê pêve dabeş kiriye ji bo du dest e.<sup>84</sup>Hîn nivîskar jî hene cînavkên kesê pêve dabeş kiriye ji bo sê deste.<sup>85</sup>Nivîskar heye cînavkên kesê pêve debeş kiriye ji bo du deste û desteya duyem jî ji bo sê desteyên din.<sup>86</sup>Nivîskar jî heye qertafên cînavkên

1- Ev cînavkin bi tenê serbixwe nikarin bên gotin ta ku bi bêjeyeka din re tînin, neşet axaftin bi wan bê dest pêkirin)

Nurî Elî Emîn, "Rêzimanî kurdî" R.85.

2- Ev cînavkin ku şuna cînavkên kesê serbixwe ve digirin di nivîsin û axaftin de, ev cînavk jî bi tenê seraxwe ne dinivîsin de ne di axftin de bi tenê seraxwe wateyeka wan tune ye lê gavê tînin ber pêyvên din meramek diden." Binêre:

Lîjneyek le wezareti perwerde, "*Ziman û Edebî Kurdî*", Polî Heştêmî Bineretî, Bijardekirin û Dariştinewey: Yasîn Usman Hesên, Şêrko Ehmed Hewêz...Hwd, Çapî pêncem, Çapxaney Dar, Lubinan, 2012, R. 45.

3- Ev morfîmên qertafa rêzimanî ne, bi tenê hîç wateyek nadene dest, bîngeha hevok û axftinên kurdî ne, hertim bi keresteyên dinê ya hevokê mîna "navdêr, rengdêr, hoker, cînavk, lêker...hwd. ve tînin nivîsin, rol û erkên cuda dilizin." Binêre:

Yusif Şerîf Se'îd, "Cênawî kesî le Kurdî û Farsîde lêkolîneweyekî wesfî Berawirdkarîye", Govarî Zankoy Selaheddîn, jimare 6, Hewlêr, 29. ayarî .1999, R. 54.

<sup>83</sup>Binêre:

A- Îbrahîm Ezîz Îbrahîm, "*Gîrugirfî Nûsînî Firman Legel Ranaw Lerûy Pêkewenûsan û Pêkeweneûsanewe*", Govarî Korî Zaniyarî Êraq – Destey Kurd, Bergî Noyem, Çapxaney Korî Zaniyarî Êraq, Bexda, 1982. R. 454.

B- Miwefeq Zubêr Yasîn, "*Cihnav di Navbera Zimanê Kurdî û 'Erebîde'*", Namey Master, Fekolîtiya Zanstên Mirovat, Zankoy Zaxo, 2013, R. 48.

<sup>84</sup> Binêre:

A- Nurî Elî Emîn, "Rêzimanî kurdî", R. 86.

B- Lîjney Ziman û Zanstekan le Korî Zaniyarî Kurd, "*Rêzimanî Axawtînî Kurdî*", R.36.

C- *Ewrehmanî Hacî Marîf*, "*Rêzimanî Kurdî Bergî yekem (wişesazi) Beşî duyem(Cênaw)*", R. 104.

Ç- Şêrko Baban, "*Pîley Pole Cênawekan*", Govarî Karwan, Jimare 142, Hewlêr, şubatî. 2000, R. 106

D- Samanmihemed, "*Cênawekan le Beşe Dîyalêktî Xwarûda*", R. 237.

E- Tara Muhsîn Qadir, "*Cênaw: Lêkdnneweyekî Niwê le Zimanî Kurdîde(Bekerestey Dîyalêktî Xwarû)*", R. 6.

<sup>85</sup> Ebdul Wahîd Muşîr Dizeyî, "Zare kurdîyekan", çapî yekem, çapxaney Pak, Hewlêr, 2011, R. 48.

<sup>86</sup> Binêre:

A- Wirya Umer Emîn, "Rêzimanî Ranawî Likaw", Govarî Karwan, Jimare 8, Hewlêr, 1986, R. 68.

B- Xoşinaw Ezîz Emîn, "*Rêzimanî Cênawî Likaw le Zimanî kurdî de (Kirmancî Nawerast)*", R.73.

kesî yek alî dabeş kiriye ji bo ça.<sup>87</sup>Dikarin bêjim piraniya nivîskaran du desteyên qertafên cînavkên kesî diyarî kirine:

desteya yekem: "im/m - man", "it/t - tan", "iy/y/î - yan"

desteya duyem: "m/im – yin/în", "î/y/iy – n/in", "Ø,ê/ê, at/a – in/n"

Piraniya nivîskarên rêzimana K. Jêrîn wisa dabeşkiriye, hin nivîskaran jî mîna Nerîman Xoşnaw, Xoşnaw Ezîz Emîn û di pirtûka programên xwêdingehên başûrê kurdistanê de ji bo kesê duyemina forma "e- in/n" a fermanîê jî diyar kiriye. Derbareya navlêkirina van desteyên cînavkan di K.Jêrîn de piranî bi "desteyê yekem û desteyê duyem" an "komeleya(koma) yekem û duyem" hatine binavkirin. Şêrko Baban, destaya yekem û duyem diguhere, desteya duyem nav dike "pola yekem" desteya yekem jî nav dike "pola duyem"<sup>88</sup> Bi wateyeka din piraniye nivîskar desteya cînavkên "im/m - man", "it/t - tan", "iy/y/î - yan" bi desteya yekem binav dikan, Şêrko Baban bi ya duyem binav dike. Desteya "m/im – yin/în", "î/y/iy – n/in", "Ø,ê/ê, at/a – in/n" jî bi ya duyem binav dikan, Şêrko Baban bi desteya yekem binav dike. Hin nivîskar jî hene desteya yekem binavê "corî hêz"(cureyên bihêz) desteya duyem jî binavê "corî bêhêz"(cureyên bêhêz) binav dike.<sup>89</sup> wisa jî nivîskar heye desteya yekem binavê "desteya(A)" binav dike û desteya duyem jî bi navê "desteya(B)" binav dike. Her wisa jî desteya duyem dike "desteya(B1), desteya(B2) û desteya(B3)"<sup>90</sup> Lazime em bizanin tu têkilî di navbera van navan û cînavkan de tune ye, her wekî seydayê Xoşnaw dibê: *"Ev hemû ji bo merame lêkolîn û hêsanî fêmkirina xwêner hatine kirin."*<sup>91</sup>Em jî dê desteya yekem binav dikan bi desteya bihêz û desteya duyem jî bi desteya bêhêz, her wisa desteya duyem jî dikan bi sê desteyên din.

#### 1.2.2.2.1 Desteya Bihêz:

Ji ber ku desteya yekema van cînavkên (im/m - man", "it/t - tan", "iy/y/î – yan) roleke xurt û aktîv dilîzin di hevok û axaftinê de, zêdetir dikarin hemû erkên

<sup>87</sup> Binêre:

A- Nerîman Xoşnaw, *"Rêzimanî Kurdî"*, R. 30.

B- Yildirim Kadri, *"Fêrkerî Soranî"* Rêzman Ferhengî Mijarî Axawtin, Istanbul, 2014, R. 41.

<sup>88</sup> Şêrko Baban, *"Piley Pole Cênawekan"*, R. 106.

<sup>89</sup> Ewrehmanî Hacî Marîf, *"Rêzimanî Kurdî Bergî yekem (wişesazî) Beşî duyem(Cênaw)"*, R. 104.

<sup>90</sup> Xoşnaw Ezîz Hemeemîn, *"Rêzmanî cênawî likaw le zîmanî kurdîde(kirmancî nawerast)"* R. 72.

<sup>91</sup> Heman Jêder, R. 73.

navdêran bigirin ser xwe û di hevokê de jî li gor hebûn û tunebûna hin kereseyan hevoksazî cihê wan tê guhertin me jî ew bi desteya "bihêz" bi nav kir. Ev desteya di warê lêkolîn û teoriya wan kêmîr cihê nîqaş û tevliheviyên mîna desteya serbixwe awayê wan ta asteke baş hatiye kişfîkirin.

#### 1.2.2.2.2 Desteya Bêhêz:

Desteya cînavka bêhêz di K. Jêrîn de her tim cihê nîqaş û şîrovekirinê bûne di nav rêzîmannivîsên cînavkên kesî de. Ev nîqaş û şîrove jî yan li ser teşeya wan bûye yan jî li ser tûne bûna wan bûye. Ji ber ku hin nivîskaran gotiye ev desteya ne cînavkin, divê bizanin ku hejmarê van nivîskaran ne gelek e, nivîskarên berê jî ne û bi hêsanî jî dişê bersiva wan û fikra wan bidin:

#### 1- Kurdistan Mukiriyânî

Yek ji wan nivîskarane ku dibe desteya bêhêz ne cînavk in kurdistan mukiriyânî ye. Di lêkolînekê de binavê "*Corekanî Cînav Dewriyan le Risteyî Kurdî de le Diyalêktî Xwarû û Jûrû de*"<sup>92</sup> dibêje: "*cureyên cînavkên a desteya duyem ne cînavkên pêve ne, her wisa jî ne lêker in lê belê ev paşpirtikin ku bi dawiya lêkerên neborî gerguhêz û negerguhêz herwisa lêkera negerguhêz a dema borî re tîn nivîsin. Di hevokê de ew rol nalîzin ku cînavkên desteya bihêz"-im/m, -it/t, -y/î, -man, -tan, -yan"dilîzin û dibin bireser û têrker û raveker. Erka desteya duyem tenê nîşandana kes û hejmarê lêker ye."<sup>93</sup> Kurdistan Mukiriyânî rast dibêje dema dibêje awayê karkirin û hatinan di hevokê de ne mîna desteya bihêz e, divê bizanin ger ev desteya jî mîna desteya bihêz in di hevokê de bîn û cudahî tune be, wê demê hebûna wan ne lazim e. Her wisa ew Bawerê me şaş e; dibêje cînavkên desteya bêhêz dibe "*nikarin mîna cînavkên desteya bihêz rol û erkê bibînin di hevokê de*", ji ber ku ew dikarin bibin:*

- 1- Kirde: **Hatim.** : Min hatim.
- 2- Bireser: **Êwe nusîtanîn.** : Êwe êmetan nusî.
- 3- Raveker: **Ew kitêbekeyî sutandîn** : Ew kitêbekey êmey sutand.

<sup>92</sup> Kurdistan Mukiriyânî, "*Corekanî Cînav û Dewriyan le Risteyî kurdî de le Diyalêkitî Kirmancî Xwarû û Kirmancî Jûrûda*", RR. 229- 254

<sup>93</sup> Heman Jêder, R. 240.

her wisa gelêk erkên din. Em dê piştra wan erkan şîrove bikin.

## 2- Îbrahîm Ezîz Îbrahîm:

Yekî din ji van nivîskarên ku dibê cînavkên desteya bêhêz ne cînavkin Îbrahîm Ezîz Îbrahîm e di gotara "*Gîrûgirfî Nûsînî Ferman Legel Ranaw Lerûy Pêkewe nûsan û Pêkewe nenûsanewê*"<sup>94</sup>. de Di destpêkê de cînavkên desteya bêhêz bi dawiya lêker bi nav dike û dibêje: "*agahiyên min bi xwe di rêzimana kurdî de ev tişt run dike ku wêneya (im/m, it/t y/î, (yt/ît, . , yin/înû , in/n , in/n...) ne cînavk in û nabe binav bikin, bi cînavk.*"<sup>95</sup> Ji bo peyitandina raya xwe jî çar delîlên zehîf tîne, ku hîç ji wan jî ne cihê baweriyê ne, ji bilî vê yekê jî ev di K. Jêrîn de hatiye peyitandin ku cînavk in û ne cihê nîqaşan in. Delîlên wî jî ev in:

- 1- Di delîla yekem de, di rûpela "454" de dibêje: "*van ku bi cînavk hatine binavkirin ne cînavkin nikarin bibin bi beşek ji beşên hevokê*". Ev delîla ji du aliyan ve şaşî di nav de heye. *Yek"beşên axaftinê; bûn bi beşek ji beşên hevokê nayên cudakirin, ji ber ku gelek beşên axaftinên din hene ku nikarin bibin ji beşeke serekî ji beşên hevokê.*"<sup>96</sup> Ji aliyêkî din jî cînavkên desteya bêhêz dikarin bibin kirde, bireser, raveker...hwd. di hevokê de.
- 2- Di delîla duyem jî de, di rupela "454" de dibêje "*bi tu awayî cihê xwe naguherin di hevokê de*". Ev jî delîleke gelek zehfe ji ber vê yekê ku cînavk hert im li dawiyê tîn em wan bi cînavk nahesibînin. Her wisa qet cihê guherînê di hevokê de nebûye danasîn û nasnameya cînavkê<sup>97</sup>
- 3- Di delîla sisê jî de di Rupela "454" de dibê "*her tim bi dawiya lêkerê ve tîn nivîsîn xwe li dawiya lêkerê cuda nakin*" ev jî ne raste ji ber ku ne merce hertim bi dawiya lêkerê ve bîn nivîsin ji ber ku bi kerese yên din jî re tîn nivîsîn nemaze di nîv lêkerê de:

Navdêr: Êm ê kurdin.

<sup>94</sup> Îbrahîm Ezîz Îbrahîm, "*Gîrûgirfî Nûsînî Firman Legel Ranaw Lerûy Pêkewenûsan û Pêkeweneûsanewê*" RR. 50 – 480.

<sup>95</sup> Heman Jêder, RR. 453- 454.

<sup>96</sup> Xoşnaw Ezîz Hemeemîn, *Rêzmanî cênawî likaw le zimanî kurdîde(kirmancî nawerast, R. 25.*

<sup>97</sup> Ewrehmanî Hacî Marîf, "*Rêzmanî Kurdî Bergî yekem (wişesazî) Beşî duyem(Cênaw)*", R. 45.

Rengdêr: Êw ê jîrin.

Cînavk: Ewan newey dahatûn.

4- Ji bo delîla çarem jî di heman rupel de dibê: *"teşeya sifir çawa dikere bibe cînavk"* ev ne lazime em pirs bikin ji ber ku ev tişt tenê ne di zimanê kurdî de heye di zimanê erebî û farsî û gelek zimanên din jî de heye merema morfîma sifir (Ø) jî ev e ku cînavk bi awayekî eşkere xuya nake.

5- Miwefeq Zubêr Yasîn:

Yekî din ji van vekolerên ku dibên desteya bêhêz ne cînavk e. "Miwefeq Zubêr Yasîn" e. Di teza xwe a "Lisansa Bilind" de binavê *"Cihnav di Navbera Zimanê Kurdî û Erebi de"* Wan binav dike bi "Nîşanên rêkeftinê", dibêje: *"Bi dîtina me di zimanê kurdî de bi tenê me desteyeke cihnavên kesên likaw(pêve) yên hene. Ew jî cihnavên "im/m, it/t, y/i, man, tan, yan" ên K. Jêrîn\*..... Yên din her du diyalêktên kurdî de di tenê nîşaneyên rêkeftinê ne, kes û jimareyên xwe li dawiya hevokê rêkdixin, çimkî ew şiyayên "im/m, it/t, y/i..." heyn ji bo diyarkirina kes û jimareyên kesên bêyî pêdivî bi navekî yan cihnavêkî yan morfîma (sifir)bibin. Nîşanên rêkeftinê tu şiyayên nîn in, ta ku cihnavêkê cuda yan morfîma(sifir) di gel da nebit."*<sup>98</sup> pişt ra vekoler di heman rupelê de ji bo peyitandina raya xwe hevokê pirsyarî tîne, ku cînavkên desteya bihêz a kesê duyem bûye kirde:

- Waneket nûsî?
- Belê, nûsîm an Nexêr nem nûsî.

Wate di pirsyarkirîna da pêdivî bi hindê naket bêjin

To waneket nûsî?

Di bersiva pirsyarê jî da pêdivî neket bêjin:

- Belê min nûsîm yan nexeyr min nem nûsî.

---

\*Nivîskar bi xwe nivîsye "k.n" kurtkiriya peyva kirmanciya nawerast e wateK. Jêrîn

<sup>98</sup> Miwefeq Zubêr Yasîn, *"Cihnav di navbera zimanê kurdî û 'Erebîde"* R. 34.

Wateya li vir de nivîskar dibêje: cînavka "t" li cihê cînavka serbixwe hatiye, ku bi tu awayî lazime bi cînavka serbixwe nake. Em divê bizanin cînavkên desteya bêhêz jî dikarin bi heman awayî ji bilî cînavkên kesî serbixwe bê. Ev mebest û meramê jî bigihînin, mînak:

- Hatî?

-Belê hatim an nexêr ne hatim.

Wate di vir da jî di pîrskirinê de pêdivî bi vê nake bêjîn.

To hatî?

her wisa di bersiva pîrsê jî da pêdivî nake bêjîn:

Belê, min hatim an Nexeyr, min nehatim

Di delîleke din di rûpela "35" de behs ji xwedîtî dike û dibêje e "*di rista 'boman bihêne.' de (man) şiyaye heman mebest û erkê cihnavê kesê yê cuda(ême) diyarbiket bêy pêdivî bi cihnavê (ême) bibît.*" Em jî bi mîna wî dibêjîn; cînavkên desteya bihêz cînavkên desteya bêhêz jî dikarin di erka xwedîtî de heman mebest û erkê cînavkên kesê yê cuda"ême" diyarbike bêy pêdivî bi cînavkê "ême" hebe, mînak:

- kitêbekî standîn.

Di vir de cînavkê dawî peyva "sutand" ku "în" e heman erk û rola cînavka "ême" yî dîtîye. Lazime bi cînavka serbixwe jî nebûye.

Di delîleke din de di heman rupel de dibêje: "*neşên bi tenê li gel cihavekê kesî yê cuda rêk bikevit dewrê(rola) xwe yê rêzimanî bigehînit û kesê mebest pê diyarî bike, çunkî ger em bêjîn 'çûn' ev 'n' ya dawî 'çûn' erê mebest pê kesê duwê yan kesê sêyê ye?.*" Ger em lê hur bîn dibînin vekoler rast dibêje lê ev tenê ji bo kesê duyem û pirjimara siyemîn raste, di K. Jêrîn jî de pêdivî bi cînavkên serbixwe dibe. Ji bo cudakirina kesê duyem û siyem lê divê bê zanîn ev jî nabe vê egerê ku ev desteya nebûna cînavkê. Dibe em jî bizanin cînavkên kesê serbixwe yên xwerû ya pirjimara siyemîn û yekjimar di K. Jorîn de bi rêka cînavkên kesî yên pêve tên li hev cudakirin. mînak



Ew hat.            Ew hatin.

Wateya cînavkê dibin alîkarê hev û din, ji bo diyarkirina kes û mêjeran. Tu ji wan nivîskaran nikarine delîleke wisa bixine pêşiya me. Ta ku em jî bêjin mîna wan ev ne cînavkin, ji ber wê yekê em dikarin bêjin ev cînavk in ji ber ku dikarin li dewsa navdêran bên. Ev destê jî ji ber ku kêmtir aktîv in û piraniya caran tên dawîya lêkerê û kêma car cihê xwe diguherin ji ber wê vê desteyê jî bi nav dikin bi navê desteya "bêhêz" ji bo hêsanî lêkolîn û fêmkirinê jî cardin vê desteyê dabeş dikin ji bo desteya "bêhêz-1", "bêhêz-2" û "bêhêz-3".



## 2 ŞÎROVEKIRNA MORFOLOJÎ Û MORFOFONÊMIYA CÎNAVKÊN KESÎ:

### 2.1 Morfolojiya Cînavkên Kesî ya K.Jorîn:

Di K.Jorînîn de, me du desteyên cînavkên serbixwe he ne. yek xwerû ye û yek jî tewandî ye.

#### 2.1.1 Cînavkên Serbixwe Desteya Xwerû:

Her weku ji beriya niha me gotiye, ev cînavk li dewsa wan navdêran tên, yên ku di hevokê de nayên tewandin, an jî *"di rewşa xwerû de ne, nehatine diyarî kirin"*<sup>99</sup> Anku di hevokê de qertafên zayendeyê wernagirin. Pêdiviye em bizanin jî, ku tu carî navdêr qertafên zayendeyê wernagirin. Dema lêker negerguhêz be, kirde qertafên zayendeyê wernagire. Ger lêkera gerguhêz jî di dema borî de bû, wê demê jî qertafên zayendeyê wernagire. Ev deste cînavk hertim ji aliyê kes û hejmar ve di gel lêkerê li hev dikin, wate *"lêker tim di bin bandora cînavkên xwerû de ye. dema ku cînavka xwerû kirde be lêker ligor kirdeyê tê kişandin, dema ku bireser be li gorî bireserê."*<sup>100</sup> tê kişandin, ji ber wê hin nivîskar ji wan re dibêjin Cînavkên Desteya Rêkeftin. Ji bo zanîna forma wan jî, li vê xişteya jêrîn binere:

Hej.	Kes		C.	Mînak		
Yek.	Yekem	Axêver	Ez	<u>Ez</u> hatim.	<u>Ez</u> xweşik im.	Wî <u>ez</u> dîtîm.
	Duyem	Guhdarîker	Tu	<u>Tu</u> hatî.	<u>Tu</u> xweşik î.	Min <u>tu</u> dîtî.
	Siyem	Neamade	Ew	<u>Ew</u> hat.	<u>Ew</u> xweşik e.	Min <u>ew</u> dît.
Pir.	Yekem	Axêver	Em	<u>Em</u> hatin.	<u>Em</u> xweşik in.	Wî <u>em</u> dît in.
	Duyem	Guhdarîker	Hûn	<u>Hûn</u> hatin.	<u>Hûn</u> xweşik in.	Min <u>hûn</u> dît in.
	Siyem	Neamade	Ew	<u>Ew</u> hatin.	<u>Ew</u> xweşik in.	Min <u>ew</u> dît in.

Xişteya (2- 3)

Divê em bizanin, ku bi sedema diyardeyên dengsazî yê, hin caran hinek ji Cînavkên Kesî Yên Xwerû, rastî guertinê tên.<sup>101</sup>

Mînak: Tu çû yî → Ti çû yî

<sup>99</sup> Baran Bahoz, "Rêzimana Kurmancî", R. 88.

<sup>100</sup> Tan Samî, "Rêzimana Kurmancî", R. 125.

<sup>101</sup> Miwefeq Zubêr Yasîn, "Cihnav di Navbera Zimanê Kurdî û Erebi de", R. 52.

Ev cînavk ji bo her du zayendên nêr û mê yên yekjimar û pirjimar tê bikaranin.<sup>102</sup> Mînak:

A ku dipeyive mêza ye(ez): Ez keça kurdan im.

Ê ku dipeyive nêrza ye(ez): Ez xortê kurdan im.

Nabe em ji bîr bikin, ku hin caran "di ravekê de bi formeke awarte raveber cih digirin."<sup>103</sup> Anku ev cînavk guhrêbar in, di rewşên awarte de, dikarin qertafên zayendeya nêrza û mêza jî werbigirin:

- Qertafê Mêza: (a): Eza birîndar , Tuya bêkes , Ewê pêşketî
- Qertafa Nêrza: (ê): Ezê birîndar , Tuyê bêkes , Ewê pêşketî
- Qertafa Nêter: (ên): Emên dilşkestî , Hûnên bêkes , Ewên pêşketî

Di desteya cînavkê xwerû de, tu têkilî di navbera kesên pirjimar û yekjimar de tune ye. Bi tenê teşeya kesê siyem a yekjimar û pirjimar weke hev e. Di herduyan de "ew" e. Ji bo ji hev cudakirina teşeya wan, em qezenc ji cînavkên kesî yên pêve werbigirin. Ger ku "ew" ji bo kesê siyem a yekjimar bû, lêker cînavkên kesî yên pêve "e/ye, Ø" werdigire. Ger ku forma "ew" ji bo kesê siyem a pirjimar bû, wê demê lêker cînavkên kesî yên pêve "in/n/ne" werdigire. Mînak:

Hej.	C. Kesê Siyem	Mînak
Yek.	Ø	Ew hat.
	e	Ew xweşk e.
	ye	Ew gundî ye.
Pir.	in	Ew hat in.
	n	Ew çû n.
	ne	Ew gundî ne.

Xiştaya(2- 4)

### 2.1.2 Cînavkên Serbixwe Desteya Tewandî:

Ev cînavk li dewsa wan navdêran tîn, yên ku di hevokê de tîn tewandin. Bi wateyeke din, li dewsia wan navdêran tîn, yên ku di hevokê de qertafên zayendeyê

<sup>102</sup> Ocak Nezir, "Waneyên Rêzimana Kurmancî", R. 114.

<sup>103</sup> Karabax, bê sal, R. 62.

werdigirin. Têker in, ger ku lêker gerguhêz be û di dema borî de be, hingê kirde tê tewandin. Di dema "niha" û "bê" ya lêkera gerguhêz jî de, bireser tê tewandin. Ev cînavk ji ber ku dibin raveker û xwedîtîyê nîşan diden, hin nivîskar ji wan re dibêjinn Cînavkên Kesî Yên Xawenetî(Xwedîtî). Formê wan jî hatiye diyarkirin.

Hej.	Kes		C.	Mînak
Yek.	Yekem	Axêver	Min	Azad hevalê <u>min</u> e.
	Duyem	Guhdarîker	Te	Ez <u>te</u> dibîn im
	Siyem	Neamade	Wî wê	Ez <u>wî</u> dibîn im. (wî: nêrza ye.) Ez <u>wê</u> dibîn im. (Wê: mêza ye.)
Pir.	Yekem	Axêver	Me	<u>Me</u> ji xwe re du pirtûkên kurdî kirîn.
	Duyem	Guhdarîker	We	Ez ji <u>we</u> re dibêj im.
	Siyem	Neamade	Wan	Ez ji <u>wan</u> re dibêjim hûn ê baş bixebtin.

#### Xiştaya (2- 5)

Ev cînavk bi tu awayî qertafên zayendeyê wernagirin. Li dewsa navdêrên nêrza û mêza tên bikaranîn. Bi tenê di kesê siyem a yekjimar de cudatîyê di navbera navên nêrza û mêza de dike; Kesê diaxive nêrza, an mêza be, cudahî tune, bi tenê dibêje "min" û ji bo kesên din jî wisa ye. Bi tenê kesê siyemê yekjimar, ger ku ev kesê neamade nêrza be, divê li dewsa wî teşeya "wî" bê bi karanîn. Ger ku kesa neamade mêza be, divê li dewsa wê teşeya "wê" bê bi karanîn. Mînak:

Min Azad dît, ji wî re pirtûkek kirî.

Min Rûken dît, ji wê re pirtûkek kirî.

taybetmendiyeke dina vê destê cînavkê heye ku merce di hevokê de bîn bilêvkin, mînak di hevoka "'ez Xwarim'? de ne kifîş e. ji ber wê divê kirde di hevokê de bê nivîsandin."<sup>104</sup> gelo kê xwarim?:

Te ez xwarim. , Wî ez xwarim. , Wan ez xwarim.....

ji ber wê mecburiye di hevokê de hebin.

<sup>104</sup> Aktuğ Halil, "Gramera Kurdî – Krütçe Gramer", R. 264.

Di vê deste cînavkê jî de wisa xuya dibe, ku tu têkilî di navbera yekjimar û pirjimar de tune ye. Bi tenê di kesê siyem a pirjimar de, pirjimariya kesê siyem a yekjimar e, ew jî dema ku qertafa "an" a pirjimar diçe ser teşeya kesê siyem a yekjimar "wî/ wê". Ji ber ku du tîpên dengdêr li du hev nayên, her yek ji tîpên "î" ya "wî" û tîpa "ê" ya "wê" ji nav çûne û teşeya "wan" wergirtî ye.

$$\left. \begin{array}{l} \text{Wî} \\ \\ \text{Wê} \end{array} \right\} + \text{an} \rightarrow \text{w} \otimes \text{an} \rightarrow \text{wan}$$

Pêdiviya em bizanin jî, "kesê siyem a yekjimar, di koka xwe de, ji "ew" di gel "ê"ya nîşaneyê zayendeya mê û "î"ya zayendeya nêr pêkhatî ye."<sup>105</sup>

### 2.1.3 Cînavkên Pêve:

Ev cînavk di warê lêkolîn û şîrovekirinê de, di nava rêzimanivîsên berê de, cihê nîqaş û fikrên cuda ne. Her weke me di beşa borî ev yek zelal kir, ku negengaze em bêjin ev ne cînavk in, ji ber ku li dewsa kesan tîpên û hertim bi lêker, an jî bi nivlêkerê ve tîpên nivîsîn. Ji bo zelalbûna lêkolînê, em dê van cînavkan bi ser çar destê(gurop)yên din de parve bikin. Ku her yek ji wan bi cureyekî lêkeran re tîpên her yek ji wan çar destê cînavkan hêj zêdetir teşeyên wan hene ku ev cudahî ji bo sedema fonolojiya zimanê kurdî ye; du tîpên dengdêr li ba hev nayên. Me ev çar destê li ser bingeha cureyên lêkeran cuda kirine. Bi vî awa yê:

- Pêve Desteya -1

Ev desteya bi lêkerên dema borî ya gerguhêz û negerguhêz re tîpên:

Hej.	Kes		C.	Mînak	
Yek.	Yekem	Axêver	im/m	Ger.	Xwarim , Nasim
				Neger	Hatim , Hatibum
	Duyem	Guhdarîker	yî/î	Ger	Xwarî , Nasîyî
				Neger	Hatî , Hatibûyî

<sup>105</sup> Awerehmanî Hacî Marîf, "Rêzmanî Kurdî, Beşî duyem Cênaw, R. 102.

	Sêyem	Naamade	Ø	Ger	Xwar , Nasî
				Neger	Hat , Hatibû
Pir	Yekem	Axêver	in/n	Ger	xwarin , Nasîn
				Neger	hatin , Hatibû
	Duyem	Guhdarîker	in/n	Ger	Xwarin , Nasîn
				Neger	hatin , Hatibûn
	Siyem	Naamade	in/n	Ger	Xwarin , nasîn
				Neger	hatin , Hatibûn

Xişteya (2 - 6)

- Desteya Bêhêz -2

Ev destya cînavan, bi lêkerên gerguhêz û negerguhêz re, di dema niha û bê de tê bikaranîn:

Hej.	Kes		C.	Mînak		
					D.Niha	D.Bê:(dê)+Rayek
Yek.	Yekem	Axêver	im/ m	Ger.	Dibînim , Dibim	Bibînim , Bibim
				Neger	Diçim , Dizê	Biçim , Bizê
	Duyem	Guhdarîker	yî/î	Ger	Dibînî , Dibî	Bibînî , Bibî
				Neger	Diçî , Dizêyî	Biçî , Bibî
	Siyem	Naama de	e/ Ø	Ger	Dibîne , Dibê	Bibîne , Bizê
				Neger	Dibîne , Dibê	Biçe , Bizê
Pir	Yekem	Axêver	in/ n	Ger	Dibînin , Dibin	Bibînin , Bibin
				Neger	Diçin , Dizên	Biçin , Bizên
	Duyem	Guhdarîker	in/ n	Ger	Dibînin , Dibin	Bibînin , Bibin
				Neger	Diçin , Dizên	Biçin , Bizên
	Siyem	Naama de	in/ n	Ger	Dibînin , Dibin	Bibînin , Bibin
				Neger	Diçin , Dizên	Biçin , Bizên

Xişteya (2 - 7)

Dema em lê dinerin, cudahî di navbera desteya "1" û "2" de, bi tenê di kesê siyem a yekjimar de derdikeve. Di "desteya -1" de, ji bo kesê siyem a yekjimar morfîma sifirê(Ø) he ye, di "desteya -2" de morfîma "e" û "Ø" he ye. Ku di kesê

siyem a yekjimarê desteya-2 morfa "e" ye, wê demê ku rayeka lêkerê bi tîpeke dengdêr bi dawî hatibe, dibe "Ø", an wekî din herdu yek deste cînavk in.

- Desteya -3

Ev deste cînavk, hertim di hevokên nîvlêkerya dema niha ya bûna bingehî de tên. Anku di dema fireh de tên, û bi awayê serbixwe tên nivîsin:

Hej.	Kes		C.	Mînak
Yek.	Yekem	Axêver	im/me	Xwendekar <u>im</u> . , Mamoste <u>me</u>
	Duyem	Guhdarîker	î/yî	Xwendekar <u>î</u> . , Mamoste <u>yî</u> .
	Siyem	Neamade	e/ye	Xwendekar <u>e</u> , Mamoste <u>ye</u> .
Pir.	Yekem	Axêver	in/ne	Xwendekar <u>in</u> . , Mamoste <u>ne</u> .
	Duyem	Guhdarîker	in/ne	Xwendekar <u>in</u> . , Mamoste <u>ne</u> .
	Siyem	Neamade	in/ne	Xwendekar <u>in</u> . , Mamoste <u>ne</u> .

Xiştaya (2 - 8)

Di desteya –"1" û "2" de teşeya "m, î,...,n,n,n" he ne lê di desteya -3 de tune ne. Herwisa di desteya -3 de forma "me, ye,...,ne,ne,ne" hene û di desteya –"1"û "2" de tune ne. Divê em ji bîr nekin, di dema niha/fireh de, anku ger pêveber nîvlêker a bûna bingehî bû, wê demê Cînavkên Kesî Yên Pêve bi awayekî serbixwe tên nivîsîn. Ev bi tenê di wê demê de dibe, ku nivîs bi tîpên latînî be:

Ez xwendekar im. Tu xwendekar î. Ew xwendekar e.

Lê ger ku nivîs bi tîpên aramî bû, wê demê bi hav re tên nivîsin. Mînak:

ئەز خوێندەکارەم. تۆ خوێندەکارێ. ئەو خوێندەکارە.

Tiştêke din jî heye, pêwîste em bizanin, ku teşeya cînavkên kesê yekem, duyem û siyema pirjimar, mîna heve, ji bo cudakirina wan jî bi rêka Cînavkên Kesê Serbixwe dibe. Mînak:

Em xwendekar in.

Hûn xwendekar in.

Ew xwendekar in.

- Desteya -4

Ev deste cînavk hertim bi lêkerên fermanî re tên, lêker gerguhêz, an negerguhêz be cudahî tune ye. Ji ber ku ferman bi tenê bi kesê duyem tê kirin ji ber vê yekê tenê ji bo kesê duyem a yekjimar û pirjimar e.

Hej.	Kes		Cînavk	Mînak	
Yek	Duyem	Guhdarîker	e/Ø	Ger.	Bixwene , Bikire , Bişo
				Neger	Bizivire , Bimeşe , Bistrê
Pir.			in/n	Ger	Bixwênin , Bikirin , Bişon
				Neger	Bizivirin , Bimeşin , Bistrên

Xiştaya (2 - 9)

Piraniya van teşeyan nêzî hev in. Di rastî de, hemû alomorfên hevdu ne. Bi sedema dem û coreyên lêkeran, teşeyên cuda çêbûne. Tîpên dengdêr û dengdar formên cuda saz bûne. Herwisa ji ber tîpa dawîya rayeka lêkerê jî, di her yek ji wan desteyan de, teşeyên cuda afirîne, ku ev mijara morfofonêmî ye.

Der encama şîrovekirna hemû coreyên cînavkên kesî yên pêve ya K. Jorîn de, me zanî ku hatina wan bi lêkerên gerguhêz û negerguhêz ve, herwisa bi demên borî, niha û bê re tên. Agahiyên zêdetir, di xiştaya jêrîn de tên xuyakirin.

	D.Borî	D.Niha û Bê	Fireh	Fermanî
Ger	.....	C. Desteya -2	.....	C. Desteya-4
Neger	C. Desteya-1	C. Desteya -2	C. Desteya -3	C. Desteya-4

Xiştaya (2 - 10)



## 2.2 Morfolojiya Cînavkên Kesî Ya K.Jêrîn:

### 2.2.1 Cînavkên Serbixwe:

Tiştta ku li vir divê were gotin: Ev cînavk weke her peyveke din, di hevokê de cuda tên nivîsîn û teşeyeke wan a taybet he ye. Bi awayekin ku kêmtir tên guhertin. Di K. Jêrîn jî de, bi tenê yek koma cînavkên kesî yên serbixwe he ye.

Hej.	Kes		C.	Mînak
Yek.	Yekem	Axêver	Min	<u>Min</u> nanim xward.
	Duyem	Guhdarîker	To	Ew kitêbe hî <u>to</u> ye.
	Siyem	Neamade	Ew	<u>Ew</u> pencerekey şikand.
Pir.	Yekem	Axêver	Ême	Zimanî <u>ême</u> kurdîye.
	Duyem	Guhdarîker	Êwe	<u>Ewan</u> kitêbekeyan bo êwe kirî.
	Siyem	Neamade	Ewan	<u>Ewan</u> kitêbekeyan bo ême kirî

Xiştaya (2 - 11)

Ev cînavkên li jor, ji bo navdêrên nêrza û mêza tên bi kar anîn. Anku nêterin û her wisa jî ji bo kesê yekem, duyem, siyem u pirjimar û yekjimar tên bi kar anîn. Di gel hemû coreyên lêkeran, gerguhêz û negerguhêz, herwisa di gel hemû demên lêkeran "bor û neborî"\* tên kişandin. Tu têkelî di navbera yekjimarî û pirjimariya kesê yekem û duyem de nîn e. Anku têkelî di navbera "min" û "ême" de tune ye. Herwisa jî di navbera "to" û "êwe" jî de tune ye. Bi tenê têkeliyek di navbera "ew" a kesê siyem a yekjimar û "ewan" a kesê siyem a pirjimar de he ye. Li vir jî "ew" a yekjimar morfîma pirjimarî "an" wergirtiye û bûye "ewan" ji bo kesê siyem a pirjimar.

(kesê siyem a yekjimar + qertafa pirjimar(an)) → kesê siyem a pirjimar

ew + an → ewan

\*Di K. Jêrîn de tenê dema borî û neborî heye. Dema niha û bê de cudahî tune ye. Tenê bi rêka hokeran dema niha û bê tê cudakirin, mînak:

min êsata dêm (Dema niha)

min beyanî dêm (Dema Bê)

Heger em lêbinêrin bi rêka hokeran dema niha û bê tê cudakirin wek tê zanîn jî hoker keresekekên zêde ne. Wateya bûyîn û tunebûna wan di hevokê de ne girînge, em ji ber wê bi dema niha û bê dibêin "neborî", em K. Jêrîn dema "Nebor" re dibêin "Ranebirdû", bi dema borî jî "Rabirdû" dibêjin.

### 2.2.2 Cînavkên Pêve Desteya Bihêz:

Ji ber zelaliya rola wan di hevok, axavtin û nivîsinê de, ev deste ye di warê lêkolînên zimanê kurdî de, kêmtir cihê nîqaşê ye. Teşeya wan diyerîkirî ye. Ev cînavk bi lêkerên dema boriya gerguhêz ve tîn nivîsîn.

Hej.	Kes		C.	Mînak
Yek.	Yekem	Axêver	im/m	Birdim , Kêlam, Helimgirt
	Duyem	Guhdarîker	it/t	Birdit , Kêlat, Helitgirt
	Siyem	Neamade	y/î	Birdî , Kêlay, Helîgirt
Pir.	Yekem	Axêver	man	Birdman, Kêlaman, Helmangirt
	Duyem	Guhdarîker	tan	Birdtan, Kêlatan, Heltangirt
	Siyem	Neamade	yan	Birdyan, Kêlayan, Helyangirt

Xiştaya (2 - 12)

Kesê duyem a yekjimar(t), dibe hin caran teşeya xwe biguhere û bi awayê "w" derbikeve. Divê ji bîr nekin "*bi tenê di axftinê de ye. Herwisa di gelek herêman de nayê bilêvkirin lê bi piranî tî nivîsin*"<sup>106</sup>. Anku em dikarin bêjin, di hin devok û axaftinên rojane de forma "it/t" a kesê duyem dibe "w", di nivîsînê de ev guhertin kêmtir tî kirin.

Detnêrêt → Dewnêrêt

Pêdiviye em bizanin, tîkeliyeke bi hêz di navbera yekjimarî û pirjimariya van cînavkan de he ye. Ji ber ku pirjimariya van cînavkên kesê yekem, duyem û siyem, pirhirjmarî kesê yekem, duyem, siyem a yekjimar e<sup>107</sup>. Mînak, kesê yekem a yekjimar morfîma pirjimarî "an" wergirtî ye, bûye kesê yekem a pirjimar (man) kesê duyem û siyem jî herwisa Anku kesên yekjimar hatine pirhirjmarkrin:

im/m + an = man

ti/t + an = tan

<sup>106</sup> Şêrko Baban, "*Şirove karî rêzmanî le Zimanî Nûsînda*", Çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 2000 R. 13.

<sup>107</sup> A- Ewrehmanî Hacî Marif, "Rêzmanî Kuridî, Beşî duyem Cênaw, RR. 114-115.

B- Xoşnaw Ezîz Emîn, "*Rêzmanî Cênawî Likaw di Zimanî kurdî de (Kirmancî Nawerast)*", RR. 74.

iy/î + an = yen

Ev cînavk di nivîsînan de, bi vê tê zanîn cînavk cihê xwe diguherin, hertim bi kereseşên nav hevokê ve tîn nivîsîn, cihê wan ne destnîşankirî ye. Ji ber ku hertim li gor hebûn û nebûna kereseşên nav hevokê cihê wan tê guhertin. Anku di hevokê de hertim awayekî azadiyê he ye, li gor zêdekirin û kêmkirna kereseşên nav hevokê û bi kêfa axêver û xwezaya hevokê cihê wan tê guhertin. Ji bo fêmkirna zêdetir, li van xalên li jêr binêre:

- 1- Rayeka dema borî
- 2- Qertaf
  - A- Qertafa dema boriya berdest(de)
  - B- Qertafa neyniya dema borî (ne)
  - C- Qertafên pêşgira bêjesaz(hell, ra,...)
- 3- Daçek(be, ji bo, le)
- 4- Têker
- 5- Bireser..... zagona"1".\*

Heker em lêkera "girtin" wekî mînak werbigrin û şîrove bikin, bi awayekî baştir dê zelal bibe:

- 1- Rayeka Dema Borî: Ger hevok tenê rayeka dema borî bû, wê demê Cînavkên Desteya Bihêz dê pê re werin nivîsandin, Mînak:

Girtim.

- 2- Qertaf:

A- Qertafa Dema Bori Ya Berdest: Dema ku hevok bi tenê ji lêker pêk hatibe û lêker jî li gor dema boriya berdest hatibe kişandin, wê demê cînavkên desteya bihêz bi qertafa dema boriya berdest ve tîn nivîsîn. Mînak:

Demgirt.

---

\*ji bo rîz kirna wan xalan em mefa dîtiye:

A- Wirya Umer Emîn, "*Layenêkî Ciyawazî*", Govarî Korî Zaniyarî – destey Kurd- Çapxaneyî Korî Zaniyarî, jimare"10", Bexda, RR. 262- 263,  
B- Şêrko Baban, "*Ristesazî û Şîtelkarî Zanstî*", Çapxaney Minare, Hewlêr, 2015, R. 62.

B- Qertafa Neyînî Ya Dema Borî: Dema ku hevok bi tenê ji lêker pêk hatibe û lêker jî bi awayê neyînî hatibe kişandin, wê demê cînavkên desteya bihêz bi qertafa dema borî ve tên nivîsîn. Mînak:

Nemdegirt.

C- Qertafên Pêşgir Ya Bêjesaz(hell, ra,...): Dema ku hevok ji lêkerê nexwerû û pêşgireke bêjesaz pêk hatibe, wê demê cînavkên desteya bihêz bi pêşgirî ve tên nivîsîn. Mînak: **Hellim** girt. , **Hellim** degirt. , **Hellim** nedegirt.

3- Daçek(be, bo, le): Dema ku hevok ji daçek û lêkerê pêk hatibe, wê demê Cînavkên Desteya Bihêz bi daçekan ve tên nivîsîn. Mînak:

**Bom** degirt. , **Bom** hellgire. , **Bom** hell degirt. , **Bom** helli nedegirt.

4- Têrker: Dema di hevokê de têrker he be, wê demê cînavkên desteya bihêz bi têrkerê ve tên nivîsîn. Mînak:

Bo **Azadim** girt.

Bo **Azadim** hellgirt.

Bo **Azadim** hell degirt.

Bo **Azadim** hell negirt.

5- Bireser: Dema di hevokê de bireser he be, wê demê cînavkên desteya bihêz bi bireserê ve tên nivîsîn. Mînak:

Namekem bo **Azad**girt.

Namekem bo **Azad** hellgirt.

Namekem bo **Azad** hell degirt.

Namekem bo **Azad** hell negirt.

### 2.2.3 Cînavkên Pêve Desteya Bêhêz:

Herwekî ji beriya niha jî me gotî, ev desteye dibe sê desteyên din û hemû jî ji hevdu nêz in. Bi tenê ji bo ku lêkolîn bi hêsanî were fêmkirin, me bi vî awayî nivîsî ye, li gor cureyên lêkeran dibin sê deste:

- Desteya "Bêhêz -1"

Cînavkên Desteya "Bêhêz – 1" di K.Jêrîn de, bi lêkerên negerguhêz ên dema borî re tên:

Hej.	kes		C,	Mînak
	Yekem	Axêver	im/m	<b>Hatim</b> , <b>Çûm</b> , <b>Helçûm</b>
Yek.	Duyem	Guhdarîker	yt/ît	<b>Hatî/Hatît</b> , <b>Çûy/Çûyt</b> , <b>Helçûy/Helçûyt</b>

	Siyem	Neamade	Ø	Hat , Çû , Helçû
Pir.	Yekem	Axêver	yn/în	Hatîn , Çûyn , Helçûyn
	Duyem	Guhdarîker	in/n	Hatîn , Çûn , Helçûn
	Siyem	Neamade	in/n	Hatîn , Çûn , Helçûn

Xiştaya (2 – 13)

1. Desteya "Bêhêz -2"

Cînavkên Desteya "Bêhêz – 2" di K.Jêrîn de, bi lêkerên gerguhêz û negerguhêz ên dema neborî re tên:


Hej.	Kes		C.	Mînak	
Yek	Ye kem	Axêver	im/ m	Ger.	Dekem , Dexom , Werdegirim
				Neger	Derom , Deçim , Radekem
	Du yem	Guhdarîker	ît/ yt	Ger	Dekey/Dekeyt , Werdegirî/Werdegirît
				Neger	Deroy/Deroyt , Radekey/Radekeyt
	Sêyem	Naamade	at/ êt	Ger	Deka/Dekat , Werdegrê/Werdegrêt
				Neger	Derwa/Derwat , Radeka/Radekat
Pir.	Yekem	Axêver	in/ n	Ger	Dekeyn , Dexoyn , Werdegirîn
				Neger	Deroyin , Deçîn , Radekeyn
	Duyem	Guhdarîker	in/ n	Ger	Deken , Dexon , Werdegirin
				Neger	Deron , Deçin , Radeken
	Siyem	Naamade	in/ n	Ger	Deken , Dexon , Werdegirin
				Neger	Deron , Deçin , Radeken

Xiştaya (2 – 14)

Her weku xuya dibe, cudahî di navbera desteya cînavkên K.Jêrîn a desteya bêhêz a "1" û "2" tenê di kesê siyem a yekjimar de ye. Ji ber ku kesê siyem a yekjimar di desteya bêhêz-1 de, cînavka morfîma sifire(Ø), ev dete cînavk di gel lêkera dema boriya gerguhêz tê. Di desteya bêhêz- 2 de, cînavk dibe "at/a , êt/ê" li gel lêkera dema neborî ya gerguhêz û negerguhêz tê.

- ❖ Gereke ev yek zelal bibe, ka kesê siyem a yekjimar "at/a , êt/ê" çawa tên bi karanîn?

Ger rayeka dema neborî bi tîpên dengdêra "e, o" bi dawî were, wê demê forma "at" tê bi kar anîn. Pêdiviyê em bizanin jî, du guhertin tên kirin yek: Ger bi "e" dawî be, tîpa "e" jî nav diçe, ger bi "o" jî dawî be, tîpa "o" jî dibe "w".<sup>108</sup> Ji bo agahiyên zêdetir binere:



Ev yek jî li gorî xwezaya fonolociya zimanê kurdî pêk tê. Lewra di zimanê kurdî de, du tîpên dengdêr li duhev nayên. Ji bo fêmkirin û zelalkirna zêdetir, li ven mînakên li jêr binere:

Rader	R.D.Neb.	Lêkera kesê siyem a yek.
Xwardin	Xo	Dexwat/Dexwa
Royştin	Ro	Derwat/Derwa
Rakirdin	Rake	Radekat/Radeka
Gehîştin	Ge	Degat/Dega

Xiştaya (2 - 15)

Ji bilî wan raderan ku rayeka dema neborî bi tîpa "e" û "o" dawî tê bi her tîpêka din dawî be, dema li gor kesê diyema yekjimar bên kişandin jibo forma Cînavka Kesê Siyem "êt" tê bikaranin. Herwisa divê were zanîn, Ger rayeka dema neborî bi tîpa "û" bi dawî hat, wê demê kesê siyem dibe "w", lewra di K.Jêrînîn de, du tîpên dengdêr nikarin li duhev werin.

(R.D.Neb ) → u + êt/ê → R.D.Neb → w + êt/ê

(nûstin): nû: Denwêt

<sup>108</sup> Xoşnaw Ezîz Heemîn, "Rêzmanî Cênawî Likaw (Kîrmancî Nawerast)", R. 76.

Weku din tu guhertin bi ser rayeka dema neborî de neyên. Ji bo agahiyên zêdetir, li van mînakên jêrîn binere:

Rader	R.D.Neb.	Lêkera kesê siyem a yek.
Çûn	Ç	Deçê/Deçêt
miridin	mir	Demirê/Demrêt
Gehîştin	ge	Dega/Degat

Xiştaya (2 - 16)

❖ Tîpa "t" di "yit/ît" û "at/êt" de:

Nabe em ji bîr bikin, ku "t"ya kesê duyem a yekjimar, di destê cînavkên bêhêz - 1 û 2"de û "t" a kesê siyem a yekjimar de bêhêz- 2 de, karkêfî ye. mînak:

To yarî dekeyt: dekey.

Ew deçêt: deçê.

Piraniya caran jî dikarin jê bibin û tu guhertin jî di wateyê çênabin. lêbelê hin caran mecburiye:

- "T" a kesê duyem a yekjimar (di "yt/ît" de) de:

Tîpa "t" a dawiya kesê duyem a yekjimara di destê cînavkên bihêz-1,2 de karkêfî ye û piranî caran em dikarin wê bilêv nekin, ji ber ku ev "t"ê di zimanê kurdî tu zerarê nade em bêjin beşeke li cînavkan an tîpêke zêdeye ji bo xweş gotinê hatiye.<sup>109</sup>Lê divê em bizanin ku gelek caran em mecbûrin wê tîpê bilêv bikin:

- 1- Ger ku morfîma dubare bûn "ewe / we"<sup>110</sup>, bi dawiya lêkerê ve hebû, wê demê em mecbûr dibin bilêv bikin<sup>111</sup>. mînak:

<sup>109</sup> Mes'ud Mihemed, "Hindê Babetî Ziman û Rênusî Kurdî", R.110.

<sup>110</sup> ji bo zaniyarî derheqa Morfîma "ewe/ we" ya Dubare bûn, binêre:

A- Cemal Nebez, "Zimanî Yekgirtûy Kurdî", RR. 29- 30.

B- Rojan Nurî Ebdulle, "Ferhengî Ziman û Zarawesazî Kurdî", RR. 91- 95.

<sup>111</sup> Şêrko Baban, "Zimanî Nusînê Rêzmandar", Dazgay Çap û Billawkirdineweyî Aras, Çapî Yekem, Çapxaney Dezgay Aras, 2008, R. 55.





"t" a pišta "ê" û "a" ya kesê yekjimara siyemîn a cînavkên bêhêz-2 mîna "t" a pišta "y/î" kesê yekjimar a duyemîn a cînavkên bêhêz-1 û 2ye<sup>116</sup>. dive em bizan in ev "t" ye her çiqas bi karkêfî be mîna a kesê duyemîn ev jî tê zîndîkirin, tê bilêvkirin merca bê nivîsin û bê vexwendinê gava tîpeke dengdêr li dawîya wê be.<sup>117</sup>

1- Ger morfîma dubare kirin li dawî hat<sup>118</sup> bi tu awayî nikarin ev "t" yê jê bibin, Ew dekew(ê) + ewe. : dekewête.

2- Mîna kesê duyem jî di kesê siyem jî de ger daçeka "e" li cihê daçeka "bo" bê em mecbûrin wê "t" yê bilêv bikin.<sup>119</sup>

Azad deçê bo bazar. : Azad deçê bo bazar.

Azad deçê(t)(e) bazar. : azad deçête bazar.

3- Her wisa gava daçekê "be" diguhere û dibe "pê" piştra dibe "ê" wê demê "t" lazim dibe.<sup>120</sup>

Ew dega be ew. : Ew dega pêyî. : Ew dega(t)(ê). : ew degatê.

her wisa ger di wêjeya kilasîk jî binêrin hin caran helbestvan ev "t" ya bikar aniye û hin caran jî bi karkêfî jê biriye. Mînak:

Rêy hurmt û bê hurmetî hergîz nekutabê

Çend aw rijabê û, çî awî nerjabê (Dîwanî Nalî, R.631)

Rabêll û tar , pop kuloy befire , abşar

ba bay dedat û masî pêdadê wek mekok (Dîwanî Nalî, R. 2)

## 2. Desteya "Bêhêz – 3"

Ev deste ye li gel lêkera fermanîê ya gerguhêz û negerguhêz tê bi kar anîn. Her weku xuya ye, lêkera fermanîê bi tenê ji bo kesê duyem a yekjimar û pirjimar tê bi

<sup>116</sup> Heman Jêder, RR 131, 137..

<sup>117</sup> Şêrko Baban, "Piley Polî Cênawekan", R. 103.

<sup>118</sup> Şêrko Baban, Hendê le Akare Rengînekanî Rêzmanî Kurdî, Çapî Yekem, Dezgay Tuyêjînewey Mukiryay, Çapxaney Xanî, 2008, R. 11.

<sup>119</sup> Xoşnaw Ezîz Heemîn, "Rêzmanî Cênawî Lîkaw di Zimanî kurdî de(Kirmancî Nawerast)", R. 87.

<sup>120</sup> Şêrko Baban, "Piley Polî Cênawekan", R. 103.

kar anîn. Ji ber ku bi tu awayî kes nikare ferman bi kesê yekem, an kesê siyem bike. Mînak:

Hej.	Kes		Cînavk		
Yek	Duyem	Guhdarîker	e/Ø	Ger.	Bigire , Bişo , Giwêbigire
				Neger	Biçêne , Serbikewe
Pir.			in/n	Ger	Bigirin , Bişon , Giwêbigirin
				Neger	Biçênin , Serbikewin

Xiştaya (2 - 17)

Cînavkên Bêhêz-3, di hevokê de bi tenê dikarin bibin kirde. Divê were zanîn, cînavkê kesê duyem a yekjimar hinek caran xuya nake, ew jî dema ku rayeka dema neborî bi tîpeka dengdêr bi dawî hatibe, ji ber ku Cînavka Kesê Duyem a Yekjimar jî "e" ye û dengdêr e. Mînak:

Radar	R.D.Neb.	Tîpa Dawî Ya R.D.Neb.	Raw. Fer. a Kesê Duyem ê Yek.
Geran	Gerê	ê	Bigerê
Xwardin	Xo	o	Bixo
Kirdin	Ke	e	Bike
Dirûn	Dirû	û	Bidirû
Giriyan	Girî	î	Bigirî

Xiştaya (2 - 18)

Divê haya me hebe, ku Cînavkên Desteya "Bêhêz – 1, 2 û 3" bi gelemperî bi dawiya lêker ve tîpên nivîsîn<sup>121</sup>. Der encama şîrovekirna hemû coreyên Cînavkên Kesî Yê Pêve de di K. Jêrîn de, me zanî ku hatina wan bi lêkerên gerguhêz û negerguhêz ve, herwisa bi demên borî û neborî re tîpên. Agahiyên zêdetir, di xiştaya jêrîn de tîpên xuyakirin.

	D. Borî	D.Neborî	Fermanî
Ger	Bihêz	Bêhêz – 2	Bêhêz – 3

<sup>121</sup> Wirya Umer Emîn, "Layenêkî Ciyawazî", R. 268.

Neger	Bêhêz – 1	Bêhêz – 2	Bêhêz – 3
-------	-----------	-----------	-----------

Xiştaya (2 - 19)

## 2.3 Şîrovkirina Morfofonêmiya Cînavkên Kesî:

### 2.3.1 Morfofonêmî:

Di serî de, pêdiviyê em bizanin morfofonêmî çî ye? Morfofonêmî: *Ew dengin ku di asta dengsaziyê de fonîm in, dikarin di asta peyvsazî(morfolojî)yê jî de bibin morfîm û di asta hevoksazyê jî de rola xwe ya morfîmiyê diparêzin û li gorî cihê xwe di hevokê de erkên xwe dibînin.*"<sup>122</sup> Divê em vê yekê jî bizanin, ku yek ji erkên morfolojiyê "*diyarîkirna morfên her morfîmêk ye. Anku girê- dana morfolojiyê bi fonolojîyê ve.*"<sup>123</sup> Mijara me jî şîroveya morf û morfofonêma cînavkên kesî ye, bi taybet cînavkên kesî yên pêve, ji ber ku "*cînavkên kesî yên pêve bi sedema ku ketine jêr bandora wê jiyngêhê ku cînavkên pêve di nav de derdikevin, di gel sedema fonolojî bandorê dike ser wan, bi teşeyên cuda xuya bibin.*"<sup>124</sup> Mexseda me ji peyva jîngêh li vir, zagonên fonolojîya zimanê kurdî ye. Ku ev jî Zagona Jêbirinê ye, di zimanê kurdî de. Li gorî vê zagonê, negengaze du tîpên dengdêr li kêleka hevdu bîn\* ger hatin jî, rastî zagona jêbirinê, an peydabûnê tên. Her yek ji teşeyên cuda jî morfeke morfîmên xwe ye. Ji morfên cuda re ya yek morfîm(cînavk) "alomorf", jî tê gotin, ji ber ku koka morfîmê bi xwe jî "*biçûktirina tîpa wtedara zimanê ye*"<sup>125</sup> Anku nikare were biçûktirkirin, ji ber ku ger bê biçûktirkirin, wateya wê namîne. Pir morfîm he ne, ku bi gelek teşe û şeweyan xuya dikin. Her coreyekê jî teşe(morf)eke morfîmên xwe ye. Hemû morfên morfîmek jî alomorfên hevdu ne. Gelek caran morfîmekê bi tenê yek morfa xwe he ye, anku ji yek cîgirê wê zêdetir tune ye, an destûra wê ji bo yek morfê zêdetir tune ye.<sup>126</sup> *Bi wateyeke din, merce "her morfîmek*

<sup>122</sup> Ebdulla Husên Resûl, "*Çend Basêkî Wirdî Zimanewanî – Kurdî*", R. 275.

<sup>123</sup> Wiriya Umer Emîn, "*Rêzmanî Ranaw- Hindê Şikirdineweyî Morfolojî*", R. 193.

<sup>124</sup> Xoşnaw Ezîz Hemeemîn, "*Rêzmanî Cênawî Likaw le Zimanî Kurdîde (Kirmancî Nawerast)*", R. 90

\* Ev tişt bi piranî di nivîsîna aramî de zelal dibe. Ji ber ku qet çênabe di nivîsîna aramî de du tîpên dengdêr li kêleka hev werin. Dinwîsîna latînî de, gelek caran du tîpên dengdêr li kêleka hev tên. Divê ji bîr nikin, ev peyvên ku tê de du tîpên dengdêr li kêleka hev hatine, di koka xwe de ne wisa ne. Mînak peyva "diavêjim" ger lê binerîn dibînin tîpa "i" û "a" yên dengdêr li ba hev hatne, divê bizanin peyv di koka xwe de wisa ye "dihavêjim", tîpa "h"ê ketiye di nivîsîna aramî jî de tîpa "ه" tê zêdekirin, anku wisa tê nivîsîn "دئاڤڤڤڤڤم".

<sup>125</sup> Sadiq Beha Eldîn Amîdî, "*Rêzmanî kurdî/Kirmancîya Jor û jêrya Hevberkirî*", R. 149.

<sup>126</sup> Wiriya Umer Emîn, "*pîtokekanî zimanewanî*", Dezgayî Çap û Bilawkiridineweyî Aras, Çapî Yekem, Çapxaneyî Aras, R. 64.

alomorfeka wê he be, hinek caran jî morfîmekê du, an sê alomorf, an zêdetir jî he ye."<sup>127</sup> Mînak:

Morfîm → dar , kevir , pirtûk  
           ↓       ↓       ↓

Morf → dar , kevir , pirtûk

❖ Gelek caran jî dibe, ku morfîmekê zêdetir ji yek morfa xwe he be. Her yek jî ji bo xweza, an ciyekî cuda tê bi kar anîn. Mînak:


- Morfîma "kuj" du morfên wê he ne: kuj û kuş: Kuşt , dikuje

Her yek ji "kuşt û kuj" jî alomorfên hevdu ne.

- Morfîma "ges" du morfên wê he ne: ges û gez : Gestim , degezim

Her yek ji "ges û gez" jî alomorfên hevdu ne.

Li gor van mînakan, em dikarin bêjin, ku alomorf teşeyên cuda yên yek morfîmê ne. An jî, gava ku morfîmek bi çend coreyên cuda tê bi lêvkinin, ji wan ra dibêjin alomorfên hevdu û her yek ji wan jî morfek e. Ji bo pitir zalalbûna têkeliya di navbera morfîm, morf û alomorfê de, li vê skeçê binere:\*



<sup>127</sup> Mihemed Me'ruf Fetah û Sebah Reşîd Qadir, "Çend layenêkî Morfoflojî Kurdî", Dezgayî Bilawkirdineweyî Beşî Runakbîrî, çapxaneyî Rûn Silêmanî, 2006, R. 17.

\*Ev skeç ji, Xoşnaw Ezîz Emîn, "Rêzmanî Cênawî Likaw le Zimanî Kurdîde (Kirmancî Nawerast)" R. 90. Hatiye wergirtin.

Herwisa morfên cînavkên kesî yên pêve jî, hinek caran hevdu temam dikin û dibin alomorfên hevdu. Divê ev du mercîn li jêr jî di nav de hebin.<sup>128</sup>

- 1- Herdu alomorf, an jî hemû yek erk bibînin.
- 2- Herdu alomorf, an jî hemû nikaribin li ciyê hevdu werin.

Di zimanê kurdî de, teşeya cînavkên kesî ji ber van sedemên jêrîn bi teşeyên cuda cuda derdikevin:

- 1- Dema lêker borî, an niha û bê be.
- 2- Lêkerên gerguhêz û negerguhêz.
- 3- Tîpa dawiyê ya wê matryala ku "cînavkên pêve" pê ve tên nivîsîn.
- 4- Zayendeya nêrza û mêza dibe sedema çêbûna teşeyên cuda.

### **2.3.2 Morfomonêmiya Cînavkên Kesî Yên K.Jorîn:**

#### **2.3.2.1 Cînavkên Serbixwe desteya Xwerû:**

##### **❖ Morfîmên Cînavkên Kesî Yên Serbixwe Yên Xwerû**

Tev cînavkên kesî yên serbixwe yên xwerû, bi tenê ji yek morfîm pêk tînin. Ji bo kesê yekem, duyem û siyem a pirjimar du nerînên cuda he ne. Hinek dibêjin, du morfîm in, ji ber ku di hindurê xwe de xwedî morfîma yekjimarî û pirjimariyê ne.<sup>129</sup> Hinek din jî dibêjin, hemû cînavkên serbixwe yek morfîm in, "ji ber ku hemû cînavkên kesî yên serbixwe xwedî heman taybetmendiyan sentaksî û ferhengî ne, lewra negengaze ji hêla taybetmendiyan ve werin cudakirin"<sup>130</sup> Her çiqas yên pirjimarî bi xwe di hindurê xwe de xwedî morfîmên pirjimarî û yekjimarî ne jî, ji ber ku tu nîşanên pirjimariyê bi wan ve tune ne, tenê wek yek morfîm tînin naskirin.

##### **❖ Morfên Cînavkên Kesî Yên Serbixwe Yên Xwerû:**

Her yek ji cînavkên kesî yên serbixwe yên xwerû bi tenê xwedî yek morf in. Ji ber ku her yek ji wan bi awayê serbixwe tê nivîsîn û bi tu peyv, an morfîmên din ve nayê

<sup>128</sup> Mehemed Me'rif Fetaş û Sebah Reşîd Qadir, "Çend layenêkî Morfoflojî Kurdî", R. 17.

<sup>129</sup> Wiriya Umer Emîn, "Asoyekî tirî zimanewanî", R. 216.

<sup>130</sup> Şêrwan Husên, Hevdîtina Şexsî, Çirîya Pêşîn 2011.

nivîsîn. An jî jîngiha bi kar anîna wan nabe sedema morfên cude. Herwisa jî tev xwerû ne û morfîmên zayendeyê jî wernagirin, da ku yek ji wan ji bo nêrza û yek jî ji bo mêza were bi kar anîn.

### 2.3.2.2 *Cînavkên Serbixwe Desteya Tewardî:*

#### ❖ Morfîmên Cînavkên Kesî Yên Serbixwe Yên Tewardî

Tevaya cînavkên kesî yên serbixwe yên tewardî yên yekjimar, bi tenê ji yek morfîm pêk tên. Kesê yekem û duyemê pirjimar jî, her çiqas di hindurê xwe de xwedî du morfîman "yekjimar û pirjimar" bin jî, ji ber ku tû nîşaneke wan ya yekjimar û pirhirjariyê tune ye, bi yek morfîm tên hesabkirin. Kesê siyem a pirhirjimar xwedî du morfîm e, ji ber ku ji du morfîman pêkhatî ye, morfîmek ya yek- hijmariyê "wê/wî" ye,ema ku ev morfîm di gel morfîma duyem a pirhirjariyê ku "an"e tên, tîpa dawiya morfîma yekem(wê/wî) di nav tîpa yekema morfîma "an" a pirhirjariyê de dihele, ji ber ku di nav zimanê kurdî de du tîpên dengdêr li kêleka hevdu nayên.

#### ❖ Morfên Cînavkên Kesî Yên Serbixwe Yên Tewardî:

Her yek ji cînavkên kesî yên serbixwe yên tewardî, ji bilî kesê siyem a yekjimar, bi tenê xwedî yek morf e. Ji ber ku her yek ji wan bi awayê serbixwe tê nivîsîn û bi tu peyv, an morfîmên din ve nayê nivîsîn. Herwisa jî hemû xwerûne û morfîmên zayendê jî wernagirin, ku yek ji wan ji bo nêrza û yek jî ji bo mêza bê bi kar anîn. Her weku me bal kişandî ser, ji bilî kesê siyem a yekjimar, lewra du morfên wî kesî he ne. Yek li şûna navdêrên nêrza tê bi kar anîn ku "wî" ye. Yek jî ji bo navên mêza tê bi kar anîn, ku "wê" ye. Mînak:

1- Morfa "wî" ev morf li şûna navdêrên nêrza tê bi kar anîn.

Min Azad dîtû min ji wî re got, em sibê diçin sînema yê, tu jî were.

Li vir cînavka "wî" li dewsa navdêrekî nêrza hatî ye.

2- Morfa "wê" ev morf li dewsa navdêrên mêza tê bi kar anîn. Mînak:

Min Leyle dît û min ji wê re got, em sibê diçin sînema yê, tu jî were.

Li vir cînavka "wê" li dewsa navdêreke mêza hatî ye.

### 2.3.2.3 Cînavkên Pêve:

#### ❖ Morfmên Cînavkên Kesî Yên Pêve:

Her yek ji cînavkên kesî yên pêve yên yekjimar û pirjimar di K.Jorîn de, bi tenê ji yek morfîm pêk tê. Her çiqas em bêjin pirjimariya wan cînavkan di zanista ziman de bi "supplative" tên naskirin ku morfîmên yekjimar û pirjimariyê di nav de ne û ji hevdu nayê cudakirin,<sup>131</sup> bi baweriya min, ev ne morfîm in, ji ber ku morfîm biçûkitirîn yekeya watedara ziman e, gerek wate, an jî erka wê he be. Di van cînavkan de, tu nîşaneke pirjimariyê tune ye. Ji ber vê çendê bi tenê yek morfîm in. Ku her morfîmekê jî, pitir ji yek morfên xwe he ne.

#### Morfên Cînavkên Kesî Yên Pêve:

Mijara morfên cînavkên kesî yên pêve di K.Jorîn de, weke K.Jêrîn e. Anku her yek ji wan jî xwedî pitir ji morfêkê ye. Ev mijar, mijareke aloz e, em ê helwê bidin bikaribin vê mijarê jî zelal bikin:\*

#### • Kesê Yekem a Yekjimar:

Kesê yekem a yekjimar yê cînavkên pêve di K.Jorîn de, xwedî sê morfên cuda ye: "im , m , me". Ku her yek ji wan li gor tîpa dawîya lêkerê û cureyên lêkeran tên guhertin:

#### A. -im

Ger cînavka kesê yekem bi lêkerê ve hat nivîsandin, lêker gerguhêz, an negerguhêz be, di dema borî, an niha, an jî di dema bê de be ferq nake, bi tenê bi dengdarekê bi dawî hatibe, wê demê morfa cînavkê dibe "im". Herwisa Ger têrkera dema niha ya nîvlêkerê bi dengdarekê bi dawî hat, wê demê jî morfa cînavka kesê yekem dibe "-im".

Ez → hat-im , dik-im , xweşk-im , dê biç-im

<sup>131</sup> Wiriya Umer Emîn, "Rêzimanî Ranaw – Hendê Şikirdinewey morfolocî", R. 193.

\* Berê me cînavkên kesî yên pêve di K. Jorîn de kirbû çîwar destê lê livir wisa hêsantire hemî bi yek desete bîn ravekirin, ji ber wê me her çîwar destê bihevre şîrove dikin

B. -m

Ev morf hingê tê bi kar anîn, dema ku lêkera temam bi tîpeke dengdêr bi dawî hetibe, di dema borî, an niha an bê de be, cudahî tune ye. Mînak:

Ez → çû-m , bû-m dişo-m, dê bişo-m

C. -me

Ev morf hingê tê bi kar anîn, dema ku tîpa dawîya têrkera nîvlêkera bûna bingehî dema niha, dengdêr be. Morfa kesê yekemê yekjimar dibe"-me"\*

Ez → mamosta -me , zana -me

• Kesê Duyem a Yekjimar:

Kesê duyemê yekjimar bi pênc morfên cuda derdikeve, ku li gor tîpa dawîya lêkeran, coreyên lêkeran û dema lêkeran tê guhertin:

1. -î

Ev morf, ji bilî raweya fermanîê, di her dem û raweyekê din de be, ger tîpa dawîya lêker, an têrkera nîvlêkera dema niha bi dengdarekî bi dawî be û lêker jî li gor kesê duyem a yekjimar hatibe kişandin; Morfa cînavka kesê duyem a yekjimar dibe "-î". Mînak:

Tu → xweşk -î , hat-î , diç-î , dê biç-î

---

\* Divê em bizanin, demê ku têrkera hevoka nîvlêkerî bi tîpeke dengdêr bi dawî bibe, tîpa(e) ya Cînavka Kesê Pêve"e" diçe dawîya cînavka kesî û li gel qertafa dema boriya dudar tevlihev nekin. Ji ber ku forma herduyan weke hev e. Cudahî bi tenê ew e, ku di lêkera dema boriya dudar de, lêker, cînavk û qertafa dema borî bi hevdu ve tîpê nivîsîn. Di dema niha ya nîvlêker de, lêker xuya nake, bi awayê morfa sifir(Ø) derdikeve. Anku di navbera cînavk û têrkera dema niha ya nîvlêker de, valehî he ye. Mînak:

Ez mamoste me.

Di vê hevokê de, tîpa piştî"m" ya dawî yê, beşeke ji cînavka kesî. Ka em li hevoka jêrîn jî binêrin:

Ez hatim e.

Li vir, tîpa dawîya cînavka"m" ku tîpa"e" ye, qertafa dema boriya dudar e:



## 2. -yî

Gava rayeka lêkerê, an têrkera nîvlêkerê, bi tîpeka dengdêr bi dawî bû, ji bilî raweya fermanîê, di her demêke din de be, bi mercê ku morfîma dawî tîpeke dengdêr be, hingê morfa cînavka kesê duyem a yekjimar dibe "yî":

Tu → mamoste -yî , çû-yî , dişo-yî , dê bişo-yî

## 3. -e

Ger ku lêker li gor raweya fermanîê hat kişandin, gerguhêz an negerguhêz belê tîpa dawî dengdêr be, wê demê morfa kesê duyem a yekjimar dibe "e". Mînak:

Tu → biç-e. , wî bibe

## 4. -Ø

Ger lêker li gor raweya fermanîê hat kişandin, gerguhêz an negerguhêz be lê ku tîpa dawî dengdêr be, wê demê morfa kesê duyem a yekjimar dibe "-Ø". Mînak:

Tu → bicu-Ø , bişo-Ø , bişkê-Ø

- Kesê Siyem a Yekjimar:

Di K.Jorîn de, Kesê Siyem a Yekjimar jî mîna kesên din xwedî morfên cuda ye. Li gor dema lêkeran û tîpa dawiya lêkeran lêkerên tewaw û nîv lêkeran tê guhertin, morfên wê jî ev in:

### 1- -Ø

- Cînavka Kesê Siyem

Di du rewşan de dibe morfa "Ø".

Di K.Jorîn de, gava ku lêkera gerguhêz di dema borî de be û li gor kesê siyem a yekjimar hatibe kişandin, wê demê morfa wê dibe morfa"-Ø" Mînak:

Ew → hat-Ø. , şûşt-Ø , çû-Ø

Herwisa ger dawiya lêkerên dema niha û bê tîpeke dengdêr be, morfa cînavka kesê siyem a yekjimar dibe "Ø", ji ber ku cînavka kesê siyem a yekjimar bi xwe dengdêr e. Ger tîpa dawiya lêkera dema niha û bê jî dengdêr be, wê demê morfa kesê siyemdihele û dibe morf "-Ø". Mînak:

Ew kincan dişo -Ø , ew → diçû-Ø , dizê-Ø , dişkê-Ø

2- -e

Ev jî morfeke cînavka kesê sêyem a yekjimar e. Hingê derdikeve, dema ku lêker di dema niha û bê de be. Herwisa bi bitîpêke dengdar bi dawî hatibe, an ger tîpa dawiya têrkera nîvlêker tîpeke dengdar be. Di van rewşan de, bi awayê "-e" derdikeve. Mînak:

Ew diç-e , ew dê biç-e , ew pirtûkan dixwîn-e , ew xwendekar-e.

3- -ye

Ev jî morfeke din a cînavka kesê siyem a yekjimar e. Dema ku têrkera nîvlêkera di dema niha de bi tîpeke dengdêr biqede, wê demê cînavka kesê siyem a yekjimar morfa "-ye" werdigire. Mînak:

Ew mamoste -ye. Ew zane -ye

- Kesê Yekem, Duyem û Siyem a Pirjimar:

Ji ber ku di K.Jorîn de teşeya her sê kesên pirjimar a cînavkên kesî yên Pêve, weke hev e, em ê van hersê kesan bi hev re şîrove bikin, ji bo ku lêkolîna me dirêj û dubare nebe.

Di rewşa pirjimariyê de, her yek ji cînavkên kesî yên pêve xwedî sê morf e:

1. -n

Ev morfa cînavkên kesî yê pêve yê pirhîrjmar, hingê tê bi kar anîn, dema ku tîpa dawîya rayeka lêkran dengdêr be. Cudahî tune ye ger lêker di dema borî an niha an bê de be, gerguhêz, an jî negerguhêz be. Divê bizanin ev form di hevokên nîvlêkera bûna bingehî ya dema niha de qet xuya nabe. Her dema lêker bi tîpeka dengdêr bi dawî hat û li gor cînavkên kesê pirjimar hatibe kişandin, wê demê morfa pirjimar ji bo kesê yekem, duyem û siyemdibe "-n" e. Mînak:

Kesê Yekem a Pirhîrjmar: Em → kincan dişo -n , Em → diçû-n , dizê-n , dişkê-n

Kesê Duyem a Pirhîrjmar: Hûn → kincan dişo -n , Hûn → diçû-n , dizê-n , dişkê-n

Kesê Siyem a Pirhîrjmar: Ew → kincan dişo -n , Ew → diçû-n , dizê-n , dişkê-n

## 2. -in

Her gav tîpa dawîya lêkerê, an têrkera nîvlêkerê bi tîpeke dengdar bi dawî hat, wê demê ji bo kişandina lêkerê li gor kesê yekem, duyem û siyem a pirhîrjmar, cînavk morfa "in" werdigire. Mînak:

Kesê Yekem a Pirhîrjmar: Em → diç-in , dê biç-in , Ew pirtûkan dixwîn-in

Kesê Duyem a Pirhîrjmar: Hun → diç-in , dê biç-in , Hûn pirtûkan dixwîn-in.

Kesê Siyem a Pirhîrjmar: Ew → diç-in , dê biç-in , Ew pirtûkan dixwîn-in

## 3. -ne

Gava têrkera nîvlêkera bûna bingehî di dema niha de bi tîpeka dangdêr biqede, wê gavê morfa kesê yekem, duyem û siyem a pirjimar bi awayê "ne" derdikeve. Mînak:

Kesê Yekemê Pirhîrjmar: Em mamoste -ne.

Kesê Duyemê Pirhîrjmar: Hûn mamoste -ne.

Kesê Siyemê Pirhîrjmar: Ew mamoste -ne

ji bo fêm kirna tevahiya morfên cînavkên kesî yên pêve di K. Jorîn binêre vê Xişteya jêr:

Hej.	Kes.	Mori	Jîngeha Derkeftina Wan	
Yek	Yekem	f		
		-im	Dema li pişt tîpeke dengdar be.	
		-m	Dema di lêkera tewaw de, li pişt tîpeke dengdêr be..	
	Duyem	-me	Dema, di dema niha ya bûna bingehî li pişt dengdêr be.	
		-î	Dema li pişt tîpeke dengdar be.	
		-yî	Dema li pişt tîpeke dengdêr be.	
		-e	Dema li pişt tîpeke dengdêr be, di raweya fermanî de.	
	Siyem	-Ø	Dema li pişt tîpeke dengdêr be, di raweya fermanî de.	
		-e	Dema li pişt tîpeke dengdar be.	
		-Ø	Dema di lêkera tewaw de, li pişt tîpeke dengdêr be.	
	Pir.	Yekem, duyem	-in	Dema li pişt tîpeke dengdar be.
			-n	Dema di lêkera tewaw de, li pişt tîpeke dengdêr be.
û siyem		-ne	Dema, di dema niha ya bûna bingehî li pişt dengdêr be.	

Xişteya ( 2 - 20)

### 2.3.3 Morfofonêmiya Cînavkên Kesî Yên K.Jêrîn:

#### 2.3.3.1 Cînavkên Serbixwe:

- Morfîma Cînavkên Kesî Yên Serbixwe

Cînavkên kesî yên serbixwe di K.Jêrîn de, ji bo kesê yekem, duyem û siyem a yekjimar yek morfîm heye û tu pirsgirêkeke wan tune ye. Pêdiviye em bizain, ger ku kesên yekem û duyemên pirjimar tenê yek morfîm jî bin, em nikarin inkar ji kesê

siyem a pirjimar bikin, ji ber ku dikare bibe du morfîm, yek morfîma kesê siyem a yekjimar "ew", du, morfîma pirjimarî "an" e.

- **Morfên Cînavkên Kesî Yên Serbixwe**

Hemû cînavkên kesî yên serbixwe yên K.Jêrîn, xwedî yek morf in, ji ber ku bi tu awayî nakevin jêr bandora derdora xwe, an wê jingiha ku tê de tên bi kar anîn. Lewra hertim bi awayekî serbixwe tên bi kar anîn. Morfên wan jî ev in: "min, to, ew, ême, êwe, ewan".

### 2.3.3.2 *Cînavkên Pêve Desteya Bihêz:*

- ❖ **Morfîma Cînavkên Kesî Yên Pêve Yên Desteya Bihêz:**

Her yek ji cînavkên kesî yên pêve yên kes a yekem, duyem û siyemên yekjimar, bi tenê ji yek morfîm pêk tên. Morfîma "im/m, t/it , y/î". Divê em bizanin, ku kesê yekem, duyem û siyemyên pirhirjimar, her yek ji wan xwedî du morfîm e<sup>132</sup>

Kesê Yekemê Pirjimar: Man → du morfîm e: Yak morfîma "m" ya cînavka kesî ya yekjimar. Du jî morfîma "an" a pirhirjariyê ye.

Kesê Duyemê Pirjimar: Tan → du morfîm e: Yak morfîma "t" a cînavka kesî ya yekjimar. Du morfîma "an" a pirhirjariyê ye.

Kesê Siyem a Pirjimar: Yan → du morfîm e: Yak morfîma "y" a cînavka kesî ya yekjimar. Du jî morfîma "an" a pirhirjariyê ye.

- ❖ **Morfên Cînavkên Kesî Yên Pêve yên Desteya Bihêz**

Ev desteya cînavkan, di K.Jorîn de li gel lêkerên gerguhêz tên bi kar anîn, li gor wê derdora ku tê de tên bi kar anîn, bi morf û teşeyên cuda:

- **Kesê Yekemê Yekjimar: im / m**

Her dema ew morfîma ku cînavka kesê duyem a yekjimarê pê ve têt nivîsandin bi tîpeke dengdar bi dawî hatibe, morfa cînavkê dibe "im". Ger bi tîpeke dengdêr bi dawî hatibe, dibe "m". Mînak:

1- m: Frê – m - da , Ro - m – kird , De - m - xward

---

<sup>132</sup> Wirya Umer Emîn, "Rêzmanî Ranaw- Hindê Şikirdineweyî Morfolojî," R. 195.

2- im: Ser - im - xist , Hel - im - girt , Firoşt – im

- Kesê Duyemê Yekjimar: it / t

Her dema ew morfîma ku cînavka kesê duyem a yekjimarê pê ve têt nivîsandin bi tîpeke dengdar bi dawî hatibe, morfa cînavkê dibe "it". Ger bi tîpeke dengdêr bi dawî hatibe, dibe "t". Mînak:

1- t: Ro - t – kird , Frê - t - da , De - t - xward

2- it: Firoşt - it , Hel - it - girt , Ser - it - xist

- Kesê Sêyemê Yekjimar: y / î

Her dema ew morfîma ku cînavka kesê siyem a yekjimarê pê ve têt nivîsan-din bi tîpeke dengdar bi dawî hatibe, morfa cînavkê dibe "î". Ger bi tîpeke dengdêr bi dawî hatibe, dibe "y".<sup>133</sup> Mînak:

1- y: Frê - y – da , Ro - y – kird , De - y – xward

2- î: Firoşt - î , Ser - î - xist , Hel - î – girt

Kesê Sêyemê Yekjimar awayekî awerte jî he ye: "gava Cînavka Kesê Siyem a Yekjimar, bi lêkera gerguhêz ve, di dema boriya dudar de bê nivîsîn, wê demê morfa wê cînavkê dibe "y-...-tî"<sup>134</sup>

mînak: Froştû - "y – e - tî" ,

Nûsîw - "y - e – tî"

Herwisa di hevoka nîvlêkera bûna bingehî ya di dema niha de, bi cînavka kesê Siyem a Yekjimar rola ravekera têrkerê be, wê demê cînavka kesê siyem a yekjimar morfa wî dibe "y-....-tî".<sup>135</sup> Mînak:

Ew mamosta - "y - e - tî". ,

Ew xûşk - "y - e - tî".

- Kesê Yekem, Duyem û Siyem a Pirhirjmar

Her yek ji kesê yekem, duyem û siyemyên pirhirjmar, di cînavkên kesî yên desteya bihêz de, bi tenê xwedî yek morfî û teşeyê ne<sup>136</sup>. Morfa wan jî: "man, tan , yan".

<sup>133</sup> Wiriya Umer Emîn, "Asoyekî tirî Zimanewani", R. 75.

<sup>134</sup> Wiriya Umer Emîn, "Lêkolîneweyekî Morfofonemî", Govarî Korî Zaniyarî Êraq- Destey Kurd, Çapxaney Korî Zaniyarî, Jimare "29 û 30", Bexda, 2002, R. 294.

<sup>135</sup> Xoşnaw Ezîz Emîn, "Rêzmanî Cênawî Likaw le Zimanî Kurdîde (Kirmancî Nawerast)", R. 92.

Kesê Yekem a Pirjimar: -man

Firoşt - man, De - man – xward, Hel - man - girt, Ro - man – kird, Ser - man - xist

Kesê Duyem a Pirjimar: tan

Firoşt – tan , Frê -tan – da , Hel - tan – girt , Ro - tan – kird , Ser - tan - xist

Kesê Siyem a Pirjimar: -tan

Firoşt – yan , Frê -yan – da , Hel - yan – girt , Ro - yan – kird , Ser - yan – xist

Ji bo agahiyên zêdetir û bi awayekî xweştir fêmkirî ê, li vê xişteya jêrîn binere, tê de morfên her yek ji cînavkên kesî yên pêve yên desteya bihêz û sedema çêbûna awayê morfên wan hatine zelalkirin:

Hej.	Kes	Morf	Jîngehê Derkeftina Wan
Yek.	Yekem	-m	Dema li pişt tîpeke dengdêr bê.
		-im	Dema li pişt tîpeke dengdar bê.
	Duyem	-t	Dema li pişt tîpeke dengdêr bê.
		-it	Dema li pişt tîpeke dengdar bê.
	Siyem	-y	Dema li pişt tîpeke dengdêr bê.
		-î	Dema li pişt tîpeke dengdar bê.
-y..tî		Dema, D.B.Dudar de, dema niha ya bûna bingehî de rola ravekera têrkerê dibîne.	
Pir.	Yekem	-man	Dema li pişt tîpa dengdêr û dengdar bê.
	Duyem	-tan	Dema li pişt tîpa dengdêr û dengdar bê.
	Siyem	-yan	Dema li pişt tîpa dengdêr û dengdar bê.

Xişteya (2- 21)

### 2.3.3.3 Cînavkên Pêve Desteya Bêhêz:

#### ❖ Morfîmên Cînavkên Desteya Bêhêz

Hemû cînavkên kesî yên desteya bêhêz, bi tenê ji yek morfîmê pêk tên. Her çiqas cînavkên kesê pirhirjimar di hindura xwe de xwedî morfîmên pirhirjimarî û yekjimarî

<sup>136</sup> Heman jêder, R.92.

jî bin, ji ber ku tu nîşanek, an qertafeke wan ya pirhrjmarî û yekjimariyê bi wan ra tune ye, bi tenê weke yek morfîm tên hesabkirin.

❖ Morfên Cînavkên Desteya Bêhêz:\*

• Kesê Yekemê Yekjimar:

Kesê yekem a yekjimar di desteya bêhêz de, weke kesê yekem a yekjimar e di desteya bihêz de, ji ber ku di herduyan de du morfên wî he ne: "m" û "im". Ger tîpa dawiya rayeka lêkera ku ev cînavk pêve tê nivîsîn, tîpeka dengdêr be, wê demê morfa cînavka kesê yekem a yekjimar dibe "-m". Ger tîpa dawiya wê dengdar be, wê demê morfa wê dibe "-im". Mînak:

1- m: Çû -m , dexo -m , deke -m

2- im: Hat -im , deç -im , deyfiroş -im

• Kesê Duyem a Yekjimar:

Cînavkên desteya bêhêz, ji bo kesê duyem a yekjimar bi şeş morfan xuya dibe: "-yt, -ît, -y, -î, -e, -Ø". Ku her yek ji wan morfan li gor coreyên lêker û tîpa dawiya lêkeran tê bi kar anîn:

Bi lêkera gerguhêza dema borî û lêkerên gerguhêz û negerguhêza dema neborî re, bi çar morfên cuda xuya dibe: -yt, -ît, -y, -î

1) Morfa: -yt, -ît

Ger tîpa dawiya rayeke lêkerê bi tîpeka dengdêr bi dawî hat, wê demê Cînavka Kesê Duyem a Yekjimar morfa "-yt" werdigire. tîpeke dengdar bi, wê demê morfa wê dibe "-ît": Mînak:

1. yt: Çû -yt , dexo -yt , deke -yt

2. ît: Hat -ît , deç -ît , deyfiroş -ît

2) Morfa: y, î

---

\*Herçende me berê Cînavkên Bêhêz kiribû sê desteyên biçûk, desteya - "1" û "2" bi tenê ji bo kesê sêyem cuda bûn û desteya - "3" jî bi raweya fermanî re dihat, ku bi tenê kesê duyemê wê he ye. Ji ber ku pir nêzî hev in, em ê li vir hemûyan bi weke yek deste bidin şrovekirin. Her weku di serî jî de me gotibû, cînavkên vê deteyê hertim diçin dawiya lêkeran, bi lêkerên dema boriya gerguhêz, neboriya gerguhêz û negerguhêz, herwisa bi raweyên fermanî, gerguhêz û negerguhêz jî re tê:



Di zanista ziman de, ji derkeftina tîpa "t" a vê cînavkê re dibêjin "optional". Anku bi karkêfî(xwestek). Ev fenomen jî hinek caran tu bandorê li rêziman û wateyê nake. Ji ber vê yekê du morfên vê cînavk jî he ne "-y" û "-î"<sup>137</sup>.

Ger tîpa dawîya rayeka lêkerê tîpeke dengdêr bû, wê demê tîpa "-t" a karkêfî neyê bi lêvkirin û cînavk morfa "-y" werdigire. Ger tîpa dawîya rayeka lêkerê tîpeke dengdar bû, wê demê cînavk morfa "-î" werdigire. Mînak:

1. y: Çû –y , dexo –y , deke -y
2. î: Hat –î , deç –î , deyfiroş –î

- Dema cînavka desteya bêhêz bi lêkera fermanîê re hat nivîsîn, wê demê du morfên cînavka kesê duyem a yekjimar peyda dibin: "e" û "Ø".

1. Morfa: e

Ger rayeka lêkera fermanîê bi tîpeke dengdar bi dawî were, hingê Cînavka kesê duyem a yekjimar pêve tê nivîsîn û morfa wê dibe "-e".

Bixwên –e , bikir –e , binêr –e

2. Morfa: -Ø

Ger rayeka lêkera fermanîê bi tîpeke dengdêr biqede, hingê Cînavka Kesê Duyem a Yekjimar pêve tê nivîsin û cînavk di nav dengdêra dawîya rayeka fermanîê de dihele, morfa wê jî dibe "-Ø"<sup>138</sup> mînak:

Biro –Ø , bike –Ø , bixo –Ø

- Kesa Siyem a Yekjimar:

Di K.Jêrîn de, aloziyên herî zêde di mijara cînavkan de, li ser morfên kesê siyem a yekjimarê desteya bêhêz e. Ji ber ku bi gelek teşeyên cuda derdikeve, "sedema sazûna van teşeyên cuda, ew jîngehên fonolojiyên cuda ne, ku tê de derdikevin"<sup>139</sup>. Şeş morfên vî kesî he ne: -at , -êt , -a , -ê , -t

Bi lêkerên gerguhêz û negerguhêzê dema neborî

<sup>137</sup> Wirya Umer Emîn, "Asoyekî tirî Zimanewanî", R. 219.

<sup>138</sup> Xoşnaw Ezîz Emîn, "Rêzmanî Cênawî Likaw le Zimanî Kurdîde (Kirmancî Nawerast)", R. 94.

<sup>139</sup> Wirya Umer Emîn, "Lêkolîneweyekî Morfofonîmî", R. 291.

Cînavka kesê siyemê yekjimar dema bi lêkerên neborî ra tê, bi pênc morfên cuda derdikeve: -at , -êt , -a , -ê , -t

1. Morfa: -at

Gava rayeka lêkera dema neborî bi tîpa "o" an "e" bi dawî be, morfa cînavka kesê siyemdibe "-at". Wê demê cînavka "at" werdigire. Ger tîpa dawiyê "o" be, dibe "w", ger jî "e" be dihele û dernakeve:

(Roştin): ro → derw –at , (kirdin): ke → dek –at

2. Morfa: -êt

Dema rayeka lêkerê bi her tîpeke din ji bilî tîpa "o" û "e" bi dawî hat û di dema neborî de be, cînavka kesê siyem a yekjimar ya desteya bêhêz morfa "êt" werdigre. Her weku di mînakên jêrîn de xuya dibe:

(Mirdin) : mir → demr –êt , (nûsîn): nûs → denûs –êt , (bûn): b → deb –êt

3. Morfa: -a , -ê

Derkeftina tîpa "-t" di cînavka kesê siyem a yekjimar de, her wekî kesê duyem a yekjimar e, ku di zanista ziman de jê re dibêjin "optional", anku bi kêfkarî jê bibirn, di hinek ciyan de tu bandorê li rêziman û wateyê nake. Ji ber wê du morfên din jî li Cînavka Kesê siyemê yekjimar zêde dibin. Ew jî morfa "-a" û morfa "-ê" ye. Anku her yek jî "-at" û "-êt" alomorfeke din jî he ye, ku ji bo "-at" dibe "-a" û ji bo "-êt" jî dibe "-ê":

1. -a: (Xwardin): xo → dexw –at → dexw –a, (Kirdin): ke → dek –at → dek- a

2. -ê: (Mirdin) : mir → demr –êt → demr –ê , (Bûn): b → deb –êt → deb –ê

4. Morfa: t

Ji bo kesê siyem a yekjimar, morfeke din jî hatiye diyarkirin. Anku kesê siyem a yekjimar xwedî alomorfeke dine, ku morfa "t", Ev morf di sê jîngehên cuda de saz dibe:

a- Gava rayeka lêkera dema borî bi tîpa "ê" bi dawî bû, wê demê tîpa "ê"ya pêşiya cînavka "êt", di nav tîpa dawîya rayekê lêkerê dihele û bi tenê "t" dimêne<sup>140</sup>

Mînak: (Sûtan): sûtê → desûtê –t , (Gorîn): gorê → degorê –t

b- Gava hevok di dema neboriya avaniya tebatî de be, tîpa "ê"ya pêşiya cînavka "êt"û morfîma "ê"ya dema neboriya avaniya tebatî, di nav hevdu de dihelin. Morfa cînavka kesê siyemli vir jî dibe "t".<sup>141</sup>Mînak:

Sûtandin: de + sûtên + r + ê + êt → desûtênê –t

Xwardin: de + xu(xo) + r + ê + êt → dexurê –t

c- Herwisa di gel dema neboriya lêkerên awarte yên weke: giryan, jîyan û...hwd. Ji ber ku tîpa dawîya wan dengdêran û tîpa destpêka cînavka kesê siyem jî dengdêre, ji ber wê tîpa "ê" ya cînavka "êt" dihele, bi tenê "t" dimêne. Wê demê morfa kesê snyem bi awayê "-t" derdikeve: Mînak

(Giryan): giriye → degiriye –t , (Jîyan): jiye → dejiye –t

1- Morfa: -Ø

A- Ger ku lêker di dema borî de û gerguhêz be, an jî lêker di avaniya tebatî de be:

Ger morfa kesê siyem a yekjimar bi lêkerên dema boriya gerguhêz hatibe kişandin û avaniya tebatî di dema borî de be, wê demê morfa kesê siyem xuya nabe. Anku awayê wê dibe morfa sifir (-Ø).<sup>142</sup>Mînak:

- Lêkera Gerguhêza Dema Borî:

Hat –Ø , Çû –Ø , mird –Ø

- Avaniya Tebatî Di Dema Borî De:

Xwêndra –Ø , firoşra –Ø , kirdira –Ø

- Li Gel Nîvlêkera Dema Niha Ya Bûna Bingehî:

<sup>140</sup>Xoşnaw Ezîz Heemîn, "Rêzmanî Cênawî Likaw le Zimanî Kurdîde (Kirmancî Nawerast)", R. 97.

<sup>141</sup> Lîjney Ziman û Zanstekan, R. 37.

<sup>142</sup> Xoşnaw Ezîz Emîn, "Rêzmanî Cênawî Likaw le Zimanî Kurdîde (Kirmancî Nawerast)", R. 92

Morfa cînavka kesê siyem a yekjimar, di hevoka nîvlêkerî de, diçe paş morfîma "e"ya dema nihaya nîvlêkerî.

Ew zîreke -Ø , ew mamostaye-Ø

B- Gava di lêkerên dema borî de, tîpa "t"ya dawîya cînavka "êt" û "at" were jêbirin, wê demê tîpa dawîya cînavka "êt" tê jêbirin. Ger dengdêr li dawîya wê nehat<sup>143</sup> , Di sê warên cuda de, dibe sedema derkeftina morfa (Ø).

Gava rayeka dema borî bi tîpa "ê" bi dawî be, di gel tîpa destpêka cînavka "êt" di nav hevdu de dihelin. Bi tenê tîpa "t" ya dawîya cînavka "êt" a kêfkarî dimîne û ew jî tê jêberin. Wê demê morfa cînavka kesê siyem dibe"Ø". Mînak:

(Sûtan): sûtê → desûtê -t → desûtê -Ø,

(Gorîn):gorê → degorê -t → degorê -Ø

Dema ku hevok di dema neboriy avaniya tebatî de be, tîpa "ê"ya pêşîya cînavka "êt" di gel morfîma "ê"ya dema neboriya avaniya tebatî, di nav hevdu de dihelin. Wê demê morfa Cînavka Kesê Siyem dibe "t". Tîpa "t"ê tê jêbirin, ger ku pişt wê tîpeka dengdar be, wê demê tenê morfa (Ø) dimîne.

Sûtandin: de + sûtên + r + ê + êt → desûtênê -t→ desûtênê -Ø

Xwardin: de + xu(xo) + r + ê + êt → dexurê -t→ dexurê -Ø

Herwisa di gel dema neboriya lêkerên awarte de. Mîna: giriyan, jîyan û...hwd. Lewra ber jî ku tîpa dawîya wan dengdêran û tîpa destpêka cînavka kesê siyem jî dengdêr e. Ji ber vê yekê tîpa "ê" ya cînavka "êt" tê jêbirin û bi tenê "t" dimîne. Wê demê morfa kesê siyembi awayê "t" derdikeve. Pişt re jî tîpa "t" a kêfkarî tê jêbirin û morfa cînavka kesê siyembi awayê morfa "Ø" dibe. Mînak:

(Giriyan): giriye → degiriye -t → degiriye -Ø ,

(Jîyan): jiye → dejiye -t→ dejiye -Ø

- Kesê Yekemê Pirjimar:

---

<sup>143</sup> Wiriya Umer Emîn, Pîtotekanî Zimanewanî", R. 65.

Cînavkên kesê yekemê pirjimar yên desteya bêhêz di gel lêkara gerguhêz a dema borî û lêkerên negerguhêz û gerguhêz a dema neborî tên bi kar anîn. Du morfên wê he ne: "yn" û "în" Ger rayeka lêkerê bi tîpeke dengdêr bi dawî hatibe, wê demê awayê morfa kesê yekem a pirjimar dibe "yn"; Ger rayeka lêkerê bi tîpeke dengdar jî dawî hatibe, wê demê awayê morfa kesê yekem a pirjimar dibe "în"

1- yn: Çû –yn , dexo –yn , deke -yn

2- î: Hat –î , deç –î , deyfiroş -î

• Kesê Duyem û Siyemê Pirjimar:

Her yek ji kesên duyem û siyemên pirjimar yên desteya bêhêz, xwedî du morfên wekhev in.\* Ew jî morfa "in" û "n"; ger rayeka vê lêkera ku cînavka kesê duyem û Siyemyên Pirjimar pêve tê nivîsîn, bi tîpeke dengdêr bi dawî bê, morfa wê dibe "n". Heger rayeka vê lêkera ku cînavka kesê duyem û siyem yên Pirjimar pêve tê nivîsîn, bi tîpeke dengdar jî bi dawî bê, morfa wê ê biibe "in":

1. n: Kesê Duyemê Pirjimar: dixon , denun , çûn, biron(Fermanî)

Kesê Siyemê Pirjimar: dixon , denun , çûn

2. in: Kesê Duyemê Pirjimar: hatin , defroşin , deçin , bixwênin(Fermanî)

Kesê Siyemê Pirjimar: hatin , defroşin , deçin.

Ji bo fêma kirna tevahiya morfên cînavkên kesî yên pêve ya desteya bêhêz di K. Jêrîn, binêre vê xîştaya jêr:

Hej.	Kes	Cureya lêkeran	Mor	Jîngeha derkeftinê
			f	

\* Ji ber ku teşeya cînavkên kesê duyem û siyem a pirjimar yên desteya bêhêz weke hev e, em ê bi hev re morfên herduyan diyar bikin. Her duyan jî bi lêkerên gerguhêzên dema borî û lêkerên erguhêz û negerguhêzên dema neborî. Herdu mîna hev in, bi tenê kesê duyem ku bi lêkerên fermanî re tê a kesê siyem bi lêkerên fermanî re naye bi kar anîn. teşeya kesê duyem û siyem weke hev in. Her yek ji kesa duyem û siyemê pirjimar bi tenê du morfên wan hene ku: "n" , "in" ne.

Yek	Yekem	B.Ger. + Neb.Ger û Neger	-im	Dema rayeka lêkerê bi tîpeke dengdêr dawî bê.	
			-m	Dema rayeka lêkerê bi tîpeke dengdar dawî bê.	
	duyem	B.Ger.+ Neb. û Fer. Ger. û Neger.	-yt	Dema rayeka lêkerê bi tîpeke dengdêr dawî bê.	
			-y	Dema rayeka lêkerê bi tîpeke dengdêr dawî bê."t"ya kar kêfî tê jêbirin,	
			-ît	Dema rayeka lêkerê bi tîpeke dengdar dawî bê.	
			-î	Dema rayeka lêkerê bi tîpeke dengdar dawî bê."t"ya kar kêfî tê jêbirin,	
			Fer. a Ger û Neger.	-e	Dema rayeka lêkerê bi tîpeke dengdêr dawî bê.
			-Ø	Dema rayeka lêkerê bi tîpeke dengdêr dawî be.	
	Siyem	Nîvlêker D.niha, tebat	-Ø	bi awayekî hertimî	
			Neb. Ger. û Neger.	-at	Ger rayek bi "e" û "o" dawî bê.
				-a	Dema "t"ya Karkêfî tê jêbirin, di wan reyekan de bi "o" û "e" dawî bê.
				-êt	Rayek ji bilî "o" û "e" dawî bê.
				-ê	Dema "t"ya karkêfî tê jêbirin ji wan reyekan ji bi tîpa "o" û "e" dawî hatine.
				-t	Dema rayek bi "ê" dawî bê, "ê"ya cînavk dihele, li hin raderên awerte û dema boriya avaniya tebatî de.
				-Ø	Dema "t"ya karkêfî tê jêbirin, di rayekên bi"ê" dawî tîn, hin raderên awerte û dema boriya avaniya tebatî

Pir	Yekem	B.Ger.+Neb	-yn	Rayeka lêkerê bi tîpeke dengdêr dawî bê.
		Ger.ûNeger.	-în	Rayeka lêkerê bi tîpeke dengdar dawî bê.
	Duyem	B.Ger.+Neb	-in	Rayeka lêkerê bi tîpeke dengdar dawî bê.
		ûFer. Ger. û Neger.	-n	Rayeka lêkerê bi tîpeke dengdêr dawî bê.
	Siyem	B.Ger.+Neb	-in	Rayeka lêkerê bi tîpeke dengdar dawî bê.
		Ger.ûNeger.	-n	Rayeka lêkerê bi tîpeke dengdêr dawî bê.

Xiştaya (2 -21)

## 2.4 Berhevxiştina Fonolojiya Cînavkên Kesî Di Navbera K.Jêrîn û Jorîn:

### 2.4.1 Ji Aliyê Cudatiyê Ve:

#### A. Cînavkên Serbixwe

- 1- Di K. Jorîn de: Du coreyên cînavkên serbixwe hene. Di K. Jêrîn de bi tenê yek desteya Cînavkên Serbixwe heye. Yekem desteya K. Jorîn, cînavkên xwerû ne, ku li dewsa navdêrên xwerû tên bi kar anîn, bi xwe jî xwerû ne, anku li dewsa wan navdêran tên bi kar anîn, yê ku di wê demê de qertafa zayendeyê wernagirin. Duyem desteya jî di K. Jorîn de, desteya tewandî ye. Lewra jê re tewandîdebêjin, ji ber ku tên tewandin. Anku li dewsa wan navdêran tên, yê ku di hevokê de qertafa zayendeyê bi wan ve ye û hatine tewandin. Di K.Jêrîn de, bi tenê yek desteya cînavk heye, ku li dewsa hemû navdêran tê, ji ber ku di K. Jêrîn de navdêrên tewandî tune ne, hemû navdêrên hevokê xwerû ne. Bi awayeka din, di K. Jêrîn de zayend tune ye, navdêr koka wê çawa be, wisa tê nava hevokê, bê bi kar anîna qertafên nêrza û mêza di hevokê de tê.
- 2- Di K. Jorîn de "di cînavkên kesê siyem a awayê tewandî de di K. Jorîn de zayend heye"<sup>144</sup>. "wî" li dewsa navdêrên nêr tê û "wê" jî li dewsa navdêrên mê tê. Di K. Jêrîn de, tiştekî wisa tune ye, hemû cînavk li cihê navdêrên nêr û mê jî tên.
- 3- Di K.Jorîn de, desteya xwerû teşeya kesê siyem a yekjimar û pirjimar ku, morfîma "ew" e, mîna hev in. Bi rêya cînavkên pêve ji hev tên cudakirin. Di K.Jêrîn de tû cînavkên kesî yê serbixwe tune ne, ku weke hev bin.

<sup>144</sup> Tan Samî, "Rêzimana Kurmancî" R. 127

- 4- Hemû cînavkên serbixwe yên K. Jorîn, ji bilî kesê siyem a pirjimarê desteya tewandî, bi tenê ji yek kitê pêk tên. Di K. Jêrîn de, cînavkên serbixwe, yên kesên pirjimar tev ji du kitan pêk tên.
- 5- Heryek ji kesê yekema yekhiyem û pirhiyem, her wisa duyemû siyem a pirjimarê desteya cînavkên xwerû yên K. Jorîn, anku her yek ji "Ez - Em, - Hûn , Ew(pirjimar)", li gel kesê siyem a yekjimarê desteya tewandiya K.Jorîn (wî, wê), tu têkelî bi destê cînavkên kesî yên K.Jêrîn re tune ye û gelek ji hev cuda ne.

#### B. Cînavkên Kesî Yên Pêve:

- 1- Me di mijara cudahiya cînavkên kesî yên serbixwe de got, du destê cînavkên serbixwe yên K. Jorîn hene. Di K. Jêrîn jî de bi tenê yek destê heye. Di mijara cînavkên pêve de, ev tişt berevajî di be, anku di K.Jorîn de, bi tenê yek destê cînavkên pêve heye.\* Di K. Jêrîn de, du destê cînavkên pêve hene, yek bihêz û ku xurt e, li gor hebûna kerseyên hevoksaziya nav hevokê cihê xwe diguhirin. Desteya duyem jî desteya bêhêz e, ku hertim bi dawiya lêker û koka lêkerê ve tên nivîsîn.
- 2- Di K. Jorîn de, ger pêveber niv lêkera bûna bingehî bû, wê demê cînavkên Pêve bi awayî serbixwe tên nivîsîn. Anku ger cînavkên kesî yên pêve yên K. Jorîn, piştî cînavkên serbixwe, navdêran, rêngdêran, an jî hokeran hatin nivîsîn, hingê valahî di navbera wan peyvên û cînavkan de derdikeve. Di K. Jêrîn de tiştê wiha tune ye. cînavkên kesî yên pêve hertim bi kerese û morfîma ji beriya xwe ve tên nivîsîn.
- 3- Di cînavkên K. Jorîn de, reweke wiha tune ye. ku cînavkên kesî yên pêve li gor hebûna kerseyên hevoksaziyê cihê xwe biguherin. Di K. Jêrîn de desteya bihêz li gor hebûn û tûne bûna kerseyên hevoksaziyê cihê xwe diguhirin.
- 4- Di K. Jorîn de, tu tîpên cînavkên kesî yên pêve nikarin bi awayekî karkêfî werin jêbirin, an jî gotin. Di K. Jêrîn de, di desteya bêhêz de, ji bo kesê

---

\* Di rastî de, me Desteya Cînavkên Pêve ya K.Jorînîn, kiribû çar desteyên biçuk. Ya K.Jêrînîn jî me Desteya Bêhêz kiribû sê desteyên biçûklê bi tenê ji bo şîrovekirinê me wisa lê kiribû, ana di koka xwe de her yek bi serê xwe destê cînavk e.



duyem û siyem a yekjimar tîpa "t" piraniya caran bi awayekî karkêfî tê jêbirin, an gotin. Herwisa jî tîpa "t" di K. Jorînde tune ye, di K. Jêrîn de, di yekjimariya kesê duyem a desteya bêhêza -1 û kesê duyem û siyem a yekjimariya desteya bêhêz -1 û 2 de he ye.

- 5- Di K. Jorîn de, tu têkilî di navbera yekjimar û pirjimariya cînavkên pêve de tune ye. Di K. Jorîn de, desteya bihêza cînavkên pirjimar bi rêya komkirina kesê yekem, duyem û siyem a yekjimar çêbûne.
- 6- Di K. Jorîn de, ew morfa ku di nîvlêkerên dema niha ya bûna bingehî çêdibin, dima ku têrker bi tîpeka dengdêr bi dawî be, ku teşeya wan dibe "me- ne, yî- ne , ye -ne" morf û teşeya wisa di K. Jêrîn de tune ye.
- 7- Di K. Jorîn de, du teşeyên kesê yekjimara duyemîn he ne, ku "î , yî, e, Ø"lê di K. Jêrîn jî de, di Desteya Bihêz de, du teşeyên wê he ne, ku "t, it" in cuda ne. Herwisa di desteya bêhêz jî de, şeş teşeyên wê he ne, ku "ît ,yt, î, y, e, Ø" in. Teşeya "yî" di K. Jorîn de he ye, di K. Jêrîn de tune ye. Herwisa teşeyên "ît ,yt, y" jî di K. Jêrîn de he ne, di K. Jorîn de tune ne.
- 8- Kesê siyem a yekjimar a K. Jorîn bi tenê sê morfên wî kesê hene, ku "Ø,e, ye" ne lê K. Jêrîn de, şeş morfên wî kesî he ne, ku "Ø, at ,êt, t ,a, ê" in. Weke xuya dibe, bi tenê ji aliyê morfa "Ø"ê ve mîna hev in, ji aliyên din ve ji hev cuda ne.
- 9- Kesên pirjimar a cînavkên kesî yên Pêve yên K. Jorîn, hersê kes weke hev in lê di K. Jêrîn de, di desteya bêhêz de, kesê yekem a pirjimar bi tenê tîpa "y/î" zêde ye û hersê kes ne weke hev in.

#### **2.4.2 Ji Aliyê Wekheviyê Ve:**

##### **A- Cînavkên Kesî Yên Serbixwe:**

- 1- Desteya tewandî ya K. Jorîn, ji aliyê teşeyê ve, gelek nêzî Cînavkên Serbixwe yên K. Jêrîn e. Ji ber ku: Kesê yekem a yekjimar di herdu zaraveyan de "min" e. Kesê duyem a yekjimar jî, di K. Jorîn de, desteya tewandî "te" ye û Desteya Xwerû jî "tu" ye. Xuyaye awayê fonetekî pir nêzî "to" ya K. Jêrîn e. Kesê Siyem a yekjimarê desteya xwerû ya K. Jorîn û K. Jêrîn weke heve û di desteya tewandiya

gorîn de jî, dengê "e" ya beriya "wî, wê – wan" ketiye û qertafa zayendeyê wergirtiye.

1. Kesê yekem û duyem a pirjimarê desteya tewandiya gorîn, weke ya jêrîn e, bi tenê di ya jêrîn de tîpa "ê"yê despêka "ême , êwe" zêdeye û di ya gorîn de ketî ye. Herwisa di kesa siyem a pirjimar jî de, di K. Jêrîn de, tîpa "e"ya "ewan" zêde ye, Di K. Gorîn de ketî ye. Dîsa jî kesê siyemê desteya tewandiya K. Jêrîn, bi qertafa pirjimariya "an" hatiye pirhirjmarkirin desteya xwerûya K. Gorîn de, nehatiye pirhirjmarkirin.
2. Di herdu zaraveyan de, cînavkên serbxwe ji bilî kesê siyem a pirjimarê tewandiyê K. Gorîn û K. Jêrîn, ji du morfîman pêk hatine, yên din hemû di herdu zarave de bi tenê ji yek morfîm pêk hatine.
3. Cînavkên serbixwe ya yekjimar di herdu zaraveyan de tenê ji yek kitê pêk tê.

#### B- Cînavkên Kesî Yên Pêve

Cînavkên kesî yên pêve yên K. Gorîn, gelek nêzî cînavkên kesî yên pêve yên desteya bêhêz in. Pêdiviyê em bizanin, ji bilî cînavkên K. Gorîn, ku di dema fireh de tên, di K. Gorîn de dibe "Desteya -3". Ev cuda ne, yên din nêzî hev in, an jî weke hev in.

- Kesê Yekem:

Kesê yekemê yekjimar: Di desteya-1, 2 û 3 ya K. Gorîn de, teşeya wî "im, m," ye her wisa di K. Jêrîn de, di desteya bihêz û bêhêz jî de bi tenê "im, m"ye, ku weke heve in.

- Kesê Duyem:

Cînavkên kesê duyem a bêhêz ya K. Jêrîn, gava tîpa "t"ê kêfkarî ye tê avêtin, ji aliyê pirjimariyê û yekjimariyê ve li gel cînavkên pêve ya K. Gorîn weke hev in.

- Kesê Siyem:

Ji bo kesê siyem a yekjimar, di herdu zaraveyan de bi tenê ji aliyê teşeya morfa "Ø" mîna hev in. Herwisa ji aliyê pirjimariyê jî ve weke hev in û di herduyan de, teşeya "in" û "n"ye.

Ji aliyê morfîman jî ve, desteya bêhêza K. Jêrîn, weke K. Jorîn e, hemû bi tenê ji yek morfîm pêk tên.

Cînavkên desteya bêhêza K. Jêrîn û cînavkên pêve yên K. Jorîn herdu jî bi dawiya lêkeran ve tên nivîsîn. Di herdu zaraveyan de desteya -1 bi lêkerên gerguhêz ve tê, desteya -2 jî di herduyan de bi lêkerên dema neborî(niha û bê) ve tê nivîsîn. Di K.Jorîndesteya- 4 û di K.Jêrîn desteya-3, bi raweyên feramandanê ve tên nivîsîn û teşeya wan weke hev e.

## 2.5 Tevlîbûna Hinek ji Cînavkên Kesî di Navbera Herdû zaraveyan de:

### 2.5.1 Cînavkên Kesî yên Serbixwe:

Ji ber ku cînavkên kesî di zimanê kurdî de dîrokeke kevnariya wê heye. Dîroka cînavk nemaze cînavkên kesî ta ku serdema zimanê partî dizivire ku nêzîkatiyeke gelek di gel zimanên din zindî û mirî yên hînd-Ewropayî heye. Ji ber ku ger em li teşiya cînavkên kesî yên zimanê partî binêrin, dibînin nêzîkbûnî gelek di gel cînavkên kesî îro ya kurdî nemaze ya K. Jorîn de heye. Cînavkên kesî di zimanê partî de<sup>145</sup>:

Kes	Yek.	Pir.
yekem	Az/Man	Amā
duyem	Tû/Tō	Aşmā
siyem	Hō	Hawin

Xiştaya (2 - 22)

Her wisa cînavkên kesê ya kevin a K. Jêrîn gelek nêzî cînavkên kesê serbixwe ya îro ya standar e, K. Jorîn in. Ji ber ku ger em bala xwe bidine devokên K. Jêrîn nemaze devoka Mukiriyân û Xoşnawetî her wasa wêjeya folkilora K. Jêrîn û nivîs û metinên kevin. Dibînin ku ji aliyê cînavkên kesê serbixwe ve gelekî nêzî cînavkên kesên xwerû û tewandîya îro ya K. Jorîn e. Nêzîkatiyeke baş di navbera devok û wêjeya klasîka jêrîn di gel nivîsina standara îroya jorîn de heye. Ji aliyê cînavkên serbixwe ve. Mixabin di îro de ev nêzaketi kêm buye. gelekî hev û din dur

<sup>145</sup> Şaswar herşîmî, "Zanstî Berawiridkirdinî Pêwaney Le Zimanî Hîndo Ewrûpîyekanda", Destnivîs.

ketine, ji ber ku di nivîsna standara îroya K. Jêrîn de, ev cînavk hatine guhertin û ne mîna berê ne. Mînak:

Di devokên K. Jêrîn de mînak mûkiryan û xoşnawetî û navêçeyên hewlêrê ku mîna K. Jorîn dû desteyên cînavkên serbixwe hene. Her yek ji wan rol û cihên diyarîkirên xwe heye. Bi awayek ku di nav van devokan de neşê cînavkên desteya yekê li cihê desteya duyem bên bi kar anin mîna K. Jorîn in:

Desteya yekem<sup>146</sup>:

Kes	Yekjimar	Pirhrjmar
Yekem	Emin	Eme
Duyem	Etû , eto	Ewe
Siyem	Ewî(nêr), ewê(mê)	Ewan

(Xişteya ( 2 – 23)

Ev deste cînavk ji alê teşê ve gelekî nêzî deste cînavka tewandî ye, tenê tîpa "e"yê li pêşiya van da heye. Her wisa jî ji bo kesê duyem a yekjimar de, di K. Jorîn de "te" ye, ku di wir de zêdetir nêzî desteya xwerû ye. Awaya karkirin û bikaranîna vê desteyê zêdetir nêzî desteya xwerû ne, ji ber ku dikare hemû erkên hevoksazî bibîne. Ji bilî xwedanetî û ravekerî û nikare bibe têrker jî wate nikare piştê daçekan bê. Mînak:

- Bi lêkerên negerguhêz a dema borî û neborî re dibe kirde:

Emin çûm.

Emin deçim

- Bi pêveberên nîv lêker re dibe kirde:

Emin zîrekim.

<sup>146</sup> Ji bo agahên zêdetir û awayên kar kirin û teşên desteya yekm binêre:

A- Ebdûlla Hûsên Resûl, "*Ranawe Kesyekanî Şêwezaelî Xoşnawetî*", Govarî Zankoy Sellaheedîn, 10. Hûzeryan, Hewlêr, 2000, R. 43 – 65.

B- Îdirîs Ebdûlla, "*Cênaw Cor û Şêwekanî le Şêwezari Deştî Hewlêr-de*", r.229

C- Taban Nûrî Heme Se'îd, "*Şêwezari Nawçey Pişder*", (Lêkolîneweyekî Zimanewanî Wesfîye), Namey Master, Kolêjî Ziman, Zankoy Selaheddîn, 2011, R. 30.

- Bi lêkerên gerguhêz a dema borî û neborî dikare bibe kirde û bireser jî:

Emin etom dî ke le serban danîştûy.

- Bi lêkerên avaniya tebetî dikare bibe bireser(cîgira biker(kirde)):

Ew kujira.

Destey duyem:

Teşeya vê jî mîna desteya yekem e. Tenê tîpa "e"yê li vir de li pêşiya wan cînavkan hatiye jêbirin.<sup>147</sup>

Kes	Yekjimar	Pirhrjmar
Yekem	Mîn	Me
Duyem	Tû, to	We
Snyem	Wî (nêr)/ wê(mê)	Wan

Xiştaya (2- 24)

Ev deste cînavk ji aliyê teşê ve mîna desteyên tewandî K. Jorîn e. Tenê li kesê duyem a yekjimar de teşeya "tû/te" tê bi kar anina, li K. Jorîn teşeya "te" tê bi kar anin,<sup>148</sup> dibê ji bîr nekin di devoka Xoşnawetî ji bo kesê duyem a yekjimar ji bilî "tû/to , etû/eto" teşeya "te" jî tê dîtin. Ku mîna kesê duyem û yekjimar a desteya tewandî ye, her wisa jî K. K. Kurdoyêv behs jê dike û ku dibê di metinên Mackenzie de hatiye "kurim babî te wextî xoy mindar bû".<sup>149</sup>

Ev deste cînavk mîna ya deste ya tewandî ye û li cihên navdêrên tewandî tîn, di van beşên zaravan de. Mîna kesên siyem a yekjimar a K. Jorin "wî" li cihê navdêrên nêr tê û "wê" jî li cihên navdêrên mê tê.<sup>150</sup> Mînak:

<sup>147</sup> me ji bo awayê karkirî û teşeya desteya duyem mefa ditiye ji:

A- Ewrehmanî Hacî Marif, "Rêzmanî Kurdî", Bergî yekem "Wişesazî", Beşî Duwem "Cênaw", r.92

B- Ebdûlla Hûsên Resûl, "Ranawe Keseyekanî Şêwezai Xoşnawetî", RR. 43 – 65.

C- Îdirîs Ebdûlla, "Cênaw Cor û Şewekanî le Şewezarî Deştî Hewlêr-de", R. 229.

Ç- Taban Nûrî Heme Se'îd, "Şewezarî Nawçey Pişder", R. 30.

<sup>148</sup> Mezin Usman, "Hendê Berawirid û Serncî Zimanewanî", Çapxaney Şehab, Hewlêr, 2008, RR.51-52.

<sup>149</sup> K. K. Kurdoyêv, "Rêzmanî Kurdî be kerestey diyalêktî Kirmancî û Soranî", R. 139.

<sup>150</sup> Cemal Nebez, "Zimanî Yekgirtûy Kurdî", R. 25.

Malê wî suta(sotî) : mallê azadî suta(sotî). (Nêrza)

Malê wê suta(sotî) : mallê şîlanê suta(sotî). (Mêza)

Legel wanim kirî : legel şîlan û azadanim krî (Nêter)

Di bê em ji bîr nekin ji aliyê hevokszî ve ev desteya jor ji desteya tewandî ya K. Jorîn nêz in ji ber ku ev deste cînavk ya van devokan "tenê erka raveker û xwedanî , her wisa piştî daçekan tê dibe têrker û bi cînavka 'heyî' jî ra tên".<sup>151</sup> Ev deste cînavk dişên bibin raveker û xwedanetî nîşan didin

Malî min(me, tû, we....) suta.

Marê min(me, tû, we....) suta.

- Ev deste cînavk dişên bi daçekan ra bên û bibin têrker: Ew kitêbekey le min kirî.
- Her wis digel cînavka heyî jî tên:

Ewe hemû de î minin.

Her wisa di devokên K. Jêrîn de mîna devokên: "Hewlêr, Rewandûz, Mehabad, Mukiriyan,.. hwd" her wisa di devokên K. Jorîn de mîna devokên "Dihok, Hekaryan, Urimiye, ... hwd" de ji bo kesê duyem ê pirjimariya teşeya "hengo, engo" tên bilêvkin. Dibê ji bîr nekin ev "E" ya pêşiya cînavkên desteya yekem gelek kevnar e, ne tenê di devokên K. Jêrîn de heye. Ev "e" ye di vekolinên berê ya K. Jorîn jî hatiye behis kirin, mîna ku "*D.N: Mackenzie 'kurdish dialect studise-1' de bi vê awayê derdikevin pêşberî morov:*

*koma yekem*                      *koma duyem*

*ez*                                      *(e)min*

*etû*                                      *(e)te*

*ew*                                      *(e)wî*

---

<sup>151</sup> Taban Nûrî Heme Se'îd, "*Şêwezari Nawçey Pişder*", R. 42.

<i>em(a)</i>	<i>(e)me</i>
<i>engo</i>	<i>(engo), we, hewe</i>
<i>ew(ab)</i>	<i>(e)wan"<sup>152</sup></i>

her wek xuya dike tîpa "e" li pêşiya desteya xwerû(koma yekem) desteya tewandî(koma duyem) de heye.

❖ Kesê yekem a yekjimar: cînavka "ez"

Dîroka cînavka "ez" di nav van cînavkên ku tên bikaranin a herî kevinar e. Ev peyv(cînavk) di zimanê avêsta yê de bi awayê 'ezêm' hatiye, em dinêrin cînavkan ev peyvanan di zimanê sanskrêtî bi awayê 'ehem' derketiye. Di sîlaviya kevin de jî bi heman awayê kurdiya îro bi 'ez' tê dîtin<sup>153</sup> Di eslê xwe de jî tê vê wateyê "*ger ku ez dibêm 'ez' wate ez xwedê me an yezdan im an êzîdim*"*ez = ezdî*"<sup>154</sup> Her ji ber wê jî di devoka kevna silêmanî hin devokên dinê ya K. Jêrîn de hebûye. Mixabin di îro de naye bi kar anin tenê dinav van gotin û metnên berî de hebûne hêj jî tê bikar anin. Mînak: Gotineka pêşînan heye ku bi devoka silêmanî tê gotin û niha jî tê gutin û tê bikar anin "*Eger zanî ezim û ger neyzanî dizim.*"<sup>155</sup> An jî mîna mamosta Tewfîq wehbî derheqa "ez" dibêje: "*mîster Rîç li sala '1820' de guhdarî stranek kiriye ku dinav de hevoka 'ez dinalim' hebûye.*"<sup>156</sup> Her wisa jî di wêjeya kilasîk jî de tê dîtin. Mînak:

Xaw bê xawî dû zullfî xawm **ez**

Çawe çawî yek xezale çawm **ez**

Ger nîye awr le sînemda betaw

Ji boç leber qullull xerîqî awm **ez**?! (Dîwanî Nalî, R. 232)

<sup>152</sup> veguhastin, Tan Samî, "Rêzmana kurmancî", R. 128.

<sup>153</sup> Şaswar herşîmî, Zanstî Berawiridkirdinî Pêwaney Le Zimanî Hîndo Ewrûpîyekanda, destnivîs

<sup>154</sup> Îbrahîm R. Surçî, "Felsefey Avêsta Binema Dîn û Zimanekane", Çapxaney Roşinbîrî, Hewlêr, 2010, R. 396.

<sup>155</sup> Binêre:

A- K. K. Kurdoşyêv, "*Rêzmanî Kurdî be kerestey diyalêktî Kirmancî û Soranî*", R. 25.

B- Cemal Nebez, "*Zimanî Yekgirtûy Kurdî*", R. 139.

<sup>156</sup> Twfîq Wehbî, "*Eslî Pite Qallbî 'e'y Şewey Silêmanî*" Korî Zanyarî Kurd, Bergî yek, Çapxaney Korî zanyarî Kurd, Bexda, 1973, R. 15.

Her wisa jî didevoka mukiryan jî nemaze di wêjeya folklor de bi awayekî ber bilav tê dîtin. Mînak:

Di dastans "mem û zîn" de hatiye; Ku ev dastan hatiye wergerandin ji bo ser devoka mukiryan; ku dinav de heye û nîşaneyê hebûna cînavka "ez" a îroya K. Jorîn e:

Xuşkê ez û bibim be qurban

Bela eme kake memî helgirîn bîbeyne czîre û botan<sup>157</sup>

Her wisa di dastana "qelay dimdim" jî de hatiye. Ku ev dastan jî hatiye wergerandin ji bo ser devoka mukiryan û dinav wê devokê tê gûtin:

heta li dinê ez bijîme

Ji boxom perjînî şerîme<sup>158</sup>

Me li vir bi awayê cuda tenê behsa kesê yekjimara yekemîn ya desteya "xwerû" kiriye. Ji ber ku cînavkên kesên din cudahî di gel her du destê cînavkên Mûkiriyan Xoşnawetî, tenê fonetîkî ye. Her wisa divê vê yekê jî bizanin cînavkên kesên din jî dîrokeke kevnaî ya wan heye. Ev jî ne karê me ye ku dîrok û bingeha wan şîrove bikin \*

### 2.5.2 Cînavkên Kesî yênPêve:

Ger ku em li awayên berê û îroya cînavkên kesê pêve ya K. Jêrîn û jorîn devokên wan binêrin û tê dîtin, berevajî cînavkên kesî yên serbixwe ku devokên K. Jêrîn û axavtinên berê ya K. Jêrîn mîna nivîsna standarta îroya K. Jorîn e. Di berê de gelek nêzî hev bûne lê îro ne ew qasî nêzî hev in. Di warê cînavkên pêve de devokên K. Jorîn û awayê berî mîna wan cînavkan e ku îro di K. Jêrîn de tên dîtin û bi kar anin. Nemaze kesê yekem a pirjimar û siyem a yekjimar gelek nêzî desteya bêhêza K.

<sup>157</sup> Oskarman, Tuhfey Muzeferîye, Pêşekî û Saxkirdinewe û Hênane Ser Rênûsî Kurdî: Hêmin Mukiriyanî, Çapî Sêyem, Dezgay Çap û Billawkirdinewey Aras, Hewlêr, 2011, R. 146.

<sup>158</sup> Heman Jêder, R. 138.

\* Dîroka cînavka "min" a desteya tewandî dighêje ser zimanê Hînd- Ewropa ji ber ku peyv(cînavk)a "ego an ezê" di Latîni de gavê tê ekusatîv(tewandî) de dibe "mê", di girki de "êmê" ye. di sanskrêtî de "mam" e. di avêsta jî de "me" wateya xwedanî digehêne wate "ya min". Her wisa cînavka "mene" jî di avêsta de ji bo min hatiye bikar anin. Her wisa di gelek zimanên dî jî de derbaz dibe. Binêre: Şaswar herşîmî, Zanstî Berawiridkirdinî Pêwaney Le Zimanî Hîndo Ewrûpîyekanda, destnivîs



Jêrîn in. her wisa cînavkên kesî yê pêve desteya bihêza ya K. Jêrîn berî di zaimanê kurdî de tune bûye, tê gutin ku li zimanê farsî ra hatibine nav zimanê kurdî.

#### 1- Kesê yekemê pirjimar:

Li hin devokên K. Jorîn de, cînavkên pêve, kesê pirjimara yekemîn teşe bi awayê "în/yn" tê derkevtin. Wate li şuna "Em kurd in." di van devokan da debên "Em kurd in." tê gotin. Ev teşe di devoka "Behdînî û Rojhelat û botan" de tê bilêvkirin.<sup>159</sup> Her wisa jî di wêjeya klasîk a K. Jorîn jî de bi awayekî ber bilav tê xuya kirin. mînak Ehmedê Xanî di şêkare xwe ya bi nav û deng "mem û zîn"ê de weha gotye.

Ya ne weha em çirra nekar in

Mecru'h û ze'îf dilfegar in

Her wek tê dîtin ji bo kesê duyema ya pirjimar ji bilî "in" Ehmedê Xanî teşeya "in" bikaraniya ev teşe jî mîna kesê duyem a pirjimara cînavkên desteya bêhêz a K. Jêrîn e, ev teşe di piraniya axaftin û gotinên berî ya devoka behdînî û botan nivîsên klasîka K. Jorîn tê dîtin.

#### 2- Kesê siyem a yekjimar:

Cînavkên kesê pêve ya K. Jorîn di kesê siyem a yekjimar desteya -2 ji bil awayê standar ku di K. Jorîn tê bikaranin, gelek teşeyên din jî di devok û wêjeya klasîk a berê de tên bikaranin, ku piraniya wan gelek nêzî destê cînavka pêve ya desteya bêhêz-2 dibin, mînak:

#### 1- ê:

---

<sup>159</sup> Binêre:

- A- Ewrehmanî Hcî Marîf, "Rêzmanî Kurdî", Bergî yekem "Wişesazî", Beşî Duwem "Cênaw", R. 161.
- B- Sadiq Behaedîn Amêdî, "Rêzimana Kurdî/Kirmancîya Jorî û Jêrîya Hevberkrî, R. 45.
- C- Tan Samî, Rêzmana Kurmancî, R.140.

Di hin devokên rojavayî navendiya K. Jorîn de cînavka kesê siyem bi awayê "ê" tê derketin,<sup>160</sup> ku mîna kesê siyem a yekjimar desteya bêhêz-2 ya K. Jêrîn e ji ber kû yek li teşeyên kesê siyem a yekjimar di K. Jêrîn de "ê" e.

Mînak: Ew dibêje.

Ew dellê

2- ît /it/t:

Ji bo kesê siyem a yekjimar ji bilî teşeya "e" yê teşeya "ît/it/t" tê bilêvkirin, xûya ye ku ew form di K.Jorîn a berê de hebûye û niha jî di hinek devokan de tê bikaranîn, nemaze di klasîkên kurmancî de baş tên dîtin: Xanî û Cizîrî bi piranî di berhemên xwe de bikaranîne. Herwiha ew di hin berhemên li devera Behdînan çapkirî (bi taybetî bi alfabe ya kurdî-erebî lê carinan jî bi kurdî-latînî) ev paşgir tên xebitandin.<sup>161</sup> Ev awayê di wêje de cihê xwe girtiye. Mînak di gelek cihan de; Mela Mehmûdê Bayezîdî di "Adat û Rusûmatnameê Ekaradiyê" de bikar dîne mîna di behsa "Mêraniya Kurdan" de dibêje: "*Hakim bit jî elbette cewwaba heq dibêjin û natirsin*"<sup>162</sup> wek tê dîtin Mela ji bilî bêje "Hakim be" dibêje "Hakim bit", wek tê zanin jî di morfên kesê siyem a yekjimar a K. jorîn tîpa "t" heye. her wisa ger li wêjeya kilasîk nema "Mem û Zîn" a Xanî binêrî gelek form û teşeya "it, t" tê dîtin mînak:

Meyla ji ruxê kuran berî bit

Sed carî horî û perî bit<sup>163</sup>

An di malikeka din de dibêje:

Herçî ku wekîl e bêt û rûnit

mewla kî ye? Xutveê bixûnit<sup>164</sup>

<sup>160</sup> Husin Muhammad, "*Paşgirên kesî yên lêkeran û dîroka wan*", R. 121.

<sup>161</sup> Heman jêder, R. 122.

<sup>162</sup> Mela Mehmûdê Bayezîdî, "*Adat û Rusûmatnameê Ekradiye (1797 - 1867)*", Ravekirin, Tîpguhêzî û Lêkolîn: Jan Dost, Çapî Duyem, Nûbihar, 2012, R. 63.

<sup>163</sup> Ehmedê Xanî, "*Mem û zîn*", Şîrove û Kurdiya Îro: Jan Dost, Çapî Yekem, Avêsta, Stembol, 2010, R. 250.

<sup>164</sup> Heman Jêder, R. 293.

Her wisa li cihê "-ît, -t" di van devokan "-îtin , -tin" tê dîtîn, ji berku bibêjin:

- ew dibêjit, ew dibêjîtin.

- ew dibêjît, ew dibêjîtin.

### 3- itin/ îtin:

Teşeyeka din ku di wêjeya klasîka K. Jorîn de heye; ya kesê yekjimara siyemîn di gelek cihan de tê dîtîn, teşeya "itin" e ye.<sup>165</sup> Mînak; Mela Mehmûdê Bayezîdî di "Adat û Rusûmatnameê Ekaradiyê" de di behsa "Nijadê kurdan û navê Kurdistanê", Dibêje:*Me'lûmê(naskiriyê) cenabêd talib(xwendevan) û naziran (zanayan)bibitin ko ew tewayifêd (elên mezin) Ekradan...*<sup>166</sup> Wek tê dîtîn Mela ji bilî bêje "bibe" dibêje "bibitin" li cihê cînavka "e" cînavka "itin" bikar dîne. Her yek ji teşeya "tin û îtin" di awayê standarta K. Jêrîn de tune. Di gelek devokan de tên bilêvkirin mîna devokên ; Xoşnawetî û Hewlêr, her wisa di wêjeya kilasîk jî de tê dîtîn. Mînak:

Meh beşew heldê, pena degrêt û denwêtin be roj

Da bgate sîrrî peççey perçem û wesfî biroy (Dîwanî Nalî, R. 700)

Demê mirov kesê siyem bi awayê teşeya "it , ti , tin, îtin" bilêv bike. kar ji wateyê hevok û axaftinê nake lê di awayê standart dût dikeve

Li dawî de dikarin bêjin ger em li devok û wêjeya folklor û klasîka K. Jorîn û K. Jêrîn binêrin dibîn teşeya cînavkên kesê serbixwe û pêve wan gelekî nêzî hev in lê di standartiya îroya herdû zarave de ev nêzîketî tune ye û mixabin zêdetir durî hev ketine. Dişê ji bo nêzîkî bûna K. Jorîn li K. Jêrîn ev teşe bîn bikaranin ku di K. Jorîna berî de nêzî K. Jêrîn in her wisa ji bo K. Jêrîn jî wisa ... ger ku di nivîsin û xwendina pirtûkên ziman û rêzimana kurdî bîn xebitandin hêdî hêdî her dû zarave nêzî hev bibin.. ji bo diyerî kirine hemû teşên din a devokên K. Jorîn û Jêrîn gekek dem divêt û mijareka serbixwe lazime meramê me li vir tenê peyama me bigihêje; awayê kevnar û devokên her dû zarave gelek nêzî heve lê îro durî hev ketine

<sup>165</sup> Husin Muhammad, "Paşgirên kesî yê lêkeran û dîroka wan", R. 122.

<sup>166</sup> Mela Mehmûdê Bayezîdî, "Adat û Rusûmatnameê Ekradiye(1797 - 1867)", R. 35.

### 3 ROL Û ERKA CÎNAVKÊN SERBIXWE DI HEVOKSAZÎYÊ RÊKEFTINÊ DE:

#### 3.1 Rol û Erkên Hevoksaziya Cînavkên Desteya Xwerû(K. Jorîn):

##### 3.1.1 Di Rola Kirdeyê de:

Cînavkên kesê serbixwe a desteya xwerû di K. Jorîn de; dişêin Rola kirdeyê bilîzin, Kirde jî: *"ew keseke an tişteke ku erkekî bicih tîne an jî buyerekî digire serxwe."*<sup>167</sup> Her wisa ku cureya lêkerê diyar dike. Qey dişên di vê hevokê de desteya xwerû bibin kirde an na? Ku li sê warên cuda da dişên bibine kirde:\*

1- Ger ku lêker gerguhêz be, di dema niha û bê de be. Wê demê cînavkên desteya xwerû rola kirde dibînin. Ji bilî lêkera "viyan". Ji ber ku lêkerekê awerte ye. Mînak:

- Dema Niha: Ez pirtûkê dixwenim. : naxwenim.
- Dema Bê: Ez dê pirtûkê bixwenim. : nexwenim.

2- Ger ku lêker negerguhêz be; cînavkên desteya xwerû ya K. Jorîn dişên rola kirdeyê bibînin. Lêker di dema borî an niha an bê de be. Cînavkên Serbixwe ya xwerû dişên bibine kirde. Mînak:

- Dema borî

Ez hatim. : nehatim. (D.B. Têdayî)

Ez hatibûm. : nehatibûm. (Ç.D. B. Têdayî)

Ez hatime. : nehatime. (D.B. Dudar)

Ez dihatim. : nedihatim. (D.B. Berdest)

- Dema niha : Ez dêm. : nayem.
- Dema bê: Ez dê bêm. : neyem.

---

<sup>167</sup> Mizgîn 'Ebdurehman Ehmed, "Doxî Êrgetîv le Zîmanî Kurdîde(kirmancî serû)", R. 11.

\*di vê parê de hemî mînanan li gor kesê yekem a yekjimar tînin kişandin,

2- Her wisa ger ku lêker, di raweya fermanan da be. Cînavkên desteya xwerû rola kirde dibînin. Di awayên gerguhêz û negerguhêz jî de:

Gerguhêz: Tu azad bişo. : neşo.

Negerguhêz: Tu were. : neyê.

### 3.1.2 Di Rola Nîhadê de:

Ger ku lêkera hevokê nîv lêker be. An jî dikarin bêjin gava pêvebera hevokê lêkera "bûn" bû. Wê demê deste cînavka serbixwe ya xwerû ya K. Jorîn rola nîhad\* dibinin. Nîhad jî bi xwe *'peyveke di hevokê de tu kar û buyeran encam nade lê bi tiştêk tê şîrovekirin'*.<sup>168</sup> Wê demê cînavkên serbixwe ya xwerû dikarin bibin bi nîhad di hemû demên lêkera "bûn" de. Di zimanê kurdî de sê celeb lêkerên bûnê hene. Ku nîv lêker in. Dû celeb ji radera "bûn" hatine girtin. Yek jî ji radera "hebûn" hatiye girtin. Nîvlêkera bûnê hertim negerguhêz e û pêdiviya wê bi bireserê tune ye. Lê, hin caran dibe lêkereke tewawker ku bi wateyê jidaykbûn an çêbûn an jî bi wateya mezinbûn (şînbûn) be. Wê demê ew lêkereke dibe lêkereke tewaw. Dişê ev lêker geguhêz be jî dişê negerguhêz jî be<sup>169</sup>. Mînak:

Zarok ji dayk bû. : Lêkera tewaw a dema borî, gerguhêz ye.

Mîna pirtûk heye. : Lêkera tewaw a dema niha, gerguhêz ye.

Dar mezin bû. : Lêkera tewaw a dema borî, negerguhêz ye.

Her wisa gavê lêkera "bûn" bi navdêr û rengdêran ra an bi lêkerên din ra lêkerên hevedûdanî çêdike, wê demê lêkera bûnê teşeyê nû digire û dibe lêkera temam. Mîna "hînbûn, fêrbûn, rizgarbûn, dirêjbûn..."<sup>170</sup> Her wisa lêkera "bûn" û "hebûn" ger

---

\* Nîhad hertim di awayê pêveberên nîv lêkerê re tê, di lêkolîna K. Jorîn de nîhad jî her bi kirde tê binav kirin Lê di rastî de kirde dibe lêkera hevokê ku di nav de kar an tevgerk bê encamdan lê di awayê nîv lêkerê de buyer û tevger tune ye. Di zimanê kurdî jî de sê awayên lêkera bûnê hene ku dibe nîv lêker û di wan siyan jî de nîv lêker lêkereke negerguhêz e, ji ber wê ye em tenê behsa wan lêkeran dikin ku negerguhêz in gava bune gerguhêz buyer û tevger dibe û nîhad jî dibe kirde. Nîhad têgeheke K. Jêrîn e, bi wateya despêk tê.

<sup>168</sup> Nerîman Ebdulla Xoşnaw, "Ristesazî", Çapî Yekem, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr. 2012, R.115.

<sup>169</sup> Nerîman Ebdulle Xoşnaw, "Nîhad û Guzare", Beşî Sêyem, Govarî Zimannasî, Jimare"11", 2011, R. 135,

<sup>170</sup> Ji bo agahiyên zêdetir derheqa raweya lêkera "bûn" binêre:

A- Tan Samî, "Rêzmana Kurmancî", R. 295.

B- Baran Bahoz, "Rêzimana Kurmancî", R.164.

gerguhêz jî be lêkerekawarte ye. Ji ber ku hemû lêkerên gerguhêz dişê bibe lêkerekaw tebatî lê, lêkera "bûn û hebûn" neşê bibine lêkerekaw tebatî."<sup>171</sup>

- Bûna bingehî: ev bi wateya hebûn an heyin tê ji radera "bûn" hatiye girtin: Mînak:

Ez mamosta bûm. (D. Borî)

Ez mamosta me. (D. Niha)

Ez dê mamosta bim. (D. Bê)

Tu mamosata be. (Raweya fermanî)

- Bûna guhraw : Celebeka din ji lêkera bûnê lêkera bûna guhraw e ku "ev *kar çêbûn û guherîna rewşa kesekî an tişteki, ji qonaxek ta qonaxeka tir*".<sup>172</sup> digihîne. bi wateyeke din ev bi wateye bûnek tê ku hatiye guhertin, an jî tê guhertin. ji radera "bûn"ê hatiye girtin. Mînak:

Ez bûm mamosta. (D. Borî)

Ez dibim mamosta. (D. Niha)

Ez dê bibim mamosta. (D. Bê)

Tu bibe mamosta. (Raweya fermanî)

- Bûna heyî: Buna heyî bi wateyê bûna heqîqî mirov tê an bi wate "wicud" a Erebi tê. Cudahiya nivlêkera bûna heyî li nivlêkerên din a bûnê ev e ku bûna heyî li radera "hebûn" hatiye girtin û têker jî tune. Mînak:

Ez hebûm. (Dema borî )

Ez hem. (Dema niha)

---

C- Taş Çetîn, Waneyên Rêzman û Rastnivîsa Kurmancî", Çapa Duyemîn û Berfirehkirî, Diwan, Istanbul, 2013, R. 204.

<sup>171</sup> Binêre:

A- Ebdûlwahab Xalîd Mûsa, 2000, R. 22.

B- Viyan Silêman Hacî Slêvaneyî, "Rêkewtin le Şêwey Jûrûy Zimanî Kurdîde", R. 69.

<sup>172</sup> Ebdûlfetah Deham, "Cînav", R. 16.

Ez dê hebim. (Dema bê)

Tu hebe. (Raweya fermanî)

### 3.1.3 Di Rola Cîgira Kirdeyê de:

Di K. Jorîn de deste cînavka xwerû, dişên rola cîgira kirde bibinin, di hevoka lêkerên tebatî de. Wateya lêkera tebatî an mijara cîgra kirde di her zimanêkî de heman têgeh û heman tişt digihenêt, meram jî ev e, ew kas an ev tişt ku kar têne encam dan ne diyare.<sup>173</sup> Her wisa merca guhrîna hevoka lêker lebatî ji bo tebatî hebûna bireser e, guhêstina kirde ji bo cihê bireser û avêtina kirde ye.<sup>174</sup> Di K. Jorîn de bi van pêngavên jêrîn hevokeka lêker lebatî dibe hevokeka lêker tebatî.<sup>175</sup>

1- Avêtina kirde û ev cînavkên ji bo kirde dizivrête ve:

2- Bireser tînin cihê kirde:

3- Lêkera alîkara "hatin" tînin li gor dema lêkerê:

Hate (D. borî)

Dihête (D. niha)

Dê bihête (D. bê)

Her wisa ji bilî "dihête" ji bo dema niha teşeya "tê"jî heye, ji bo dema bê jî, ji bilî "dê hête" teşeya "dê bê"jî heye<sup>176</sup>

4- Li gor hejmar û kesê bireserê an cîgira kirdeyê cînavkên kesê pêve bi lêkera alîkar ve tînin nivîsin:

5- Her kereşeyeka din di hevokê de heb wek xwe tînin nivîsin:

<sup>173</sup> Wîrya Umer Emîn, "le Peywendiyekî Biker Nadiyê", Govarî Roşinbîrî Niwê, Jimare"129", Bexda, 1992, R. 18.

<sup>174</sup> Xoşnaw Ezîz Hemeemîn, "Rêzmanî cênawî likaw le zimanî kurdîde(kirmancî nowerast)", R. 126.

<sup>175</sup> Ji bo wan Pêngavan, mefa ji Van çavkaniyan hatiye girtin:

A- Mizgîn 'Ebdurehman Ehmed, "Doxî Êrgetîv le Zimanî Kurdîde(kirmancî serû)", R.83.

B- Wîrya Umer Emîn, "Ristey Biker Nadiyr", Govarî Roşinbîrî Niwê, Jimare"95", 1982, Bexda, R. 35.

C- Lîjneyek le Wezaretî Perwerde, "Ziman û Edebî Kurdî", Polî Noyemî Bineretî, Bijardekirdin û Darştineweyî: Şêrko Ehmed Hewêz, Feysel Mistefa Hacî... Hwd. 2010, RR. 82-83.

<sup>176</sup> Ewrehmanî Hacî Marîf, "Rêzmanî Kurdî, Bergî Yekem(Wiesazî), Beşî Pêncem(Kirdar), Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Slêmanî 2000, R.46.

Ger em hevoka "Te ew dîtin." bi guhrîn ji bo hevokeka lêker tebatî, dibe:

- 1- "te" kirde ye; tê jêbirin.
- 2- "ew" bireser e; mîna xwe tên nivîsin.
- 3- Lêkera hevokê di dema borî de ye. Ji ber wê lêkera alîkar "hatin" ji bo dema borî tê girtin û dibe "hate".
- 4- Ji ber ku bireser ji bo kesê siyem a pirjimare, ji ber wê lêkera "hate" jî cînavka kesê siyem a pirjimar digire û dibe "hatine"
- 5- Kereseyên din tenê "dîtin"e ku lêker e; mîna xwe tê nivîsin

Wê gavê hevok dibe:

Ew hatine dîtin.

- Ger ku ji bo dema niha be. dib: Ew dihête dîtin.
- Ger ku ji bo dema bê jî di be: Ew dê bihête dîtin.

*Divê bê zanin "ger ku lêker di dema niha û bêde be bireser bi cînavkên desteya 'min, te...hwd' hatibin bilêvkirn, wê demê divêcînavkên tewandî mîna kereseyên lêkera tebatî biguhêrin ji bo desteya 'ez, tu... Hwd.'"<sup>177</sup> Mînak:*

Azad min dît.

Lêkera vê hevokê lebatî ye. Di dema niha de ye û bireser jî cînavkên tewandî ne, ger ku em bikin tebatî hevok dibe ;

Ez hetime dîtin

Ji bo dema bê jî wisa tê guhertin

Azad dê min bibîne (dema bê / lebatî)

Ez dê bême dîtin. (dema bê / tebatî)

---

<sup>177</sup>Wirya Umer Emîn, "Ristey Biker Nadiy", R. 35.



### 3.1.4 Di Rola Bireserê de:

Ger ku lêker gerguhêz be û di dema borî de be. Wê demê destê cînavkên xwerû dişên rola bireser bibinin Divê bê zanin: "*Bireser ew hêmana hevokê ye ku, rasterast dikeve bin bandora lêkerê.*"<sup>178</sup> Ji ber wê ye di K. Jêrîn de jê ra dibêin *berkarî rastewxo* ku bi wê wateyê tê "*ku rastewxwe û yekalî karê kirdeyê tê ser wê*"<sup>179</sup> Ku hertim di hevokên gerguhêz de ew derdikeve pêşberî mirov.<sup>180</sup> Cînavkên xwerû jî dikarin rola bireser bibinin. Mînak:

Wî ez pelixandim. : nepelixandim. (D.B. Têdayî)

Wî ez dipelixandim. : nedipelixandim. (D.B. Berdest)

Wî ez pelixandime. : nepelixandime. (D.B. Dûdar)

Wî ez pelixandibûm. : nepelixandibûm. (Ç.D.B. Têdayî)

Her wisa her yek ji lêkerên "werîn, şîyan, zanîn û karîn" awarte ne. Ji ber ku lêkerên gerguhêzin, cînavkên kesê serbixwe ya desteya xwerû neşên bibine bireser. "*Ji ber ku di wan lêkeran de tenê hevok dişê bibe bireser. Bi wateyeka din her yek ji wan karan jî vê rêzika karên gerguhêz derketine. An ku berkar(bireser) ê wan hertim hevokeka sergihayî ye , li pey wan tê.*"<sup>181</sup> Mînak:

Min şîya ez nameyê bixwenim.

Min zanî tuyê dê qazanc bikî

Hûn di karin biçin zozanan.

### 3.1.5 Di Rola Têrkerê de:

Deste cînavkên xwerû neşên rola têrker bibinin ji ber ku têrker hertim tewandî ye ev destê cînavkê jî xwerû ne.

<sup>178</sup> Taş Çetîn, "*Waneyên Rêzman û Rastnivîsa Kurmancî*", r.225.

<sup>179</sup> Umer Mehmed Kerîm, "*Karî Têper û Têneper le Zimanê Kurdî de(Kurmancî Xwaru)*", Namey Master, Kolêcî Perwerde – Îbin Rûşid, Zankoy Bexda, 2004, R. 34.

<sup>180</sup> Taş Çetîn, "*Waneyên Rêzman û Rastnivîsa Kurmancî*", R. 309.

<sup>181</sup> Ebdulfettah Deham, "*Kar(Lêker) di Zimanê kurdî de*" , R. 233.

### 3.1.6 Di Rola Raveberê de:

Deste cînavkên xwerû ya K. Jorîn dişên rola rêveber bibînin. Bi alîkariya veqetandekên "a, ê, ên" ku li gor nêter û mêjer tên bikaranin.

- Veqetandeka: a

Gava ravebera cînavka xwerû ya yekjimar be, ji bo zayenda mê veqetandeka "a" tê bikaranin û bi ravekerê ve tê girêdan:

Eza birîndar , Tuyê birîndar , Ewa pêşkestî

- Veqetandeka "ê"(Nêrza):

Gava ravebera cînavka xwerû ya yekjimar be. Ji bo zayenda nêr veqetandeka "ê" tê bikaranin û bi ravekerê ve tê girêdan:

Ezê birîndar , Tuyê birîndar , Ewê pêşkestî

ji bo kesê duyem a yekjimar tîpa kelejandinê tê navbera veqetandekê û cînavka "tu" di her dû awayên nêrza û mêza:

Tuyê birîndar , Tuyê birîndar

Gavê raveber yekjimar be veqetandekê nêrza û mêrza ya yekjimar bikar tê, wate veqetandekên nêrza û mêrza tenê bi cînavkên yekjimar ve tîpê nivîsin. gavê raveber pirjimar be veqetandeka pirjimar tenê bi cînavkên pirjimar ve tê nivîsin

- Veqetandeka "ên"

Gava ravebera cînavka xwerû ya pirjimar be, wê demê zayenda nêter e ji ber wê veqetandeka "ên" tê bikaranin û bi ravekerê ve tê girêdan:

Emên birîndar , hûnên birîndar , Ewên pêşkestî.

Gava cînavkên kesê serbixwe ya xwerû dibin bi raveber digel raveker dişên di hevokê de van erkên jêrîn bibînin. Ya balkêş ew e ku bi hev re tenê wan erkan dibinin

ku desteya cînavkên xwerû dişên erkên wisa bibinin. Bi wateyeka din tenê li dewsa navdêrn xwerû tên û nayen tewandin.\*

1- Kirde: cînavkên kesê xwerû gavê dibin raveber bi ravekerê re dişên rola kirde bibinin. Ger ku awayê lêkerê yek ji yên jêrîn bû:

- Ger ku lêker negerguhêz di "D.Borî" de: Ewê pêşketî hat.
- Ger ku lêker gerguhêz di "D. Niha" de: Ewê pêşketî her roj pirtûkan dixwene.
- Ger ku lêker gerguhêz di "D.Bê" de: Ewê pêşketî dê her roj pirtûkan bixwene.
- Ger ku lêker negerguhêz di "D.Niha"de : Ewê pêşketî dê.
- Ger ku lêker negerguhêz di "D. Bê"de: Ewê pêşketî dê bê.

2- Nîhad: Gavê destê cînavka xwerû di rola raveber dibinin, wê demê bi ravekerê ra dişên rola nîhad bibinin, ger ku lêker, lêkera "bûn" be, wate pêveber nîv lêker be:

- Bûna Bingehî: Ewê bêkes mamosta bû.
- Bûna guhraw: Ewê bêkes dê bibe mamosta
- Bûna heyî : Ewê pêşketî heyê

3- Bireser: ger ku lêker gerguhêz be û di dema borî de be. Gavê desteya xwerû dibin bi raveber, wê demê bi ravekerê ra dişên rola bireser bibinin.

Min ewê pêşketî dît

4- Cîgira kirde: Di lêkerên tebatî de gavê destê cînavka xwerû rola raveber dibinin, wê demê bi raveker re di hevokê de dişên rola cîgira kirde bibinin:

Ewê pêşketî hate kuştin.

---

\*Cînavk neşên bi veqetandekên nebinav kirî ra bîn ji ber ku gava veqetandekên nebinavkirî bi peyveke re tên nivîsin, wê peyvê dikin nebinavkirî. Cînavkên kesî jî bixwe dihindura xwe de binavkirî ne, ji ber wê neşetê dû tiştên cuda di nav peyvekê da hebin.

### 3.1.7 Di Rola Ravekerê de:

Ev deste cînavk nikarin rola ravekerê bibînin, ji ber ku raveker di K. Jorîn de tê tewandin, ev deste cînavk jî xwerû ne.

## 3.2 Rol û Erkên Hevoksaziya Cînavkên Desteya Tewandî (K. Jorîn):

### 3.2.1 Di Rola Kirdeyê de:

Deste cînavkên tewandiya K. Jorîn hin car rola kirde dibinin ger ku lêkera hevokê gerguhêz\* be û di dema borî de be:

Min pirtûk xwend. : ne xwend (D.B. Têdayî)

Min pirtûk xwendiyê. : nexwendiyê (D.B. Dûdar)

Min pirtûk dixwend. : nedixwend (D.B. Berdest)

Min pirtûk xwendibû. : nexwendibû (Ç.D.B Têdayî)

Her wisa em jibîr nekin di lêkera alîkara"vîyan" a awerte ya negrgehêz de cînavkên desteya tewandî, di dema borî û niha û bê de rola kirde dibinin:<sup>182</sup>

Min viya.

Min divêt.

We divêt.

### 3.2.2 Di Rola Nîhadê de:

Deste cînavkên tewandî neşên rola nîhad bibinin ji ber ku ev navdêr rola nîhad dibine xwerû ye. naye tewandin.

### 3.2.3 Di Rola Cîgira di Kirdeyê de:

Deste cînavkên tewandî neşên rola cîgira kirde bibinin ji ber ku ev navdêr rola cîgira kirde dibine xwerû ye, naye tewandin.

---

\*dibê em ji bîr nekin gavê lêkera"bûn" bi wate ya hebûn û xwdanyetiya tiştêkî bê dibe gerguhêz mîna min xanî heye.

<sup>182</sup> Ebdulfetah Deham, "Kar(Lêker) di Zimanê kurdî de", R. 233.

### 3.2.4 Di Rola Bireserê de:

Ger ku lêker gerguhêz be û di dema niha û bê de be, wê demê destê cînavkên tewandî dişên rola bireser dibinin lê ger ku di dema borî de be ev destê cînavk neşên rola bireser bibinin. Mînak:

Ez te dibinim (D. niha)

Azad dê te bibine (D. bê)

Her wisa di raweya fermanî de jî ger ku lêker gerguhêz be, destê cînavka tewandî rola bireser dibinin. Mînak:

Tu wî bişo.

Her wisa di awayekî awerte de jî ger ku lêkera alîkar hebe, di raweya xiwastek de. wê demê destê cînavka tewandî rola bireser dibinin. Mînak

Divê ez wan bibinim

### 3.2.5 Di Rola Têrkerê de:

Têrker di K. Jêrin de jê ra dibên *berkarî narastewxo* an *tewawker* ku têrkerê "bi wan peyvan tê gotin ku bi awayekî narastewxwe dikevîne bin bandora lêkerê û merca derkeftina têrkerê jî hebûna daçeke ye".<sup>183</sup> Wateya têrker û tewawker jî bi vê wateyê tê ku lêkerê tewaw dike an têr dike. Deste cînavka tewandî dişên rola têrker bibinin, gavê li dawîya daçekan bên. di hemû cureyên lêker û demên lêkran û raweyen de her gav daçek bê destê cînavka tewandî dişên li pey wan bên û rola têrker binin. Daçekên K. Jorîn jî ev in: "li ,ji, di, b, b...re, ji...re, ji...ra, bi...ve, ji...ve, di....de, di....re".<sup>184</sup> dibê bê zanin di K. Jorîn tenê desteya tewandî dişên dawîya daçekan bên. Mînak:

Wan li me xist, me li wan nexist.

We nebihstiyê, ji we re negitiyê.

<sup>183</sup> Nerîman Xoşnaw, "Ristesazî", R. 109.

<sup>184</sup> Tan Samî, "Rêzmana Kurmancî", R.143.

### 3.2.6 Di Rola Raveberê de:

Deste cînavkên tewandî neşên rola raveber bibinin. Ji ber ku bi xwe tewandî ne, Ji ber wê neşên qertafên zayendî bigirin. Ji ber ku raveber hertim qertafê zayendî digire.

### 3.2.7 Di Rola Ravekerê de:

Deste cînavka tewandî dişên rola raveker bibinîn bi alikariya veqetandekên binavkirî û nebinavkirî<sup>185</sup>, ku bi raveber ve tînin nivîsin.

#### ❖ Veqetandekên binavkirî

1- Veqetandeka: -a

Ger ku raveber yekjimar û mê bû veqetandeka "a"tê bi kar anin û raveker jî dişê cînavka tewandî be. Mînak:

Mala min                      Xweşka te

2- Veqetandeka: -ê

Ger ku raveber yekjimar û nêr bû veqetandeka "ê"tê bi kar anin û raveker jî dişê cînavka tewandî be. Mînak:

Xaniyê te                      Birayê te

3- Veqetandeka: -ên

Ger ku raveber nêter bû an dikarin bêjin ger ku pirjimar bû veqetandeka "ên"tê bikar anin û raveker jî dişê cînavka tewandî. Mînak:

Birayên min                      Xweşkên min

#### ❖ Veqetandekên nebinavkirî

---

<sup>185</sup> Ji Bo Agahên Zêdetir derheqa Veqetandekên binavkirî û nebinavkirî binêre:

A- Aydogan MiStef, "Rêbera Rastnivîsînê", Çapî yekem, Rupel, 2012, R. 169.

B- Baran Rizgar, " <https://sites.google.com/a/baranrizgar.co.cc/azadiya-kurdistan/home/pirs-u-mijaren-zimane-kurdi/pasirtiken-pevgiredan-tekiliye-veqetandek--e-i--e--a--en-pasirtiken-rewsa-nebinavkiri--ek--in>, 02. 12. 2016.

Vegetandekên nebinavkirî di K. Jorîn de ji bo yekjimar "ek" û ji bo pirjimar "in" e lê qertafên veqetandekê yên binavkirî "-ê", "-a" û "-ên" digirin û dibin<sup>186</sup>:

-eka: mê û yekjimar

-ekê: nêr û yekjimar

-inên: pirjimar

Lê ev jî diruvê xwe diguhêrin û diruveka wiha digirin<sup>187</sup>:

-eka: dibe/ -eke/ mê û yekjimar

-ekê: : dibe/ -ekî/ nêr û yekjimar

-inên: dibe /-ine/ pirjimar

Bi vê diruva jor rola veqetandek dibinin, navbera raveber û raveker digirin. Wê demê jî dişê raveker cînavkên tewandî bin. Wate rola raveker bibinin. mînak

-eke → Sêveke min rizî bû.

-ekî → Mêrekî wî got.

-ine → Hevaline we çûn bajêr.

### **3.3 Rol û Erkên Hevoksaziya Cînavkên serbixwe ya (K. Jêrîn):**

Cînavkên kesê yên serbixwe di zaraveya K. Jêrîn di gel hemû cureyên lêkar an û hemû demên lêkeran tîn, dikarin di hevevokê de hemû erkên navdêran bibînin. Bê çêbûna awayekî awarte, jî jiber ku di zaraveya K. Jêrîn tenê yek deste cînavkên serbixwe hene û navdêrên tewandî û xwerû tune ye, hemû navdêr xwerû ne. Erkên hevoksazî ya cînavkên serbixwe ya K. Jêrîn ev in:

#### **3.3.1 Di Rola Kirdeyê de:**

Cînavkên kesê serbixwe ya K. Jêrîn dikarin bibin bi kirde demê li dewsa navdêrekî tîn ku dihevokê de karek dikin an jî buyrek tînin cih. Ev cînavk dikarin di hemû cureyên lêker û deman de bibin bi kirde. Mînak:

<sup>186</sup> Onen Ronayî, Tan Samî, "*Hîsker (Kurmançî)*", Asta Yekem, Çapa duyemin, Çapxan: Soylu Matbaa, Enstîtuya Kurdî, Stenbol, 2012, R. 64.

<sup>187</sup> Ocak Nezir "*Waneyên Rêzimana Kurmançî*", R. 82.

- Dema boriya gerguhêz: Min namekem nusî. : nenûsî. (D.B. Têdayî)  
Min namekem nusîbû. : nenûsî bû. (Ç.D.B. Têdayî)  
Min namekem nusîbîwe. : nenûsîwe. (D. B. Dudar)  
Min namekem denûsî : nedenûsî. (D.B. Berdest)
- Dema boriya negerguhêz: Min çûm. : neçum. (D.B. Têdayî)  
Min çûbûm. : neçûbûm. (Ç.D.B. Têdayî)  
Min çûme. : neçûme. (D.B. Dudar)  
Min deçûm. : nedeçûm. (D. B. Berdest)
- Dema neboriya gerguhêz: Min name denûsim. : nanûsim
- Dema neboriya negerguhêz: Min deçim. : naçim
- Raweya fermanîa gerguhêz: To name binûse. : menûse
- Raweya fermanîa negerguhêz: To biço. : meço

### 3.3.2 Di Rola Nîhadê de:

Cînavkên kesê serbixwe di K. Jêrîn de dikarin rola nîhad bibinin, ger ku lêkera hevokê nîv lêker bû. An bi wateyeka din lêkera hevokê "bûn" bû. Wê demê cînavkên serbixwe dikarin bibin bi nîhad di hemû demên lêkera bûn de û di her sê celebên lêkera bûnê de: \*Mînak:

- Bûna bingehî: Min mamosta bûm. (Dema Borî)  
Min mamostam. (Niha)  
Min wiriya debim. (Bê/daxwazî)  
To wiriya be. (Fermanî)
- Bûna guhraw: Min bûm bemamosta. (Dema Borî)

---

\* Away û celebên lêkera "bûn"ê di K. Jêrîn mîna ya K. Jorîn e. Ji ber wê lazim bi dubare kirin neke.



Min debim bemamosta. (Niha)

Min bibê bibim mamosta. (Bê/daxwazî)

To bibe bemamosta. (Fermanî)

- Bûna heyî: Min hebûm (Dema Borî)

Min hem (Niha)

Min debim (Dema bê)

### 3.3.3 Di Rola Cîgira Kirdeyê de:

Cînavkên kesê serbixwe di K. Jêrîn de dişên rola cîgira kirde bibînin di hevokê lêkerên tebatî de. Bo dema borî û neborî.

Pêngava guhirîna hevoka lebatî ji bo tebatî di K. Jêrîn de:<sup>188</sup>

- 1- kirde û cînavkên pêve yên kirdeyê di hevokê de davêjîn derve,
- 2- Cihê kirdeyê bi bireserê tê girtin.
- 3- Rayeka dema borî ya radarê têgirtin.
- 4- qertafa nediyarî "r" a lêkera tebatî bi rayeka dema borî pêve dinivîsin.
- 5- Piştira qertafa dema borî "a" mirfîma "ê" ji bo dema neborî pêve dinivîsin.
- 6- Qertafên deman"de, ew...e/û..e, bû..." mîna xwe tînin nivîsin:
- 7- Li gor kes û hejmara bireserê cînavkên pêve, bi dawiya lêkerê tînin pêvenivîsin:
- 8- Her kerese yeka din ger hebû wek xwe tînin nivîsin:

Ger hevoka "Min êwem bînîbû" bikin bi hevokerê lêker tebatî:

<sup>188</sup> Ji bo wan pêngavan jî em mefa girtiya ji:

A- Wîrya Umer Emîn, "*Ristey Biker Nadiyr*", R. 34.

B- Fereydun Abdul Berzincî, "*Nadiyarî*", Berêweberatî Çap û Billawkirdinewey Silêmanî, Çapxaney Roman, Silêmanî, 2008, R. 96.

C- Ebdulwahîd muşîr dizey, "*Rêzmanî Kurdî*", R. 208.

- 1- Kirde "min" ew tê avêtin di gel cînavka pêveya "m" a dawiya "êwe" ji ber ku ji bo kirde dizivirête ve.
- 2- "êwe" ji ber ku bireser e, tê destpêkê.
- 3- Rayeka dema borî vê lekerê "bîn" e.
- 4- Qertafa nadiyarî pêve tê nivîsîn, dibe "bînra"
- 5- Qertafa dema borî "a", pêve tê nivîsin, dibe "bînra"
- 6- Lêkera di çîrokiya dema boriya têdayî de ye û qerafa wê jî "bû" ye. Ev jî tê pêve nivîsin û dibe "bînra bû".
- 7- Bireser ji ber ku di kesê duyem a pirjimar daye. lêker jî cînavkên kesê duyem a pirjimar digire û dibe "bînra bûn"
- 8- Di vê hevokê de tu kerseyên dî tune ye, ta ku em binivîsin

Wê demê hevok dibe : Êwe bînra bûn.

### 3.3.4 Di Rola Bireserê:

Cînavkên kesê yên serbixwe ya K. Jêrîn dikarin rola bireser bibînin di hevokê de wate dikarin bibin bi bireser. di dema borî û neborî di bibin bireser. Ya giring tenê lêker gerguhêz be. Mînak:

Azad minî bînî : nebînî (D. B. Têdayî)

Azad minî bînîbû. : nebînîbû (Ç.D.B. Têdayî)

Azad minî bînîwe : nebînîwe (D.B. Dudar)

Azad minî debînî : nedebînî (D.B. Berdest)

Azad min debînêt. : nabînêt (D. Neborî)

### 3.3.5 Di Rola Têrkerê de:

Cînavkên kesê serbixwe di K. Jêrîn de. Di hemû dem û cureyên lêkerên wate di dema borî û neborî û bi lêkerên gerguhêz û negerguhêz re, ew cînavk bi alîkariya daçekan dikarin bibine têrker. Daçekên serbixwe ya bingehî ya K. Jêrîn ev in: "be,

bo,le" ku awayên wan a serbixwe ku bi paşgir re hatine sazkirin hene û dû cur awayên pêvebestî jî hene.<sup>189</sup> binêre:

Awayên bincî	Awayên serbixwe bi paşgir	Awayên pêvebestî yekem	Awayên pêvebestî duyem
Bo	Bo..., bo...bo...	-----	-----
Be	Be.../...e, be...de, be...ewe	Pê..., pê...de Pê....ewe	-----
Le	Le..., le...de, le..we. Le..ewe...ta	Lê...,lê...da, lê...ewe	Tê....., tê... de, tê...ewe

Xiştaya (3 - 25)

Di K. Jêrîn de cînavkên serbixwe tenê dikarin piştî daçekên awayên bincî û awayên serbixwe bi paşgiran ra bên. Wê demê ev cînavik rola têrker bibinin.

Azad namekey da be min.

Azad kitêbekeyî bo min dehênêt.

Tiştêkî balkêş ev e gavê daçeka "be" piştê lêkeran hat dişêt forma bibe awayê pêvebestî, wate bi awayê "e" tê derketin û bi dawiya lêkerê ve tê nivisin. cînavkên serbixwe piştê daçeka "e" tên û rola têrker dibinin. Mînak:

Nameke dedem be to.

Nameke dedeme to.

### 3.3.6 Di Rola Raveberê de:

Dema cînavkên kesê serbixwe di hevokê de dikarin rola "sereya firêz" bibînin. Wê demê dişêt "sereya firêz a cînavk, bi ravekeran li pêş û paş re bê ravekirin"<sup>190</sup>,bi

<sup>189</sup> Mefa hatiye girtin ji:

A- 'Ebdulwahîd Muşîr Dizeyî, "Rêzmanî Kurdî", RR.76-75.

B- Şêrko Baban, "Ristesazî û Şîtelkarî Zanstî, R. 59.

<sup>190</sup> Umêd Berzan Bizro, "Dirûstey Firêz û Riste le Zimanî Kurdîde", R. 34.

wateyeka din dema cînavkên serbixwe ye K. Jêrîn rola hevoksazî dibînin wê demê dişê li pêş û paş ve û bê ravekirin. Di K. Jêrîn tenê yek veqetandek heye ku ji bilî navdêrên nêr û mê û nêter jî tê ku di lêkolînên K. Jêrîn jê ra dibên "Amrazî xistineser" ev amraz jî tîpa "î,y" ne. Ger veqetandek bi dawiya wê morfîmî ku pêve tê nivîsin dengdar bû wê demê veqetandeka"î" tê bikar anin. Ger ku dengdêr jî bu wê demê tîpa "y" tê bikar anin. Ger ku raveker cînavka nadiyar be û li pêşiya raveber be, wê demê pêtivî bi veqetandek tune ye.

- Gavê raveber li pêşiya raveker be, bi dû awayî tê derketin:

❖ Yek pêtivî bi veqetandek tune ye.

Gavê raveker cînavka nadiyar be, li pêşiya raveber be; wê demê pêtivî bi veqetandek tune ye.

(Raveker + Cînavka Serbixwe(Raveber))

- Hemûewan hatin.
- Hermin hatim.

❖ Dudu gavê raveber û pêşiya raveker bê ger raveker hejmar be pêtivî bi veqetandek heye:

(Raveker + Veqetandek (y) + Cînavka Serbixwe (raveber))

Nîwey ewan hatin.

- Gavê raveber cînavkên serbixwe be di K. Jêrîn, pêşiya raveker bê; wê demê hertim pêtivî be veqetandek heye:

(Cînavka Serbixwe(Raveber) + Veqetandek(y/î) + Raveker)

A- Dişê raveker navdêr be: Êmey kurd bo azadî xebat dekeyin.

B- Dişê raveker rengdêr be: Êmey qurbeser bo azadî xebat dikeyin.

C- Dişê raveker hejmar be: Minî yekem xelat kiram.

Dibê em ji bîr nekin cînavkên kesê serbixwe awayekî awarteyan hene. Ku dişên Qertava nebinavkirî (Amirazî nenasrîwî/ Morfîmî Nenasrawî) bigirin. Her çiqas cînavkên serbixwe bi xwe dihindura xwe de binavkirîne lê dişên morfîma nebinavkirî "êk" bigirin, di gel "amrazî Xistineser(veqetandek)" a "î" bi rveker û raveber bi hev girê bidin, cînavkên serbixwe rola raveber bibinin û raveker jî hertim rengdêr e.

Minêkî damu , Minêkî bêkes

Cînavkên kesê serbixwe gavê dibin raveber wê demê dikarin bi ravekeran ra hemû erkên hevoksazî ya navdêran bibin:

1- Kirde: Cînavkên kesê serbixwe di rola raveber de dişên bibine kirde, ger raveker pêşiya raveber bê an li paşiya raveberê bê, her wisa di hemû cureya lêkeran û demên lêkeran jî de:

Her min hatim. (/hatbûm/ harûme/dehatim.)

Êmey xwêndekar xebat dekeyn.

Minêkî damu hatim.

2- Nîhad: Demê pêveber nîv lêker be, cînavkên kesî yê serbixwe dişên rola raveber bibinin û bi ravekerê re rola nîhad bibinin.

- Bûna bingehî Her min mamosta bûm.
- Bûna guhraw: Her min bûm be mamosta.
- Bûna heyî: Her min hem.

3- Cîgirê kirde: Cînavkên serbixwe gavê dibin raveber bi ravekerê ra, di lêkerên tebetî de dişên rola cîgirê kirde bibinin.

Her ewan dekujirên.

Êmeyî kurd enfal kirayn.

Minêkî damau dekujirên

4- Bireser: Di lêkerên gerguhêz de ev cînavk gavê dibin raveber bi ravekerê ra rola bireserê bibinin.

Ewan her ême debînin.

Ewan êmey kurd baş denasin.

5- Têrker: Cînavkên kesê serbixwe dişên bi bin raveber û bi ravekerê ra rola têrker bibînin.

Gava raveker piştê raveber tê, wê demê daçek berî wan tê :

Ewan le êmey kurd detirisin.

Ewan be minêkî damaû dewêrin.

Di rola têrker de, gava veqetandek tune, raveker beriya raveberê tê wê demê jî daçek dinavberê wan tê. Wate wisa lêtê:

(Raveker + Daçek +cînavkên kesî(raveber)

Ewan her le ême detirisin.

### 3.3.7 Di Rola Ravekerê de:

Cînavkên kesê serbixwe di K. Jêrîn de bi alîkariya veqetandeka "y,î" dibin bi raveker; "ger ku tîpa "y,î" dinav berê navdêrek û cînavka serbixwe yan naveka din hat ji bilî vê yekê ku navdêr û cînavk bi hev re girê dide, dibe morfîma xwedanî, wate cînavka serbixwe dibe xwedanî navdêr."<sup>191</sup> wate bi rêka tîpa "y,î\*", cînavk yek wateya xwedanî dighenêt, didu jî cînavk dibe ravekera navdêrê: Mînak:

Kitêbî min

Li vir cînavka "min" buya ravekera "kitêb" bi rêka tîpa "î" her wisa "min" bûye xwedana "kitêb".

---

<sup>191</sup> 'Ebdula Husên Resul, "Çend Basêkî Wirdî Zimanewanî – Kurdî", R. 316.

\* Her wek me berî got ev di K. Jêrîn de jê ra dibên "amirazî xistineser" lê di K.Jorîn de dibê veqetandek, ev veqetandek jî zayend û mêjera wê tune ye wate nêtere bi navdêrên nêr û mê û yekjmar û pirjmar ra tê. Ger veqetandek bi dawiya wê morfîmî ku pêve tê nivîsin dengdar bû wê demê veqetandeka"î" tê bi kar anin, ger ku dengdêr jî be wê demê "y" tê bikaranin.

Her wisa hertim navdêra raveber tê pêşiya raveker û veqetandek jî tê navenda wan\*.  
Bi vê awayê jêr

(Raveber + Veqetandek"y,î" + Raveker)

Kitêb + î + min → kitêbî min

Her wisa di hevokê de ger cînavka serbixwe rola raveker dît dişê bibe ravekerê van beşên jêr:

1- Kirde : cînavkên serbixwe bi alfkariya veqetandeka "y,î" dişên bibin ravekera kirde ya lêker dema borî û neborî gerguhêz û negerguhêz. Mînak:

Malekey min suta. /sutawe/ desut/ sutabû. (D. Borî)

Kurî min dehat. (D. Niiha)

2- Nîhad: cînavkên serbixwe dişên bibne ravekera nîhad, ger ku nîhad bi awyê serbixwe di hevokê de hebe.

Kurî min zîreke.

3- Bireser: cînavkên serbixwe dişên bibine ravekera bireser, ger ku lêker gerguhêz be.

Min bawkî to dibînim

Min bawkî tom bînî.

4- Têrker: cînavkên serbixwe dişên bibne ravekera têrker. Gavê li piştê daçeka tên. Di lêkerên dema borî û nebor, gerguhêz û negeruhêz de: mînak:

Min be yarmetî êwe serdekewim.

---

\*li hin devokên K. Jêrîn tîpa "y,î" naye bilêvkirin mîna devoka "Sineyî" de dibên:

Piyag aza.

Mal êwe.

ji bo agahên zêdetir binêre:

Ruxzade Elî, "*Rêzmana Kurdî Soranî*", R. 109.

Her wisa devoka germiyan û gelek devokên dî ev veqetandek naye bilêvkirin . mînak dibên:

Mal azad.

Mal to.

Min be qelemî to wane dexwênim.

5- Cîgira kirde. Di hevokên lêkera tebatî de. Dişê cînavkên kesê serbixwe bibîne ravekera cîgira kirde.

Kitêbekey min sutêndira.

Kitêbekey min desutêndira.

### **3.4 Şîroveya Rêkeftinê di HerDu Zaraveyan de:**

#### **3.4.1 Şîroveya Rêkeftinê:**

Rêkeftin, fenomena rêzmanê ye ku di nav sînora hevokê de, keresekekê bi kereseke din ve girê dide. Ger ku têkeliyên rêzimanî di nav wan de hebe<sup>192</sup>. Di her zimanekî jî de du cureyên rêkeftinê hene yekem rêkeftina ji aliyê xwiyanga rêzimanî yê mîna "hejmar, kes, zayend, ekusatîvus". Duyem jî rêkeftina wateyî ye ku bi wateya rêkeftina kereseyên hevoksazî ji aliyê wate ve tê<sup>193</sup>.

#### ❖ Rêkeftinên xwiyanga rêzimanî

##### 1- Hejmar:

Ji aliyê hejmaran ve wateya vê tiştî, yekjimar e. Yan jî pirjimar e. Wek tê zanin jî di zimanê kurdî de pirjimar ji hejmara du ve destpê dike, wate her tiştî du be yan zêdetir be wê demê pirjimar e. Gava yek be yekjimar. Cînavkên kesî jî nîv yekjimar in û nîv jî pirjimar in.

##### 2- Kes:

Ev mijar jî yek alî ve têkiliya wê bi cînavkê re ye. Nemaze cînavkên kesî ku me berî şîrove kiriye û dibine sê kes; Kesê yekem, duyem û siyem in

##### 3- Mêjer

Di hemû zimanan de zayend heye. Di hin zimanin de tenê zayenda siruştî heye, ji mirov û ajalên hin nêr in hin jî mê ne. Mînak :

<sup>192</sup> Trask.R.L. "A dictionary of Grammatical Terms in Linguistics", Great Britain, Routledge, 1993, R. 12.

<sup>193</sup> Vîyan Slêmab Hacî Slêvaneyî, "Rêkewtin le Şêwey Jûrûy Zimanî Kurdîde", R. 26.



Zayenda mê: jin, xesû, mirîşik, meh....

Zayenda nêr: mêt, xezûr, keleşêr, nêrî...

Cureyêke dinê zayendê heye ku zayenda rêzimanî dibên; ev cur e di K. jêrîn de tune ye. Wateya zayenda peyvê di rêzimanê de ne diyare an bê zayend û nêter e. Lêbelê di K. Jorîn de her bêjeyêke yekjimar xwedan zayend e. Ger pirjimar jî be dibe nêter, zayend di rêzimana K. Jorîn de; *"bi xêra hin nişaneyan tê naskirin ku ew jî qertafên veqetandek û tewangê ne."*<sup>194</sup> Ger ku di xwezayê de zayenda wê hebe. Di rêzimanê de jî li gor wê tê diyarkirin. Ger ew peyv di xwezayê de wê zayend be jî lê di rêzimana K. Jorîn de zayenda wê tê diyarkirin. Mînak *"di ravekê de, bêjeya yekem qertafê veqetandekê digire û ya duyem jî qertafa tewangê digire"*<sup>195</sup>. mînak: 'bavê leylayê' paşgira "-ê" ku piştê bêjeya "bav" hatiye. Qertafê veqetandekê, nêrtiya "bav" nişan dide, paşgira "-ê" jî ku piştê "leyla"\* hatiye. Tewangê, mêtîya bêjeya "leyla" nişan dide. Em ê vê taybetiya zimanê kurdî li vê xîştêya jêrîn li ser hin mînakên şîrove bikin.<sup>196</sup>

Qertafên veqetandek û tewangê			Mînak			
			Mêza		Nêrza	
			Bêje	Di ravekê de	Bêje	Di ravekê de
Veq etan Dek	Bina	-a → mêt	mal	mala min	Xanî	xaniyê me
	v	-ê → nêr	gul	gula sor	ap	Apê azadî
	Kirî	-ên → nêter	ap	apên min	met	Metên min
	Nebi	-eke → mêt	keç	keçeke te	Derî	deriyekî mezin
	nav	-ekî → nêr	dar	dareke guzê	cil	cilekî binî
	Kirî	-ine → nêter	cil	ciline binî	dar	darine guzê
Tew ang	Bina	-î → mêt	guz	Dara guzê	ser	kaxizê serî
	v	-ê → nêr	dar	pelên darê	bin	Cilê binî
	Kirî	-an → nêter	der	kilîla deran	guz	Dara guzan

<sup>194</sup> Samur Azîz, "Kurdiya Kurmancî", R. 72.

<sup>195</sup> Heman Jêder. R. 72.

\* Tîpa "y" navberê peyva "leyla" û paşgira "-ê" tîpa kelejandinê ye. ji ber ku di zimanê kurdî di du dengdêr li du hev nayan hin caran tîpên kelejandinê ten peyda bûn.

<sup>196</sup> ji bo çêkirina xîştêya jor mefabinye:

Heman Jêder, R. 72.

	Nebi	-ekê →mê	gor	axa gorekê	derî	kilîla derekî
	nav	-ekî →nêr	prtûk	nivîsa pirtûekê	xanî	dara xaniyekî
	Kirî	-inan →nêter	xanî	Dara xaninan	gor	axa gorinan

Xiştaya (3 - 26)

Bila em ji bîr nekin û şaş jî fêm nekin ger li van mînakên jor binêrin hemû di awayê ravekê dane. Raste qertafên veqetandekê tenê di awayê ravekan de tîn. Her wisa di lêkerên gerguhêz de, di dema niha û bê de bireser tê tewandin, di dema borî de kirde tê tewandin. Her wisa navdêra piştî daçekan jî qertafa tewandî digire. Tewang tabetiyêke di hin ziman de, di hevokê de awayeka taybet dide bi peyv ku di K. Jêrîn jê ra dibên "Dox", bi wate ya "accusativus" latîni tî. Mînak jî di zimanê erebî de ger ku navdêr di rola fa'îl de be, merfu' di be, ku ev nîşan jê ra dibên "zeme" ger ku navdêr, meful be di rola mefulî de nîşaneyeka digire, jê ra dibên "fethe."<sup>197</sup>

❖ Rêkeftina wateyî:

Me got duyem rêkeftin, rêkeftina wateyî ye ku bi wateya rêkeftina kereseşên an meteralên hevoksazî ji aliyê wateyê ve tê ku ev rêkeftin di hemû zimanan de mîna hev in û dibe rêkeftina watuyî hebe.

Mînak di van hevokên jêrîn de di hevoka "1" de rêkeftina rêzimanî û watuhî heye lê di hevoka "2" de her çiqas rêkeftina rêzimanî heye lê rêkeftina wateyî tune ye. Di hevoka "3" de jî rêkeftina wateyî heye lê ya rêzimanî tune ye, ji ber wê tenê hevoka "1" dirûste.

1- Ez hatim

ez ——— hatim

ez ——— hat

$\lfloor [+1.yek.] \quad [+1.yek.] \rfloor \lfloor [+ giyan,] \quad [+ giyan.] \rfloor$

rêkeftina kes û hejmar

rêkeftina wateyî



<sup>197</sup> Wirya Umer Emîn, "Rêkkewtin le Zimande", Govarî Roşinbîrî niwê, Jimare 92, Bexda, 1982. RR. 16-17.

2- Ew dar hat

Dare ————— hat

dar ————— ha

⌊ [+1.yek.] [+1.yek.] ⌋ ⌊ [- giyan.] [+ giyan.] ⌋



rêkeftina kes û hejmar

Rêkeftina Wateyî tune ye

3- Azad û Birwa hat

Azad û Birwa ————— hatin

Azad û Birwa ————— hatin

⌊ [+3 pir.] [+3 yek.] ⌋ ⌊ [+ giyan.] [+ giyan.] ⌋



rêkeftina rêzmanî tune ye.

rêkeftina wateyî heye.

Her wek tê zanin rêkeftina wateyî di hemû zimanan de heye. Li vir ne mijarê me ye lê rêkeftina rêzmanî li gor ziman û zaraveyan tê guhertin. Ji ber wê em tenê behsa rêkeftina rêzmanî dikin û di nav rêzman de jî em tenê behsa rola cînavkên kesî yên serbixwe û pêve di rola rêkeftinê de dikin.


### 3.4.2 Rola Rêkeftinadi K. Jorîn de:

Di K. Jorîn de du cureyên rêkeftinên bingehîn ya cînavkên kesî hene. Yekem rêkeftina kirde û pêveberê didu jî rêkeftina bireser û pêveberê ye. Ev jî peywendiya bi cureyên lêkeran gerguhêz û negerguhêz dema lêkeran (borî, niha û bê) ve heye. Wate ger ku lêkera hevokê gerguhêz be û di dema borî de be. Rêkeftin di navbera bireser û pêveberê dibe lê li hemû awayên din (hevoka lêkera gerguhêz a dema neborî, negerguhêza dema borî û neborî) rêkeftin di navbera kirde û pêveberê de dibe.<sup>198</sup> Ji bo agahîyên zêdetir binêre wêneya jêr<sup>199</sup>

hevok

<sup>198</sup> Veguhastin, Jardine, R.f., 1992, R. 40-41.

<sup>199</sup> Wiriya Umer Emîn, 'Peywendî Ranaw û Firman le Kirmancîyê Jûrûda', Govarî Karwan – Emîndarêti giştî bo roşinbîrî û lawan jimare 2, Hewlêr, 1983, R. 41.



### 1- Cînavkên Desteya Tewardî:

Cînavkên desteya tewardî ne ji aliyê kes û ne hejmarî û ne zayendî ve hîç nikarin di gel kerese-yên din yên hevokê rola rêkeftinê bibînin. Divê ji bîr nekin dema cînavkên tewardî rola raveker dibînin wê demê jî neşên rola rêkeftin bibînin. di gel ravekerê ji ber ku *"Ger ku awayê teşeya wan hin caran mîna hev be, ew cureyên mîna hev nabe rêkeftin."*<sup>200</sup> ji ber ku li zaraveya jorîn a zimanê kurdî de rengdêr, cînavkên veşerok û cînavkên kesê desteya tewardî teşeya wan neguherbare û teşeyeka wan a taybet bi xwe heye. Dibine raveker û di awayê tewardî de. bi tu awayî nakevine bin bandoriya revberên xwe. Ne ji aliyê hejmar û ne ji aliyê zayend ve di gel wan rêknakevin û hertim awayên xwe tên parastin.<sup>201</sup> Mînak:

- Bawerê me

- Leşkirê wan

Bawerê me  
 $\left[ \begin{array}{l} +yek. \\ +nêr \end{array} \right] \left[ \begin{array}{l} +yek. \\ +nêr \end{array} \right] +yek +pir. \downarrow$

leşkirekê wan  
 $\left[ \begin{array}{l} \\ +nêr \end{array} \right] \left[ \begin{array}{l} \\ \end{array} \right]$

- Kiça min

- Diya min

\* Di K. Jorîn de tenê "hejmar û cînavkên nebenavkirî". Gavê dibin raveker dişên li hin awayan de bi ravekeran ra rola rêkeftin bibinin Ji aliyê hejmar û zayend. ji ber ku awayê wan guhrêbar e Hemû nevroz

Ez bajêra xwe nadem bi dehbexdayan.

Vîyan Silêman Hacî Slêvaneyî, 2001, R. 34.

<sup>200</sup> Vîyan Silêman Hacî Slêvaneyî, "Rêkewtin le Şewey Jûrûy Zimanî Kurdîde", R. 33.

<sup>201</sup> Heman jêder, R.32

kiça	min		diya	wan
⌊ +yek. ⌋	⌊ +yek. ⌋	⌊ + yek. + pir. ⌋	⌊ ⌋	⌊ ⌋
⌊ +mê ⌋			⌊ + mê ⌋	

- Kiçên min

- Kurên wan

Kiçên	min		kurên	wan
⌊ +pir. ⌋	⌊ yek. ⌋	⌊ + pir. + pir. ⌋	⌊ ⌋	⌊ ⌋

Ger ku em li van mînakên jor binêrin dibînin hin çaran rêkeftin di navbera raveker û raveber de heye. Ev rêkeftina nabe rêkeftna rêzimanî, tenê ji aliyê teşê ve mîna hevîn.

## 2- Cînavkên Kesî yên Serbixwe Desteya Xwerû – yên Pêve:

Cînavkên desteya xwerû û cînavkên desteya pêve her erkek bibînin her duyan ji aliyê kes û hejmar rêkdikevin ji ber ku cînavkên desteya pêve hertim bi dawiya lêker ve tînin nivîsin. Ji ber wê "*cînavkên desteya xwerû di hevokê de her erkek û roleka wan hebe; kirde an bireser xwiyanga wan a kesî û hejmar bi awayê teşeya pêvebestî bi ser lêker de tînin sepandin, ji ber wê bi desteya rêkeftin tînin binavkirin*"<sup>202</sup>. bi wateyeka din dikarin bêjin ji ber ku cînavkên desteya pêve bi lêker ve tînin nivîsin, lêker jî her tim digel desteya cînavkên xwerû li aliyê kes û hejmar rêkdikevin, wate ger desteya duyem rola kirdeyê bibine pêveber di gel kirdeyê rêkdikeve ger ku rola bireserê bibine pêveber digel lêkerê rêkdikeve.<sup>203</sup>

### 1- Rêkeftina Bireser û Pêveberê:

Di K. Jorîn de di dema borî de ger lêker gerguhêz be. Rêkeftin di navbera bireser û pêveberê de dibe.<sup>204</sup> Wate ger ku lêkera hevokê di dema borî de be û gerguhêz be jî. Wê demê bireser û pêveber di yek kes û hejmarê de dibin, yan bi wateyeka din

<sup>202</sup> Heman Jêder, R. 33

<sup>203</sup> Wirya Umer Emîn, "*Rêzimanî Ranaw Le kirmancî, Jûrûde*", Govarî Korî Zaniyarî Êraq – Destey Kurd, Jimare "21", Bexda, 1990, RR.256- 257.

<sup>204</sup> Wirya Umer Emîn, "*Rêkewtin le Zimande*", Govarî Roşinbîrî niwê, Jimare "92", Bexda, R. 18.

bireser di kîjan kes û hejmarê de be, lêker jî di heman kes û hejmarê cînavkê digire.  
Mînak

Min hûn dîtî.

Bireser "hûn" e di kesê duyema pirjimarê de ye. Ji ber wê lêker jî li gor kesê duyem a pirjimar hatiye kişandin, bi rêka cînavkên kesê pêve.

#### 1- Rêkeftina Kirde û Pêveberê:

Di K. Jorîn de piranî caran rêkeftin di navbera kirde û pêveberê de ye. Ji ber ku di gelek awayan de pêveber di heman kes û hejmarê kirdeyê de cînavkên kesê pêve digire:

Ger ku lêker gerguhêz be, di dema niha û bê da be<sup>\*</sup>. Rêkeftin di navbera kirde û pêveberê da dibe ji aliyê kes û hejmar ve. mînak

Ez pirtûkê dixwenim. (D. Niha)

Ez dê pirtûkan bixwene. (D. Bê)

Kirde di kesê yekem a yekjimar de ye. Pêveber jî cînavkên kesê pêve ji bo kesê yekem a yekjimar girtiye. Ji ber wê rêkeftin di navbera kirde û pêveberê de ye.

1. Ger ku lêker negerguhêz be, di dema "Borî, bê û niha" de be kirde û pêveber li gor kes û hejmarê rêkdikevin. mînak

Azad û Bawer hatin. (D. Borî)

Adaz û bawer tîn. (D. Niha)

Azad û bawer dê bên. (D. Bê)

Kirdeya van hevokên jorê ya hemûyan di kesê siyem a pirjimar de ye. Ji ber wê lêker jî li gor kesê pirjimar a siyemîn hatiye kişandin, ev jî bi rêka cînavkên kesê pêve ye. Ji ber wê rêkeftin di navbera kirde û pêveberê de ye.

#### 2. Raweya Fermanî:

---

\*jibilî lêkera "viyan". Ji ber ku lêkerekê awerte ye.

Wek tê zanin cînavkên desteya xwerû rola kirdeyê dibînin. Di raweya fermanî a awayên gerguhêz û negerguhêz de, cînavkên kesê pêve jî bi lêker ve tên nivîsin. Li gor kes û hejmara kirdeyê. Ji ber wê em dikarin bêjin di raweye fermanî de kirde û pêveber rêkdikevin ji aliyê kes û hejmarê ve. mînak

Tu azad bişo. (Ger.)

Tu were. (Neger.)

Di her du hevokan de kirde di kesê yekjimar a duyemîn de ye. Lêkera pêveberê jî li gor kesê yekjimar a duyemîn bi rêka cînavkên kesê pêve hatiye kişandin. Ji ber wê rêkeftin di navbera kirde û pêveberê de ye.

## 2- Rêkeftina Nîhad û guzareyê

Ger ku lêkera hevokê nîv lêker be wateya rayeka lêkerê "bûn" a negerguhêz be, rêkeftin di navbera nîhad û guzareyê dibe li hemû awayî û cureyên lêkera bûnê de:

A. bûna bingehî : Ez mamosta bûm.

B. bûna guhraw: Ez bûm mamosta.

C. bûna heyî : Ez hebûm.

Ger em li hemû awayên nîv lêkera bûn û hebûnê binêrîn, dibînin ger ku nîhad di kîjan kes û hejmarê de be lêkera bûn û hebûnê jî di heman kes û hejmarê de cînavkên kesê pêve girtine. Ji ber wê dikarin bêjin rêkeftin di navbera nîhad û guzareyê de ye.

## 3- Rêkeftina Cîgira Kirdeyê û Lêkera Alîkar a Tebatî.

Di awayê hevokên lêker tebatî de cîgira kirdeyê di kîjan kes û hejmarê de be, lêkera alîkar "hatin" jî di heman kes û hejmar de dibe. Wek tê zanin di awayê lêkera tebatî de an jî ji bo çêkirina hevoka lêkera tebatî di K. Jorîn mefa ji lêkera alîkar "hatin" tê girtin.

Em hatine firotin. (D. Borî)


Em dihêne firotin. (D. Niha)

Em dê bihêne firotin. (D. Bê)

ger em li mînakên jor binêrin tê zanîn" em" cîgira kirdeyê ye. Di kesê yekem a yekjimar de ye, ji ber wê lêkera alîkar jî heman kes û hejmar girtiye di hemû deman de. Ji ber wê em dikarin bêjin di hevokên lêker tebatî de rêkeftin di navbera cîgira kirde û lêkera alîkarî de ye.

### 3.4.3 Rola Rêkeftina di K. Jêrîn de:

Her weke tê zanin rêkeftina rêzimanî, wateya rêkeftina kerseyên hevokê, ji aliyê "hejmar, kes û zayend", her wisa tê zanin jî zayenda rêzimanî di K. Jêrîn de tune ye, wê gavê tenê rêkeftina "hejmar û kes" dimîne. Pêwendiya her duyan jî yek alî bi cînavkên kesê pêve ye. Wateya cînavkên kesê pêve roleka girîng dibînin li rêkeftina kerseyên nav hevokê. Divê em bizanin jî di K. Jêrîn de, du rêkeftinên bingehîn hene, rêkeftina kirde û bireserê ger ku lêkera gerguhêz di dema borî de be. Rêkeftina din; rêkeftina kirde û pêveberê ye. Ger ku lêkera negerguhêz di dema borî de be, her wisa lêkera gerguhêz û negerguhêz di dema neborî de an di raweya fermanî da. Ev rêkeftin jî bi rêka cînavkên kesê serbixwe û pêve dibe, yê roleke xurt dibînin di rêkeftina kerseyên hevokê cînavkên desteya pêve ye bihêz û bêhêz in. Ji ber ku cînavkên pêve li gor kirdeyê tên kişandin, Ger wateya kirdeyê cînavkên serbixwe be yan navdêr be di çî kes û hejmar de be. Cînavkên kesê pêve jî li gorî wê bi bireser an lêkerê ve tên nivîsin. Ji bo agahên zêdetir binêre wêneya jêr:



Cureyên Rêkeftinê ya K. Jêrîn:

- 1- Rêkeftina Kirde û Bireserê:



Ger ku lêkera hevokê di dema borî de be û gerguhêz jî be wê demê rêkeftin di navbera kirde û bireserê de dibe.<sup>205</sup> Ger ku watey kirdeyê yekjimar be bireser jî yekjimar dibe, ger ku pirjimar jî be bireser jî pirjimar dibe. Mînak ger ku kirde ji bo kesê yekem be bi heman awayî bireser jî dibe ji bo kesê yekem, ji bo kesê duyem û siyemjî her wisa ye. Wê demê jî destê cînavkên kesê pêve desteya bihêz wê rolê dibînin. Wek tê zanîn û me berî jî gotibû desteya bihêz di dema boriya lêkerên gerguhêz rola bireserê dibînin û li gor hebûna kerese yên hevokê cihê xwe diguherin lê guherîna cihê wan tu bandorî ji rêkeftinê nake. mînak

Dara merikanî awda.

Ger ku em li kirdeya vê hevoka jor binêrin, xuya ye ji bo kesa yekjimar a siyemîn bi heman awayî bireser jî di kesa yekjimar a siyemîn de ye. Ji ber wê rêkeftin di navbera kirde û bireserê de heye.

## 2- Rêkeftina Kirde û Pêveberê:

Ger ku lêkera hevokê gerguhêz bû û di dema borî de be, yan jî gerguhêz û negerguhêz be û di dema neborî de be, yan jî di lêker raweya fermanî de be wê demê rêkeftin di navbera kirde û pêveberê de dibe. Wate "*kirde di çi kes û hejmar de be, lêker jî bi heman kes û hejmar tê kişandin.*"<sup>206</sup> Her wisa ev erk jî ji aliyê cînavkên kesê yê pêve desteya bêhêz tê dîtin. Mînak:

A- Dema Boriya Gerguhêz: Azad û Ehmed hatin.

B- Dema Neborîya Gerguhêz: Ême wane dexwênîn.

C- Dema Neboriya Negerguhêz: Min dehatim.

Ger ku em li van mînakên jor binêrin tê xuyakirin di hevoka "A" de kirde di kesê yekjimar a siyemîn de ye û lêker jî li gorî heman kes û hejmarê hatiye kişandin. Her wisa di hevoka "B" de, kirde di kesê yekem a pirjimar de ye. Lêker jî li gorî kesê pirjimar a duyemîn hatiye kişandin. Di hevoka "C" jî de bi heman awayî kirde û lêker her du di kesê yekjimar a yekemîn de hetine kişandin.

<sup>205</sup> Wiriya Umer Emîn, "Rêkewtin le Ziman de", R.1 7.

<sup>206</sup> Umêd Berzan Birzo, "Dirustey firêz û riste le zimanî kurdîde"

❖ Raweya fermanî:

A- To wane bixwêne (Ger.)

B- Êwe werin (Neger.)

Kirdeya hevoka "A"ê ji bo kesê yekjimara duyemîn e ku "to" ye, ji ber wê lêker jî li gor kesê yekjimar a duyemîn hatiye kişandin. Her wisa di hevoka "B"ê jî de kirde "êwe" ye. Ji bo kesê pirjimar a duyemîn, ji ber wê lêker jî li gor kesê pirjimara duyemîn hatiye kişandin. Rêkeftin di navbera kirde û pêveber de heye.

D- Rêkeftina Nîhad û Guzareyê

Ger ku lêkera hevokê niv lêker bû wê demê rêkeftin di navbera nîhad û guzareyê dibe ger ku wateya nîhadê di kîjan kes û hejmar da be guzareyê jî di heman kes û hejmarê de dibe. Ev jî bi rêka cînavkên kesê pêve desteya bêhêz dibe: mînak\*

A. Bûna bingehî:Min mamosta bûm,

B. Bûna guhraw:To debî be mamosta.

C. Bûna heyî:Ew heye.

Ger ku em li van mînakên jor binêrin tê xuyakirin nîhad di kîjan kes û hejmarê de be, guzarejî di heman kes û hejmarê de hatiye kişandin. Bi rêka cînavkên desteya bêhêz.

1- Rêkeftina Cîgira Kirde û Pêveberê:

Ger ku pêvebera hevokê lêkera tebatî bû, di dema borî yan neborî de be, pêveber li gorî cîgira kirdeyê cînavkên kesê pêve digire. Wateya cîgira kirdeyê di kîjan kes û hejmarê de be lêker jî li gorî heman kes û hejmarê de tê kişandin. mînak:

A- Xanweke sutêndira (D. Borî)

B- To dekujrêyît (D. Niha)

---

\* ji ber ku heger em ji bo hemû demên cureya lêkera bunê mînakekê bidin lêkolîna me gelek dibe ji ber wê ji bo her derazeka lêkera bunê tenê mînakekî didin

Tê zanin ev lêkera hevokê lêkereke tebatî ye. Cîgira kirdeyê di hevoka "A" de "xanweke" ye. Di kesê yekjimar a siyemîn de ye lêker jî "sutêndira" ye. Li gorî kesê yekjimar a siyemîn hatiye kişandin. Morfîma cînavkên desteya bêhêz ji bo kesê yekjimar a siyemîn di dema borî de dibe "Ø". Di hevoka "A" yê jî de, "to" cîgira kirde ye ji bo kesê yekjimar a duyemîn. Lêker jî di heman kes û hejmar de hatiye kişandin. Wateya rêkeftinê di navbera cîgira kirdeyê û lêkera tebatîya pêveberê de ye.

### **3.5 Berhevxiştina Hevoksazî û Sîstema Rêkeftinê di Cînavkên Serbixwe de:**

#### **3.5.1 Ji aliyê cudahiyê ve:**

❖ Di Rola Hevoksaziya Cînavkên Serbixwe de:

Cînavkên kesî yên xwerû di K. Jorîn de dikarin qertafên binavkirî yan jî veqetandekên binavkirî bigirin. Nikarin yên nebinavkirî bigirin. Wê demê rola raveberê dibînin. Desteya tewandî jî nikarin veqetandek bigirin, rola raveberê dibinin, di K. Jêrîn de cînavkên serbixwedikarin morfîma nenasrawî(nebinavkirî) "êk" bigirin digel veqetandek(Amrazî Xistineser) a "î" jî ku di K. Jêrîn de nêter e, li pey wê tê. Wate bi rêka "-êkî" ve cînavkên kesî yên serbixwe di K. Jêrîn de rolaraveberê dilîzin. Her wisa Cînavkên serbixwe ya K. Jêrîn dikarin rola ravekerê jî bibinin.

❖ Di Rola Rêkeftinê de:

- 1- Di K. Jorîn de rêkeftin di navbera bireser û pêveberê de heye, ger ku lêker di dema boriya gerguhêz da be lêbelê di K. Jêrîn ev cureya rêkeftinê tune ye. Ji bilî vê cureya rêkeftinê rêkeftineke din heye ev jî rêkeftina kirde û bireserê di dema boriya lêkerên gerguhêz de.
- 2- Di K. Jorîn de hevokên lêkerên tebatî de rêkeftin di navbera cîgira kirde û lêkera alîkarê "hatin" de ye. Di K. Jêrîn de lêkera alî kar tune ye û rêkeftina di navbera cîgira kirde û lêkera bingehin de ye.

### 3.5.2 Ji Aliyê Wekheviyê ve:

#### ❖ Di Rola Hevoksaziya Cînavkên Serbixwe

Weke tê zanin û berê jî me gotibû. Cînavkên kesî di K. Jorîn du cure ne; yek xwerû ye dikare tenê di hevokên lêker negerguhêz û dema niha û bêya gerguhêz de rola kirdeyê bibînin. Desteya tewandî jî di hevokên lêkerên gerguhêz a dema borî dikarin rola kirdeyê bilîzin lê desteya serbixwe ya K. Jêrîn di hevokên lêkerên gerguhêz û negerguhêz, dema borî û neborî rola kirdeyê dilîzin. Her wisa cînavkên xwerû yê K. Jorîn di lêkerên gerguhêz a dema borî dikarin rola bireserê bibînin û didema niha û bê jî de desteya tewandî dikarin rola bireserê bibînin, cînavkên serbixwe ya K. Jêrîn di hemû demên lêkerên gerguhêz de dikarin rola bireser bibînin

Di K. Jorîn de cînavkên xwerû dikarin rola nîhad, cîgira kirde û raveberê bibînin, ya tewandî nikarin wan rolan bibînin. Desteya tewandî jî dikarin rola raveker û têkerê bilîzin lê ya xwerû nikarin rola ravekerê bibînin, di K. Jêrîn de destê cînavkên serbixwe dikarin hemû rolan bibînin.

#### ❖ di Rola Rêkeftinê de

Di her du zaraveyan de desteya cînavkên pêve rola rêkeftinê dibînin û tenê du rêkeftinên bingehî jî hene ku cureyekiyên mîna heve ji ber ku di her duyan de rêkeftina di navbera kirde û pêveberê de heye.

- 1- Di her du zaraveyan de di lêkerên negerguhêz de rêkeftin di navbera kirde û pêveberê de heye.
- 2- Di her du zaraveyan de di lêkerên gerguhêz di dema niha û bê ya K. Jorîn û neboriya K. Jêrîn de rêkeftin di navbera kirde û pêveberê de heye.
- 3- Di her du zaraveyan de di raweya fermanî de rêkeftin di navbera kirde û pêveberê de heye.
- 4- Di herdu zaraveyan de rêketin di navbera nîhad û guzareyê de heye.

## 4 ŞÎROVEYA HEVOKSAZIYÊN CÎNAVKÊN PÊVE:

### 4.1 Hevoksaziya Cînavkên Pêve ya (K. Jorîn):

#### 4.1.1 Di Rola Kirdê de:

Di K. Jorîn de gelek caran mirov dema diaxive ji bo hêsanî axivîn û sivikkirin an jî ji bo kurtkirina axivînê, kirde bi awayî serbixwe bilêv nabe. Wê demê jî cînavkên kesî yên pêve rola kirdeyê dibînin û bi dawiya lêkerê ve tên nivîsandin.

##### 4.1.1.1 Bi Lêkerên Dema Borî ya Negerguhêz re:

Ger lêker negerguhêz be û di dema borî de be di hemû demên dema borî de cînavkên "desteya-1" rola kirde dibînin. Di awayê erênî û neyênî de cihê xwe naguhurin. Di dema boriya têdayî û dema boriya berdest yek alî bi rayeka dema boriya lêkerê ve tên nivîsandin. Mînak:

( tu ): Çûyî : Neçûyî ( D.B.Têdaî )

( tu ): Diçûyî : Nediçûyî ( D.B.Berdest )

Lê ger lêker li gor dema boriya dûdar de bê kişandin, cînavkên kesê desteya-1 di rola kirde de diçine navbera qertafa dema boriya dûdar "i...e"\* mînak:

(ez) : Hatime : Nehatime

Ger ku lêker li gor dema boriya dûdar ji bo kesê duyem a yekjimar bê kişandin, teşeya wê dibe "tu hatiyî". Ku beşa duyem a qertafa dema boriya dûdar dikeve, ji bo sivikkirinê.

(Kirde): + (Ra.D.B.Têdayî + Beşa Yekem a Q.D.B.Dûdar + C. + (y) kelejandin + Beşa Duyem a Q.D.B.Dûdar)

---

\* Her çiqas vekolerên berê tenê "e" bi qertafê dema boriya dûdar peyitandine, lê qertafê dema boriya dûdar "i.e" ye. Baştirin delîl jî ku qertafa dema boriya dûdar; ger em lêker li gor kesê siyem a yekjimar bikşênin, di dema boriya dûdar dibe "Ew hatiye." wek tê zanin jî cînavk di kesê siyem a yekjimar de di be morfîma "Ø" wate di lêkera "hatiye" de cînavk dibe morfîma sifrê em bi pirsîn ger tenê ev "e" ya dawî lêkera "hatiye" qertafa dema boriya dûdar be. Her yek ji "i" û "y" dawîya lêkera "hat" çi ne? em dibê ev "i" ye û "e"ye qertafa dema boriya dûdar in û ev "y" navenda herduyan jî tîpa kelejandinê ye, ji ber ku dî tîpên dengdêr li dî hev nayen, pêdiviya wan bi tîpa kelejandinê dibe. Ger ku rayeka lêkerê jî bi tîpeka dengdêr dawî be, wê demê beşa yekemîn qertafê dema boriya dûdar dikeve "i" ye.

(Nîhad): + (hat + i + yî + y + e) → hatiyêye

Xuya ye teşeya wisa "hatiyêye" di ziman de tune ye ji ber wê qertafa beşa duyem(e) dikeve. Gavê "e" dikeve tîpa kelejandinê "y" a duyem jî dikeve wê demê forma lêkerê wîsa lê tê "hatiyî"

Her çend li gor wan çevkaniyên li ber destê me de ne piraniya nivîskarên K. Jorîn wisa difikirin ger ku lêker li gor dema boriya dûdar ji bo kesê duyem a yekjimar bê kişandin, teşeya wê dibe "tu hatiye."<sup>207</sup> Ev bi baweriya me ne rast e. Ji ber ku yek ev teşeya kesê siyem a yekjimar e. Her wisa jî di nav kurmancî axêvên jorîn de tu kes nabê "tu hatiye". Ji ber wê ne rast e. Nivîsîna teşeya kesê duyem bi vî awayî dizivirête ve ji bo wê yekê ku di nav lêkolînên K. Jorîn de şaşiyek heye. Ku ziman li gor rêziman diguhirin û lêkolîn dikin ev jî şaşiya herî mezin e. Ji ber ku dibe lêkolînên rêziman li gor ziman û axivtina axêveranê wê zimanê bê lêkolîn û şîrovekirin. Her wisa em ji bîr nekin ger ku rayeka lêkerê bi tîpeka dengdêr dawî be, beşa yekema qertafa dema boriya dûdar dikeve. Cînavk rastewxwe bi lêkerê ve tê nivîsandin. Mînak:

(Tu): Çûyî : Neçûyî

Ger ku lêker di çîrokiya dema boriya dûdar da be, cînavkên desteya-1 bi qertafên dema boriya dûdar ve tîpên nivîsandin û wate dibe:

(Tu): Hatbûyî : Nehatbûyî.

Ji bo cihên cînavkên kesî yê pêve di hemû demên borî de binêre:<sup>208</sup>

C.	D.B.têdayî	D.B.dûdar	D.B.berdest	Ç.D.B. Têdayî
im	Hatim	hatime	dihatim	hatibûm
î/yî	Hatî	hatiyî	dihatî	hatibûyî
Ø	Hat	hatiye	dihat	hatibû

<sup>207</sup> Binêre:

A- Tan Samî, "Rêzimana Kurmancî", R. 269.

B- Ocak Nezir, "Waneyên Rêzimana Kurmancî", R. 224.

<sup>208</sup> Me bo çêkirina wê xiştaya jor û cihê wan cînavak di dema borî ya negerguhêz mefa girtiye ji: Onen Ronayî û Tan Samî, "Hînkê- Kurmancî, Asta duyemîn", R. 127.

in/n	Hatin	hatine	hatin	hatibûn
in/n	Hatin	hatine	hatin	hatibûn
in/n	Hatin	hatine	hatin	hatibûn

Xiştaya (4 - 27 )

#### 4.1.1.2 *bi Dema Niha û Bê re:*

Heger lêkera hevokê di dema niha û bê de be, gergguhêz be an negerguhêz be, di awayê erênî de be an nerênî de be, cînavkên kesî yên pêve desteya-2 rola kirde dibînin û bi dawiya lêkerê ve tên nivîsandin. Cihê xwe naguhirin.

(Tu): Diçî.

(D. Niha, Neger.)

(Tu): Pirtûkê dixwenî.

(D. Niha, Ger.)

Dema bê:(Tu): Dê biçî.

(D. Bê, Neger.)

(Tu): Dê pirtûkê bixwenî.

(D. Bê, Ger.)

#### 4.1.1.3 *Bi Raweya Fermanî ra:*

Heger ku lêkera haevokê di raweya fermanî de be, lêker gerguhêz be an negerguhêz be, erênî be an nerênî be, cînavkên kesî pêve desteya-4 rola kirde dibînin û bi dawiya lêkerê ve tên nivîsandin. Cihê xwe jî naguhirin. Mînak:

(Q. Raweya Fermanî + Ra.D. Niha + C. Desteya-4)

Bi + ç + e → biçe : neçe

Her wek tê zanin jî raweya fermanî tenê li gor kesê duyem a yekjimar û pirjimar tê kişandin. Ger ku rayeka lêkerê jî bi tîpeka dengdêr dawî be, cînavka kesê duyem a yekjimar nayê xuyakirin. Wate dibe morfa"Ø".\* Mînak:

jîn: bijî

şuştin: bişo

\* ji bo agahên zêdetir binêre (2.1.3), R. 51.

#### 4.1.2 Di Rola Nîhadê de:

Di hevokên nîvlêkerî yên K. Jorîn de cînavkên kesê pêve desteya bêhêz rola nîhad dibîin. Nîvlêker di zimanê kurdî de her wek me berî jî gotibû li radera "bûn"ê tîs sazîkirin.\* Di K. Jorîn de du rayekên lêkera bûnê hene; "bûn" û "hebûn". Di rastî de "bûn" bîngêhî ye û lêkera "hebûn" jî "bûnê" hatiye girtin. Di K. jorîn de sê celebên radera "bûn"ê hene, wek nîvlêker. ku du celeb jî lêkera "bûn"ê hatine girtin û yek jî jî lêkera "hebûn" ê.

##### 4.1.2.1 Bi bûna bîngêhî re:

Bûna bîngêhî pêtvî bi têrkerî heye, têrker jî jî navdêr, rêngdêr û cînavkên xwerû...hwd ne, tîsê pêşîya lêkera bûnê.<sup>209</sup>

Dema borî:

Di dema borî de cînavkên kesî yên pêve desteya-1 rola nîhad dibînin û bi dawîya lêkera bûnê ve tîs nivîsîn<sup>210</sup>. Binêre:

(Nîhad): + (T. + Ra.D.B. Lêkera Bûnê "bi" + Q.D.B "û"+ C. Desteya -1).

(Tu): + (Mamosta + b + û + yî) → Mamosta bûyî : Mamosta nebûyî

- Dema Niha:

Cînavkên desteya-2 di dema de niha anku hin kes jê ra dibên dema fireha lêkera bûna bîngêhî rola nîhad dibînin û bi awayî serbixwe tîs nivîsîn. Ji bo sedema cuda nivîsîna van cînavkan di dema niha de mamosta Nezîr Ocak dibêje "Sedema cudabûna nivîsandina cînavkên kesandinê digel navdêr, cînavkên xwerû û rengdêran, ew e ku ev cînavk di wateya lêkerê de ne û ne jî cîsê wan in, jî ber vê yekê ye cuda tîs nivîsîn"<sup>211</sup>. Lê ev bi bawerîya me nerast e jî ber ku ti taybetmendiyeke wan ne mîna lêkera ne. Her wisa divê em bizanin di rastî de serbixwe nayên nivîsîn û bi lêkera bûnê ra tîs nivîsîn. Ji ber ku rayeka dema niha ye. Lêkera bûnê qertafê dema niha lêkera bûnê herdû dibîne morfîmî "Ø". Ji ber wê wisa xuya dike ku biserbixwe

\* Ji bo wata û cureyên lêkerên bûnê binêre:(3.1.2), R. 95.

<sup>209</sup> Umêd Berzan Bizro, "Rêzmanî Cênaw le Şêwezari Xaneqînîde", R. 39.

<sup>210</sup> Ebdulfetah, Kar (Lêker) di Zimanê Kurdî de(K. Jorîn), R. 266.

û Aktuğ Halil, *Gramera Kurdî – Kriitçe Gramer*", RR. 360- 378.

<sup>211</sup> Ocak Nezîr, "Waneyên Rêzimana Kurmancî", R. 125.



tên nivîsîn. Ger em lêkera bûnê li gor dema borî, niha û bê bikşênin baştir tê xuya kirin:

Ez xwendekar bûm

Ez xwendekar ØØim.

Ez dê xwendekar bim.

Ger ku em balê xwe bidenê wan mînakên jor, tê xuya kirin tenê di dema niha de rayeka lêkerê bûn xuya nake. ev jî tê wê wateyê ku taybetmendiyeke wan cînavkan heye. Di nivîsîna elfabêya latînî de tenê bi lêkerê ve tên nivîsîn Ji ber ku lêker jî xuya nake ew cînavk bi ti kerese yên din ve nayên nivîsin û bi awayê serbixwe tên xuyakirin. Em dibê bizanin jî di K. Jorîn de tenê di dema niha ya nivlêkerê de qertafa "di" ya dema niha dikeve û xuya nake.

(Nîhad): (T + Ra.D.B. L. Bûnê "Ø"+ Q.D.Niha "e/Ø" + C. Desteya-2)

(Tu): (Mamosta + Ø + Ø + yî) → mamosta yî

- Dema Bê:

Di dema bê de ji bo lêkera bûna bingehîn destê cînavkên desteya-2 rola nîhad dibînin û bi rayeka lêkera bûnê ve tên nivîsîn.

(Nîhad): + (Beşa Yekem a Q.D. Bê "dê" + T. + Beşa Duyem a Q.D. Bê "bi"+ Ra.D.B. L. Bûnê "b"+C. Desteya-2)

(Tu): + (dê + jîr + bi + b + î) → dê jîr bibî : Nebî

Di dema bê ya lêkera bûna bingehîn de beşa duyema qertafê dema bê ku "bi"yê gelek caran dikeve.<sup>212</sup> Wate ji bilî bêjîn "tu dê jîr bibî" dikarî bêjî "tu dê jr bî"ew jî ji ber sivîk bûnê ye.

- Raweya Fermanî.

---

<sup>212</sup> Baran Bahoz, "Rêzimana Kurmancî", R. 165.

Di raweya femandan de cînavkên desteya-4 rola nîhad dibin. Bi rayeka lêkera bûnê ve tèn nivîsîn, qertafa raweya fermanî dikeve û tenê rayeka lêkera bûn dimîne. Bi delîla vê ku hertim qertafê nerê kirin diçe cihê qertafê erêkirin. Gavê em raweya fermanî jî nerê bikin qertafê nerê diçe pêşiya vê "b"ê ku xuya dike. Wate rayeka lêkerê bûnê dimîne, gavê raweya fermanî bi awayî nerê bê kişandin.

(Tu): Mamosta be

(Hûn): Mamosta Bin

#### 4.1.2.2 *Bi Lêkerên Bûna Guhraw re:*

bi heman away sê demên vê cureya lêkerê jî hene.

- Dema Borî:

Teşeya dema boriya lêkera bûna guhraw bi heman awayê dema boriya bûna bingehî ye. Tenê cudahî ew e ku têrker diçe dawiya nivlêkerê. Bi hema awayî jî cînavkên desteya-1 rola nîhad dibin. Di awayê nerêkirin jî bi qertafa "ne" tê nerêkirin. Tê pêşiya rayeka dema boriya lêkera "bûn" ê. Cînavk jî cihê xwe naguhirin.

(Nîhad): + (Ra.D.B.L. Bûnê "b" + Q.D.B. "û" + C. Desteya-1+ T.)

(Tu): + (b + û + yî + mamosta) → bûyî mamosta.

- Dema niha

Di dema niha ya bûna guhraw, bi qertafê dema niha û rayeka lêkera bûnê tê sazkirin. di wê awayê de têrker hertim tê dawiya nivlêkerê. Cînavkên desteya-2 rola nîhad dibînin û bi rayekê lêkera bûnê ve tèn nivîsîn. Awayê nerêkirinê jî bi qertafa nerênî "na"ya dema niha tê nerêkirin û diçe cihê qertafa "di"ya erênî ya dema niha. Wate cînavkên desteya-2 di rola nîhad de cihê xwe naguhirin. Binêre:

(Nîhad): + (Q.D. Niha ye erênî "di"+ Ra.L. bûnê "b" + C. desteya-1 + T.).

(Tu): + (Di + b + î + mamosta) → Dibî mamosta.

- Dema bê:

Teşeya dema bê ya bûna guhraw heman teşeya dema nihaya bûna guhraw e, tenê qertafê demê diguhire. Bi heman awayî jî cînavkên desteya-2 rola nîhad dibînin.

(Nîhad): + (Q.D. Bê ye erênî "dê bi"+ Ra.L. bûnê "b" + C. desteya-1 + T.).

(Tu): + ( Dê bi + b+ î + mamosta) → Dê bibî mamosta. : Nebî mamosat

- Raweya Fermanî a Bûna Guhraw:

Raweya fermanî a bûna guhraw, heman teşeya raweya fermanîa lêkera tewaw e ku bi heman awayî jî cînavkên desteya-4 rola nîhad dibînin. Li vê awayê de têrker diçe dawîya raweya fermanîê. Her wek tê zanin di neyîniya raweya fermanî de qertafê "ne" tê pêşîya lêkerê û qertafa "bi" dikeve.<sup>213</sup> Qertafê "ne" diçe cihê qertafê "bi"ya erênî ya raweya fermanî û cînavkên desteya -4 jî rola nîhad dibînin.

(Nîhad): + (Q. Raweya Fermanîê "bi" + Ra.L. bûn "b"+ C. desteya-3 + T.)

(Tu): + (bi + b + e + mamosta) → bibê mamosta : nebe

#### 4.1.2.3 Bi Lêkerên Bûna Heyî re :

di lêkerên bûna heyî de "*pêvîya wê bi têrkrt tune ye. Tenê bi qertafê dem û bi cînavkên kesî yê pêve tê sazkin.*"<sup>214</sup>

- Dema Borî:

Lêkera "hebûn" didema borî de cînavkên desteya -1 rola nîhîd dibînin û bi dawîya lêkerê ve tê nivîsîn. Awayê nerêkirin jî bi qertafa "ne" tê nerêkirin û diçe cihê "he"ya pêşgira lêkera hebûn. Binêre:

(Nîhad): + ("he"ya Pêşgira hebûn+ Ra. L. bûnê "b" + Q.D.B. "û"+ C. Desteya -1)

(Tu): + ( He + b + û + yî) → Hebûyî : Nebûyî

- Dema Niha

<sup>213</sup> Aktuğ Halil, "Gramera Kurmancî- Kürtçe Gramer", R. 342.

<sup>214</sup> Umêd Berzan Bizro, "Rêzmanî Cênaw leşewezarî Xaneqînîde", R. 46.

Di dema niha ya bûna heyî de cînavkên desteya-2 rola nîhad dibînin û bi dawiya lêkera hebûnê ve tên nivîsin.

(Nîhad): + ("he"ya pêşgira hebûn+Ra.L. bûnê "Ø" + Q.D.Niha "e/Ø"+ C. Desteya -1).

(Tu): + ( he + Ø + Ø + yî → heyî

Di kesê siyem a yekjimar de ji ber cînavk dengdêr e. Dawiya pêşgira "he"yê jî dengdêr e ji ber wê tîpa "y" a kelejandinê tê zêde bûn.\* Wate dibe

Ew heye.

- Dema Bê

Dema bê ya bûna heyî cînavkên desteya -2 rola nîhad dibînin û bi rayeka lêkera bûnê ve tên nivîsin. Her wisa beşa düyem a qertafa dema bê ku "bi"ye dikeve. di awayê nerêkirin jî "na" diçe cihê "he"ya pêşgira "hebûn" ê.

(Nîhad): + (Beşa Yekema Q.D.bê "dê"+"he" ya Pêşgira "hebûn" ê + Beşa Duyema Q.D.bê "bi"Ø + R.L. bûnê "b"+ C. Bêhêz-2).

(Tu): + (dê + he + bi⊗ + b + î) → dê hebî : dê nebî

#### 4.1.3 Di Rola Cîgira Kirdeyê de:

Lêkera tebatî bi rêka sazkirina radera "hatin" ve, ji bo demên borî , niha û bê, li gor kes û hejmara bireser tê bikaranîn. Mîna lêkera alîkar pêşiya wê lêkerê tê ku em dixwazin bikin bi lêkerekê tebatî.<sup>215</sup> Wek tê zanîn jî di lêkera tebatî de cîgira kirde

\* Ger em mîna K. Jêrîn li K. Jorîn binêrin an li gorî K. Jêrîn tîpa dawiya "ew heye"ya K. Jorîn binêrin. Dişê bêtin ev "e" ye tenê ne cînavka kesî ya pêve ye ji bo kesê siyem a yekjimar, wate gavê lêkera bûna heyî li gor kesê siyem a yekjimar di dema borî de bê kişandin dibin bi du"e", yek cînavk e, yek jî qertafa dema niha ye, wate wisa ye

he+e+e

"e"ya yekem qertafa dema niha ya lêkera hebûnê ye. "e" ya duyem jî cînavk e. pişt re jî tîpa kelejandinê di navbera her sê "e"yan de derketiye û bûye

he + y + e + y + e → heyeye

lê formeke wisa di zimên de tune ye. ji ber wê jî yek ji wan (ye) ketiye bûye"heyey".

<sup>215</sup> Fereydun Ebdûl Berzincî, "Nadiyarî", R. 159.

heye. Ku bireser e, di lêkerên tebatî de dibe cîgira kirde.\*\* Cîgira kirde jî mîna gelek beşên din a hevokê dişê ev rol ji aliyê cînavkên kesî yê pêve bê dîtin.<sup>216</sup>

- Dema Borî

Di dema boriya lêkera tebatî de, cînavkên desteya -1 rola cîgira kirde dibînin û bi dawiya lêkera alîkarê "hatin" ve tînin nivîsandin. Teşê û cihê cînavkên desteya-1 di rola cîgira kirde di dema borî de, mîna cihê û teşeya cînavkên desteya-1 di rola kirde di demên boriya lêkerên negerguhêz e. Her wisa dê bizanin jî di awayê erê û nerê cudahî tune ye. Ji ber ku cihê xwe naguhirin. Mînak, ger lêkera hevoka "wî ez dîtim" bikin bi hevoka lêker tebatî, dibe.:

(Tu) : hatî dîtin. : nehatî dîtin. (D.B.Têdayî)

(Tu) : hatiyî dîtin. : nehetiyî dîtin. (D.B.dûdar)

(Tu) : dihatî dîtin. : nedehatî dîtin. (D.B.Berdeste)

(Tu) : hatibûyî dîtin. : nehatibûyî dîtin. (Ç.D.B.Têdayî)

- Dema Niha

Wek tê zanin rayeka lêkera alîkara "hatin" di dema niha de, dibe "ê". Cînavkên desteya-2 rola cîgira de dibin û bidawiya "ê" ve tînin nivîsîn. divê bizanin ku qertafa "di" ya dema niha awayê xwe diguhire û dibe "t". An jî her mîna xwe "di" tê bikar anin lê "i" dikeve. Mînak:

(Tu) : tîyî dîtin.

- Dema Bê

Di dema bê de bi alîkariya qertafa dema bê û wergirtina rayeka demê bê ya "hatin" ku "ê" ye, tê sazîkirin. tîpa "i" ya "bi"ya qertafa dema bê dikeve. Cînavkên desteya- 2 rola cîgira kirde dibînin û bi dawiya rayeka "bê" ve tînin nivîsîn. Mînak:

\*\* Ji bo pêngavên guhrîna lêker lebatî ji bo tebatî, di K. Jorîn de binêre:(3.1.3), R. 97.

<sup>216</sup> ji bo wê mijarê em mefa ditiye ji:

A- Onen Ronayî û Tan Samî, *Hînkêr- Kurmancî, Asta duyemîn*", R. 91.

B- Taş Çetîn, *Waneyên Rêzman û Rastnivîsa Kurmancî*", RR. 208 - 209.

C- Fereydun Ebdûl Berzincî, "Nadiyarî".

(tê) : dê bêyî dîtin.

Em dikarin ji bilî lêkera "hatin" .werin bikar bihênin. Wê demê qertafa "bi" ya dema bê ne lazime û cînavkên desteya-2 jî rola cigira kirde dibînin.

(Tu) : dê werî dîtin.

#### **4.1.4 Di Rola Bireserê de:**

Her gava ku lêkera hevokê di dema borî de be û gerguhêz be, cînavkên desteya-1 rola bireser dibînin û bi dawiya lêkerê ve tînin nivîsîn. Piranî car jî wê demê dibe mirov ji bo sivikkirina axavtîna bireser bi awayê serbixwe bilêvneke. Ji ber ku di zimanê kurdî de em dikarin kirde û bireserê herdu bi cînavkên kesî yê serbixwe bikaribin bilêvbikin. Ji ber ku *"bilêvkirina cînavkên kesî yê pêve xweştir e. Bi dema kêmtir jî tînin bilêvkin, birawird bi cînavkên kesî yê serbixwe."*<sup>217</sup> cînavkên pêve di dawiya lêkerê de bireser diyarî dikin. Di hemû demên dema borî ya gerguhêz de bi dawiya lêkerê ve tînin nivîsîn.

Wî dîtim. (nedîtim, dîtîme, didîtim, dîtîbûm)

Dibe ji bîr nekin ku lêkera "viyan" lêkerê awarte ye û di wê lêkerê de neşet bireser bi cînavkên pêve bê bilêvkin.

#### **4.1.5 Di Rola Têrkerê de:**

Di K. Jorin de ji ber ku têrker tewandî ye, wate her navdêrek an cînavkek ku rola têrker bibîne dibe bê tewand in, di K. Jorîn jî de tenê yek cînavkên pêve hene. Ew jî hertim li cihê navdêren xwerû tînin. Ji ber wê nikarin bitewin. Ger netewin jî nikarin cihê navdêren tewandî bigirin. Di K. Jorîn ti cînavkên kesî ya pêve ya din jî tune ye, rola têrker bibîne.

#### **4.1.6 Di Rola Têrker, Bireser û Kirdeyê de bi Hevre:**

Me berî jî gotibû ku di K. Jorîn de tu cînavk tune ye ku rola têrker bibîne, yê dimîne di rola bireser û kirde ye. Wek tînin zanîn bireser hertim di lêkerên gerguhêz de tînin. Di lêkerên gerguhêz de jî tenê di dema borî de bireser bi cînavkên pêve tînin bilêvkin. Wê demê jî kirde di awayê tewandî de ye. Di dema niha û bê de jî kirde

---

<sup>217</sup> Umer Mahmud Kerîm, *"Karî Têper û Têneper le Zimanî Kurdî de(Kirmancî Xwarû)"*, R. 34.

dibe xwerû û bireser ditewa. Gava bireser tewandî be jî di K. Jorîn de em nikarin bi cînavkên pêve bilêvbikin. Ew jî ji ber wê ye ku K. Jorîn zaravayeke nîvergatîvî ye.

#### **4.1.7 Di Rola Ravekerê de:**

Di K. Jorîn de cînavkên pêve qet rola ravekerê nabînin. Ji ber ku raveker di K. Jorîn de tewandî ye. Cînavkên pêve jî di K. Jorîn de tenê yek deste cînavkên pêve hene ku ew jî xwerû ne û ne tewandî ne

#### **4.2 Hevoksaziya Cînavkên Kesî Pêve ya K. Jêrîn:**

##### **4.2.1 Di Rola Kirdeyê de:**

Cînavkên kesî yên pêve ya K. Jêrîn di hevokê de dikarin mîna navdêr û cînavkên kesî yên serbixwe rola kirde bibînin di hemû dem û cureyên lêkeran.

Cînavkên desteya bihêz: Dema lêkera hevokê di dema borî de be û gerguhêz be, desteya cînavkên bihêz, dişên rola kirde bibin.

Cînavkên desteya bêhêz: Dema lêkera hevokê di dema borî de be û negerguhêz be. Her wisa lêkera hevokê di dema neboriya gerguhêz û negerguhêz de be. Di raweya fermanî de jî desteya cînavkên bêhêz dişên rola kirde bibînin û bi dawîya lêkerê ve tînin nivîsîn.

##### **4.2.1.1 Bi Dema Boriya Gerguhêz re:**

Ger ku lêkera hevokê di dema borî de be û gerguhêz be wê demê desteya cînavkên kesî pêve ya bihêz dişên rola kirde bibin. Her wek me berî jî şîrovekirî bû *"ev desteya cînavk li gor wan kerseyên di hevokê de hene an derdikevin, cihê wan di hevokê de tê guhertin li gor teşeya hevokê"*.<sup>218</sup> Di hevokê de :

1- Ger bireser hebe cînavkên desteya bihêz bi bireserê ve tînin nivîsîn. Ne girîng e awayê lêkerê çawa ye. Tînin bireser hebe tewawê. mînak

- Gulîjt bo azad nard.
- Gulekejt bo azad helgirt.

---

<sup>218</sup> Wiriya Umer Emîn, *"Rêzmanî Ranawî Likaw"*, R.12.

- Xanweket bo azad dirustkird.
- 2- Ger bireser bi awayî serbixwe tune be lê têrker hebe wê gavê cînavkên desteya bihêz di rola kirde de bi têrker ve tîn nivîsîn. Mînak.
- Bo Azadî nard.
  - Bo Azadî helgirt.
  - Bo Azadî dirusykird.
- 3- Ger têrker û bireser bi awayî serbixwe neyên bilêv kirin, cînavkên desteya bihêz di rola kirde de bi daçekan ve tîn nivîsîn. Wate ger ku têrker û bireser herduyan jî bi cînavkên pêve hatin bilêvkirin ne girinig e awayê lêkerê çawa ye. Tenê ger daçek hebe bi daçekan ve tîn nivîsîn. Mînak:
- Bo nard.
  - Bo helgirt.
  - Bo dirustkird.
- 4- Ger bireser bi awayî serbixwe neyê bilêvkirin û têrker û daçek jî tune bin, cînavkên desteya bihêz di rola kirde de û bi rayeka lêkerê ve tîn nivîsîn. Wek tîn zanîn rayeka lêkerê her tim gelek qertafên cuda digire. Li gor hebûna wan qertafan cihê cînavk jî tîn guhertin:

❖ Ger ku lêker xwerû be

- Di awayê erênî dabe.

- 1- Ger ku dema lêkerê di dema boriya têdayî de be, bi dawiya lêkerê ve tîn nivîsîn.

Mînak: Nardit.

- 2- Ger ku dema lêkerê di dema boriya dûdar de be, cînavkên bihêz di rola kirde de diçine navenda qertafa dema boriya dudar. Wate qertaf dibe dû beş û beşa dawiya qertafa ku "e"ya diçe piştî cînavka desteya bihêz. Binêre.



(Kirde): + (R.D.B.+ Beşa Yekema Q.D.B.Dudar "û" + C. Bihêz(Kirde) + Beşa Duyema Q.D.B.Dudar "e").

(To): + (Nard + û + t + e) → Nardûte

Divêem ji bîr nekin di awayê kesê siyem a yekjimar de cînavka desteya bihêz teşeya "etî" zêde dibe,"e" ya pêşiya paşgira "etî" li nav diçe. Ji ber ku beşa duyema qertafa dema boriya dudar jî "e" ye, dibine du dengdêr, du dengdêr jî li dû hav nayan.

Mînak: Nardûyetî .

3- Ger ku dema lêkerê di çîrokiya dema boriya têdayî de be, cînavkên bihêz di rola kirde de û bi dawiya qertafa çîrokiya dema boriya têdayî ve tîn nivîsîn.

Mînak: Nardbût.

4- Ger ku dema lêkerê di dema boriya berdest da be, cînavkên kesê pêve di rola kirde de û bi qertafên dema boriya berdest ve tîn nivîsîn.

Mînak: Deṭnard.

Binêre vê xişteya jêr ku cihê cînavkên desteya bihêz di rola kirde û di lêkerên dema borî de tê nîşandan. Bila em ji bîr nekin biresera mînakên jêr di hemiyana de cînavka kesê bêhêz-1 ji bo kesê siyem a yekjimar e. Ev jî morfa sifr e, ji ber wê bireser nayê xuyakirin.

C.	D.B.têdayî	D.B.dûdar	D.B.berdest	Ç.D.B. Têdayî
im	nard <u>im</u>	Nardû <u>me</u>	de <u>m</u> nard	nardibû <u>m</u>
it/t	nard <u>it</u>	Nardû <u>te</u>	de <u>t</u> nard	nardibû <u>t</u>
î/y	nard <u>î</u>	Nardû <u>y</u> etî	de <u>y</u> nard	nardibû <u>y</u>
man	nard <u>i</u> man	Nardû <u>m</u> ane	de <u>m</u> annard	nardibû <u>m</u> an
tan	nard <u>i</u> tan	Nardû <u>t</u> ane	de <u>t</u> annard	nardibû <u>t</u> an
yan	nard <u>i</u> yan	Nardû <u>w</u> yane	de <u>y</u> annard	nardibû <u>w</u> yan

Xişteya (4 - 28 )

- Ger ku lêker xwerû be û di awayê nerênî de be.

Gavê lêker xwerû be û di awayê nerênî da be, di hemû demên borî de cînavkên desteya bihêz di rola kirde bi qertafên nerênî ve tîn nivîsîn.

Netnard. (D.B.Têdayî)

Netnarduwe. (D.B.Dûdar)

Netdenard. (D.B. Berdest)

Netdenard. (Ç.D.B. Têdayî)

❖ Ger ku lêker nexwerû bû:

- Lêkerên pêkhatî bi pêşgir:

Ger ku lêkera gerguhêz di dema borî de lêkerekê pêkhatî be bi pêşgir, bireser bi awayê serbixwe nehatibe bilêvkirin û daçek û tîrker jî tune bin, wê demê cînavkên desteya bihêz dirola kirde de û hertim bi pêşgir ve tîn nivîsîn. Di hemû awayên dema borî û awayên erênî û neyênî de. Mînak

Mînak: Helitgirt. (helitnegirt /helitgirtibû/helitgirtuwe/helitdegirt)

- Lêkerên hevedûdanî:

Ger ku lêkera gerguhêz di dema borî de be û lêkerekê hevedûdanî be, bireser bi awayê serbixwe nehatibe bilêvkirin û daçek û tîrker jî tune bin, wê demê cînavkên desteya bihêz di rola kirde de be, di hemû awayên dema borî û awayên erênî û neyênî de ger dû beş be, wê demê bi beşa yekem a lêkera hevûdûdanî ve tîn nivîsîn. Mînak

Mînak: Xoşît kird

Ger sê beş be, bi beşa duyem ve tîn nivîsîn. An bi wateyeka din "*ger ku lêker li sê pêyvên watedar an zêdetir hatbû çêkirin, wate beşa yekema lêkera hevûdûdanî*

*peyveka hevedûdanî be, wê demê cînavkên kesê pêve di rola kirde de diçine dawiya peyve hevedûdanî, di demêk de bireser tûne be".<sup>219</sup>*

Mînak: Serxoşit kird.

#### 4.2.1.2 *Bi Dema Boriya Negerguhêze:*

Ger ku lêkera hevokê di dema boriya negerguhêz da be, cînavkên kesê pêve ya bêhêz-1 rola kirde dibin û hertim bi dawiya rayeka lêkerê ve tên nivîsîn. Ger lêker xwerû be an nexwerû be, ger lêker erê be an nerê be cudahî tune ye. Her wisa ger têrker an daçek hebe an tune bin cudahî tune ye. Ji ber ku desteya bêhêz cihê xwe naguhrin û hertim bi dawiya lêker ve tên nivîsîn. Ji bo fêhm kirna zêdetir jî binêre vê xîşteya jêr:

dem	erênî û neyênî	Mînak		
		Xwerû	pêkhatî	hevedûdan
D.B.Têdayî	erênî	Hatît	Helhatît	Serkewtît
	neyênî	Nehatît	Helnehatît	Sernekwetît
D.B.Dûdar	erênî	Hatûyte	Helehatûyte	Serkewtûyt
	neyênî	Nehatûyte	Helnehatûte	Sernekwetûyt
D.B. Berdest	erênî	Dehatît	Heldehatît	Serdekwetît
	neyênî	Nedehatît	Helnedehatît	Sernedekwetît
Ç.D.B. Têdayî	erênî	Hatibûyt	Helhatbûyt	Serkewtbûyt
	neyênî	Nehatibûyt	Helnehatbûyt	Sernekwetbûyt

Xîşteya (4 - 29)

Wek li van mînakên jor tê xuyakirin cînavk hertim bi dawiya lêkeran ve tên nivîsîn. Lê, divê ji bîr nekin di çîrokiya dema boriya têdayî de cînavk diçe pişt qertafa çîrokiya dema boriya têdayî. Her wisa di dema boriya berdest de, qertafa boriya

<sup>219</sup> Lîjneyek le Wezareti Perwerde, "Ziman û Edebî Kurdî", Polî Dwazdehemî Amadey, Lîney Pêdaçunewey Zanstî: Fereydûn 'Ebdul Berzincî, Mistefa Mihmmmed Zengene...Hwd, Çapî pêncem, Çapxaney: El-Msteqbel, Lubinan, 2010, R. 78.

berdeset, dibe dûbeş; Beşa yekem bi lêkerê ve tê nivîsin û piştra jî cînavka desteya bêhêz-1 tê nivîsîn. Beşa duyem a wê qertafê ku "e"ye diçe pişta cînavkên desteya bêhêz, ev "e" ye jî piranî car di dema axaftinê tê jêbirin Lê ger kirde di kesê siyem a yekjimar da be dimîne. Di kesên din de jî di hin devokan de dimîne mîna ku li hin devokan dibêjin: "hatûyte, helhatûyte, serkewtûyte.... hwd".<sup>220</sup> Li mînakên jor tê xuyakirin ku daçek û têrker tune ye û ev desteya cînavk bi dawiya lêkerê ve hatiye nivîsîn. Ger hebe jî ev cînavk cihê xwe naguhirin. Mînak:

Boy hatî̂t.

Boy helgirtî̂t.

Boy serkewtî̂t.

Bila em ev cardin bêjin, her çiqas tê zanin jî ku cînavkên bêhêz desteya-1 d kesê siyem a yekjimar morfa sifre(Ø), xuya nake.

#### **4.2.1.3 Bi Dema Neborî re:**

Cînavkên "desteya -2" di hevokên lêkerên neborî de hertim rola kirde dibin. Lêker gerguhêz be an negerguhêz, xwerû be an nexwerû, erênî be an nerênî, cînavkên desteya -2 bi dawiya lêkerê ve tên nivîsîn. Her çiqas kerseyên din di hevokê de hebin an tune bin, ev cînavk cihê xwe naguhirin. Mînak:

- Lêkera gerguhêz :

Masî degirtî̂t. : nagirtî̂t

Masî be tor degrî̂t. : degrî̂t

Le taqîkirdenewe beserdekwî̂t. : besernakewî̂t

- Lêkera negerguhêz:

Dêyî̂t. : Neyêyî̂t

Heldêyî̂t. : Helnayêyî̂t

<sup>220</sup> Xoşnaw Ezîz Hemeemîn, "Rêzimanî Cênawî Likaw Lezimanî Kurdîde(Kirmancî Nawerast)", R. 112.

Le taqîkirdenewe beserdekewî. : Besernakewî

Wek tê zanin cudahî cînavkên desteya bêhêb-1 digel desteya bêhêz-2 di kesê siyem a yekjimar da heye. Ji ber ku di kesê siyem a yekjimar a bêhêz -1 de cînavk morfa sifir digire. Di bêhêz -2 de, cînavka kesê siyem a yekjimar çar morfîmên wê yên bi bingehîn hene. Ku ev in "êt, ê, at, a" ku heryek ji "êt, ê, at, a" elomorfên hevûdine.\*

#### 4.2.1.4 *Bi Raweya Fermanî re*

Di K. Jêrîn di raweya fermanî de, cînavkên kesê pêve ya bêhêz- 3 rola kirde dibînin. Ger lêker gerguhêz be an negerguhêz, xwerû be an nexweû, di awayê erênî da be an nerênî cudahî tune ye. Ji ber ku hertim di rola kirde da bi dawiya lêkerê (raweya fermanî) ve tîn nivîsîn. Wek tê zanin jî di raweya fermanî de tenê ji bo kesê duyem a yekjimar û pirjimar tê kişandin. Di K. Jêrîn jî di raweya fermanî bi qertafa "m" tê nerêkirin û li cihê qertafa "bi"ya erênî tê. Mînak:

Yarî bike. : yarî meke

Heste.

Wek tê zanin jî ger ku rayeka bi tûpa dengdêra "o, û, î, ê, e" dawî be, cînavka kesê duyem a yekjimar ku "e" ya dernakevêt û dibe morfîma "Ø".<sup>221</sup> Mînak

Kirdin → ke → bike(Ø)

Kirdin → ke → biken

#### 4.2.2 **Di Rola Nîhadê de:**

Di hevokên nivlêkerî yên K. Jêrîn de cînavkên kesê pêve desteya bêhêz rola nîhad dibînin. Nivlêker di zimanî kurdî de her wek me berî jî gotibû li radera "bûn" tîn sazîkirin. Di K. Jêrîn de tenê di lêkera "bûn" de dikarin dema niha û bê de bînin cudakirin. Wate di K. Jêrîn de tenê lêkera "bûn"ê heye ku qertaf û awayê dema niha û bê ya wî hebe. Derheqa bingeha lêkera "bûn û hebûn" jî di pirtûka xwendina başûr wisa derbaz dibe ku radera 'hebûn' bingeh e û bêjeya "he" hin caran neye xuya kirin

---

\* ji bo awayê kar kirin û bikar anîna wan çîwar alomorfan binêre: (2.3.3.3), R. 76.

<sup>221</sup> Lîjneyek le Wezareti Perwerde, "Ziman û Edebî Kurdî", R. 70.

an nayê bilêvkirin."<sup>222</sup> Lê, di rastî de ev şaşî ye ji ber ku "lêkera bûn heqîqî û bingehî ye. Lêkera hebûn jî pêkhatiyê wê lêkerê ye. Delîla herî baş jî ji bo wê heqîqetê jî bi jêbirina pêşgira 'he', tenê 'bûn' dimêne".<sup>223</sup> Mînak

### hebûnbûn

min(he)m

min(-)m

to(he)yt

to(-)yt

→ ji bo hemû kesên din jî her wisa ye.

Lêkera "bûn" û "hebûn" lêkerên negeruhêz in. Gava bûne gerguhêz wê demê ne nîvlêker in.\* Sê celebên lêkera bûnê hene:

1- Bûna bingehîn

2- Bûna guhraw

3- Bûna heyî

Her wek me berî ji gotibû bûna bingehîn û guhraw li radera "bûn" tên girtin. Bûna heyî jî li radera "hebûn" tê girtin. Nîhad jî mîna kirde û cîgira kirde û bireser dikarin di hevokê de jê bibin an bilêv nekin. Ev rol jî ji aliyê cînavkên kesê pêve bê dîtin ku ev cînavk jî rola nîhad dibînin. Bi lêkera bûnê ve tên nivîsin û hertim jî di hemû celebên lêkera bûnê de cînavkên kesê bêhêz rolê nîhad de nin.

#### **4.2.2.1 Bi Lêkerên Bûna Bingehî re:**

Demên lêkera bûna bingehîn

<sup>222</sup> Lîjneyek le Wezaretî Perwerde, "Ziman û Edebî Kurdî", Polî Dwazdehemî a Amadey, R. 40.

<sup>223</sup> Şêrko Baban, "Geştêk Benêw Rêzmanî Karî "Hebûn"de", Govarî Karwan, Jimare"195", Hewlêr, 2005, R. 152.

- \*Nîv lêkera bûn hertim negeruhêz e. pêvîya wê bi bireser tune ye, hin caran dibe lêkerêka tewaw ger ku bi wateyî ji dayk bûn an çêbûn an jî biwateya mezin bûn(şîn bûn) be. wê demê ew lêkerêka dibe lêkerêka tewaw dişê ev lêker geguhêz be dişê negeruhêz jî be

Nerîman Ebdûlla Xoşnaw, Rêzmanî Kurdî, R. 135.

jineke mindalî bû. : lêkera tewaw a dema borî, gerguhêz ye.

azad kitêbêkî heye. : lêkera tewaw a dema niha, gerguhêz ye.

dareke şîn bû. : lêkera tewaw a dema borî, negeruhêz ye.

her wisa lêkera "bûn" û "hebûn" ger gerguhêz jî be lêkerêka awerte ye. ji ber ku "hemû lêkerên gerguhêz dişê bibe lêkerêka tebatî lê lêkera "bûn û hebûn" neşê bibe lêkerêka tebatî" Ebdûlwahab Xalîd Mûsa, 2000, Çapî Yekem, Çapxaney Minare, Hewlêr, 2010, R. 22.

Viyay Silêman Hacî Slêvaneyî, Rêkewtin le Şêwey Jûrûy Zimanî Kurdîde, R. 69.

- Dema Borî :

Di dema boriya bûna bingehî de cînavkên desteya -1 rola kirde dibînin. Bi dawiya lêkerê ve tên nivîsin û bi qertafa "ne" tê nêrê kirin û diçe pêşiya lêkera bûnê:

(Nîhad): + (T. + Ra.D.B. L. bûn "bi" + Q.D.B "û" + C. Bêhêz-1).

(To): + (mamosta + bi + û+ yt ) → mamosta bûyt : mamosta nebûyt

- Dema Niha:

Cînavkên destey-1 di dema niha ya lêkera bûn a bingehîn rola nîhad dibînin û bi têrkerê ve tên nivîsîn. Ji ber ku di dema niha de rayeka lêkera bûn morfîma "Ø", ji bîlî kesê siyem a yekjimar ji ber ku gavê lêkera bûn di dema niha de, li gor kesê siyem a yekjimar tê kişandin rayeka lêkera bûnê "e" tê xuya kirin. Ji ber ku di kesê siyem a yekjimar a bêhêz-1 cînavk bi xwe morfîma "Ø" ye. Wate cînavk xuya nake ji ber wê qertafa dema niha tê xuya kirin.

(Nîhad):+ (T. + Ra.D.B. L. bûnê "Ø"+ Q.D.Niha "e/Ø" + C. Bêhêz-1)

(Min): + (mamosta + Ø +Ø + m).

(To): + (mamosta + Ø + Ø+ y).

(Ew): + (mamosta + Ø + e + Ø).

(Ême): + (mamosta + Ø + Ø + yn).

(Êwe): + (mamosta + Ø + Ø + n).

(Ewan):+ (mamosta + Ø + Ø + n).

Wek tê dîtin qertafa dema niha tenê di kesê siyem a yekjimar de tê xuya kirin. Ew jî ji ber wê ye "e" dengeka sivîk û bêhêz e. Gavê dengeka din dawiya wê be ji nav diçe. Her wisa ji ber ku kesê siyem a yekjimar morfa sifr e. Ji ber wê tenê di kesê siyem a

yekjimar tê xuya bûn. Ger ku têker bi dengeka dengdêr dawî be tîpa "y" a kelejandinê tê navenda her dû dengdêran.<sup>224</sup> Mînak:

Ew kurde

Ew mamostaye

Ger em pirs bikin qeyî ev "e" ye dawî di dema niha de çima di K.jêrîn jî de mîna K.jorîn jî ne cînavka kesê sêyema yekjimar e. Çawa bizanin ev qertafa dema niha ye, ne cînavk e. Ji ber ku ev "e" ye ya K. Jêrîn di kesên din jî de tê derketin. Mînak:

Kes	Yek.	Pir.
Yekem	Ewan miniyan pêwîste.	Ewan êmeyan pêwîste.
duyem	Ewan toyan pêwîste.	Ewan êweyan pêwîste.
siyem	Ewan ewyan pêwîste.	Ewan êweyan pêwîste.

Xiştaya (4 - 30 )

Ger ku em li van mînakên jor binêrin tê xuya kirin ku "e" qertafa dema niha ye. Di her sê kesên yekem, duyem û siyem a yekjimar û pirjimar de heye. Em nikarin jê bibin, ger jê bibin tevlihevî çêdibe.<sup>225</sup> Di hemiyên jî de cînavkên kesê serbixwe (min, to, ewan....) rola bireser dîtiye. Ger ku em wan bi cînavkên pêve cihgîr bikin, cînavkên desteya-1 rola bireser dibînin. Her wisa cînavkên bêhêz-1 di kesê siyem de morfîma sifir e (Ø). Ji ber wê tenê di kesê siyem a yekjimar de qertafa dema niha dimîne. Mînak

Kes	Yek.	Pir.
Yekem	Ewan pêwîstiyanim.	Ewan pêwîstiyanyan.
duyem	Ewan pêwîstyanît.	Ewan pêwîstyanin.
siyem	Ewan pêwîstyanê.	Ewan pêwîstyanin.

Xiştaya (4 - 31 )

<sup>224</sup> Ebdûla Husên Resûl, "Erkî Morfîmî "e" le Zimanî Kurdîde" Govarî Sabat, Jimare"1", Hewêr, 2005, R. 39.

<sup>225</sup> Şêrko Baban, "Hindê le Akare Rengînekanî Rêzmanî Kurdî" R. 45.



Ji ber wê em dikarin bêjin tîpa "e"ya dawî di K. Jêrîn de ne cînavk e mîna ya K. Jorîn. Ji ber ku di K. Jêrîn di kesê siyem a yekjimar de cînavk morfa Ø. Ji ber wê qertafa dema niha piranî di kesê siyem a yekjimar de tê derketin.

Dema niha ya lêkera bûn a bingehîn bi "nî" tê nerê kirin û tê pêşiya qertafa dema niha. Lê, di kesê siyem a yekjimar de ji ber ku qertafa dema niha bi xwe dengdêr e, qertafê nerê jî bi dengdêr dawî tê. Ji ber wê tîpa "y" a kelejandinê tê navbere wan.

Ew kurde : Kurdnîye

Ew mamostaye: Ew mamostanîye.

Rayeka lêkera bûn di dema niha de dibe "Ø". Wate naye xuya kirin. Ger ku rayeka lêkera bûnê bê di hevok de hevok dibe raweya xwastek û fermanî.<sup>226</sup> Mînak:

Zîrek+Ø+Ø+im→zîrekim

Zîrek+b+Ø+im→ zîrekbim

Wate di kesê yekem û duyem a yekjimar û pirjimar û di kesê siyem a pirhejmr de ger rayeke lêkera "bûn" bê xuya kirin, wê demê hevok dibe raweya xwastek. Lê, di kesê sêyema yekjimra de dibe raweya fermanîa Dema Bê.<sup>227</sup>

Di dema bê de ji bo lêkera bûna bingehî destê cînavkên desteya-2 rola nîhad dibîne û bi rayeka lêkera bûnê ve tîn nivîsîn. Awayê nerênî jî bi "na" tê nerêkirin û li cihê "de" ya qertafa erêya neborî digire.

(Nîhad): + (T. +Q.D.N ya erênî "de" + Ra.D.B. L. bûnê "b"+C. Bêhêz-2)

(To): + (Aza + de + b + ît → aza debît : aza nabît

#### 4.2.2.2 *Bi Lêkerên Bûna Guhraw re*

Celebêke din a lêker bûn bûna guhraw e. Di K. Jêrîn de hertim daçeka "be" di navbera têrker û nîvlêkera bûn de tê. Hin car jî daçeka "be" dibe bi daçeka "e". Ji ber

<sup>226</sup> Ebdûlle Husên resûl, "Çend Basêkî Wirdî Zimanewanî – Kurdî", R. 26.

<sup>227</sup> Ebdûla hûsên Resûl, "Pênasy Ristey Sade", Govarî Zankoy Dihok, Jimare"2", Hewlêr, Tîşrîmî Yekem. 1999, R.752.

ku tîpa "e" dikare mîna daçek cihê daçeka "be" bigire, heman erk û wate bibinê di hevokê de".<sup>228</sup> Ji aliyê dem jî ve dibe dema borî û neborî. Her wisa raweya ferman dan jî heye:

- Dema Borî:

Teşeya dema boriya lêkera bûna guhraw, bi heman awayê dem boriya bûna bingehî ye. Cudahî jî ew e ku daçek û têrker dicine dawiya nîvlêkerê. Cînavkên desteya-1 rola nîhad dibin. Binêre:

(Nîhad): + (Ra.D.B. L. bûnê "b"+ Q.D.B. "û"+ C. Bêhêz-1+ Daçek(be/e)+ T.)

(To): + (b + û + yt + be + mamosta) → bûyt be mamosta

(To): + (b + û + yt + e + mamosta) → bûyte mamosta

Di awayê nerêkirin jî de qertafa "ne" ya nerênî tê pêşiya rayeka dema boriya lêkera "bûn" ê. Mînak:

Nebûyt be mamosta.

Nebûyte mamosta.

- Dema Neborî

Awayê dema neboriya bûna guhraw mîna dema bê ya bûna bingehî ye lê daçek û têrker tene dawiya nîvlêkerê de ne. Cînavkên Bêhêz-2 rola nîhad dibînin. Binêre:

(Nîhad): + (Q.D.N.ye erênî "de"+ Ra. L. bûnê "b" + C. Bêhêz-1 + Daçek (be/e) + T.).

(To): + ( de + b+ ît + be/e + mamosta) → debît be mamosta : Debîte mamosta.

Awayê nerêkirinê jî bi qertafa nerênî "na"ya dema neborî tê nerêkirin û diçe cihê qertafa "de"ya erênî ya dema neborî. Mînak:

(to) : Nebît be mamosta.

<sup>228</sup> Umêd Berzan Bizro, "Morfîmî "e" le Rêzmanî kurdîde", Beşî Duwem û Kotayî, Govarî Zimannasî, Jimare "11", Hewlêr, 2011, R. 48.

- Raweya fermanî a bûna guhraw:

Raweya fermanî a bûna guhraw, heman teşeya raweya fermanîa lêkera tewawî heye. Ku bi heman awayî jî cînavkên desteya-3 rola nîhad dibînin lê li vir de daçek û têrker hene û diçine dawiya raweya fermanîê.

(Nîhad):+(Q. Raweya Fermanîê "bi" +Ra.L. bûn "b"+ C.Bêhêz-3+ Daçek"be/e" T.)

(To): + (bi + b + e + be + mamosta) → bibe be mamosta

her wek tê zanîn di desteya-3 de tenê ji bo kesê duyem a yekjimar û pirjimar e ku teşeya "e, in" in lê gavê daçeka "e" ji bilî daçeka "be" bê bikaranîn, cînavka kesê duyem a yekjimar morfîma "Ø" digire.

Bibe mamsta.

Her wisa di awayê nerê kirin jî de bi qertafa "me" tê nerêkirin.

Mebe mamosta.

Mebine mamosta.

#### 4.2.2.3 *Bi Lêkera Bûna Heyî re*

Di awayê bûna heyî di di K. Jêrîn jî de mîna K. Jorîn pêdivî bi têrker tune ye.

- Dema Borî:

Lêkera "hebûn" di dema borî de cînavkên desteya -1 rola nîhîd dibînin û bi dawiya lêkerê ve tîn nivîsîn. Awayê nerêkirin jî bi qertafa "ne" tê nerêkirin û diçe cihê "he"ya pêşgira hebûna heye lê tiştê sosret ev e ku "he" li nav diçe. Ger di awayê nerê bê kişandin.<sup>229</sup> Mînak:

(Nîhad): + ("he"ya pêşgira hebûn+ Ra. L. bûnê "b" + Q.D.B. "û"+ C. Bêhêz -1)

<sup>229</sup> Şêrko Baban, *Mîkanîzîme Bineretiyekanî Ristesazî Rêzmanî Bûn û Hebûn*", Wezaretî Roşinbîrî, Çapxaney ofîsî Krîstal, Hewlêr, 1997, R. 61.

(To): + ( he + b + û + yt ) → hebûyt : nebûyt

- Dema Niha

Di dema niha ya bûna heyî de cînavkên desteya-1 rola nîhad dibînin û bi dawiya lêkera hebûnê ve tên nivîsîn. Binêre:

(Nîhad): + ("he"ya Pêşgira "hebûn"+Ra.L. bûnê "Ø" + Q.D.Niha "e/Ø"+ C. Bêhêz -1).

(To) + ( he + Ø + Ø + yt → heyt

Dibe ji bîr nekin qertafa dema niha tê xuya kirin, gavê lêker li gor kesê siyem a yekjimar bê kişandin. Ji ber ku di kesê siyem a yekjimar de cînavk morfa"Ø" digire di desteya bêhêz-1 de. Dibe bizanin pêdivî bi tîpa "y" a kelejandinê dibe ji ber ku tîpa dawiya "he" dengdêr e. Qertafa dema niha jî "e" ye. Dû dengdêr jî di zimanê kurdî de li ba hev nayên.

Ew heyê.

Di awayê nerênî de bi "nî" tê nerêkirin. Qertafa nerênî jî diçe cihê "he" ya hebûnê. Her wisa di awayê nerênî jî de di kesê siyemde "y" a kelejandinê jî diçe navbera "nî" ya nerênî "e" ya qertafa dema niha.<sup>230</sup> Binêre mînak:

Ew nîye.

- Dema Bê

Dema bûna heyî bi heman awayî bûna bingehîn tê sazîkirin û cînavkên Bêhêz -2 rola nîhad dibînin. Tenê cudahî ev e di bûna heyî têrker tune ye. Binêre:

(Nîhad) + (Q.D.N "de"+ Ra.L. bûnê "b"+ C. Bêhêz-2)

(To): + (de + b + ît) → debît

Her wisa awayê nerêkirin jî "na" diçe cihê "de" ya dema borî û dibe:

To nebît.

---

<sup>230</sup> Xoşnaw Ezîz Hemeemîn, "Rêzimanî Cênawî Likaw Lezimanî Kurdîde(Kirmancî Nawerast)" , R. 142.

### 4.2.3 Di Rola Cîgira Kirdeyê de:

Wek tê zanin gava hevokeke lêker lebatî biguhirin ji bo lêker tebatî bireser a lêkera lebatî dibe cîgira kirde di hevoka lêker tebatî de. Cîgira kirde jî mîna her kirdeyeke din a hevokê dikarin di hevokê de jêbibin. Wate bilêv nekin erk û rola wê jî ji aliyê cînavkên bêhêz bê dîtin.<sup>231</sup>Wek tê zanîn jî lêkera tebatî tenê di awayê lêkerên gergihêz tê sazîkirin û li gor dema borî û neborî jî cînavkên desteya bêhêz digire\*:

#### 1- Dema Boriya Lêkerên Tebat:

Di K. Jêrîn de di dema boriya lêkerên tebatî de cînavkên bêhêz-1 rola cîgira kirde dibînin û bi dawîya lêkerê tên nivîsîn. Wate diçine piştta qertafa dema borî ku qertafa dema borî di lêkerên tebatî de morfa "a" ye, di dema boriya têdayî û berdest yek alî bi qertafa dema borî ve tên nivîsîn. Mînak

- (to nûsrayît) : nusrayt (D.B. Têdayî)
- (to denûsrayt) : denusrayt (D. B. Berdest)

Lê di çîrokiya dema boriya têdayî diçine dawîya qertafa çîrokiya dema boriya têdayî.

(Ra. + Q.L.Tebatî "r"+ Q. D. B."a"+ Q. Ç. D.B. Têdayî "Bû"+ C. Bêhê -1)

bîn + r + a + bû + yt → bînrabûyt

Her wisa di dema boriya dûdar jî wisa ye. Beşa yekem a qertafa dema boriya dudar diçe navbera cînavk û qertafa dema borî û beşa dawî ji ku "e" ye diçe dawîya cînavkê. Beşa dawîya qertafa dema boriya dûdar tenê di kesê siyem a yekjimar tê xuya kirin. Ji ber ku cînavka kesê siyem a yekjimar bi xwe nayê xuya kirin.

(Ra. + Q.L.Tebatî "r"+ Q.D.B."a"+ Beşa Yekema Q. D.B. Dudar "w"+ C. Bêhêz-1+ Beşa Duyema Q. D.B. Dûdar "e"⊗)

bîn + r + a + w + ît + e ⊗ → bînrawît

<sup>231</sup> Xoşnaw Ezîz Heemîn, "Rêzimanî Cênawî Likaw Lezimanî Kurdîde(Kirmancî Nawerast)", R. 127.

\*Me berê behsa awayê lêkera tebatî kiriye, pêngavên guherîna lêkera lebatî ji bo tebatî hemû diyarî kiriye û li vir ne pêwîst e. Em cardin wan pêngavan dupare bikin, Binêre (3.2.3.), R. 102.

Ldi kesa siyem a yekjimar dibe "bînrawe" , ku "e" ya dawî beşa duyem a qertafa dema boriya dûdar e, tê derkeftin. Ji ber ku cînavka kesê siyemxuya nake.

## 2- Dema Neboriya Lêkera Tebatî:

Di K. Jêrîn ger ku lêkera hevoka tebatî di dema neborî de be, wê gavê cîgira kirde bi awayî serbixwe neyê xuya kirin, destê cînavkên bêhêz desteya -2 rola cîgira kirde dibine yek alî û bi qertafa dema neboriya lêkera tebatî ve tê nivîsîn, ku "ê" ye. Binêre:

(Q.D.N. + Ra. + Q.L.Tebatî. "r" + Q.D.Neborî "ê" + C. desteya -2).

de + bîn + r + ê + yt → debînreyt

### 4.2.4 Di Rola Bireserê de:

Di K. Jêrîn de em dikarin bireser jî mîna her kereseyekê din bi cînavkên pêve bilêv bikin, ger ku cînavkên pêve yên bêhêz di lêkerên gerguhêz de rola kirde bibînin, cînavkên pêve yên bihêz rola bireser dibînin. Her wisa bi beravejî wê jî raste.<sup>232</sup> li vir em cihê cînavkên kesî pêve di rola bireser de behis dikin ku her gav lêkera hevokê lêkera neborî û fermanîa erênî û nerênîya xwerû an nexwerû be jî cînavkên desteya bihêz rola bireserê dibînin. Desteya bêhêz jî di hemû demên borî de di lêkerên xwerû û nexwerûya erênî û nerênî de rola bireserê dibînin<sup>233</sup>

#### 4.2.4.1 Bi Lêkerên Dema Borî re:

Heger ku lêkera hevokê di dema borî de be û gerguhêz be em dikarin bireser bi cînavkên kesî re bilêvbikin ku her tim cînavkên kesî yên pêve ya bêhêz-1 rola bireserê dibînin. Ger ku lêkera hevokê erênî be an nerênî be, xwerû be an nexwerû be, di her demeke dema borî da be hertim cînavkên bêhêz-1 rola bireserê dibînin û cihê wan jî hertim bi dawîya dawîn qertafa an morfîma lêkerê ve tê nivîsîn. Wate bi tu awayî cihê xwe naguherin. (Ji bilî yek awayî ku piştra behs dikin).<sup>\*234</sup>

<sup>232</sup> Saman Mehemed, "Cênawekan le Beşe Diyalêktî Xwarûde", R. 238.

<sup>233</sup> Xoşnaw Ezîz Heemîn, "Rêzimanî Cênawî Likaw Lezimanî Kurdîde(Kirmancî Nawerast)", R. 144.

\*Heger ku em li van mînakên jor binêrîn baş xuya dike ku hertim cînavkên kesî bêhêz -1 di rola kirde da bi dawîya lêkerê ve hatine nivîsîn. Em ê jî bo fêmkirin û kurtkirina vê mijarê di hemû cur û demên lêkeran de ku bireser kiriye cînavka kesê duyem a yekjimar ku "ît/yt" e, ev "t"ye jî karkêfi ye. Kirde jî li gor kesê yekem a yekjimar a desteya bihêzê hatiye kişandin û hertim cihê xwe diguhure li gor cure û teşeya lêkeran

● Dema Boriya Têdayî:

Girtimît.

Nemgirtît.

Helim negirtît.

Bom helnegirtît.

Min girtimît.

● Dema Boriya Berdest:

Demgirtît.

Nemdegirtît.

Helim nedegirtît.

Bom helnedegirtît.

Min demgirtît.

● Dema Boriya Dûdar

- Girtûmît.

- Nemgirtûyt.

- Helim negirtûyt.

- Bom helnegirtûyt.

- Min girtûmît.

● Çîrokiya Dema Boriya Têdayî

- Girtibûmît.

- Nemgirtbûyt.

- Helim girtbûyt.

- Bom helnegirtbûyt.

- Min girtibûmît.

Heger ku em balê xwe bidine van mînakên jor tê xuyakirin ku yê bireser e; cînavka kesê duyem a yekjimar e ku teşeya wê jî "yt/ît" e, di hemiyana de bi dawiya lêkerê ve hatiye nivîsîn. Her çiqas dema lêkera borî hatiye guhertin jî bi lêkerên xwerû û nexwerû her wisa bi awayê erênî û nerênî cihê bireser nehatiye guhertin. Tenê cînavkên kesî desteya bihêz ku di rola kirde da ne, hertim cihê xwe guhertine li gor cure û teşeya lêkerê.

Her wisa debê em ji bîr nekin ku di lêkera xwerû de ji bo her sê demên têdayî, dûdar û çîrokiya têdayî de ger lêker ji bilî qertafa çîrokiya dema borî û qertafa dema boriya dûdar ti qertaf û kerseyên dî mîna qertafê nerênî pêve nabe. Ger kirde li gor kesê siyem a yekjimar hatibe kişandin, wê demê kirde û bireser cihê xwe diguhurin.<sup>235</sup> Mînak:

<sup>234</sup> ji bo hemû awayan me mifa dîtiye li: Heman Jêder, RR. 144 – 150.

<sup>235</sup> Wirîya Umer Emîn, "Rêzmanî Ranawî Likaw", RR. 68-74.

Ew birdimî.

Ew birdûmî.

Ew birdibûmî.

Wek xuya dike ku kirde cînavka kesî bihêz a kesê siyem a yekjimar e. Bireser jî cînavka kesê yekem a yekjimar a bêhêz-1 e. Ger ku kirde di kesê siyem a yekjimar da be bireser di kîjan kesî de be hertim tê pêşiya kirde.

#### **4.2.4.2 Bi Lêkerên Dema Neborî re:**

Ger ku lêkera hevokê di dema neborî da be û gerguhêz jî be cînavkên kesî yê pêve ya bihêz rola kirde dilîzin. Ev destê cînavk wek tê zanin hertim cihê xwe diguhurin; Di rola bireser de li dû cihêyan tîn derketin.<sup>236</sup>

##### ❖ An bi Lêkerê ve tê Nivîsin

1- Ger ku lêkera hevokê xwerû be û di dema neboriya gerguhêz de be cînavkên bihêz di rola bireser dibînin. Ger lêker di awayê erênî de be bi qertafa erênî ve tîn nivîsîn. Ger di awayê nerênî de be bi qertafa nerênî ve tîn nivîsîn. Mînak:

Ew detgirêt.

Ew netgirêt.

2- Ger ku lêkera hevokê nexwerû ya hevedûdanî û di dema neboriya gerguhêz da be cînavkên bihêz di rola bireser de, bi pêşgirê ve tîn nivîsîn. Mînak:

Ew helimdegirêt.

3- Ger ku lêkera hevokê nexwerû ya pêkhatî be di lêkerên gerguhêz a dema neborî de be hertim cînavkên bihêz rola bireserê dilîzin û cihê wan jî beşa yekem a lêkera hevedûdanî ye. Mînak:

Ew bangî dekat.

##### ❖ An bi Têrkerê ve tîn Nivîsin:

---

<sup>236</sup> Xoşnaw Ezîz Heemîn, "Rêzimanî Cênawî Likaw Lezimanî Kurdîde(Kirmancî Nawerast)", RR.150 – 153.



Hin caran de ger ku têrker û daçek li pêşiya lêkera gerguhêz a neborî ve hatibin, cînavkên kesî yê pêve ya bihêz di rola bireserê de û bi têrkerê ve tîn nivîsîn.<sup>237</sup>

Mînak:

Bo ewanî fêrdekem.

Bo ewanî radehênim.

Bo ewanî siwênd dedem.

Lê ev ne merc e. Ji ber ku hin caran dişê têrker û bireser li pêşiya lêkerê ve hatibin û cînavkên bireserî her di nav lêkerê de bimînin.

Ew bo xuleke detnêrê.

Divê bizanin ger ku têrker û daçek li dawiya lêkerê ve hatibin, cînavkên bihêz di rola bireserê de her bi lêkerê ve tîn nivîsîn. Mînak:

Bangî deken bo êre.

#### **4.2.4.3 *Bi Raweya Fermanî re:***

Ger ku lêkera gerguhêz di raweya fermanî de be, wê demê destê cînavkên kesî ya pêve ya bihêz rola bireserê dilîzin. Li lêkerên xwerû û nexwerû (hevdundanî û pêkhatî) de cînavkên "im/m – man" û "y/î – yan" rola bireser dilîzin.<sup>238</sup> Ji ber ku kirde di raweya fermanî de hertim kesî duyem e. Ji ber wê neşê bireser di kesê duyem de be û ji ber ku qet çênabe ku kirde û bireser yek kes be. Cihê wan jî hertim di nav lêkerê daye:

1- Heger lêkera raweya fermanî xwerû be û di awayê erênî da be, cînavkên bihêz di rola bireserê de û bi qertafa erênîya fermanî ve tîn nivîsîn. Ger di awayê nerênî da be jî bi qertafa nerênîya fermanî ve tîn nivîsîn. Mînak

To bimanbexşe.

Êwe memanbexişin.

---

<sup>237</sup> Heman Jêder, R. 152.

<sup>238</sup> Lîjneyek lewezaretî perwerde, "Ziman û Edebî Kurdî", *Polî Dwazdehemî Amadey*", R. 94.

2- Ger lêkera raweya fermanî a nexwerû ya pêkhatî be, pêşgir wê demê cînavkên bihêz di rola bireserê de û bi pêşgir ve tîn nivîsîn. Mînak:

To ramanbikêşe.

3- Ger lêkera raweya fermanî a nexwerû ya hevedûdanî be, cînavkên bihêz bi beşa yekem a lêkera hevedûdanî ve tîn nivîsîn. Mînak:

To bangman bike.

#### 4.2.5 Di Rola Têrkerê de:

Li K. Jêrîn de her wek çawa em dikarin kirde û bireserê bi cînavkên kesî yê pêve ve bilêvbikin, bi heman awayî em dikarin têrkerê jî bi cînavkên kesî yênpêve bilêvbikin. Her wisa dema bilêvkirina têrkerê bi cînavkê kesî ve hin guherankarî bi ser teşeya daçekan da tê. Mîna daçeka "'be' dibe bi 'pê' û 'le' dibe bi 'lê'"<sup>239</sup> an dibe "tê". Dibe bizanin jî ger têrker cînavkên kesî yê serbixwe an navdêr be, merc e ku yekalî li pişt daçekan bê. Ger cînavkên kesî yê pêve rola têrkerê bilîzin, cihê wan tê guhertin û ne merc e ku hertim rasterast li dawîya daçekan bê. Cînavkên kesî yê pêve desteya bihêz dikarin rola têrkerê bilîzin; Bi lêkera dema borî û neborî, raweya fermanî a erênî û nerênî, ya xwerû û nexwerû cînavkên desteya bihêz bi alîkariya daçekan rola têrkerê dilîzin. Cînavkên bêhêz -1 jî tenê dikarin di lêkera boriya gerguhêz de rola têrkerê bilîzin.<sup>240</sup>

##### 4.2.5.1 Bi Lêkerên Dema Borî ya Gerguhêz re:

Ger ku lêkera hevokê di dema borîya gerguhêz da be, wê demê cînavkên bihêz rola têrker dilîzin. Ger lêker xwerû an nexwerû, erênî an nerênî be, cihê wê nayê guhertin. Ger ku cînavkên bihêz di hevokên lêkerên gerguhêz a borî de rola têrkerê bilîzin rasterast bi daçekê ve tîn nivîsîn. Her wisa ger ku daçek li pêşiya lêker be an li dawîya lêkerê be ferq tune ye.<sup>241</sup> Mînak

- Ewan namekeyan boç birid.

- Ew dîwarekey pêç çakirdewe.

<sup>239</sup> Wiriya Umer Emîn, "Asoyekî tirî Zimanewanî", R. 99.

<sup>240</sup> Xoşnaw Ezîz Heemîn, "Rêzimanî Cênawî Likaw Lezimanî Kurdîde(Kirmancî Nawerast)", R. 156.

<sup>241</sup> Xesro Ehmed Xoşnaw, "Berkar le Zimanî Kurdîde – Be Pêy Rêbazî Formî", Çapxaney Wezareti Roşinbîrî, Hewlêr, 2008, R. 189.

- Kitêbekeyan wergirtibûwe lêt.
- Ew kitêbekem pêt deda.

Her wisa di lêkerên gerguhêz a dema borî de dişê cînavkên bêhêz-1 rola têrkerê bilîzin û hertim jî di hevokê de bi dawiya rayeka lêkera dema borî ve tîn nivîsîn û qet bi daçekê ve nayên nivîsîn<sup>242</sup> Ew ji ber wê ye ku desteya bêhêz hertim bi dawiya lêkerê ve tîn nivîsîn û di warê zimên de wek cih negor tîn naskirin.<sup>243</sup> Mînak.

- Ew xanwekeyî bo kirîm.
- Ewan xanwekeyan bo dirûst dekirîm.
- Ew kitêbekî lê standibûm.
- Parekey lê helgirtûm.

Divê bizanin ku cînavkên bêhêz tenê di hevokên lêkera gerguhêz de û di dema borî de dikarin rola têrkerê bilîzin.

#### 4.2.5.2 *Bi Lêkerên Neborî ya Gerguhêz re:*

Ger lêkera hevokê di dema neborî ya gerguhêz da be, wê demê cînavkên bihêz dikarin rola têrkerê bilîzin. Ger daçek beriya lêkerê hatibe 'bireser bi awayê serbixwe di hevokê de hebe, cînavkên desteya bihêz dikarin rola têrkerê bilîzin û bi bireserê ve tîn nivîsîn'.<sup>244</sup> Mînak.

- Azad kitêbekeş bo dekirrêt.
- Azad qelemekêş bo helldedat

Ger ku bireser jî bi awayê serbixwe neyê bilêvkin, wê demê cînavkên bihêz di rola têrkerê de û bi daçekê ve tîn nivîsin.

- Azad bot dekirrêt.
- Azad bot helldedat.

Bê guman ger daçek li dawiya lêkerê bê, hertim cînavkên bihêz di rola têrkerê de û bi daçekan ve tîn nivîsîn.

- Azad qellem dekirêt boş.
- Azad hellîdedat boş.

<sup>242</sup> Nurî Elî Emîn, "Erk û Şiwênî Ranawe Keseyekan le (Axawtîni Kurdî) de", Dezgay Roşinbîrî û Billawkirdinewey Kurdî, Metb'e El-Zeman, Bexdad, 1986, R. 134.

<sup>243</sup> Şêrko Baban, Cênawî Likaw be Berawird, Govarî Raman, jimare "39", Dezgay Roşinbîrî û Rageyandinî Gulan, Hewlêr, 1999, R. 237.

<sup>244</sup> Xesro Ehmed Xoşnaw, "Berkar le Zimanî Kurdîde – Be Pêy Rêbazî Formî, R. 190.

#### 4.2.5.3 *Bi Lêkerên Negerguhêz re:*

Ger ku lêkera hevokê negerguhêz be, em dikarin têrkerê bi cînavkên desteya bihêz bilêvbikin. Cihê têrkerê jî:

1- Ger di lêkera negerguhêz di dema borî an neborî de be cudahî tune ye. Daçek beriya lêkerê be û kirde jî bi awayê serbixwe hatibe bilêvkin, wê demê cînavkên bihêz di rola têrkerê û bi kirdeyê ve tê nivîsîn.<sup>245</sup> Mînak

- Namekeṭ bo dêt.                      - Bûlbûlekeṭ lê helldfirrê.                      - Kewekeṭ lê berell debê.
- Namekeṭ bo hat.                      - Bûlbûlekeṭ lê hallfirrîbû                      - Kewekeṭ lê berellabû

Gelek car dişê kirde jî bi awayê serbixwe hatibe bilêvkin. Cînavk di rola têrkerê de her bi daçekê ve tên nivîsîn. Ji bo wê mijarê; Mamosta Xoşnaw Ezîz Emîn di teza xwe ya "linsansa Bilind" de rupela "161- 162". dibêje: Di vê awayê de ger ku têrker bi daçekê ve bê nivîsîn berbilavtir e ,Mînak:

- Billind lêt ture bû.
- Mamosta goranî boṭ gut.

Her wisa dibêje: *"Hin caran ger têrker bi kirdê ve bê nivîsin ji ber wê ye ku em bixwazîn tekîdî zêdetir bikin ji bo misoger kirinê. Mînak: Azadim bo hat. Li vir de meram ew e ku 'Azad' hatiye ne ku kesêkî din hatiye..."*

2- Ger di lêkerên dema borî û neboriya negerguhêz de û kirde bi awayê serbixwe nehatibe bilêvkin, cînavk di rola têrkerê de û tenê bi daçekan ve tên nivîsîn. Her wisa an tên beriya lêkerê an jî tên pişta lêkerê.<sup>246</sup> Mînak:

- Boṭ dêt.                      - Dêm bot.                      - Lêm helldfirrî.                      - Helldfirrî lêm.
- Bot hat.                      - Dehat bot.                      - Lêm hellfirrîbû.                      - Hellfirrîwe lêm.

#### 4.2.5.4 *Bi Raweya Fermanî re*

##### ❖ **Lêkera Gerguhêz :**

<sup>245</sup> Saman Mehemed, *"Cênawekan le Beşe Diyalêktî Xwarûde"*, R. 238.

Lîjneyek lewezaretî perwerde, *"Ziman û Edebî Kurdî"*, *Polî Dwazdehemî Amadey*", R. 60.

<sup>246</sup> Nûrî Elî Emîn, *"Erk û Şiwênî Ranawe Kesyekan le (Axawtinî Kurdî) de"*, R. 144.

Di raweya fermanî da ger lêker gerguhêz be, cînavkên bihêz rola têrkerê dilîzin ku her yek ji kesê yekem û siyem a yekjimar û pirjimar dikarin wê rolê bilîzin. Bi tu awayî kesê duyem a yekjimar û pirjimar nikarin wê rolê bilîzin di raweya fermanî de. Ger bireser bi awayê serbixwe di hevokê de hebe, cînavkên bihêz bi bireserê ve tên nivîsîn'.<sup>247</sup> Mînak:

- To merrekanim bo bêne.
- To waneketm bo bixwênewe.

Lê gavê bireser bi awayê serbixwe tune be, cînavka bihêz di rola têrkerê de bi daçekan ve tên nivîsîn.

- To bom bêne.
- To boman bixwênewe.

Di awayê fermanî de jî ger daçek di dawiya hevokê de hatibe, cînavk di rola têrkerê de û hertim bi daçekan ve tên nivîsîn. Mînak

- To merkan bèn bom.
- To bixwênewe boman.

#### ❖ **Lêkera Negerguhêz ra:**

Di raweya fermanî a negerguhêz de jî cînavkên desteya bihêz a kesê duyem a yekjimar û pirjimar wê rolê dilîzin. Ger kirde bi awayê serbixwe hebe an tune be cînavk di rola têrkerê de hertim bi têrkerê ve tên nivîsîn.<sup>248</sup> Mînak.

- To pêm bilê keyî bimirim.
- Azad were biço boman.

#### **4.2.6 Di Rola Têrker, Bi-reser û Kirdê de bi Hev re:**

Ev par tabete bi hatina têrker, bi-reser û kirde di hevokekê da û bilêvkirna her sê ji wan bi cînavkên kesî pêve ku di zimanê kurdî de 'bilêvkirna herdu bi-reser û têrker bi pêkve bi cînavkên pêve di axaftinê de gelek kême'<sup>249</sup>. Ji ber ku mijarekî pir girîng e û her wisa bilêvkirina her siyan jî pirosesêke îkonomî ye. Îkonomî di ziman da, wate 'mesrefkirna kêmtirîn enerjî, ji ber mesrefnekirna enerjî û dem û gihandina merem û wate, mirov dikare ta ewqas bilêvkirna peyvan kême bike ku nebe sedema

<sup>247</sup> Xesro Ehmed Xoşnaw, "Berkar le Zimanî Kurdîde – Be Pêy Rêbazî Formî", R. 194.

<sup>248</sup> Xoşnaw Ezîz Heemîn, "Rêzimanî Cênawî Likaw Lezimanî Kurdîde (Kirmancî Nawerast)", R. 168.

<sup>249</sup> Wiriya Umer Emîn, "Asoyekî tirî Zimanewanî", R. 101.

fêmnekirin û tevlîheviya zimên".<sup>250</sup> Ji ber ku bireser tenê di hevokên lêkergerguhêz da tê, hatina têrker, bireser û kirde jî bi hevra tenê bi hevokên lêkergerguhêz ra tê. Em jî li gor demên lêkeran hatina bireser û têrker û kirde bi hevra şîrove bikin di lêkerên gerguhêz de.

#### 4.2.6.1 *Di Dema Borî de:*

Di dema boriya gerguhêz de ji ber ku tenê desteya bihêz dikare rola kirde bilîze, Herdu desteya bihêz û bêhêz dikarin rola têrkerê bilîzin. Ger ku têrker desteya bêhêz-1 be, desteya bihêz rola bireserê dilîze û cînavk di rola têrker û bireser 'herduyan bi rayeka lêkerê ve tên nivîsîn'<sup>251</sup> û kirde jî bi daçekê ve tê nivîsîn. Binêre :

Bom hênabûnît.

(Kirde): + (Da. + Kirde "C. Bihêz" + Ra.L. + Bireser "C. Bihêz"+ T. "C.Bêhêz-1")

(Min): + (bo + m + hênabû + n + yt) → Bomhênabûnît.

Bom hênabûnît : Min ewanim bo to hênabû

Ger ku desteya bihêz rola têrkerê bilîze "*têrker bi daçekê ve tê nivîsîn*".<sup>252</sup> Desteya bêhêz-1 jî rola bireserê dilîze, bi dawiya lêkerê ve tên nivîsîn'.<sup>253</sup> Cînavkên bihêz jî di rola kirde de û bi cînavkên bihêz di rola têrkerê de tên nivîsîn. Binêre:

Botim nûsî.

(Kirde): + (D. + T. "C. Bihêz" + Kirde "C.Bihêz" + Ra.L. + Bireser "C.Bêhêz-1")

(Min): + (bo + t + im + nûs + î) → Botim nûsî.

Botim nûsî : Min ewim bo to nûsî.

Her wisa ger ku daçek li dawiya lêker hatibe, cînavkên bihêz rola kirde dimînin û yekalî û bi lêkerê ve tên nivîsîn. Her wisa cînavkên bihêz jî di rola têrkerê

<sup>250</sup> Derun Ebdurehman Salih, *Îkonomî le Astekanî Zimanî Kurdî de, le Bilawkirdinewey Ekdîmyay Kurdî, Çapxaney Hacı Haşim, Hewlêr, 2012, R. 22.*

<sup>251</sup> Wiriya Umer Emîn, "*Asoyekî tirî Zimanewanî*", R. 102.

<sup>252</sup> Xesro Ehmed Xoşnaw, "*Berkar le Zimanî Kurdîde – Be Pêy Rêbazî Formî*", R. 190.

<sup>253</sup> Xoşnaw Ezîz Heemîn, "*Rêzimanî Cênawî Likaw Lezimanî Kurdîde(Kirmancî Nawerast)*", R. 170 - 171.

de û bi daçekan ve tèn nivîsîn. Desteya bêhêz-1 jî rola bireserê dilîzin û bi cînavkên bihêz ve tèn nivîsin ku rola kirde de ne û bi dawîye lêkerê ve hatine nivîsîn. Binêre:

Hênamin bot.

(Kirde): + (Ra.L. + Kirde "C.Bihêz" + Bireser "C.bêhêz" + Da. + T. "C.Bihêz")

(min): + (hêna + m + in + bo + t) → Hênamin bot.

Hênamin bot: Min ewanim hêna bo to.

#### **4.2.6.2 Di Dema Neborî de**

Ger ku daçek li pêşîya lêkerê be, cînavkên bihêz rola têrkerê û bireserê dilîzin û herduyan jî bi daçekê ve tèn nivîsîn.<sup>254</sup> Desteya bêhêz -2 jî rola kirde dimîne û bi dawîya lêkerê ve tèn nivîsîn. Binêre:

Botiyan denûsim

(Da. + T. "C. Bihêz" + Bireser "C. bihêz" + Ra. L. + Kirde "C.Bêhêz")

(Bo + t + yan + denûs + im) → Botiyan denûsim.

Botiyan denûsim : Min ewan bo to denûsim.

Her wisa ger ku daçek li dawîya lêkerê be, cînavkên bihêz rola bireserê dilîzin û bireser jî bi qertafa erênî û nerênîya dema neborî ve tèn nivîsîn. Kirde jî desteya bêhêz-2 bi lêkerê ve tèn nivîsin û têrker jî bi daçekê ve tèn nivîsîn. Binêre:

Deyannêrim bot.

(Q.D. Neborî+ Bireser "C.Bihêz"+ Ra.L. + Kirde"C.Bêhêz-2"+ Daçek.+ T."C.Bihêz")

(De + yan + nêr + im + bo + t) → Deyannêrim bot.

Deyannêrim bot. : Min ewan boto denêrim.

---

<sup>254</sup> Wiriya Umer Emîn, "Rêzmanî Ranawî Likaw", R. 21.

#### 4.2.6.3 *Di Raweya Fermanî de:*

Di raweya fermanî da jî bilêvkirina kirde, bireser û têkerê mîna cureyên din bi du awayî tê derketin. Her wek tê zanîn di raweya fermanî de cînavkên bihêz-3 rola kirde dilîzin û bi dawiya lêkerê ve tên nivîsîn. Cînavkên têkerî jî hertim bi daçekê ve tên nivîsîn. Tenê cînavkên bireserî ger daçek beriya lêkerê be, bi cînavkên têkerî ve tên nivîsîn. Ger daçek jî li dawiya lêkerê be bi lêkerê vê tê nivîsîn. Cihê cînavkên bireserî di nav lêkerê de li gor sazûna lêkerê tê guhertin. Binêre:

- Heger Daçek Beriya Lêkerê be.

Bomnî bêne.

(Da. + T. "C.Bihêz" +Bireser"C.Bihêz" + Raweya Fermanî + Kirde "C. Bêhêz")

(Bo + man + î + bîn + e) → bomnî bêne.

Bomnî bêne : To ew bo ême bêne.

- Ger Daçek li Dawiya Lêkerê be.

Bimannûse boyan.

(Q. Raweya. Fermanî+ Bireser "C.Bihêz" +RaweyaFermanî + Kirde "C.Bêhêz-3" + Daçek + T. "C.bihêz")

bi + man + nûs + e + bo + yen → Bimannûse boyan.

Bimannûse boyan: To ême binûsa bo ewan.

#### 4.2.7 *Di Rola Ravekerê de:*

Cînavkên kesî yên pêve di K. Jêrîn de dikarin mîna gelek beşên din yên axavtinê rola ravekera navdêran bilîzin. Di vê rolê de wateya xwedanetî digihînin û dibine xwedanê raveberê û herdu destê cînavkên pêve wê rolê dilîzin. Cînavkên bêhêz bi lêkerên dema borî ya gerguhêz wê rolê dilîzin û li dawiya lêkeran tên.<sup>255</sup> Ji ber wê "*di rêzimana kurdî de desteya bihêz bi cînavkên xwedêtî tên nasin û her çiqas*

<sup>255</sup> Lîjneyek Lewezaretî Perwerde, "*Ziman û Edebî Kurdî*", *Polî Diwazdehemî Amadey*", R. 78.



*gelek erkên din a rêzmanî jî bi cih tînin.*"<sup>256</sup> Ji ber ku gelek aktîv in di hevokê de û dikarin bibin ravekerên hemû navdêran"*di rola ravekerê de diçine piştî raveberê û bi hokarên sîntaksî bi hev re tînin nivîsîn.*"<sup>257</sup> Wate her raveberêk diçê bi çend raveberên din bê ravekirin. Gava raveber bi cînavkên kesî yê pêve tê ravekirin, piştî wê neşet bi ravekerêke din bê ravekirin. Her ravekerêke din bê zêdekirin, dibe berî wê cînavkê be. Mînak:

\*Pencerey jûrekeman 'kitêbxaney maleke' kirawetewe.

Ev hevok nerêzmanî ye. Ji ber ku "kitêbxaneyî malekem" mîna raveker hatiye piştî cînavka "man" a ravekerê ku bi ravekera "jûrekem" ve hatiye nivîsîn. Herdû jî bi hevra ravekerê 'pencere'ne. Ger em 'kitêbxaneyî malekem' bibine beriya cînavka 'man' hevok dibe rêzmanî.

Pencerey jûrî kitêbxaney malekeman kiraweye.

Her wisa ger ku bi cînavkên kesî wê raveberê rave nekin ku bi kêfa xwe em dikarin bi ravekerên din raveberê rave bikin.

Cînavkên kesî yê pêve dikarin rola ravekera hemû kerese yê hevoksaziyê bibînin.

cînavkên pêve dikarin rola ravekera erkên hevopsaziya jêr bibine:

#### **4.2.7.1 Ravekera Kirdeyê:**

Cînavkên bihêz dikarin rola ravekera kirde bilîzin di hemû awa û cureyên lêkeran. Pêdivî bi veqetandek jî tune ye ku yekalî bi raveberê ve bînin nivîsîn. Her çiqas cînavkên bihêz wisa tînin naskirin û cihê xwe diguhurin jî lê di awayê ravekerê de nîkarin cihê xwe biguhurin. Mînak

- Ravekera Kirdeya Lêkera Borî ya Gerguhêz. Mînak: Biraket xanûy dirûst kird.
- Ravekera Kirdeya Lêkera Borî ya Negerguhêz. Mînak: Biraket hat.
- Ravekera Kirdeya Lêkera Neborî ya Gerguhêz. Mînak: Biraket xanû dirûst dekat

<sup>256</sup> Ebûbekir Umer Qdir, Berawirdêkî Morfosîntaksî le Zimanî Kurdî û Farsî de", Namey Diktora, Kolêjî Ziman, Zankoy Silêmanî, 2003, R. 49.

<sup>257</sup> Kurdistan Mukiryanî, Sîntaksî Ristey Sade Le zimanî Kurdî de, R. 124.

- Ravekera Kirdeya Lêkera Neborî ya Nerguhêz. Mînak: Birakeṭ dêt.
- Ravekera Raweya Fermanî a Gerguhêz. Mînak: Birakeṃ xanû dirûst bike.
- Ravekera Raweya Fermanî a Nerguhêz. Mînak: Birakeṃ were

Di raweya fermanî de tenê cînavkên bihêz a kesê yekem a yekjimar dikare rola ravekerê bilîze.<sup>258</sup> Wate tu kes nabêje:

Birakeman (t,tan, y, yan) xanû dirûst bike.

#### 4.2.7.2 Ravekera Cîgira Kirdeyê

Cînavkên kesî yên pêve ya bihêz dikarin rola ravekera cîgira kirde bilîzin û di hemû dem û cure yên lêkera tebatî de ku yek alî jî bi ravekerê ve bên nivîsin. Mînak:

Kurekeṭ kujrabû. (D.borî)

Kurekeṭ dekujirê. (D.niha)

#### 4.2.7.3 Ravekera Bireserê


Di K. Jêrîn de cînavkên pêve bihêz û bêhêz bê alîkariya morfîma xistineser (qertafa veqetandek) dikarin bibine ravekera navdêra bireserî. Cînavkên pêve ya bihêz di lêkerên gerguhêz ya dema bûrî, neborî û raweya fermanî de rola ravekera bireserê dibînin û bi bireserê ve tên nivîsîn.

Azad kitêbekeṭî kirî. (D.borî)

Azad kitêbekt dekirêt. (D. Neborî)

Li raweya fermanî de cînavkên kesê duyem "t – tan" li dewsa cînavka vegeroka "xot – xotan" tê.

To xanwekey to bifroşe. (Nadirûst)



To xanwekeyî xot bifroşe (Dirûste)



<sup>258</sup> Xoşnaw Ezîz Heemîn, "Rêzimanî Cênawî Likaw Lezimanî Kurdîde(Kirmancî Nawerast)", R. 178.



Di raweya fermanî da jî tenê kesê yekem dikare rola ravekera nîhadî bibîne. Mînak:  
Kurim bibe be mamosta.

❖ Ravekera Têrkerê Nîvlêkerê:

Cînavkên kesî yên pêve ya bihêz dikarin rola ravekera têrkera nîvlêkerê bûna bingehîn û bûna guhraw bibînin ku yekalî jî bi raveberê ve bên nivîsîn.

Bûna bingehîn: Azad mamostağ bû.

Azad mamosta ğ.

Di dema bê ya bûna bingehîn de Ebdulwahîd Xalîd Mûsa di pirtûka *Rêzmanî (Bûn û Hebûn) le kurdî de'* van mînakan tên e:

Min qutabîğ debim.

To biram debîğ.<sup>260</sup>

Piştira jî di rupala "35" de dibê "*cînavkên xwedanî tu karên din a piraktîkî nakin û hîç roleke din jî nabînin ji bilî xwedanî beşêke din.*" Di rastî de dibê bizanin ku hevokên wisa zêdetir di raweyên xwastek û mercî de tên gotin.

Egr to mamostam bîğ, min qutabîğ debim.

Eger beyekewe bijîğ, to biram debîğ.

Her wisa di lêkera bûna guhraw de jî cînavkên bihêz dikarin rola ravekera têrkerê bilîzin. Mînak:

Min bûme mamostağ. (D.Borî)

Min debime qutabîğ. (D.Neborî)

Êwe bibin be mamostağ. (Raweya Fermanî)

Divê ev li vir jî ji bîr nekin ku di raweya fermanî de cînavkên kesê duyem "t/it – tan" nikarin rola ravekera têrkera raweya fermanî a bûna guhraw bibînin.

---

<sup>260</sup> Ebdulwahîd Xalîd Mûsa, "*Rêzmanî Bûn û Hebûn le Kurdîde*", R. 34.

### 4.3 Berhevixistina Cînavkên Pêve ya K. Jorîn û Jêrîn di Rola Hevoksaziyê de:

#### 4.3.1 JI Aliyê Cudahiyê Ve:

❖ Di Rola Kirde da:

Di K. Jêrîn de ger ku lêkera hevokê gerguhêz be û di dema borî de be cînavkên kesî yên pêve desteya bihêz rola kirde dibînin, li gor hebûna kerseyên hevokê cihê xwe diguhirin. Di K. Jorîn de ti deste cînavkên pêve tune ye. Ger lêker gerguhêz be û di dema borî de be rola kirde bibînin. Her wisa ti deste cînavkên pêve nikarin cihê xwe biguhirin.

❖ Di Rola Cîgira Kirde de

Di K. Jorîn de cînavk bilêkerên alîkar ve tînin nivîsin, di K. Jêrîn lêkera alîkar tune ye. Ji ber wê bilêkera bingehîn ve tînin nivîsin.

❖ Di Rola Nîhad de

Di awayê nivlêkera bûnê de dibe hin cudahî di awayê teşeya herdû zarava de hebe. Ev ne karê me ye. Di awayê karkirin û teşeya cînavkên pêve ya her dû zarava de cudahî di dema niha ya nivlêkera bûnê heye. Mînak

- 1- Di K. Jorîn cudahî heye ger nivîsin bi elfabêya aramî be û bi elfabêya latînî be. Ji ber ku ger bi elfabêya latînî be di dema niha ya nivlêkera bûna bingehî de cînavk bi awayî serbixwe tînin nivîsin. Di K. Jêrîn de ti carî cînavkên pêve bi awayî serbixwe nayên nivîsin. Cudahî jî di awayê nivîsînê de dişê ji bo wê yekê bizivirête vê ku piraniya lêkolîn û nivîsîna K. Jorîn bi elfabeya latînî ye. Ya K. Jêrîn jî bi elfabeya aramî ye.
- 2- Her wisa di K. Jorîn û jêrîn de qertafa dema niha ya nivlêkera bûna bingehîn xuya nake. Di K. Jêrîn de ji ber ku di kesê siyem a yekjimar de cînavk bi awayê morfîma"Ø" e qertafê dema niha jî bi "e" xuya dike. Di K. Jorîn de ji ber ku "e" bi xwe di kesê siyem a yekjimar de cînavk e û di hemû awayên nivlêkerên dema niha û bê "e" mîna cînavk tê xuyakirin. Wek cînavk di kesên din de jî cînavkên pêve hertim morfa wan heye. Ji ber wê qertafa dema niha di K. Jorîn xuya nake.

- Di Rola Bireser de:

Di K. Jorîn de em nikarin di dema bê û niha de bireserê bi cînavkên pêve bilêvbikin. Ji ber ku cînavkên pêve xwerû ne, di K. jorîn de jî didema niha û bê de bireser tewandî ye lê Di K. Jêrîn dikarin di dema niha û bê(Neborî) bireser bi cînavkên pêve bilêvbikin.

- Di Rola Têrker de:

Di K. Jorîn de bi tu awayî cînavkên kesî yê pêve rola têkerê nalîzin lê di K. Jêrîn de di hemû cureyên lêkeran de û di hemû dem û raweyan de cînavkên kesî ya pêve dikarin rola têkerê bibînin ku gava daçek hebe di hevokê de.

- Di Rola Bireser, Têrker û Kirde de bi hevra:

Di K. Jorîn de cînavkên pêve nikarin rola kirde, bireser û têrkerê di hevokekî de bi hevra bibînin, ji bilî wê qet rola têrkerê nalîzin. Her wisa di K. Jorîn de jî qet du cînavkên pêve di hevokekê de nikarin bîn bilêvkirin. Di K. Jêrîn de dişê du cînavkên pêve an sê cînavkên pêve di hevokekî de rol bilîzin û wan bilêvbikin.

- Di Rola Raveker de

Di K. Jorîn de bi tu awayî cînavkên kesî rola ravekerê nalîzin. Lê, di K. Jêrîn de cînavkên bihêz û bêhêz, bê veqetandek dikarin rola ravekera navdêran bilîzin. Bi wateyeke din dikarin rola ravekerên hemû erkên hevoksaziya navdêran mîna kirde, cîgirê kirde, têrker û hwd bilîzin.

#### **4.3.2 Ji Aliyê Wekheviyê Ve:**

- ❖ Di rola kirde da:

1- Di K. Jorîn û jêrîn de ger ku lêkera hevokê negerguhêz be û di dema borî de be cînavkên desteya -1 rola kirde dibînin. Cihê wan cînavkan bi curek e di her dû kurmanciyan de mîna hev bi dawiya lêkerê ve tîn nivîsîn. Di herdû kurmanciyan de de qertafa dema borî dibe dû beş û "e" diçe dawiya cînavkên pêve. Di herdû kurmanciyan de cînavkên desteya-1 diçe dawiya qertafê çîrokiya dema borî.

2- Di K. Jorîn û jêrîn de ger lêker gerguhêz û negerguhêz be û di dema niha û bê (neborî) de be cînavkên kesî yê pêve desteya-2 rola kirde dibînin û bi dawiya lêkerê ve tên nivîsîn. Her wisa di K. Jorîn desteya -4 mîna desteya -3 ya K. Jêrîn e, di her duyan de di raweya fermanî de rola kirde dibînin û bi dawiya lêkerê ve tên nivîsîn.

❖ Di Rola Cîgira Kirde de:

Di K. Jorîn û jêrîn de ger ku lêkera hevokê lêkerekê tebatî be û di dema borî de cînavkên pêve rola cîgira kirde dibînin û bi dawiya lêkerê ve tên nivîsîn. Cihê wan di hemû awayên dema borî de mîna hev e. Her weha di K. Jorîn û Jêrîn di dema borî desteya-1 di dema niha û bê de cînavkên desteya-2 rola cîgira kirde dibînin.

❖ Di Rola Nîhad de:

Awayê teşê û sazûna lêkera bûnê di K. Jorîn û jêrîn de di herdû zarava gelek nêzî hev in. Bi curek di herdû zarava de sê cureyên nivlêker hene. Di her dû zarava de ew destê cînavk rola nîhad dibînin ku ji aliyê form û karkirin ve gelek nêzî hev in û ew destê cînavkin ku di K. Jêrîn navê wan desteya bêhêz e, bi curek:

- 1- Di her dû zarava de di dema boriya her sê celebên nivlêkera bûnê de cînavkên kesî yê pêve desteya-1 rola nîhad dibînin, cihê herdûyan jî mîna hev e.
- 2- Di dema niha ya nivlêkera bûna guhraw û bûna heyî de di her duyan de destê cînavkên -2 rola nîhad dibînin û cihê herdûyan mîna hev e.
- 3- Her wisa di dema bê de jî di her sê celebên nivlêkera bûnê de desteya -2 rola nîhad dibînin û li her dû zarava cihê wan mîna hev e.

• Di Rola Bireser de:

Di K. Jorîn û Jêrîn de di lêkerên dema borî de cînavkên pêve desteya-1 rola bireserê dilîzin û bi dawiya lêkerê ve tên nivîsîn. Bi heman awayî di K. Jêrîn de jî di lêkerên dema borî ya gerguhêz de cînavkên bêhêz-1 rola bireserê dibînin û bi dawiya lêkerê ve tên nivîsîn.

❖ Di Rola Têrker de:

aliyê wekhevîyê ve tune ye.

- ❖ Di Rola kirde, Bireser û Têrkerê bi hevra:  
aliyê wekheviyê ve tune ye.
- ❖ Di Rola Ravekerê de:  
aliyê wekheviyê ve tune ye.





## ENCAM:

- 1- Di zimanê kurdî de du cureyên cînavkên kesî hene; yek serbixwe û yek jî pêve ku li dewsa navdêran tên ji bilî kesê siyem ku ew dikarin li cihê navdêran bê. Cînavkên kesî yek ji mijarên herî giring a rêzimana kurdî ye. Bi awayekî hevok û axaftin bê cînavkên kesî çênabe, her çiqas gelek kesan gotiye cînavkên kesî yên pêve ya K. Jorîn û cînavkên pêve ya bêhêz a K. Jêrîn ne cînavkin lê di her du kurmanciyan de cînavk in ji ber ku li dewsa navdêran tên.
- 2- Di K. Jorîn de du destê cînavkên kesî yên serbixwe hene; yek xwerû ye û yek jî tewandî ye, her wisa desteyek jî cînavkên kesî yên pêve hene, ku ev jî li gor awa û cureyên lêkeran dibine çar desteyên piçûktir. Di K. Jêrîn de tenê yek destê cînavkên kesî yên serbixwe hene ku ew jî xwerû ne. Mîna desteya xwerû ya K. Jorîn lê teşeya wan zêdetir nêzî desteya tewandî ya K. Jorîn ne, her wisa di K. Jêrîn de du destê cînavkên kesî yên pêve hene ku her du destê jî xwerû ne. Desteya yekem bihêze û cihê xwe hertim diguherin di erkên hevoksaziyê de zêdetir mîna desteya serbixwe ya tewandî ya K. Jorîn ne. Desteya duyem a pêve ya K. Jêrîn dibê sê desteyên piçûktir. Awayê teşe û bikaranîna wê mîna desteya cînavkên pêve ya K. Jorîn ne, ji ber ku ew jî mîna wê hertim bi dawiya lêkerê ve tê nivîsin. her wisa awayê teşeyê jî gelek nêzî hevin.
- 3- Cînavkên kesî yên serbixwe di her du zaraveyan de ji bilî kesê pirjimar siyemîn a desteya tewandî ya K. Jorîn û K. Jêrîn hemû bi serê xwe tenê yek morfîmin, kesê yekem û duyem a yekjimar û pirjimar, yekjimar a siyemîn her çiqas di nav xwe de xwedanê morfîmiya yekjimar û pirjimar in lê belê ji ber ku morfîma wan naye cuda kirin, ji ber wê bi yek morfîm tên hejmarkirin.
- 4- Cînavkên kesî yên serbixwe di her du zaraveyan de ji bilî kesê siyem, tu têkelî di navbera pirjimarî û yekjimarî de tune ye. ji ber kesê siyem a xwerû dubareyên hevûdine cînavkên kesê siyemîna tewandî ya K. Jorîn û kesê siyemîn K. Jêrîn cînavkên yekjimar hatine pir hejmarkirin.
- 5- Cînavkên kesî yên pêve di her du zaraveyan de dikevin bin bandoriya jîngeha derdora xwe, her yek ji wan zêdetir li yek teşe û morfê xuya dike.

- 6- Cînavkên kesî yên pêve ji bilî desteya bihêz a K. Jêrîn di her du zaraveyan de tu têkelî di navbera yekjimar û pirjimaran de tune ye..
- 7- Di wêje ya kilasîk û devokên K. Jêrîn de cînavkên kesî yên serbixwe mîna cînavkên kesî îro ya standart a K. Jorîn in, ji ber ku di devokên mûkriyan û xoşnawetî ... Hwd û wêjeya kilasîka K. Jêrîn de du deste cînavk hebûne yek mîna tewandî û yek jî mîna xwerû, teşeya wan jî gelek nêzî hev bûye. Lêbelê di wêjeya kilasîk û devokên K. Jorîn de cînavkên kesî yên pêve teşeya wan zêdetir nêzî awayê standarta îro ya K. Jêrîn bûye. Taybet kesê pirjimara yekemîn û yekjimara siyemîn di wêjeya berî û devokên behdînî û botan ... Hwd de zêdetir nêzî cînavkên standart a K. Jêrîn ne.
- 8- Cînavkên serbixwe ya K. Jêrîn dikarin hemû erkên hevoksazî bilîzin, di hemû dem, rawe û cureyên lêkeran lê ya K. Jorîn desteya xwerû nikarin rola raveker û têrker bilîzin. Her wisa di erkên din de jî nikarin bi hemû cureyên lêkeran re hemû erkên hevoksaziyê bilîzin. Mînak tenê di lêkerên negerguhêz a dema bê û niha ya gerguhêz dikarin rola kirde, di lêkerên tebatî de rola cîgira kirdeyê, di nîvlêkeran de rola nîhad û di dema borî ya gerguhêz rola bireser dilîzin. Her wisa cînavkên tewandî jî qet nikarin rola raveber, cîgira kirde û nîhadê bilîzin. Di erkên din de jî tenê di awayê tewandî de dikarin wan rolan bilîzin. Mînak di lêkerên dema borî ya gerguhêz rola kirdeyê, di dema niha û bê de rola bireserê û di hemû cureyên dina lêkeran rola têrkerê dilîzin.
- 9- Di her du zaraveyan de du cureyên rêkeftina bingeî hene ku di K.Jorîn de cînavkên desteya tewandî qet nikarin rola Rêkeftinê bibîne. Her tim desteya xwerû û cînavkên pêve rola rêkeftinê dibînin; di lêkerên dema borî ya gerguhêz rêkeftin di navbera bireser û kirdeyê de heye, di lêkerên negerguhêz û dema niha û bê ya gerguhêz de rêkeftin di navbera kirde û lêkerê de ye. Di K.Jêrîn her sê cureyên cînavkan dikarin rola rêkeftinê bibîni. Ger lêkera hevokê di dema borî ya gerguhêz de be rêkeftin di navbera kirde û bireserê de ye. Di lêkerên negerguhêz û dema neborî ya gerguhêz de rêkeftin di navbera kirde û bireserê da ye. Wateya di K. Jorîn û K. Jêrîn de rêkeftin di navbera kirde û lêkerê de heye, rêkeftin di

navbera kirde û bireser tenê di K. Jêrîn de heye. Rêkeftin di navbera bireser û kirdeyê jî de tenê K. Jorîn de heye.

10- Cînavkên pêve di K. Jêrîn de dikarin hemû rol û erkên mîna "kirde, bireser, cîgira kirde, têrker, nîhad, raveker"ê bilîzin. Her wisa dişê di hevokek de kirde û bireser û têrker bi cînavkên pêve bihên lêvkin. Dikarin du cînavkên pêve li du hev bên. Tenê nikarin rol raveber bilîzin. Di K. Jorîn de cînavkên pêve dikarin di lêkerên negerguhêz û dema niha û bê ya gerguhêz de rola kirdeyê, di lêkerên dema borî ya gerguhêz jî rola bireserê, di lêkerên tebatî jî de rola cîgira kirdeyê û di nîvlêkeran de jî rola nîhadê dilîzin. Qet di K. Jorîn de cînavkên pêve nikarin rola têrker û raveker bilîzin. Her wisa qet du cînavkên pêve di hevokekî da neyên bi hev re.

11- Cînavkên pêve ya bêhêz yê K. Jêrîn in jî mîna cînavkên pêve ya K. Jorîn qet di hevokekî de tu car bi hev re nayên. Di her du zaraveyan de her tim di dawiya lêkeran de tên. Taybetmendiya wan gelek nêzî hevin. Cînavkên bihêza ya K. Jêrîn zêdetir nêzî cînavkên tewandiya K. Jorîn ne, ji ber ku her du cînavk wateyê xwedanî nîşan didin.

Di dawî de em dikarin bêjin mixabin ji ber qedexekirin û wan guherînên li gor demê bi ser her dû zaraveyan tê her dû zarave hêdî hêdî li hevdû dur dikevin.



## ÇAVKANÎ:

Pirtûkên Kurdî:

- 1- Aktuğ Halil, "*Giramers Kurdî – Kürtçe Gramer*", Avêsta, Stembol, 2013.
- 2- Ahmed Hesên Ahmed, "*Rêzmana Kurdî – Be kurdî û 'Erebî'*", *Bergî yekem, Çapî Yekem, Çapxaneyî Dar El-Cahz, 1976.*
- 3- Aydoğan Mistef, "*Rêbera Rastnivîsînê*", Çapî yekem, Rupel, 2012.
- 4- Aydoğan Îbrahîm Seyda, "*Rêzmanên Kurdî û termînolojiya Wan ya Zimannasiyê*," Inalco, Parîs 2011,
- 5- Bedirxan Celadet Alî, "*Bingehên Gramêra Kurmancî*", Avêsta, Istanbul, 2010.
- 6- Baran Bahoz, "*Rêzmana Kurmancî*", Çapxane: Kayhan Matbaacılı Davutpaşa Ced, Diyarbekir, 2012..
- 7- Barvî Arşîk, "*Zarê Zêrîn Lêvegera Rêzmana Kurdî bi Şêwezarê Kurmancî*", PDF, Bê sal.
- 8- Cemal Hebîb Alle, "*Lebabet Rêzimanî Horamîyewe*", Çapemenî Peyiv, 2007.
- 9- Cemal Nebez, "*Zimanî Yekgirtuy Kurdî, Billawkirdinewey Yekêtî Neteweyî Xwêndkaranî Kurd le Ewropa, Bambêrg, 1976.*
- 10- Derun Ebdurehman Salih, "*Îkonomî le Astekanî Zimanî Kurdî de*", le Bilawkirdinewey Ekadîmyay Kurdî, Çapxaney Hacî Haşim, Hewlêr, 2012.
- 11- Ebdulftah Deham, "*Cînav*", Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Stembol, 2006.
- 12- \_\_\_\_\_ "*Kar (Lêker) di Zimanê Kurdî de (K. Jorîn)*", Çapa Êkê, Çapxaneyê: Hecî haşim, Hewlêr, 2012
- 13- Ebdulkerîmî Muderîs(Mela) û Fatîh Ebdulkerîm, "*Dîwanî Nalî*", Entîsarat kirdistan, Çapî Hewtem, Sine, 1389.
- 14- Ewrehmanî Hcî Marif, "*Rêzmanî Kurdî*", *Bergî yekem "Wişesazî", Beşî Duwem "Cênaw"*, Dezgayî Roşinbîrî û Bilawkirdneweyî Kurdî, Bexda, 1987.
- 15- \_\_\_\_\_, "*Rêzmanî Kurdî, Bergî Yekem(Wişesazî), Beşî Pêncem(Kirdar)*, Dezgay Çap û Pexşî Serdem, Slêmanî 2000.
- 16- \_\_\_\_\_, "*Ferhengî zaraway zimannasî*", Dezgay Çap Billawkirdnewey- Rojhelat, Çapî Duyem, Hewlêr, kitêbxaney Awêr, Hewlêr, 2014.

- 17- Emîr Mihemd Mihemd Emîn, "*Wişey Erkî le Zimanî Kurdî de*", Çapî Yekem, Dezgayî Çap û Pexşî Narîn, Hewlêr, 2016.
- 18- 'Ebdula Husên Resul, "*Çend Basêkî Wirdî Zimanewanî – Kurdî*", Bergî Yekem, Çapî Yekem, Çapxaney- Hêvî, Hewlêr 2015.
- 19- Ebdul Wahîd Muşîr Dizeyî, "*Zare kurdîyekan*", çapî yekem, çapxaney Pak, Hewlêr, 2011.
- 20- \_\_\_\_\_, "*Rêzmanî Kurdî*", Çapî Yekem, Nawendî Awêr bo Çap û Billawkirdinewe, Hewlêr, 2014.
- 21- Ebdulwahîd Xalîd Mûsa, "*Rêzmanî Bûn û Hebûn le Kurdîde*", Çapî Yekem, Çapxaney Minare, Hewlêr, 2010.
- 22- Ehmedê Xanî, "*Mem û zîn*", Şîrove û Kurdiya Îro: Jan Dost, Çapî Yekem, Avêsta, Stembol, 2010.
- 23- Hejar Ebdurehman Şerifkindî, "*Henbane Borîne Ferhengî Kurdî – Kurdî – Farsî*", Yek Cildî, Çapî Şeşem, Sirûş, Tehran, 1388.
- 24- Hêmin Mukiriyânî, "*Dîwanî Hêmin*", Çapî yekem, Çap û Pexşî Çiwar Çira, 2708.
- 25- Îbrahîm R. Surçî, "*Felsefey Avêsta Binema Dîn û Zimanekane*", Çapxaney Roşinbîrî, Hewlêr, 2010.
- 26- Karbax Abdulla, "*Rêzimana Kurdî ya Kurmancî*", Bêsal(PDF).
- 27- K. K. Kurdoyêv, "*Rêzimanî Kurdî be Kerestey Dîyalêktî Kirmancî û Soranî*", Wergêr Kurdistan Mukiryan, Çapxaney El-Edîb El-Bexdadî, Bexdad, 1984.
- 28- Kurdî Reşîdê, "*Rêzimana Zimana Kurmancî*", Ji Elfabêya Latînî Veguhaztiye Erebi: Îsmahîl Teha Şahîn, Çapê Êkê, Çapxanaî Xanî, 2008.
- 29- Kurdistan Mukiriyânî, "*Sîntakîsî Ristey Sade Le zimanî Kurdî de*", Bê sal.
- 30- Kurdo Qenatê, "*Rêzimana Kurdî(Kurmancî – Soranî)*", ji Kurdiya Soranî: Zülküf Ergün, Çapa yekem, Çapxane NûBihar, 2013.
- 31- Lîjiney Ziman û Zanistekan le Korî Zaniyarî Kurd, "*Rêzmanî Axawtinî Kurdî*", Dezgayî Çap û Bilawkirdnewey Aras, Çapî Duyem, Çapxaneyî Aras, Hewlêr, 2011.
- 32- Lîjneyek le Wezaretî Perwerde, "*Ziman û Edebî Kurdî*", Polî Dwazdehemî Amadey, Lîney Pêdaçunewey Zanstî: Fereydûn 'Ebdul Berzincî, Mistefa

- Mihmmmed Zengene...Hwd, Çapî pêncem, Çapxaney: El-Msteqbel, Lubinan, 2010.
- 33- \_\_\_\_\_, "*Ziman û Edebî Kurdî*", Polî Noyemî Bineretî, Bijardekirdin û Darştineweyî: Şêrko Ehmed Hewêz, Feysel Mistefa Hacî... Hwd. 2010.
- 34- \_\_\_\_\_, "*Ziman û Edebî Kurdî*", Polî Heştemî Bineretî, Bijardekirdin û Dariştineweyî: Yasîn Usman Hesên, Şêrko Ehmed Hewêz...HWD, Çapî pêncem, Çapxaney Dar, Lubinan, 2012.
- 35- Mes'ud Mihemed, "*Zarewesazî Pêwane*", Dezgay Çap û Billawkirdinewey Aras, Çapî Yekem, Çapxaney Aras, Hewlêr, 2011.
- 36- \_\_\_\_\_ "*Hindê Babetî Ziman û Rênûsî Kurdî*", Dezgayî çap û bilawkirdeneweyî Aras, Çapî duwem, Çapxaneyî Aras, Hewlêr, 2011.
- 37- Mezin Usman, "*Hendê Berawirid û Serncî Zimanewanî*", Çapxaney Şehab, Hewlêr, 2008.
- 38- Mihemed. E. Elî û Dîlan Elî, "*Nasîna Rêzmanî Kurdî, Pirtûka fêrkirinê*" (PDF), Efrîn, 2012.
- 39- Mehemed Me'ruf Fetah û Sebah Reşîd Qadir, "*Çend layenêkî Morfoflojî Kurdî*", Dezgayî Bilawkirdineweyî Beşî Runakbîrî, çapxaneyî Rûn Silêmanî, 2006.
- 40- Mela Mehmûdê Bayezîdî, "*Adat û Rusûmatnameê Ekradiye(1797 - 1867)*", Ravekirin, Tîpguhêzî û Lêkolîn: Jan Dost, Çapî Duyem, Nûbihar, 2012.
- 41- Mukiyânî Gîwî, "*Ferhengî Kurdistan (Kurdî – Kurdî)*", Çapa Duyem, Çapxane Gun Matbaacılık, Enstîtuya Kurdî ya Amedê, Amed, 2010, R. 941.
- 42- Nerîman Xoşnaw, "*Rêzmanî Kurdî*", Çapî Siyemû Çap û Billawkirawey Ziyadkiraw, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2011.
- 43- \_\_\_\_\_, "*Ristesazî*", Çapî Yekem, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr. 2012.
- 44- \_\_\_\_\_, "*Rêzmanî Kurdî – Kirmancî Serû*", Çapî yekem, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2015.
- 45- Nurî Elî Emîn, "*Rêzmanî Kurdî*", Çapî duyem, Rêkixitnewe û le çapdanweyî: Nerîman Ebdulla Xoşnaw, Çapxaneyî Rojhelat, Hewlêr, 2012.
- 46- \_\_\_\_\_, "*Erk û Şiwênî Ranawe Kesyeke le (Axawtinî Kurdî) de*", Dezgay Roşinbîrî û Billawkirdinewey Kurdî, Mett'le El-Zeman, Bexdad, 1986.
- 47- Nî'met 'Elî saye, "*Rêzmanî kurdî – Zarî kelhurî*", Çapxaney Şivan, Slêmanî, 2004.

- 48- Ocek Nezîr, "*Waneyên Rêzimana Kurmancî*", Sîtav, 2014.
- 49- Onen Ronayî û Tan Samî, "*Hînkêr – Kurmancî*", asta duyemîn, çapê çaremîn, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Weşan: Soylu Matbaa, stenbil, 2014.
- 50- \_\_\_\_\_, "*Hînkêr – Kurmancî*", asta Yekemîn, çapa duyemîn, Enstîtuya kurdî ya stenbolê, çapxane: soylu matbaa, stenbil, '2015.
- 51- Oskarman, "*Tuhfey Muzeferîye*", Pêşekî û Saxkirdinewe û Hênane Ser Rênûsî Kurdî: Hêmin Mukiryanî, Çapî Sêyem, Dezgay Çap û Billawkirdinewey Aras, Hewlêr, 2011.
- 52- Rojan Nurî 'Ebdulla, "*Ferhengî Zarawesazî*", Xaney Çap û Billawkirdnewey ÇiwarÇira, Çapî Yekem, Slêmanî, 2007.
- 53- Ruxzadî 'Elî, "*Rêzimanî Kurdî Soranî*", Çapî yekem, Întşarat Kirdistan, Sine, 1389.
- 54- Refîq Şiwanî, "*Wieşazî Zimanî Kurdî (Lêkolîneweyekî Piraktîkiye)*", çapî yekem, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2011.
- 55- Se'îd Sidqî Kaban, "*Mitesir sirif û Nehuy kurdî*", Cizî yek, çapî yekem, Çapxaney Nicih, Bexdad, 1928.
- 56- Samur Azîz, "*Rêzman û Rastnivîsa Kurdiya Kurmancî*" Çapa Duyem, Çapxane: Nûbehar, 2014,
- 57- Sadiq Behaedîn Amêdî, "*Rêzimana Kurdî'Kirmancîya Jorî û Jêrîya Hevberkrî*", Çapa Êkê, Çapxana Dar El-Şû'n El-Diqafe El-'ame, Bexdad, 1987.
- 58- Şehab Teyb Tahîr, "*Binema û Pêkhatê Zarawe le Zimanî Kurdîde*", Berêweberatî Çap û Billawkirdineweyî Silêmanî, Çapxaney Kemal, Silêmanî, 2012.
- 59- Şêrko Baban, "*Mîkanîzime Bineretiyekanî Ristesazî Rêzmanî Bûn û Hebûn*", Wezaretî Roşinbîrî, Çapxaney ofisî Krîstal, Hewlêr, 1997.
- 60- \_\_\_\_\_, "*Şirove karî rêzmanî le Zimanî Nûsînda*", Çapxaney Zankoy Selaheddîn, Hewlêr, 2000 R. 13.
- 61- \_\_\_\_\_ "*Zimanî Nusînî Rêzmandar*", Dazgay Çap û Billawkirdineweyî Aras, Çapî Yekem, Çapxaney Dezgay Aras, 2008.
- 62- \_\_\_\_\_, "*Hendê le Akare Rengînekanî Rêzmanî Kurdî*", Çapî Yekem, Dezgay Tuyêjînewey Mukiryan, Çapxaney Xanî, 2008.
- 63- Şêrko Baban, "*Ristesazî û Şîtelkarî Zanstî*", çapxaney Minare, Hewlêr, 2015.



- 64- Tan Samî, "*Rêzimana kurmançî*", Çapa Berfirehkirî, Çapa Duyemîn, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2011.
- 65- Taş Çetîn, "*Waneyên Rêzman û Rastnivîsa Kurmançî*", Çapa Duyemîn û Berfirehkirî, Diwan, Istanbul, 2013.
- 66- *Tewfîq Wehbî*, "*Desturî Zimanê Kurdî*" *Cizmê yekem*, *Dar El-Tabî'e El-HesîEs*, *Bexda*, 1929.
- 67- Umêd Berzan Bizro, "*Dirûstey Firêz û Riste le Zimanê Kurdîde*", Çapî Duyem, Çapxaneyî Genc, Silêmanî, 2012.
- 68- Umêd Berzan Bizro, "*Rêzimanî Cênaw le Şêwezari Xaneqînîda*" (Lêkolîneweyekî Karekîye)", Xaney Çap û Bilawkirdinewey ÇwarÇira, Çapxaney Çiwar Çira, Silêmanî, 2009.
- 69- Fereydun Ebdul Berzincî, "*Nadiyarî*", Berêweberatî Çap û Billawkirdinewey Silêmanî, Çapxaney Roman, Silêmanî, 2008.
- 70- Wiriya Umer Emîn, "*Asoyekî Tirî Zimanewanî*", Bergî Yekem, Dezgayî Çap û Billawkirdineweyî Aras, Hewlêr, 2009.
- 71- \_\_\_\_\_, "*pîtokekanî zimanewanî*", Dezgayî Çap û Bilawkirdineweyî Aras, Çapî Yekem, Çapxaneyî Aras, 2011.
- 72- Xazî 'Elî Xurşîd, "*Rêzimana Fermî*", Çapî Yekem, Dezgayî Çap û Pexşî Serdem, Silêmanî, 2013.
- 73- Xesro Ehmed Xoşnaw, "*Berkar le Zimanê Kurdîde – Be Pêy Rêbazî Formî*", Çapxaney Wezaretî Roşinbîrî, Hewlêr, 2008 Yildirim Kadri, "*Fêrkerî Soranî*" Rêzman Ferhengî Mijarî Axawtin, Istanbul, 2014.
- 74- Yusif Şerîf Se'îd, "*Zimanewanî*", Kokirdinewey Nerîman Xoşnaw, Çapî Yekem, Çapxaney Rojhelat, Hewlêr, 2011.
- 75- Fazil Umer, "*Çend Awrek li Zimanê Kurdî*", Çapî Êkê, Çapxane: Wezaretê Perwerdê, Hewlêr, 2004.

**Kovar:**

- 1- Ednan Ehmed Elî, "*Xwêndineweyek bo Pênasey Cênawî Likaw*", Govarî Ziman-nasî, Jimare "14", Hewlêr, 2012.
- 2- Ebdûla hûsên Resûl, "*Pênasy Ristey Sade*", Govarî Zankoy Dihok, Jimare "2", Hewlêr, Tişrînî Yekem. 1999.

- 3- \_\_\_\_\_, "*Ranawe Kesyekanî Şêwezaeî Xoşnawetî*", Govarî Zankoy Sellaheedîn, 10. Hûzeryan, Hewlêr, 2000.
- 4- \_\_\_\_\_, "*Erkî Morfîmî "e" le Zimanî Kurdîde*" Govarî Sabat, Jimare"1", Hewlêr, 2005.
- 5- Ewrehmanî Hacî Marif, "*Cênawî kesî Cuda le Zimanî Kurdîde*", Govarî korî zaniyarî Êraq - destey kurid, Bergî diwazdehem, Çapxaney Korî Zaniyarî Êraq, Bexda, 1985.
- 6- Îbrahîm Ezîz Îbrahîm, "*Gîrugirfî Nûsînî Firman Legel Ranaw Lerûy Pêkewenûsan û Pêkeweneûsanewe*", Govarî Korî Zaniyarî Êraq – Destey Kurd, Bergî Noyem, Çapxaney Korî Zaniyarî Êraq, Bexda, 1982.
- 7- Mes'ud Mehemed, "*le Awêtey Em Gutsreda Tîşkî Çend Çirayek*", Govarî Karwan, Govarî Emîndaryetî Gîştî Roşinbîrî û Lawan, Jimare"20", Hewlêr, Maysî 1984.
- 8- \_\_\_\_\_, "*Surêkî Xame Bedewrî Ranaw de*", Govarî Korî Zaniyarî Kurd, Bergî Duwem – Beşî Yekem, Çapxaney Korî Zaniyarî, Bexda, 1974.
- 9- Mukiriyaniî Kurdistan, "*Corekanî Cênaw û Dewryan le Ristey Kurdîde le Diy-alêkitî Kirmancî Xwarû û Kirmancî Jûrûda*", Govarî korî Zaniyarî Êraq, Bergî Hewtem, Çapxaney Korî Zaniyarî Êraq, Bexda, 1980.
- 10- Nerîman Ebdulle Xoşnaw, "*Nîhad û Guzare*", Beşî Sêyem, Govarî Ziman-nasî, Jimare"11", 2011.
- 11- Saman mihemed, "*Cênawekan le Beşe Diyalêktî Xwarûda*", Govarî Raman, jimare: 67, Dezgay Roşinbîrî û Rageyandinî Gullan, Hewlêr.
- 12- Şêrko Baban, "*Cênawî Likaw be Berawird*", Govarî Raman, jimare "39", Dezgay Roşinbîrî û Rageyandinî Gulan, Hewlêr, 1999,.
- 13- \_\_\_\_\_, "*Piley Pole Cênawekan*", Govarî Karwan, Jimare 142, Hewlêr, şubatî. 2000.
- 14- Twfîq Wehbî, "*Eslî Pite Qallbî "e"y Şêwey Silêmanî*" Korî Zaniyarî Kurd, Bergî yek, Çapxaney Korî zaniyarî Kurd, Bexda, 1973.
- 15- Umêd Berzan Bizro, "*Morfîmî "e" le Rêzmanî kurdîde*", Beşî Duwem û Kotayî, Govarî Zimannasî, Jimare "11", Hewlêr, 2011.
- 16- Wirya Umer Emîn, "*Ristey Biker Nadiyr*", Govarî Roşinbîrîş Niwê, Jimare"95", Bexda.1982.

- 17- \_\_\_\_\_, "*Rêkkewtin le Zimande*", Govarî Roşinbîrî niwê, Jimare 92, Bexda, 1982.
- 18- Wiriya Umer Emîn, "*Peywendî Ranaw û Firman le Kirmancîyê Jûrûda*", Go-varî Karwan – Emîndarêtî giştî bo roşinbîrî û lawan ,jimare 2, Hewlêr, 1983.
- 19- \_\_\_\_\_, "*Layenêkî Ciyawazî*", Govarî Korî Zaniyarî – destey Kurd-Çapxaneyî Korî Zaniyarî, jimare"10", Bexda, 1983.
- 20- \_\_\_\_\_, "*Rêzmanî Ranawî Likaw* ", Govarî Karwan, Jimare 8, Hewlêr, 1986.
- 21- \_\_\_\_\_, "*Rêzmanî Ranaw – Hindê Şikirdinewey Morfolojî*", Govarî Roşinbîrî Niwê, Jimare "115", Bexda, 1987.
- 22- \_\_\_\_\_, "*Rêzmanî Ranaw Le kirmancî, Jûrûde*", Govarî Korî Zaniyarî Êraq – Destey Kurd, Jimare"21", Bexda, 1990.
- 23- \_\_\_\_\_, "*le Peywendiyekanî Biker Nadiyar*", Govarî Roşinbîrî Niwê, Jimare"129", Bexda, 1992.
- 24- \_\_\_\_\_, "*Lêkolîneweyekî Morfofonemî*", Govarî Korî Zaniyarî Êraq- Destey Kurd, Çapxaney Korî Zaniyarî, Jimare "29 û 30", Bexda, 2002.
- 25- Yusif Şerîf Se'îd, "*Cênawî kesî le Kurdî û Farsîde*"(lêkolîneweyekî wesfî Berawirdkarîye), Govarî Zankoy Selaheddîn, jimare 6, Hewlêr, 29. ayarî .1999.
- 26- Sindî Bedirxan, "*Ez û Min û Rêzimanê kurdîde*", Govarî Korî Zaniyarî Êraq – Destey Kurd, Bergî Dehem, Çapxaney Korî Zaniyarî Êraq, Bexda, 1983.

### **Tezên Çapnebûyî**

- 1- Ebûbekir Umer Qdir, "*Berawirdêkî Morfosîntaksî le Zimanî Kurdî û Farsî de*", Namey Diktora, Kolêjî Ziman, Zankoy Silêmanî, 2003.
- 2- Mizgîn 'Ebdurehman Ehmed, "*Doxî Êrgetîv le Zimanî Kurdîde(kirmancî serû)*", Namey Master, Kolêjî Perwerde, Zankoy Selaheddîn, Hewlêr.2006.
- 3- Miwefeq Zubêr Yasîn, "*Cihnav di Navbera Zimanê Kurdî û 'Erebîde*", Namey Master, Fekoltiya Zanstên Mirovat, Zankoy Zaxo, 2013.
- 4- Taban Nûrî Heme Se'îd, "*Şêwezarî Nawçey Pişder*", (Lêkolîneweyekî Zimanewanî Wesfîye), Namey Master, Kolêjî Ziman, Zankoy Selaheddîn, 2011.

- 5- Tara Muhsîn Qadir, "*Cênaw: Lêkneweyekî Ziwê le Zimanê Kurdîde( Bekerestey Diyalêktî Xwarû)*", Namey Master, Kolêjî Ziman, Zankoy Slêmanî, 2014.
- 6- Umer Mehmud Kerîm, "*Karî Têper û Têneper le Zimanê Kurdî de(Kirmancî Xwarû)*", Namey Master, Kolêcî Perwerde – Îbin ruş, Zankoy Bexdad, 2004.
- 7- Xoşnaw Ezîz Hemeemîn, "*Rêzimanî Cênawî Likaw le Zimanî Kurdîde(Kirmancî Nawerast)*", Namey Master, Fakeltî Perwerde, Zankoyî Koye, 2014.

### **Erebî**

Elî Qasim, "*Miqedmt Fî Îlim El-Msttl*", El-ttb't El-ewelî, Silsle El-mewsu'e El-Sxîre, Daîre El-şûin Elseqafe û El-neşir, Bexdad, 1985.

### **Tirkî**

Yıldırım Kadri, "*Temel Alıştırma ve Metinlerle – Kürtçe- Kurmancî, Üçüncü Başkı, Avêsta, Istenbul, 2013.*

### **Îngilîzî**

- 1- Trask.R.L., "A dictionary of Grammatical Terms in Linguistics", Great Britain, Routledge, 1993.
- 2- Randolph Qurik and Sindney Greenbanm, A Universty Grammar of the English Language, London: Longman, 1992.

### **Internat**

- 1- Baran Rizgar,  
"<https://sites.google.com/a/baranrizgar.co.cc/azadiyakurdistan/home/pirs-u-mijaren-zimane-kurdi/paspirtiken-pevgiredan-tekiliye-veqetandek--e-i--e--a--en-paspirtiken-rewsa-nebinavkiri--ek--in>, 02.12.2016.
- 2- ww.Taranslate.google.iq, 11.12.2016
- 3- Husin Muhammad, "*Paşgirên kesî yên lêkeran û dîroka wan*", Kovara Kanîzar, Kovara Zimanê Kurdî, Hjmar.7,( <https://zimannas.wordpress.com/>), 8-9.2006.

- 4- \_\_\_\_\_, Cînav – Peydabûn û Bikaranîna wan, Govara zimanê Kurdî kanîzer, Hajimara 6, <https://zimannas.files.wordpress.com>, 6-7/2016

### **Hevdîtin**

Şêrwan Husên, Hevdîtina Şexsî, Çirîya Pêşîn 2011.

### **Destnivîs**

Şaswar herşîmî, "*Zanstî Berawiridkirdinê Pêwaney Le Zimanê Hîndo Ewrûpîyekanda*", Destnivîs.



## **XWE JÎNENÎGARÎ**

Di sala 21. 3. 1991. li bajarê Silêmaniyê hatim dinya yê. Min lîseya li xwendingeha "Alla" yê ji navçeya Qeladizê qedand. Herwisa lîsansa xwe li Beşa Ziman û Wêjeya Kurdî, li Zanîngeha Raperînê qedand. Niha jî li zanîngahê Y.Y.U ji bo lîsansa bilindadixebitim.

